Bunun üzerine Şeyh Sait, Şuşar üzerinden Karlıova'ya gelmiş, ilk toplantısını Kırıkhan'da yapmıştır. İkinci toplantısı Karlıova'da Cıbranlılarla yapmıştır. Üçüncü toplantısını Melekan'da Şeyh Abdullah ile olacaktır. Bu bölgedeki son toplantı Çan'da yapılacaktır. Hesen Hişyar Serdi, Çan toplantısının 1 Şubat 1925 yılında yapıldığını ve Azadi'nin ikinci kongresi olduğunu söylemektedir.* Bütün veriler değerlendirildiğinde bunun bir kongre değil kapsamlı bir toplantı olduğu anlaşılmaktadır. Daha sonra Genç üzerinden Piran bölgesine geçecektir. Şeyh Sait'in, Hınıs'tan ayrılmasının iki sebebi vardır. Tutuklanma ihtimaline karşı daha güvenli bir bölgeye gitmek ve çalışmaları hızlandır

mak. Hazırlıklar hızlandırılacak ve uygun mevsimsel koşullarda hareket kuzeyden başlatılacaktır. Azadi kadrolarında iki hususta tedirginlik vardır. Subay olan kadrolarının tutuklanması, hareketin vaktinden önce başlamasıdır. Korkulan olmuş, hareket 13 Şubat 1925 günü Piran'da başlamıştır. Bu tarih örgütün planladığı tarih değildir. Bir provakasyon sonucunda hareket başlamıştır. Bu olayın olmasında Şeyh Abdurrahim'in tez canlılığının rolü büyüktür. Hareket hızla çok geniş bir alana yayılmış, bir çok il ve ilçe ele geçirilmiştir. Piran'da başlayan hareketin engellenmesi için Azadi örgütü'nün Diyarbakır şubesi çaba sarf etmişse de başarılı olmamıştır. Hareketin kışın en olumsuz koşulların başlaması, hazırlıkların tamamlanmamış olması ve hükümet kuvvetlerinin askeri üstünlüğü, askeri hareketi yönetecek subay kadrolarının tutuklu bulunması, hareketin başarısızlıkla sonuçlanmasına sebep olmuştur.

Şeyh Sait, Diyarbakır'ın ele geçirilmemesi üzerine kuzeye yönelmiş, Şerafettin Dağlarını aşıp, Murat Nehrini geçerek İran'a gitmeyi planlamış, önünün askerlerce kesilmesi üzerine Muş-Varto arasında Murat Nehri üzerinde bulunan Abdurrahman Paşa köprüsüne geri geldikleri de, Binbaşı Kasım'ın ihbarıyla 15 Nisan 1925 günü yakalanmışlardır. Şeyh Sait ve arkadaşlarının abluka altına alındıkları 14 Nisan 1925 günü, Cıbranlı Kürt Miralay Halit Bey, Bitlis Milletvekili Yusuf Ziya Bey, kardeşi Teymen Ali Rıza, Damadı Faik Bey ve Mele Abdurrahman, Bitlis'te idam edildiler.

* Serdi, Hesen Hişyar, *Görüş ve Anılarım*, Med yayınları, İstanbul, 1994, s.193

Şeyh Sait ve arkadaşları Diyarbakır'a getirilmiş Şark İstiklal Mahkemesi'nde yargılamadan sonra 48 arkadaşı ile beraber 28 Haziran 1925 günü idam cezasına çarptırılmışlar ve 46 kişi aynı gece infaz edilmişlerdir. Doktor Fuat, 17 Nisan 1925, Seyit Abdulkadir ve oğlu, Seyit Mehmet, Palulu Abdullah Sadi, Bitlisli Kemal Fevzi, Hacı Ahti, Mehmet Tevfik, Hoca Askeri 27 Mayıs 1925 günü idam edilmişlerdir.

Geriye kalanlar iki guruba ayrılmış, Hasenanlı Halit Bey, Kolağası Kerem Bey, Şeyh Ali Rıza Bey'in bulunduğu grup İran'a, Halit Bey'in kardeşi Ahmet ve Selim Beyler iki yüz kişilik bir kuvvetle iki yıl dağlarda geçirmiş, 1927 yılında Suriye'ye giderek Fransızlardan iltica talebinde bulunurlar. İran'a geçenler, İran askerleriyle aralarında çatışma çıkmış, bu çatışmada Kolağası Kerem Bey ve Hasenanlı Halit Bey'in oğlu Şemsettin ölmüşlerdir. Şeyh Ali Rıza Bey, Suriye'ye geçmiş, Hasenanlı Halit Bey, bir süre Kürt lideri Sımko'nun yanına gitmiş, 1926 yılında döndüğünde yakalanmış, 31 Temmuz 1926 günü Diyarbakır'da idam edilmiştir.

Hareketin Niteliği ve Sonuçları

Resmi tarih 1925 Kürt Ulusal Hareketini "İngiliz destekli, irticai hareket" olarak nitelemiştir. Her ne kadar resmi tarih böyle lanse ederse de, bu dönemin devlet yetkilileri bunun bir milli hareket olduğunu itiraf edeceklerdir. Dönemin Başbakanı İsmet İnönü, 1987 yılında yayınlanan anılarında 1925 hareketi için şunları söyleyecektir:

"Şeyh Sait İsyanı'nın sebeplerini değerlendirirken dikkatli olmak kanaatindeyim. Herhalde bunu bir milli hareket olarak kabul etmek lazımdır."⁽³⁹⁾

Bugün bunun gibi birçok itirafa rastlamak mümkün. Arada geçen seksen yıllık süreçte Komünist Enternasyonal'in etkisiyle "aydın ve sol" geçinen çevrelerin, olaya bakışlarının, ağırlıkla devletin genel bakış perspektifini aşmadığını da belirtmek gerekir. Bu durumu dile getirenlerin başında araştırmacı Mehmet Bayrak gelir. Mehmet Bayrak, 1925 Kürt Ulusal Hareketini değerlendirirken, "Neden Şeyh Sait İsyanı değil?" diye sorar ve devam eder:

"Sahiden hiç düşündünüz mü? Neden resmi görüş, bir Koçgiri Hareketi'ne Alişan Bey Hareketi veya Alişer Hareketi; bir Dersim Hareketi'ne Seyit Rıza Hareketi demez de 1925 Kürt Ulusal Direnme Hareketi'ne "Şeyh Sait İsyanı"der?

Kimi kavramları ve terimleri, çoğu kez irdelemeden, sorgulamadan egemen düşüncenin dayattığı ve bizlere kanıksattığı şekliyle söyleriz. Farkına varmadan egemen değer yargılarının söylemini kullanırız. Bunun tipik örneklerinden biri de kuşkusuz Cumhuriyet döneminin en büyük Kürt Ulusal Hareketlerinden biri olan 1925 Kürt Ulusal Direnme Hareketi'dir."⁽⁴⁰⁾

1925 Kürt Ulusal Hareketi, tarihte eşine az rastlanır bir örnekle adı ve niteliği bakanlar kurulu kararı ile belirlenmiştir. Hareket devam ederken,

40 Bayrak, Mehmet, *Kürt Sorunu ve Demokratik Çözüm*, Özgü Yayınları, 1999, s. 334

Genel Kurmay Başkanlığı, Bakanlar Kurulu'na 30 Nisan 1925'te bir yazı yazarak, isyanın iç ve dış basında bir milli hareket olarak yansıtılmasının ulusal çıkarlara uygun olmadığını, bu nedenle hareketin bir Kürt milli hareketi olarak değil, bir irtica ve işgal hareketi olarak yansıtılması doğrultusunda önlem alınmasını istiyor.

Genel Kurmay Başkanlığının teklifi üzerine toplanan Bakanlar Kurulu, 3 Mayıs 1925'teki toplantısında, teklif doğrultusunda karar alır, kararın uygulanması ve gerekli önlemlerin alınması konusunda Dışişleri Bakanlığını görevlendirir.

Sayın Bayrak, bu konuya değiniyor ve şöyle değerlendiriyor:

"Kısaca anlayacağımız, bir hareketin niteliği de bilim yöntemiyle değil, asker emirleriyle belirleniyor. Tarihler buna göre yazılıyor, eserler buna göre kotarılıyor, politikacılar buna göre biçimleniyor. Acı değil mi? İşte bundan dolayı diyoruz ki Cumhuriyet dönemi başta olmak üzere Anadolu halklarının tarihi yeniden yazılmalıdır."⁽⁴¹⁾

Sayın Bayrak'ın, belirttiği gibi 1925 Kürt Ulusal Hareketi, bilimsel tarih yazıcılığı esas alınarak değil, verilen talimatlar esas alınarak yazılmış ve lanse edilmiştir. Şeyh Sait ve arkadaşlarının iddianamesini hazırlayan Savcı Ahmet Süreyya Özgeevren, olayın oluş nedenini şöyle anlatır:

"Türk ülkesinin şark vilayetlerinin belirli bir kısmında bütün dünyanın

muhtelif şekillerde öğrendiği bir isyan hadisesi vardır. İsyân hiç şüphe yok ki senelerce içerde ve isyan sahası dışından vaki olmuş telkinler ve tasavvurlarla eşkıya hareketinin fiilen gözükmesiyle meydana çıkmıştır. İsyân hadisesi, iddianamede anlatıldığı üzere, gûya peygamber dininin yükseltilmesi perdesi altında meydana getirilmiştir. Halbuki asıl gaye Türk vatanının muayyen bir kısmını ana yurttan ayırmak, vatanın birlik ve beraberliğini bozup dağıtmaktan ibaretti."⁽⁴²⁾

Savcı Özgeevren, asıl gayenin bağımsız bir devlet kurmak olduğunu söylerken, resmi ağızlar dünyaya bunun bir irtica hareketi olduğunu söylüyorlardı.

Uğur Mumcu, *Kürt-İslam Ayaklanması* adlı kitabında, Şark İstiklal Mahkemesi'nde Şeyh Sait ve arkadaşlarının yapılan sorgularının, Bitlis Harp Divanı'nın tutanaklarına göre yapıldığını söylemektedir. Bitlis Harp Divanı'nın tutanakları seksen yıldır kamuoyunun bilgisinden saklanmaktadır. Şeyh Sait, sorgusunda bu işin aceleye geldiğini kabul ediyor, savcının sorusu üzerine:

"Ben bu işin ne önündeyim, ne arkasındayım. Herkes gibi içindeyim Savcı Bey!" diyordu.

Mahkeme üyesi Ali Saip'in sorusu üzerine:

"Yusuf Ziya'yı tanırım; bana gelmişti. Ramazanda idi. Bitlisli Haydar Efendi, Yusuf Ziya Bey'in Muşlu Reşit Bey'i ziyarete geldiğini bana söyledi. Kendisinden ders okumuştum.

41 Beysanoğlu, Şevket, *Diyarbakır Tarihi*, Cilt: 3, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları, 2001, s. 961-975-998

42 Beysanoğlu, Şevket, *Diyarbakır Tarihi*, Cilt: 3, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları, 2001, s. 961-975-998

Tanıdım. Yusuf Ziya'nın Bitlis milletvekili olduğunu orada öğrendim. Bir saat kaldılar, çay içtiler ve kalktılar, gittiler. Bir müddet sonra bahar eyyâmı idi, Hınıs'a gelmişti, benim köyüme misafir geldi, orada açtı, dedi ki Kürdistan Hükümeti teşkil etmek üzereyiz, bu muhaldir dedim, fikrim bunu kabul edemiyordu. Sonra Erzurum'a gitti."

Halit Bey'le görüştünüz mü? Sorusuna, Şeyh Said'in cevabı "hayır"dır. Bunun üzerine Binbaşı Kasım, devreye girer, görüşmeyi şöyle anlatır:

"Geçen sene Kemal Paşa geldiklerinde heyet-i istikbaliye meyanında gittim. Halit Bey'de kaldım. Bana dedi ki, Şeyh Said geldi, 'bu güz çıkacağım bana intiba edenlere (uyanlara) Kur'an-ı temhir ettireceğim' dedi."

Binbaşı Kasım, mahkeme sorgusunda devamlı şunları söylemektedir:

"Bu kıyam için bunlar avamil oldu. Fakat asıl sebep Kürdistan istiklali idi. Kürdistan Cemiyeti, nihayet Kürdistan İstiklal ve İstihlas Cemiyet-i inkılap etti. O yemin o kadar müthiştir ki müntesibinin kafasını kesseler söylemezler. Ben bu cemiyete dahil olmadım.

Kürtler iki zümredir: 1)Siyasiyun, 2) Diniyun. Mesela Halit Bey filan siyasiyun idi. Onlar komiteler yaparlardı. Şeyh Said Efendi de diniyundandı. Siyasiyun cihetinin amil ve müessiri Halit Bey, Kerem gibi adamlardı.

Buranın efkar-ı umumiyesine ve Şeyh Said'e bu cesareti veren bu gazetelerdi. Yoksa bu kadar çabuk olmazdı. Bağdat'taki komiteleri İngilizler'le, Halep'teki komiteleri Fransızlar'la görüşüyordu, işleri bitiremedilerdi.

Şeyh Said Efendi çok acele etti.

Bu teşkilat sırf dini olsa Şeyh Said Efendi Darahini'yi işgal ettiği zaman hırsızlık eden maiyetinin ellerini kesmesi gerekirdi. Dini zümre şeklinde bir cemiyet değildir.

Erzurum'dan Halit Bey'in 336'da Erzurum'a gittiği sırada Mithat Bey, Hoca Raif Efendi ile bir muhalefet grupları vardı. Halit Bey her tarafın Kürtleriyle temas ettiği için efkarı ummumiyeyi % 80 nisbetinde Kürtlüğe çevirdiler. Mustafa Kemal Paşa'ya arz etmiştim ve tedabir ittihazı lüzumunu bildirmiştim, tedabir gecikti ve Şeyh Said Efendi de perşembeyi çarşambadan evvel getirdi, işte bu."⁽⁴²⁾

Bütün bu ifadelerden çıkarılan sonuç, hareketin bağımsız bir Kürdistan kurmaya yönelik olduğudur. Burda Binbaşı Kasım'ın altını çizerek söylediği, hareketin vaktinden önce başladığıdır. Zaten mahkeme kararının gerekçesinde de amacın bağımsız bir devlet olduğuna vurgu yapılıyor. İstiklal Mahkemesi Başkanı Mazhar Müfit (Kansu), kararı şu sözlerle noktıyor:

"Kiminiz hasis şahsi menfaatlerinize bir zümreyi alet, kiminiz ecnebi kıskırtmasını ve siyasi hırslarını rehber ederek, hepiniz bir noktaya yani müstakil Kürdistan teşkiline doğru yürüdünüz."⁽⁴³⁾

Müstakil bir Kürdistan peşinden koştukları için yüzlerce kişiyi darağacına gönderenler, dünyaya bunların birer "irticacı" olarak lanse edeceklerdi.

⁴³ Beysanoğlu, Şevket, *Diyarbakır Tarihi*, Cilt: 3, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları, 2001, s. 961-975-998

Yapılanlar bununla sınırlı kalmayacaktı. Hareketin liderleri hakkında karalama kampanyaları da başlatacaklardı. Talimatla M. Şerif Fırat'a yazdırılan bir kitapla, Cıbranlı Kürt Miralay Halit Bey'in, "Hamidiyeci" ve aşiret çatışmalarının odağındaki isim olarak lanse edilecekti. M. Şerif Fırat, bu dönemi şöyle akatarıyor:

"Yine 1318-1902 yılının Temmuz ayında, İstanbul aşiret mektebinden mezun olan, maktul Cıbranlı Mahmut Bey'in oğlu Halit Bey, babasının yerine ikinci Cıbran aşiret kaymakamı olarak aşiretinin başına geçmiş, bu adam, üçüncü Cıbran alay kaymakamı olan diğer Halit Bey'le görüşerek Zeynel'in takibi için Bingöl dağlarına askeri kuvvetler tahrik ettikten sonra, bütün aşiretiyle Varto ve Hormek köylerine ve Selim'e saldırmışlardır."⁽⁴⁴⁾

Şerif Fırat'ı referans alan Uğur Mumcu, Kürt-İslam Ayaklanması adlı kitabında aynı değerlendirmeleri yapıyor:

"Halit Bey, komutasındaki Cıbran alayı, sırtını padişah 2. Abdulhamid'e dayamıştı. Dayandığı için de bölgede tam bir egemenlik kurmuştu. Hormek köyleri Halit Bey komutasındaki alayı tarafından sık sık basılıyor ve Hormekliler öldürülüyordu. Bu düşmanlık bir kan davası biçimine bürünerek 2. Meşrutiyet'ten sonra da sürmüştü."⁽⁴⁵⁾

Kaynakların sınırlı ve tek yanlı oluşu bu dönemle ilgili Robert Olson gibi

saygın bilim adamlarının da yanlıya düşmesine sebep olmuştur. Robert Olson, aynı dönemle ilgili şunları söylemektedir:

"Bu şahıs (Halit Bey kastediliyor), 1892'de İkinci Hamidiye Alayı kumandasını üstlenen ve 1906'da İbrahim Talu'nun oğlu Hormekli Zeynel Talu'ya karşı taaruzla geçen Halit Bey'in kendisidir."⁽⁴⁶⁾

Bu dönemin koşulları dikkate alındığında Kürtler'de aşiret yapılanmasının güçlü olduğunu ayrıca belirtmeye gerek yoktur. Uluslaşma öncesi geri bir toplumsal yapının ürünü olan aşiretlerin doğal olarak kendi egemenlik alanlarını korumak gibi bir eğilimi taşımaları ve bunun sonucunda diğer aşiretlerle çatışmaların olduğu bilinmektedir. Bu açıdan bakıldığında komşu olan ve aralarında mezhep farklılıkları bulunan Cıbran ve Hormek aşiretleri arasında zaman zaman çeşitli tahriklerin etkisiyle çatışmalar olduğu doğrudur. Ancak iddia edildiği gibi Halit Bey, bu çatışmaların içinde değildir.

1892'de Hamidiye Alayı komutanlığı üstlendiği iddia edilen Halit Bey, on yaşındadır, okumak üzere Aşiret Mektebi'ne o yıl gönderilmiştir. Beş yıl süreli olan okulu 1897 yılında, akabinde Yıldız Harp Okulunu 1902 yılında bitiren 15 yaver yüzbaşından biridir. Osmanlı Ordusuna kurmay yüzbaşı rütbesiyle Filistin Cephesine atanmıştır. Ardından İran cephesinde görev yapmıştır. Birinci Dünya Savaşı

⁴⁴ Fırat M. Şerif, *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Beşinci Baskı, Ankara-1983, s.135-156-157-160

⁴⁵ Mumcu, Uğur, (12-13-14-15-35-38-45) *Kürt-İslam Ayaklanması* (1919-1925), Tekin Yayınevi, İkinci Baskı, Ankara-1991, s. 39-40-45-46-48-54-55-66

⁴⁶ Olson, Robert, *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Özge Yayınları, Birinci Basım, Ankara-1992, s. 51-53-54-65-74-75-77

ile başlayan Rus işgali üzerine, ismi değiştirilen ve yeniden toparlanan Cıbran Hafif Suvari Alayları Komutanlığına getirilmiştir. İstanbul'da öğrenci iken Kürt yurtsever çevreleriyle ilişkileri olmuş, Kürt ulusal bilincine sahiptir. Kendi bölgesine geldiğinde ulusal bilinçle hareket etmiş, aşiret çatışmalarının önüne geçmek istemiştir. Osmanlı subayı olması ve yaratacağı bağımlılık ilişkileri ayrı bir tartışma konusudur. Bir dönemin, "Hamidyeci" diye tanımlanması hem dayanaksızdır hem de haksızlıktır.

1925 Kürt Ulusal Hareketi, kapsamı, niteliği ve hedefleriyle, 1919-1938 Kürt hareketleri içerisinde en büyüğü olmuştur. Bu hareket için söylenen "İngiliz destekli" tezi havada kalacak, bu politikanın mimarlarından İsmet İnönü bir konuşmasında "Ne yazık ki Şeyh Sait hareketinde İngiliz parmağı rastlanmamıştır" diyecektir.

EK-1

Azadi'nin Bolşeviklere Önerdiği Protokol Metni

Erzurum Komitesinin Kararı ve Koşulları

1-Kürdistan; Erzurum, Van, Musul, Bitlis, Diyarbakır, Harput, Suriye'nin batı bölgesi ve Kermansah, Sine, Sakız, Mahabad, Urmiye, ve Selmas yörelerinden oluşur.

2-Bu vilayetlerde bağımsız bir Kürdistan kurulacaktır.

3-Kürt devleti siyasi, idari, ekonomik, ve askeri ilişkilerinde bağımsız, ancak Rusya'nın himayesini kabulleneceklerdir.

(O dönemde Sovyetler Birliği yönetimi vardı.)

4-Rusya'nın himayesi; petrol, maden ve Kürdistan dağlarındaki zenginliklerin işletilmesi, demiryollarının yapımı, askeri ve teknik elemanlarının yetiştirilmesi konularında olmalıdır.

5-Kürt devleti ve önderleri, komünist ilkelere ve Rusya'nın ilerlemesine karşı olmayacaklardır.

6-Üçüncü bölümde belirttiğimiz gibi Kürt devleti Rusya'nın himayesini kabullemektedirler. Ancak böyle bir Kürt devletinin kurulması için Rusya da ekonomik ve siyasi yardımda bulunmalıdır. Rus hükümeti, önderlerin gereksinimleri için borç para vermeli ve askeri hazırlıklara yardım etmeli.

7-Kurulacak Kürt devleti, kendi özgür iradesiyle yönetim şeklini seçecektir. Rusya devleti, siyasi, mali, idari ve askeri konularda müdahale etmemelidir.

8-Eğer Kürt önderler, Kürdistan'ı kurma çabalarında Rusya'ya geçme zorunda kalırlarsa, ulaşabilmek için Rusya devletinin onlara yardımcı olması gerekir.

9-Birinci bölümde belirtilen yöreler Kürdistan devletinin sınırları içine alınmazsa, Kürtler Rusya'nın yardımıyla dışarıda kalan bölümleri elde etmek için çalışmalıdır.

10-Rusya devleti yukarıdaki 9 maddeyi olumlu bulur ve Kürt devletinin kurulmasını kabul ederse, Kürt önderleri aktif olarak harekete geçeceklerdir.

EK-2

Cıbranlı Halit Bey'in Mektubu:

"Üyesi bulunduğum Kürt halkının genel kanısına göre, Kürtler İngiltere yanlısı bir eğilime sahiptir. İngilizler, Kürtlerin özgürlükleri ve bağımsızlıklarından yana

olduklarını propaganda ediyorlar. Böyle bir izlenim vermek istiyorlar. Şahsen İngiltere sempatzanlığının hiçbir yarar sağlayacağına inanmıyorum.

Halkımızın Rusların yardımıyla özgürleşebileceğine inanıyorum. Kürtlerin İngiltereye sempati duyup yandaşlığa kapılması önlenmeli. Ruslara daha sıcak bakmalı ve bu uğurda çalışmalı. Buna uygun ortam hazırlanmalı. Böyle bir tabanın oluşturulması için kararımızı ve on maddelik görüşlerimizi size bildirdik. Rusya devleti önerilerimizi olumlu bulursa ve bu çerçevedeki bir Kürt devletinin kurulmasına yardımcı olacaksa, bize açık ve olumlu şekilde yanıt vermenizi diliyoruz. Devletinizin olumlu yanıtı geldiğinde, örgütümüzü genişletme ve ileri götürme olanakları elde etmiş olacağız. Böylece aşiret reisleri ve siyasi önderler aktif bir şekilde toparlanmış olur. Böylesi bir durumda, komitemizin sorumlularını, isimleri ve geçmişleriyle tanıma olanağınızda gerçekleşecektir. Buna söz veriyorum. Rusya'nın yardımıyla komitemizin örgütlülüğü ve eylemliliği de artacaktır. Kürt aşiret reisleri ve halk önderleri bana güveniyorlar. Ben de halkımın Ruslara güven ve sevgi ile yaklaşacağına inanıyorum.

Azadi Örgütü Lideri Cıbranlı Miralay Halit Bey"

(Ahmet Ferit- Çıra Dergisi, Stokholm, 1996, Sayı: 8, aktaran: Naci Kutlay-Kürtler, Sayfa: 278-280)

Sözlü Kaynaklar:

Ahmet Sever (Cıbranlı Halit Bey'in kardeşi)
Halil Kılıçoğlu (Cıbranlı Halit Bey'in amcası oğlu)
Kasım Demiralp (yazılı ve sözlü)
İbrahim Sever (Cıbranlı Halit Bey'in oğlu)
Dr. Dilêr Şaweys (İsmail Hakkı Şaweys'in oğlu)

ROLA HESENAN Û XALID BEGÊ HESENÎ DI TEVGERA 1925an de

Mazhar DUDERÎ

Êl(eşîret)a Hesenan di nav Federasyona Milan de cih girtiye. Hesenan, di nav xwe de dibe şeş ber (malbat, bavik):

1. TORIN: Ji malbata begên êla Hesenan re Torin tê gotin. Ev malbat jî di nav xwe de bûye çar malbat.

- 1.1. Malbata Eshed.
- 1.2. Malbata Emer.
- 1.3. Malbata Şewêş
- 1.4. Malbata Faris.

Xalid Beg, ji malbata Eshed e. Silêmanê Ehmed ji malbata Emer e. Torin, li herêma Kelê (Melazgir) û Kopê (Bulanik) jiyane. Garnîzona Xalid Begê gundê Şêrwanşêxê ye. Di roja îroyîn de Torin li Kopê, Kelê û navenda Mûşê jiyana xwe didomînin.

2. SEYÎDA: Şaxa herî mezin a Hesenan e. Di nav êla Hesenan de malbata xwediyê nufûsa herî zêde ye.

Malmezînen vê berê jî hene. Malmezînen vê berê, mîr û beg nîn in, lêbelê, malmezînen vê berê Torinan ji xwe re mezin dibînin. Malbata Ûsivê Seydo jî ji bera Seyîda ye. Di roja îroyîn de bera Seyîda li gundên navenda Mûşê, Tilê, Kelê, Kopê, Wêranşar, Qoser û Sirûcê jiyana xwe didomînin (Wêranşar, Qoser û Sirûcê ne welatê Hesenan ê qedîmî ye, lê saxên Hesenan di dewra Şêrê Cîhanê yê yekem de yan jî piştî serhildana Şêx Seîdê Pîranî li van herêman bi cih bûne).

3. QERECA: Ev ber jî şaxek ji êla Hesenan e. Malmezînen vê berê jî hene. Lêbelê ev malmezînen jî Torinan ji xwe re mezin dibînin. Di roja îroyîn de, bera Qereca li Kelê, navenda Mûşê û Ruhayê jiyana xwe didomînin.

4. ŞÊXKA: Ev ber jî şaxek ji êla Hesenan e. Malmezînen vê berê jî

hene. Malmezinên vê berê, mîr û beg nîn in. Lêbelê malmezinên vê berê jî, Torinan ji xwe re mezin dibînin. Di roja îroyîn de, bera Şêxka li Gimgim, Kop, Mûrادیye, Sirûc û Xelfetiyê jiyana xwe didomînin.

5. MALBATYA: Ev ber jî şaxek ji êla Hesenan e. Malmezinên vê berê jî hene. Malmezinên vê berê, mîr û beg nîn in. Lêbelê malmezinên vê berê jî, Torinan ji xwe re mezin dibînin. Di roja îroyîn de bera Şêxka, li Kelê, Kopê, Mûrادیyê, navenda Mûşê, Qoser û Siwêregê jiyana xwe didomînin.

6. TÎROKA: Ev ber jî şaxek ji êla Hesenan e. Malmezinên vê berê jî hene. Malmezinên vê berê, mîr û beg nîn in. Lêbelê malmezinên vê berê jî, Torinan ji xwe re mezin dibînin. Di roja îroyîn de, bera Şêxka li Kelê û Kopê jiyana xwe didomînin.

Êla Hesenan di devera Serhedê de êleke mezin e. Navenda vê êlê Kop (Bulanık) û Kelê (Melazgir) ne. Lêbelê gelek gundên Hesenan niha bi ser navenda Mûşê û navçeya wê Gimgimê (Varto), her wiha bi ser Mûrادیyeya Wanê ve ne. Di Şerê Cihanê yê yekem de Heseniyên ku ji ber artêşa Êris reviyane li deverên Mêrdînê û Ruhayê bi cih bûne. Êdî piştî şer nezivirîne Serhedê.

Di sala 1891an de damezirandina Alayên Hemîdî dest pê dike. Di navbera salên 1891-1897an de, di nav êla Hesenan de 5 alay tên damezirandin. Hejmara van alayîyan 26., 27., 28., 29. û 30. ne⁽¹⁾. Fermandarên van alayîyan Êsivê Egît Begê (bavê Xalid

Begê ye), Tajdîn Beg (neviyê Eshed Begê ye), Fethula Beg, M. Emîn Beg û Êsivê Eyaz Beg in⁽²⁾.

Li gor M. Şerîf FIRAT ku diyar dike: Ji berê de, di nava van alayiyên Hemîdî de dijminatî heye. Bi taybetî dijminatîya Heyderan û Takoriyan. Evdilmecîdê Sîpkî û Fethullah Begê Hesenî, (li ser kuştina Xelîlê Hesenê Hesenî) berdewam dike. Dîsan ji êla Hesenan Rizayê Xelîd û neviyên Şewêş jî neyar ê hev in⁽³⁾.

XALID BEGÊ HESENÎ

Sala jidayikbûyîna Xalid Begê Hesenî nayê zanîn. Lêbelê tê zanîn ku ew hemsalê Xalid Begê Cibrî, Hecî Mûsa Begê Xwêtî, Evdilmecîdê Sîpkî û Kor Hûsên Paşa ye. Wî li Ezirganê li Mekteba Hemîdî xwendiyê. Piştî xelaskirina vê dibistanê bûye serbaz û qeymeqamê Kelê. Di wexta Şerê Cihanê yê yekem de 6 alayiyên Hesenan digihînin hev û Xalid Beg bi rutbeya (pile) mîralayiyê dibe fermandarê vê alayiyê⁽⁴⁾.

Di Şerê Cihanê yê Yekem de Xalid Begê Hesenî mîralay e. Di bereya; şerê Erzirom û Qerekoseyê de li hemberî artêşa Êris şer dike. Bi Xalid Begê Cibrî re qehremaniyên mezin nîşan dide. Di gelek şeran de bi ser dikeve.

¹ AYTAR, O., *Hamidiye Alaylarından Koruculuğa*, Weşanên Medya Güneşi, 1992, r. 89

² Ev agahî min ji Mihemed Begê kurê Eliziver Beg û Dr. Muzafêr DEMİRÊ Enwer Begê ku ew ji kurê Zubeyr Begê pismamê Xalid Begê ye stendiye.

³ AYTAR, O. *Hamidiye Alaylarından Koruculuğa*, Weşanên Medya Güneşi, 1992, r.63

⁴ AYTAR, O. *Hamidiye Alaylarından Koruculuğa*, Weşanên Medya Güneşi, 1992, r.61

Ji ber sêdaqet û qehremaniya wî, her wekî Xalid Begê Cibrî, bi rutbeya mîralaytiyê wî jî digrin nava artêşa osmaniyan⁽⁵⁾. Li gor agahiyên Mihemed Begê kurê Elizîver Begê û Dr. Muzafer DEMIR: "Di Şerê Cîhanê yê Yekem de li şeva noêla sala 1915an, li Eleşgirdê diavêje ser garnîzona ûris a Qilîçgêdûgê. Wê garnîzonê ji hev belav dike û 17 topan ji artêşa ûris distîne. Lêbelê ji bîr ve dike ku kamê topan jê derxîne. Di wî şerî de Tahir Begê birayê wî jî şehîd dikeve. Di pey şer re hêzên Evdilmecîd Begê Sîpkî kamê van topan derdixînin û teslîmî artêşa osmaniyan dikin. Lewre jî, serketina vî şerî li ser Evdilmecîd Begê Sîpkî tê tescîlkin.

Çaxê ku devera Serhedê dikeve destê artêşa ûris, zar û zêçê xwe û malbata xwe dişîne Dêrika Çiyayê Mazî. Ew bi tevayî alayiya xwe ve bi artêşê re tê eniya şer. Heta ku artêşa ûris devera Serhedê terk dike, li çiyayên Qerekose û Erziromê li hemberî ûris şerê çekdarî didomîne.

Piştî ku ûris bi paş ve dizivire, li bin maiyeta Kazim Kêrabekir Paşa, Xalid Begê Hesenî di nava artêşa osmanî de tê wezîfedarkirin û mala xwe jî dibe Wanê. Piştî damezirandina Komara Tirkîyê dizivire Şêrwanşêxê. Li Şêrwanşêxê bi cih dibe.

Çaxê ku Kongreya Erziromê tê lidarxistin, ew li hember kongreyê derdikeve û naçe kongreyê⁽⁶⁾. Dîsan, Dr. Muzafer DEMIR dibêje ku: "Xalid Beg di berxwedana Ruhayê û Dîlokê ya li

hemberî hêzên emperyalîst de jî cih girtiye."

Di sala 1920an de, di wexta hevdîtînên Sevrê de, ji bo ku mafên kurd û Kurdîstanê di bin serokatiya Şerif Paşa de heyeta kurdên welatparêz dixwaze beşdarî hevdîtinan bibe. Parlemantoya Enqerê ji bo ku hewldanên vê heyetê bê encam bihêle, ji hemû deverên Kurdîstanê, bi pêgirtiyên xwe, ji konferansê û Parlemantoya Stenbolê re birûskeyan didine şandin. Di van birûskeyan de diyar dikin ku: "Şerif Paşa û hevalên xwe nûnerên me nûn in. Em û tirk birayên hev in, em ji tirkan venaqetin."

Di wê demê de waliyê Bilîsê û Silêman Sebrî Paşa jî malmezînan wan deveran li Wanê dicivînin. Bi wan jî, birûskeyê bi vî rengî didine înzekirin. Lêbelê ji beşdarên vê civînê Xalid Begê Hesenî, Kor Husên Paşayê Heyderî û Hecî Mûsa Begê Xwêtî birûskeyê înzê nakin. Li ser vê meseleyê di navbera wan û Şêx Evdilayê Kufrayê de nîqaş çêdibe. Şêx Evdilayê Kufrayê radibe Xalid Begê Hesenî, Kor Husên Paşayê Heyderî û Hecî Mûsa Begê Xwêtî wek alîgirên damezirandina dewleta Ermenîstanê îlan dike. Şêx Evdilayê Kufrayê di sala 1928an de, çaxa ku ji surgunê dizivire, li Stenbolê di civîna surguniyên dema serhildana Şêx Seîd de vê yekê dibêje û xetaya xwe ya wê çaxê qebûl dike⁽⁷⁾.

Di sala 1923an de, di hevdîtînên Peymana Lozanê de behsa Kurdîstanê û mafên kurdan ên netewî qet nayê kirin. Hukûmeta tirk ji bo ku hewldana

⁶ Ev agahî min ji Mihemed Begê kurê Elizîver Begê û Dr. Muzafer DEMIRê Enwer Begê kurê Zubeyr Begê ku pismamê Xalid Begê ye, stendiye.

⁷ SERDÎ, H. Hîşyar, Görüş ve Anılarım: 1907-1985, Weşanên Med, 1994, r.146,148,149

welatparêzên kurd bêncam bihêle, rayagîştîya Ewropayê û Dewletên Hevpeyman jî dixapîne. Heyetek ji parlamentêrên xwe yê kurd bi Îsmet Înonu re dişînin Lozanê. Îsmet Înonu di van hevdîtinan de xwe wek nûnerê tirk û kurd dide nîşandan. Ev heyet ji parlamenterên wan ên Amedê Birincîzade Feyzî, Zulfî Beg û parlamenterê wan ê Siwêregê Xelîl Fexrî tê pêkanîn. Qaşo serokê heyetê jî Xelîl Fexrî ye. Hukûmeta tirk vê heyetê beşdarî hevdîtinan dike. Xelîl Fexrî ji bo ku beşdarî hevdîtinan nebe, xwe li nexweşiyê datîne. Her du nûnerên din di civînê de dibêjin: "Em û tirk birayên hev in, em ji tirkan venaqetin⁽⁸⁾". Di 24ê Tîrmeha 1923an de peyman tê îmzekirin.

Piştî îmzekirina Peymana Lozanê, di 29ê Cotmeha 1923an de, Komara Tirkîyê tê îlankirin. Hebûna kurdan tê înkarkirin. Li ser vê yekê, hinek serbaz, axa, beg, şêx û rewşenbîrên kurd li Erziromê di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî de, bi navê **Komîteya Îstîqlala Kurdîstanê** yan jî **Tevgera Azadî** rêxistineke siyasî dadimezîrînin. Derbarê damezirandina Tevgera Azadî de sê mêjûyên cuda tên gotin. Robert OLSON di lêkolînên xwe de dibêje ku; Tevgera Azadî di sala 1921an de hatiye damezirandin. Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî) di bîranînên 1922an de hatiye damezirandin. Çavkaniyên din jî, dibêjin ku: Tevgera Azadî di sala 1923an de hatiye damezirandin. Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî) di bîranînên xwe de dibêje ku:

Tevgera Azadî di sala 1922an de hatiye damezirandin. Çavkaniyên din jî dibêjin ku: Tevgera Azadî di sala 1923an de hatiye damezirandin⁽⁹⁾. Li gor min jî mêjûya rast sala 1923an e.

Piştî Peymana Lozanê hukûmeta tirk li hundir desthilatdariya xwe tekûz dike û hebûna kurdan jî înkâr dike. Lêbelê Tevgera Azadî jî xebata xwe berfireh dike. Li gelek deveran liqên tevgerê têne avakirin.

Navenda tevgerê Erzirom e. Endamên tevgera Azadî yê ku di Êlûna 1924an de hatine tesbîtkirin ev in:

Erzirom: Mîralay Xalid Begê Cibrî (Serokê Tevgerê), Qeymeqam Selîm Beg, Qeymeqam Kazim Beg, Mîralay Raîf Beg, Qeymeqam Arîf Beg, Evdîlxwuda Cafer Beg û Aslan Beg, (ev her du bira ne), Hecî Mewlûd Efendî yan jî Hecî Dûrsin Efendî.

Stenbol: Seyîd Evdîlqadir (Serokê Liqê), Parêzer Evdirehîm.

Qers: Sitvan Tewfîq Beg (Serokê Liqê).

Bazîd: Şêx Îbrahîm.

Kelê (Melezigirt-Menasgird): Kor Husên Paşa (Serokê Liqê).

Gîngim: Mîralay Xalid Begê Hesênî (Serokê Liqê).

Xînûs: Ruştu Efendî (Serokê Liqê), Sitvan Reşîf Beg.

Mûş-Bilis: Yûsîf Ziya Beg (Serokê Liqê), Serbaz Hecî Hesên Beg, Evdirehman Axayê Şîrnexî, Hecî Darsûm Axayê Mûşî.

⁸ BOZARSLAN, Z. *Nêrînek li Dîroka Kurdîstanê*, Weşanên Doz, 2004, r.344-345

⁹ BOZARSLAN, Z. *Nêrînek li Dîroka Kurdîstanê*, Weşanên Doz, 2004, r. 358

Wan: Mele Evdilmecîd Efendî (birayê Seîdê Kurdî û Serokê Liqê), Serbaz Arif Beg û birayê wî Elî Begê Şemsikî û Sadûn Begê Hesarî.

Sêrt: Sitvan Îhsan Nûrî (Îhsan Nûrî Paşa-Serokê Liqê), Hecî Evdila Efendî, Derwêş Beg, Qeymeqam Rezaq Beg, Mîralay Weîs Beg.

Şîrnex û Derdora wê: Silêman Axa (Serokê Liqê).

Amed: Ekrem Cemîl Paşa (Serokê Liqê), Dr. Fûad Beg, Evdîlxenî Beg, Dr. Nesîm Beg, Sitvan Mistefa Beg, Qeymeqam Ednan Beg.

Mêrdîn: Hecî Qadir Efendî, Qeymeqam Xidir Begê Dêrsimî (Serbazê Alayiya 6.)

Cizîr: Hecî Dûrsin Efendî, Evdîlwehab Efendî, Evdîlmitelîb Efendî (Midûrê Silopiye).

Ezîrgan-Xarpêt-Dêrsim: Kangozade Elî Heyder (Serokê Liqê) (10).

Van Bruinessen û Robert Olson van wesîqeyan ji arşivên Artêşa Îngilîz ên istîxbarata Artêşa Hewayî girtine. Serbazên Artêşa Îngilîz ên di saziya istîxbarata bi navê SSO (Fermanberên Servîsa Taybet) tê zanîn de xebitîne. Di rapora xwe ya 'hejmar: Air-5/556' de van damezrînerên Tevgera Azadî tesbît kirine. Fermanberên vê rêxistina istîxbaratê li ser vê mijarê bi 'hejmar: Air-23/411' û bi mêjûyên '05.11.1924-08.11.1924' du raporên din ji navenda saziya xwe re şandine. Rapora bi mêjûya '27.11.1924' û bi hejmara 'Air-5/556', 15 rûpel e. (11)

10 OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı, Weşanên Öz-Ge*, 1992, r. 72,73, 247-249

Di pirtûka ku ji aliyê Reşat Halil de hatiye nivîsandin û ji aliyê Serperîştîya Giştî ya Artêşa Tirk ve hatiye çapkirin, destnîşan dike ku: "Mîralay Xalid Begê Cibrî, Mîralay Xalid Begê Hesênî, Yûsifê Ziya, Seyîd Evdîlqadir... damezrînerên Tevgera Azadî ne⁽¹²⁾".

Evdîlmelîk FIRAT diyar dike ku: "Tevgera Azadî, tevgerê veşarî ye. Ji ber wê rewşê, hemû endamên vê tevgerê nayên zanîn. Bêguman Xalid Begê Hesênî endamekî vê tevgerê ye. Damezrînerê Tevgera Azadî ye.

Pêwendiyên Xalid Begê Hesênî û Şêx Seîd ji berê de hene. Ji ber ku malbata Xalid Begê Hesênî, murîdên Şêx Eliyê Paloyî ne⁽¹³⁾.

Piştî danîna Komara Tirkîyê di sala 1924an de, cara duyemîn parlamen-toya tirk ku dicive, mafê kurdan ji binî ve înkâr dike. Li ser vê rewşê, mezinên kurdan bi hev dişewirin. Ji bo ku Şêx Seîd mirovekî rûhanî ye, dixwazin wî bikin serokê tevgerê. Di sala 1924an de Xalid Begê Cibrî, Xalid Begê Hesênî û Yûsif Ziya tene Qolhesenê (gundê Xînûsê-gundê Şêx Seîd) cem Şêx Seîd. Vê teklîfê li wî dikin. Ew jî vê teklîfê qebûl dike. Qasim jî bi wan re ye. Ji ber ku Qasim mûxbîr e, van têkiliyan roj bi roj rapor dike. Piştî ku hukûmeta tirk Xalid Begê Cibrî û Yûsiv Ziya digirin, dixwazin ku Xalid Begê Hesênî û Şêx Seîd jî bigirin. Lêbelê ew xwe nadin dest⁽¹⁴⁾.

Her çiqas Evdîlmelîk FIRAT di

12 OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı, Weşanên Öz-Ge*, 1992, r. 277.

13 KAHRAMAN, A. *Kürt İsyanları, Weşanên Evrensel*, 2004, r. 63

14 Şêx Eliyê Paloyî, bavê Şêx Seîd e.

daxuyaniya xwe de dibêje, "Xalid Begê Cibrî, Xalid Begê Hesenî û Yûsif Ziya li Şêx Seîd teklîfa serokatiya Tevgerê kirine" jî, gelek çavkanî destnîşan dikin ku piştî girtina Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya ev teklîf li Şêx Seîd hatiye kirin.

Li gor van wêsiqeyan jî, tê zanîn ku Xalid Begê Hesenî ji serî de di nav Tevgera Azadî de cih stendiye û damezrênerê tevgerê ye.

Her çiqas navê Şêx Seîd di nava navên van endamên Tevgera Azadî de derbas nebe jî, Van Bruinessen destnîşan dike ku Şêx Seîd di nava beşdarên Kongreya Tevgera Azadî ya yekemîn de beşdarê herî girîng e. Di wê kongreyê de du biryarên girîng hatine stendin. Biryara yekem: Serhildanek giştî dê dest pê bike. Ya duyem: Alîkariya welatên biyanî pêwîst e. Bi Yekîtiya Sovyetan û Brîtanyaya Mezin re têkilîdanin pêwîst e. Şêx Seîd di wê kongreyê de gelek endaman ji bo van biryaran îkna dike⁽¹⁵⁾. Li ser biryarên wê kongreyê endamên Tevgera Azadî xwe ji serhildanê re amade dikin.

Endamên Tevgera Azadî her gav di têkiliyên navxweyî de şîfre bikar dianîn. Yûsif Ziya Beg jî wê çaxê parlamanterê Bilîsê ye. Diçe Erziromê mêvandariya Xalid Begê Cibrî. Di bûyeran de diyar e ku Yûsif Ziya Beg, ji bo karên Tevgera Azadî çûye mêvandariya Xalid Begê Cibrî. Ji Erziromê, ji birayê xwe Elî Riza re biruskeyekê dişîne. Zekî Bozarşan diyar dike ku, Yûsif Ziya Beg, li ser pirsgerêka nastûriyan wê birûskeyê dişîne⁽¹⁶⁾.

Elî Riza, Îhsan Nûrî, Rasim, Xûrşîd û Tewfîq Cemîl wê birûskeyê xelet famî dikin. Li ser wê biruskeyê di rojên 3 û 4ê Êlûna sala 1924an de 400-500 leşker û serbazên kurd li Beytuşebabê derdikevin serê çiya û Alaya Kurdîstanê vedikin⁽¹⁷⁾. (Di hinek çavkaniyan de ev hejmar 350 kes e.)

Îhsan Nûrî Paşa di bîranînên xwe de diyar dike ku, "Me bi fermana wê Komîteyê li Beytuşebabê dest bi serhildanê kir⁽¹⁸⁻¹⁹⁾". Îhsan Nûrî Paşa û hevalên wî dest bi serhildanê dikin, lêbelê li deverên din serhildan dest pê nake. Ji ber wê Îhsan Nûrî Paşa û hevalên xwe leşkeran dişînin malên wan. Ew jî derbasî Kurdîstana başûr dibin.

Di wê demê de, Elî Riza tê girtin. Piştî girtina Elî Riza di roja 10ê Cotmeha 1924an de Yûsif Ziya Beg li Erziromê tê girtin. Yûsif Ziya Begî di ser Xînûs, Gimgim û Mûşê re derbas dikin û dibin Bilîsê. Piştî girtina Yûsif Ziya Begê û li gor hinek îdiayan, li ser agahiyên wî, dewleta tirk di 20ê Sermaweza (Meha 12an) 1924an de dest didin ser Xalid Begê Cibrî. Girtina Xalid Begê Cibrî jî wisan çêdibe: Ji bo pirsyarkirina bêrahiyên derheqê lazîmatiya artêşê de, wek wezîfedar wî dişînin Sariqamîşê. Bi xap wî ji garnîzona Erziromê derdixînin derve û dest didin ser⁽²⁰⁾. Wî di riya Patnosê re dibin Bilîsê. Çaxê ku

17 BOZARSLAN, Z. *Nêrînek li Dîroka Kurdîstanê, Weşanên Doz*, 2004, r. 366

18 BOZARSLAN, Z. *Nêrînek li Dîroka Kurdîstanê, Weşanên Doz*, 2004, r. 366

19 Bîranînên Îhsan Nûrî Paşa, *Hêvî*, Kovara Çandî ya Giştî, Hejmar: 2 r. 28

20 BOZARSLAN, Z. *Nêrînek li Dîroka Kurdîstanê, Weşanên Doz*, 2004, r. 367

15 Daxuyaniyên Evdîlmelik FIRAT

16 OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyli Said İsyanı*, Weşanên Öz-Gc, 1992, r. 78-79

wî di herêma Heyderan re derbas dikin, ew ji Kor Husên Paşa re nameyekê dişîne. Di nameya xwe de dibêje: "Ji min re 40 zêrên xas bişîne." Bi wê şifreyê 40 mêrxasî ji Kor Husên Paşa dixwaze. Lêbelê Kor Husên Paşa alîkarî nade Xalid Begê Cibrî. Mufrezeya tirk bê pirsgirêk wî dibin û diavêjin zindana Bilîsê.

Dr. Muzafer DEMIR û Mihemed Begê Elîzîver Begê diyar dikin ku: "Xalid Begê Hesenî wê çaxê li Wanê ye. Ew ji girtina Xalid Begê Cibrî haydar dibe. Lêbelê di herêma Heyderan de mudaxele nake. Du sedemên mudaxelenekirinê hene. Sedemê yekem: Ew naxwaze ku dubendî bikeve navbera Hesenan û Heyderan. Sedemê duyemîn: Naxwaze ku endamê Tevgera Azadî û hevalê xwe Kor Husên Paşa rencîde bike. Piştî ku Xalid Begê Cibrî ji herêma Heyderan derdixînin, Şemsedîn û Ferzende bi tevî 60 milîsî li pey wî dişîne. Lêbelê ew dereng dimînin."

Biraziyê Xalid Begê Cibrî Dr. M. Emîn Sever diyar dike ku: "Min ji bavê xwe bihîstiye ku li ser dîrektîfa Xalid Begê, kesî mudaxele nekiriye. Wî vê tembîhê kiriye ku: Em ji serhildanê re vê gavê ne amade ne. Ji bo ku provakasyonêk dernekeve bila kes mudaxele neke. Ku wî alîkarî bixwesta hêzên Cibran dê mudaxele bikirana. Bi dek ji garnîzonê derxistina wî rast e. Qaşo parê fermana wezîfeya wî li Hesênqelewê ve dikin. Lêbelê di pare de fermana girtina wî nivîsandine. Rîwayeta 40 zêran jî rast nîn e. Bi rastî, wî bi dizî dibin Bilîsê. Ji bo wî, hewldanên Xalid Begê Hesenî rast in. Ew û

Xalid Begê Hesenî hevalên hev in û gelek ji hev hez dikin.

Du caran li ser xilaskirina Xalid Begê Cibrî civîn çêbûne. Cara yekem li Alpîra (gundê Kanîreşê) Sadiyê Telhe, bavê min (Ehmed Beg) û Selîm Beg dicivin. Ji ber mercên zivistanê vê teşebusê bi paş de dixînin⁽²¹⁾. Ya duyem li Şêrwanşêxê çêdibe. Ji ber mercên zivistanê çûyina ser Bilîsê paş de dixînin."

Xalid Beg di 14ê Avrêla 1925an de di zindana Bilîsê de tê şehîdkirin.

Her çiqas Xalid Begê Hesenî li ser yekîtî û tifaqa gel hewl dabe jî lê piştî ku serhildan dest pê dike Kor Husên Paşa alîkariyê nade tevgerê. Piştî ku serhildan dipelişe, li hember hêzên ku dixwazin derbasî herêma Şikakiyan bibin şer dike. Bi rastî di vê serhildanê de alîkariya tirkan kiriye.

Li gor Qedri Cemîl Paşa, di wê operasyona ku li ser Xalid Beg û Yûsif Ziya Begê pêk hatibû de 20 kesên din jî tên girtin. Di nava wan de Hecî Mûsa Beg, Şêx Mehsûnê Norşînî û Şêx Silhedînê Hîzanî jî hene. Waliyê Bilîsê Kazim DÎRÎK ji bo ku dubendiyê têxîne nava endamên Tevgera Azadî û nava êl û eşîrên Kurdîstanê, qet Kor Husên Paşa nagire. Ji girtiyan jî, Hecî Mûsa Beg, Şêx Mehsûn û Şêx Silhedîn berdide. Bi vî awayî Kazim DÎRÎK bi ser dikeve. Êlên ku bi konfederasyona Babakurdî ve girêdayî ne beşdarî serhildanê nabin û gelek ji wan jî li dijî serhildanê dertên⁽²²⁾. Bi vî awayî, Kazim DÎRÎK êl û eşîrên nav devera Hesenan û Bilîsê dikişîne bi

²¹ SEVER, M. Emin, *Kovara Bîr, Hejmar: 2*, r. 27

²² Navê Kanîreşê guhartine, kirine Karlova (deşt a bi befir)

aliyê xwe ve û ewlekariya Bilîsê tekûz dike.

Kazim DÎRÎK, dixwest ku Şêx Seîd û Xalid Begê Hesênî jî bigre. Xalid Begê Hesênî xwe nade dest. Ew jî di serhildanê de dibe pêşkêşekî girîng⁽²³⁾. Kazim DÎRÎK ji bo ku Xalid Begê Hesênî bigre muferezeyekê dişîne Şêrwanşêxê. Ji ber ku ev dever di bin kontrola hêzên Xalid Begê de ne, mufreze bédeng dimîne û teşebusa girtina wî nake, lê Xalid Begê dawetî Bilîsê dike. Xalid Beg mufrezê verê dike û dibêje, "Ez ê berî biharê di firehiyê de bêm û bi Kazim Paşa re hevdîtî-nê çêkim⁽²⁴⁾".

Ji bo Xalid Begê Cibrî ji nav destê tirkan derxîne lawê xwe Şemsedîn û biraziyê xwe Ferzende tevî 60 milîsan ve bi pey wan xistiye, lêbelê negihane. Mufrezeya tirk beriya wan xwe digihînin kela Bilîsê û Xalid Begê Cibrî diavêjin zîndanê. Ev hêza ku li pey Xalid Begê Cibrî diçe, ji Deşta Rehwayê dizivire⁽²⁵⁾. Biraziyê Xalid Begê Cibrî Dr. M. Emîn Sever dibêje ku: "Ez bi vê bûyerê agahdar nebûme."

Hewldanên Kazim DÎRÎK ên li ser girtina Xalid Begê Hesênî bêencam dimînin. Ew nikare Xalid Begê Hesênî bi dest xîne. Xalid Beg jî, êla xwe beşdarî serhildanê dike. Ew ji bo ku Xalid Begê Cibrî ji zîndanê rizgar bike gelek caran diavêje ser Bilîsê. Lêbelê ev hewldanên wî bêencam dimînin⁽²⁶⁾.

²³ OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Öz-Ge, 1992, r.140-141

²⁴ OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Öz-Ge, 1992, r.141

²⁵ Dr. M. Emîn Sever.

²⁶ Ev agahî min ji Mihemed Begê kurê Elîzîver Beg û Dr. Muzafer DEMİRÊ Enwer Begê kurê Zubeyr Begê ku pîsmamê Xalid Begê ye, stendiye.

Sedemê ku Heyderan, Xwêtiyan, Elmanan û malbatên şêxan ên Kufrayê, Norşînê û Hîzanê jî alîkarî nadin serhildanê lewma jî teşebuskirina bidestxistina Bilîsê naçe serî û Xalid Begê Cibrî ji zîndanê nayê rizgarkirin.

Di roja 22ê Sermaweza 1924an de ji aliyê qeymeqamê Xînûsê Maqsûn Begî ve îfadeya Şêx Seîd tê girtin. Şêx Seîd van îdiayan red dike. Şêx, piştî ku ji Xînûsê dizivire ji Xalid Begê xeber distîne. Di vê xeberê de "Fermana destpêka serhildanê heye." Li ser vê xeberê Şêx Seîd jî, ji Xalid Begê Hesênî di keysa yekem de rizgarkirina Xalid Begê Cibrî dixwaze. Şêx Seîd di 27ê Sermaweza 1924an de ji gundê Qolhîsarê dertê. Diçe Çebaqçûrê, ji wê derê diçe Paloyê, ji wê derê jî diçe Licê û Hêneyê. Kar û barê serhildanê dike⁽²⁷⁾.

Biraziyê Xalid Begê Cibrî Dr. M. Emîn Sever, li ser vê nihêrîna Robert Olson diyar dike ku: "Mamê Xalid Beg Îsmâil Axa, ji bo ramanên wî yên li ser serhildanê fêr bibe, Hemîdê Mamasê dişîne Bilîsê cem Xalid Begê. Di wê hevdîtî-nê de Xalid Beg serokatiya Şêx Seîd pêşniyar kiriye. Lêbelê vê tembîhê jî kiriye û ji Hemîdê Mamasê re gotiye ku, "Bila ji bo serhildanê û rizgarkirina min ecele-yê nekin!"

Dr. M. Emîn Sever van agahiyên Robert Olson jî kê-m dibîne. Û dibêje, "Van agahiyên ku Van Bruinessen û Robert Olson diyar kirine, istîxbarata Brîtanyaya Mezin ji serbazên bûyera Beytûşebabê girtine. Dibe ku xelet hatibe neqil-kirin."

²⁷ OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Öz-Ge, 1992, r.141

Piştî ku serhildana Şêx Seîd di roja 8ê Reşemeha 1925an de dest pê dike, Xalid Begê Hesenî dest dide ser herêma Hesenan, Cibrî jî dest didin ser herêma Cibran. Ev her du dever bêyî şer dikevin destê endamên Tevgera Azadî. Şêx Seîd jî, Şêx Evdilayê Melekan dike berpirsiyarê Eniya Bakûr (Serhed)⁽²⁸⁾.

Di vê serhildanê de ji Eniya Amedê pêştir, eniya herî girîng, êniya Serhedê ye. Berpirsiyarên Eniya Serhedê; Xalid Begê Hesenî, Ahmed Beg, Selîm Beg û Sadiyê Telheyê Cibrî, Selîm Begê Madragî, Şêx Elî Riza û Şêx Evdilayê Melekan in⁽²⁹⁾.

M. Şerîf FIRAT diyar dike ku di plankirina serhildanê de ev hebû ku serokên êla Cibran dê biavêjin ser Solaxan, Gimgim û Mûşê. Şêx Evdila dê biavêje ser Erziromê, Xalid Begê Hesenî û Şêx Elî Riza jî dê biavêjin ser Qerekose û Bilisê.

Lêbelê di navbera herêma Hesenan û Qerekoseyê de Heyderî dijîn û ew jî alîkariya dewleta tirk dikin. Ji ber ku Xwêtî û Elman û malbatên şêxan ên li Kufrayê û li Norşînê û li Hîzanê jî alîkarî nadin serhildanê, lewma jî Bilis nakeve dest û Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg jî nayên rizgarkirin.

Hêzên Cibran di roja 22ê Reşemeha 1925an de li başûrê Gimgimê bi êlên Xormek û Lolan re dest bi şer dikin. Her du alî jî di vî şerî de gelek mirî didin. Ev şer jî, rê li ber êrîşkirina bi ser Erziromê digire. Bi

alîkariya hêzên Şêx Evdila, di roja 12ê Adara 1925an de navenda Gimgimê dikeve destê hêzên serhildanê. Li ser berxwedana hêzên Xormekî û lolaniyan di roja 19ê Adara 1925an de hêzên Cibrî, Gimgimê terk dikin û Selîm Beg û Ahmed Beg tevî hêzên xwe ve derbasî devera Hesenan dibin⁽³⁰⁾.

Hêzên Xalid Begê Hesenî, Ahmed Beg, Selîm Beg û Sadiyê Telheyê Cibrî, Selîm Begê Madragî di roja 27ê Adara 1925an de êrîşê dibin ser Xînusê. Lêbelê bi ser nakevin. Bi şûn de dizivirin Kelê.

Piştî ku hêza Şêx Seîd li Amedê jî têk diçe, Şêx Seîd xwe ber bi Serhedê ve dikişîne. Şêx Seîd di şeva 14-15ê Avrêla 1925an de li ser Pira Evdiraman Paşa tê girtin. Wê şevê Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya li Bilisê tên dardekirin. Her çiqas Robert Olson di berhema xwe de mêtûya dardekirina Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Begî 19-20ê Adara 1925an diyar bike jî, ev mêtû ne rast e. Ya rast, şeva 14-15ê Avrêla 1925an e.

Dr. Nûrî DÊRSIMÎ di pirtûka xwe ya bi navê "*Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim*" de li ser Xalid Begê Hesenî wiha dinivîsîne: "Hêzên Xalid Begê Hesenî, di destpêka serhildanê de Bongilan, Gimgim, Kelê, Kopê û derdorên Mûşe zeft kir. Dest bi karên girtina ser Erziromê kiribû. Armanca wî ew bû ku Qerekose û Bilisê jî zeft bike û Xalid Begê Cibrî û Yûsiv Ziya ji zîndana Bilisê rizgar bike. Di roja 19ê Adara 1925an de êrîşê dibin ser Mûşê. Di wê çaxê de Osman Paşa bi firqeyên

28 OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Öz-Ge, 1992, r.142

29 OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Öz-Ge, 1992, r.144

30 OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Öz-Ge, 1992, r.168

9. û 12. êrişê tîne ser Xînûsê. Di roja 23ê Adara 1925an de, li Geliyê Çemê Zoro (Arapderesi), bi hêzên Osman Paşa re dest bi şerî dikin. Gelek leşkerên tirk dîl digirin. Piştî ku firqeya 8. û hêza Xormekiyan xwe digihînin hêza Osman Paşa, hêza kurd paş ve dizivire.

Li herêma Serhedê, li deverên Gimgim û Kanîreşê êlên Xormek û Lolan, li deverên Mûş, Bîlîs û Qerekoseyê hinek êlên kurdan (Heyderan, Motkan, Xwêtiyan, Elmanan, Celaliyan û malbatên şêxan) alîkariya hêzên tirk kirin û bi vî rengî serhildanê pelîşandin.

Piştî ku serhildan têk çû, hêzên Xalid Begê Hesênî xwe ber bi Îranê ve dikişînin, dixwazin xwe bigihînin herêma Şikakan. Wê çaxê serokê şikakiyan Simko (Simaîl Axayê Şikakî) bû. Bi taybetî, hêzên Heyderan rê nedan wan. Hêzên Xalid Begê Hesênî derbasî Makoyê bûn... Di pey re çûn cem Simko. Di bihara 1926an de, Xalid Begê Hesênî dizivire, lêbelê li Kelê tê girtin. Û li Amedê roja 31ê Tîrmeha 1926an tê dardekirin⁽³¹⁾.

Piştî ku serhildana Şêx Seîd têk diçe û Şêx Seîd tê girtin, Şêx Elî Rîza, Hecî Heyderê Kerxê, Şêx Mehdî, Şêx Diyadîn, Şêx Silhedîn tevî malbatên xwe ve, xwe digihînin Şêrwanşêxê. Ji ber ku artêşa tirk dorê li wan digire, ew jî wê derê terk dikin. Li gor Dr. Muzafêr û Mihemed Begê, çaxa ku Xalid Begê Hesênî û hevalên xwe ji Şêrwanşêxê dertên 680 siwarî ne. Ji malbata Şêx Seîd pêştir, her du birayên

Xalid Begê Cibrî, Selîm Beg û Ehmed, Kerem Begê Zirkî, Şêx Husênê Kêsrî û ji malbata Xalid Begê Hesênî jî, pişmamê wî Silêmanê Ehmed Begê û malbata wî ne.

Çaxa qefle ji Çemê Muradê derbas dibe, gelek kes bi avê de diçin. Wê demê ji bera Qereca Silêmanê Hesê jî winda dibe. Ji Silêmanê Ehmed Begê re xebera windabûna Silêmanê Hesê tînin. Lêbelê ew bawer nake. Silêmanê Ehmed Begê dibêje ku, "Wî xebera me ji Kor Husên Paşa re biriyê!" Gotina Silêmanê Ehmed Begê rast derdikeve. Hêzên Kor Husên Paşa, pêşiyê li Xalid Begê Hesênî û hevalên wî digirin. Kor Husên Paşa riya derbasbûna devera Şikakan nade wan. Di navbera hêzên Xalid Begê Hesênî û hevalên wî û hêzên Kor Husên Paşa de şer derdikeve. Ji aliyê din ve Celalî û Memanî jî li hember Xalid Begê Hesênî û hevalên wî şer dikin. Di wî şerî de gelek mirov tên kuştin. Xalid Begê Hesênî û hevalên wî, bê dilê xwe derbasî Makoyê dibin. Selîm Beg û Ehmed Begê Cibrî ji sînorê Îranê dizivirin welatê xwe. Selîm Begê Cibrî, di Êlûna 1926an de li gundekî Kanîreşê (li Kızılçubuk) tê kuştin. Nûnerê hukûmeta Îranê ji Xalid Begê Hesênî û hevalên wî daxwaza çekdanîne dike. Xalid Begê vê daxwazê qebûl nake. Li ser wê, di nava hêzên Xalid Begê û leşkerên Îranê de şer derdikeve. Di wî şerî de Silêmanê Ehmed Begê, Şemsedîn Begê kurê Xalid Begê, Şêx Diyadînê birayê Şêx Seîd, Kerem Begê Zirkî, Selîm Begê Madragî û gelek mirovên din şehîd dikevin. Piştî vî şerî, yên ku difilitin

³¹ OLSON, R. *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı*, Weşanên Özgüç, 1992, r.170

diçin cem Simayîl Axayê (Simko)
Şikakî.

Di bihara sala 1926an de Xalid Begê Hesenî dizivire nav êla xwe. Armanca wî ev e: Ku dîsan dest bi serhildanê bike. Ji bo ku Tevgerê dîsan rake piyan, derbasî Dêrsimê bibe û demekê jî li wê derê bimîne. Mixabin ev hewldan, raman û armancên wî naçin serî. Di wê demê de hukûmeta tirk efûyeke giştî derdixîne. Hevalên wî teslîmî tirkan dibin. Xalid Beg, eqrebayê wî Evdilcebar û Xalidê Seyîd teslîm nabin û li çiyayê Tırşongê dimînin.

Li ser ixbara Xalidê Baqo, Xalid Beg û her du hevalên xwe li çiyayê Tırşongê tîn girtin. Xalid Begî di ser Mûşê re dibin Amedê. Li Amedê di roja 31ê Tîrmeha 1926an bidarde

dibin.³²

³² DÊRSIMÎ, Dr. Nûrî, *Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim*, Weşanên Doz, 2004, r.185-187, Ev agahî min ji Mihemed Begê kurê Efqîzîver Beg û Dr. Muzafer DEMİRÊ Enwer Begê kurê Zubeyr Begê ku pîsmanê Xalid Begê ye, stendiye.

Qada Desthelatiya Serokê Millî yê Kurd: Îbrahîm Paşa

Îsmail Heqî Şaweys

Wergerandina ji Soranî: Seîd Veroj

**Hukim û Hêz û Karîna Wî ya Li
Navçeyên Wan, Diyarbekir,
Urfe, Entab, Heleb,
Eskenderûn, Terablus û Şam
Çawan Bûye?**

Di Salên 1860-1912

Navçeyên ku di dema dawî ya qernê 19. de li bin bandora hêz û tiwana (karîna) desthilatiya serokê Millî; Îbrahîm Paşayê Kurd bûn, li jêrê hatine nîşankirin: Wan, Melezzgird, Bedlîs, Sêrd, Diyarbekir, Cezîre, Mardîn, Wêranşar, Siwêrek, Urfe, Mereş, Entab, Kilîs, Îslahiye, Osmanîye, Bab, Heleb, Dortyol, Pabas, Eskenderûn, Entaqiye, Hema, Humis, Trablus û Şam.

Serokê Millî Îbrahîm Paşayê kurd, li navçeyên Wan, Mûş û Melezzgird

ligel general Husên Paşa yê kurd -serokê eşîreta Heyderan- yekîtî bestiye. Hêz û karîna Husên Paşa heta Wirmiyê, Rewasiyê, Makû û Bayezîdê riştiye. Husên Paşa ligel eşîretên Zîlan, Celalî û Qefqasî li navçeyên Agirî (Ararat) cînişîn bûn, ligel turkmenan kurdên navçeyên Agirî -robarê xwar ê Aras, ligel kurdên Qulp, Qaxizman, Qers, Erdehan, Sarîqamiş bi hoyê sîyaseta asayîş û refdarê baş ê Rûsî ve... hatûçûna wan hebûye. Bi vî rengî hevkarî kirine ligel Rusyayê -Çar Nikolad/Qeyser Nîkolay- pêwendiya wan hebûye, ji yekûdu agadar bûne.

Ji layê (aliyê) hemû kesî ve aşkira ye ku Husên Paşa yê kurd, di dema dawî ya qernê 19. yê xîlafeta Sultan Hemîdê Duwem de, generalê leşker û hêza 32 alayên siwarî yên kurd bûye ku her alayiyek pêlî boluka wî siwar e

û her bolokek 4 platûnî(manga) bûye. Di seferber de her taqîmek 60 siwarî bûye. Her alayek siwarî, 1 batarya wan a topê çiyayî hebûye. Belam her bolukekî eşîretê ji 240 siwaran pêkhatî bûye. Bi vî rengî alayek siwarî, 1200 siwarî bûne. Li vê demê di nefira giştî de, qewmê kurd bi vê terhî li navçeyên xwe de hatibû dabeşkirin û ji yekûdu hatibûn veqetandin û ji şexsiyet û hukim û fermana serokê mezin ê kurd hatibûn dûrxistin, tabih bi xîlafet û seltenetê Osmanîyan bûn. Ketibûn jêr emr û fermana hikumet û leşkerên Osmanî... Ev 32 alayiyên siwarî yên kurd bo du armancan dihatin bikar anîn:

1- Bo hêriş û tirsandina gelê ermen.

2- Bo mebesta qayimkirina serîdanana kurd, ji emr û hukim û fermana xîlafet û selteneta turk re... Ku Sultan Hemîdê duyem Xelîfeyê 300 mîlyon alemê îslamê bû.

Yekem jimarey le Rezberî 1324.6 î Teşrînî yekem 1945 da bilawkirawetewe, em jimareye 30 lapere bû. Le ser bergî yekemî govare ke tenha Hawar nûsra bû, le ser bergî duyem Hawarî Kurd nûsrawe....⁽⁴⁾

Hawarî Kurdistan

Yekem jimarey le 21 Martî 1946 da le Mehabad çapkirawe, organî Lawanî Dîmokrat bûwe. Sidiq Encîrî serperiştî kirdiwe. Le ser laperey yekem eme nûsrawe: govarêkî edebî, sîyasî, komelayetî. Rêbazî Marksî le nawerokî da dîyar e. Le ser û nawî govarekew nûsrawe "be sewad bîxwênêtewe bo bê sewad..."⁽⁵⁾

Govarî Girugali Mindalanî Kurdistan

Le jêr çawdêrî Mele Qedrî muderîsî da kirêkaranî çapxaney Kurdistan le Mehabad bilawyan dekirde. Le jêr nawî govareke da nusrawe "Bîrî kargeranî çapxaney Kurdistan". Yekem jimarey le Nîsanî 1946 da çapkirawe, çîwar jimare le govareke kewtunete ber dest, pêdeçêt her ewe çîwar jimareye bilawkirabêtewe...⁽⁶⁾

Geşanewey Aborîyî Bojandinewey Bazar û Bazirganîyî

Serbestîyî hatin û çûn û çalakî

bazirganîyî û zorbûnî berhemî kişt - ûkal û gorînewey kelûpel, damezrandinî kompanya û hewalî kirdinewey sînema...Ewane ta radeyek bazarî nawçekey sînorî komaryan bojandewe. Belam deramet û dahatî serekî le komekî Yekêfî Sovêtewe bû ke le rêgey Tewrêzê we denêrdira.

Degotirêt ke: "Komarî Azerbaycan 20.000" tumanî nizîkey (4400 dolar) î be qerz dabûwe Komarî Mehabad biryarîş dira be şekir pir bikrêtewe...⁽⁷⁾ Herçend e rijêmî Şah ablûqe xistibûwe ser nawçeke, be taybetî qedexekirdinî kirrînê tûtin le cutyaran bo bîrsîkirdinî nawçeke belam (Sovyet tûtinî ew saley Kurdistanî kirrî be (80.000) pawen...⁽⁸⁾)

Herçende Azerbaycan sîyasetêkî aborî sosyalîstaney pîyade dekird, ke çî serkirdayetî komarî Kurdistan kem û zor bîrî le we nedekirdewe û pêrewî sîyasetêkî lew corey ne dekird. Boye em xoy dûr xistewe le dabeşkirdinî zewî û zar be ser cutyaran da, wek Azerekan kirdeyan. Yekêk lew hev-taney ke dira bo zîyatir geşe pêkirdinî aborî, hewlî serokkomar bû bo kirdinewey bank û dawakirdinî le xelk ke altûn û parekanyan wek qerz le wêda dabinên, bê ewey serkewrîn be destan behênêt. Dîsan zerîbe le hendê xêzanî dewlemendî wek xêzanî Şafîî le Mehabad ke berberekanî komaryan dekird, wer degîra...⁽⁹⁾

**Damezrandinî ew qeware
Kurdîye xomaliye mitmaney be
tiwana û îradey sîyasî û
neteweyî xulqand.**

Nebûnî ezmûnî hikumranî xo î xoberêwebirdin, sepandinî hikum î

yasa û kulturêkî namo be kurd, dirêj-xayenîyî ew haletê, dîyardey ne asayî lay xelkî kurd xuliqand bû. Dîyardeyekî corî le razîbûn bew barudoxane, dîyardeyekî nebûnî tiwana û hêzêkî ewto ke kurd bitiwânêt wilatî xoy berêwe bibat, boye xamoşîyî ew nawçeyey Kurdistanî girtibowe. Be damezrandinî ew qewareye, kurdayetî bujabewe serbexoyî sîyasîyî, herçend e yek layane û tenha dîfaktoyek bû, hênaye arawe, kêşey kurdî lew beşe da zindû kirdewewe hênraye ser şanoyî sîyasî, le gelêkî çewsawe û jêr destewe ke sadetîrîn mafîşî zewt kirabû, bû be xawenî qewarey sîyasî û neteweyî û îdarey xoy, berdewamî ew gorranane, mitmaney kurd be xo û îdarey sîyasî xoy, be tiwanay xo berêwebirdinî wilatî xoy behêz kird. Kobûnewe bîst hezar neferîyekey dûy Rêbendan, rîfrandûmekî neteweyî bû bo mitmaney be serkirdayetî komar, bo dananî dam û dezgey berêwekirdin, bo rizgarkirdinî kurd le her kuyyek bijîn.

**Cemhuriyêti Kurdistan bizwê-
nerî hest û berjewendîye kome-
layetî û çîneyetîyekanî komel
bû**

Şan be şanî geşe kirdinî layenî sîyasî. Layenî komelayetî û çîneyetîyekanîş geşeyan kurd, herçende le sînorêkî zor tesk le ser xo bû, eweş hokarî taybetî xoy hebûwe le çewsandinewe û dagirkirdinî sedan sal da xoy deniwand, boye cemawerî cutyar û xelkî zehmetkeş komarekeyan be hî xoyan dezanî. Çunke ta radeyek zulm û zor wek caran pîyade ne dekira, xelk

boyan hebû şikayet û dawa û daxwaz-
yekanyan bigeyenin.

Tenanet pêşawa Qazî Muhemmed
rêge û şiwênî taybetî bo em core
diyardane dana bû be taybetî rêgey
geyandinî name û dengî hawwilatyan
be xoy, ewaneş derencamî damezran-
dinî Komarî Kurdistan bû çünke:

*Geşekirdinî bizotnewey kurdayetî
kewte naw qonaxekî niwê we ke bîr
û layene komelatîyekan baştir xoyan
derbixen, pêwîstîyî gorankarîyî barî
komelayetî û guzeranî xelk le ber
çaw bigirên.

*Ew nîmçe serbexoyî û rizgarîyî û xo
berêwebirdine, çewsandinewey sîya-
sî û neteweyî û zulm û zorî dagîrker-
anî nehîştibû, dergay le ser reformî
komelayetî kirdewe. Belam nebûnî
nexşeyekî lew babete, nebûnî dahat
û binemay aborîyî dewletî, zorîyî
kêşe û girifte corawcorekan, bûnî
hereşey berdewam le layen hêzekanî
rejêmwê û xerîkbûnî lîpîrsirawan
be karî pêşmergeyî û peydekirdinî
pêdawîstîyekanî şer... Le ber ewane
ne detuwanra karî girîngî lew babete
encam bidrêt.

*Damezrandinî komar bûwe hoy
tund û tîjkirdinî milmilanî le nêwan
netewî kurd û çînî deshelatdar, le
naw xoş da axa û serok xêla
wabestekan rejêmwê bibune corêk-
îtîr le guşar (hem) bo serkomar û
hem bo serdanîştîwan.

Ewaneş karî xoyan le ser xelke
xwêndeware dekird ke xwazyarî corek
le edaletî komelayetî bûn, karî xoyan
dekirde le ser xelkî zehmetkeş, betay-
betî ke kar û kirdewey ne asayî serok
xêl û derebeg û xawen mulkekanyan
baştir bo derdekewt, belam her ew
narezayî û kartêkirdinane bes nebûn

bo gorran, bes nebûn ta sudyan lê
werbigirêt û bikirêne hêzêkî rêkxirawî
ewto ke komarîşyan pê biparêzêt..

Bujandinewey hest û nestî neteweyî û gîyanî nîştîman- perwerîyî

Geşekirdinî bizotnewey kurdayetî
her le sînorî komareke da nebû, belkû
zorbay nawçekanî Kurdistanî girti-
bowe, cimûcol û çalakîyî, amadebûnî
gelî ronakbîr û nîştîmanperwer bo
xizmetî komar. Bûnî hêzekey
Kurdistanî Îraq ke Mela Mistefa
serkirdayetî dekird, be hoy şikestî
şoreşî Barzan û naçariyî ew hêzane bo
kişanewe û xo geyandinewe nawçê-
kanî komar ke bubû bew hêzey mit-
maney pêbikrêt û cigey dîlnîyayî
parastinî komar bêt. Cige le amade-
bûnî gelî nîştîmanperwer le nawçeka-
nîtirewe, le Kurdistanî Îraq û Turkiya
û Suryaşewe em geşekirdin û firawan-
bûnî hest û nestî neteweyîye, çend
diyardeyekî tirî xulqand, lewane kew-
tine ser rêbazî hizb û korr û komal
pêkhênan. Damezrandinî Partî
Dîmokratî Kurd le Kurdistanî Îraq
(16î Abî 1946) encamêkî girîng û
prosey damezrandin û berêwebirdinî
Cumhuriyetî Kurdistan bû ta ew saley
ke le zor ruwewem hizbe niwêye haw-
çênî Hizbî Dîmokratî Kurdistan bêt.

Firawanîyî şepolî hestî neteweyî û
gîyanî nîştîmanperwerîyî le hemû
parçekanî Kurdistan da be corêk ke
tenarete rûxandinî komareke û le
sêdaredanî pêşewa û hevalekanîş bûn
be hokarêkî tirî ew firawanbûn û geş-
kirdinane.

Pêkhênanî supa û hêzekî çekdarî pêşmerge, tiwana û gîyanî bergirîyî kurdî selimand...

Bo yekem car bû ke supa û hêzî pêşmerge le astêkî baş da rêkbixrê, be çekî suk pir çek bikrê, yekekanî hêz ke le biçûktirînewe bo hêz û supa, bûnî deyan efserî lêweşawe û derçûy kolêj û ekademîyey serbazî, bûnî piley corawcorî supayî her le çekdarêkî asayîyewe ta piley ceneral û wezîrî hêzî bergirî, rêxistinî ewane le wezaretêkî taybet be ceng û bergirî le komar bo ew serdeme, karekî asan nebû. Legel eweş da ewane be corêk kiran ke hêzekan berdewam le haletî amadeyî da bêt bo şer, le çendîn şer û pêkdadan û neberdî da azayetî û tiwanayî supakeyan selmand.

Lewaneş girîngtir, supake û hêzî pêşmerge hêzî millî bûn. Le pênavî parêzgarîkirdinî komar û bergirî legel rêkxiraw bûn, be pêçanewey erteşî rijêmî Şah we ke erteşêkî fire regez û be zore millî damezra bû.

Herçende komelge ke gîyanî xêlekî tê da zeq û komelgey nîmçe derebegî bû, gelf lew serok xêlaney hewlî sepanî xwast û arezûyî şexsîyan deda. Legel kem û kurtî pêdawîstîye serbazîyekan her le fişekî asayî û azuqewe ta çekî qurs, legel ewaneş da mameley lêpîrsirawanî supa legel pêşmerge û çekdarekan corêkî tirî şaristanîyan nîşan deda. Çunke be tengîyanewe dehatin û hewlîyan deda pêdawîstîyekanyan cêbecê bikrên, bûnî efserê lêzanekan be taybetî efseranî kurdî Îraq, lêweşaweyî û şarezayî û seliqey kurdîyan le meydanekanî supa û hêzî bergirî û ceng da derdexist.

Ewane mitmane û birwabawerî xelkî kurdîyan be komar û be supakey behêztir kird.

Helbijardinî serokkomar û xulqanî Sistêmî komarî, pêkhênanî encumenî wezîran (Heyetî Reîsey Millî) û dananî Hacı Baba Şêx be serokî, rêxistinî damûdezekanî wezaretikan

Bunî serçawe bo yasadanan û biryar, herçende fire serçawêş bû, xulqandinî amrazî berêwebirdin û lêpîrsinewe le xelk û çareserkirdinî kêşekanyan û bayexdan be qutabxaney kuran û kiçan û xwêndin be zimanî kurdî û be êlzemkirdinî û azadanî ewaney mindalekanyan nedarde qutabxane. Kirdinewey pol bo nexwêndewaran, bayexdan bo tendurustî giştîyî, çareserkirdinî kêşey newantîre û xêlekan awirdanewe le kemîne netewetîyekan le rûy berêwebirdin û hawbeşîkirdinîyan û kirdinewey qutabxaney taybetî boyan.

Awirdanewe le hemû ew layenaney jîyanî xelk wek le pêkhatey wezaretikan da derdekewin ke tiwaney xelkî nawçeke derdexin selmandîyan ke detiwanin xoyan berêwe biben û tiwanekan bixene kar.

Bayexdan be tendurustîyî giştî, çawdêrîyî şiwêne giştîyekan, şeqamekan û rûnakkirdineweyan, be hemam û çapxane û çêştîxanekan û pak û temîzîyan û çawdêrîkirdinîyan.

Bêguman eger sûdyan le tiwanekanî xelkî Kurdistanî Îraqîş werbigirtaye her wek çon le rûy pêşmergeyêtîyewe sûdyan lê wergira ewa berêweberêtîyekî baştir dehênraye arawe.

Legel ew natewawî û boşayî û girif-taney dewrî komaryan dabû. Legel lawazîyî û kizîyî barî aborî û guşarî Azerbaycan bo bestinewey Mehabad be Tewrêze we, ewqakirdinî komar le rûy aborî û sîyasîyewe, sereray sepandinî stratejî bergirîkirdin û pêkxistinî hewlê firawankirdinî sinûr, wituwêjî bê berhem û serlêşewan, legel nizmî astî sîyasîyî û xwêndewarî zor le lêpir-sirawan û kem ezmûnyan, legel ewaneş da berêweberêtîyekî ta radeyek baş û rêkûpêk bû.

**Bizotneweyî Cemawerîyî
Lawan û Jinan û karî rêkxira-
weyî, diyardeyekî niwêy naw
komelgey kurdewarî bû**

Le pêş hemû bizotnewey cema-werîyekan, bo yekem car rêkxira-wîyayan û lawan xulqa, dîsan bo yekem car bû ke kiçan û jinan le korî û kobûnewe cemawerîyekan amade debûn û witaryan dexwêndewe, le damûdezga û dayerekan da karyan dekird mamosteyanyan le qutabxaney kiçan da dersiyar dewtewe, beweş nerîte komelayetîye kon û bawnema-wekan xirane lawe, be taybetî her pêş ewaneş malî pêşewa Qazî Mihemmed laney ew jin û kiçan bûn ke ber zulmî pîyaw û kes û kar dekewtin, xanewad-ay pêşawa pêş hemûwan le meydanî xebat da bû. Yekêti Ciwananî Kurdistan berhemêkî tirî komar bû, em yekêtiye çalakane heldesuraw erkekanî serşanî encam deda.

**Yasadanan û hewlî cêbecê û
piyadekirdinî, dîmenêkî şaris-
tanî Komar bû**

Hîç dewlet û hikumetêk baş û seqemgîr û adil nabêt eger yasay bo danenrê, hîç komelgeyekîş bê yasa şaristanîyî nabêt. Herçende serçaweka-nî yasadanan fire layen bû, her le Pêşewa û serok û wezîranewe ta komîtey nawendî Hizbî Dîmokratî Kurdistan û hendê serçawey serbazîyî wek wezîrî hêzî dîmokratî Kurdistan, legel eweş da le maweyekî kurtî wek temenî komar da, cêgey serince ke ew hewlane dirawin û wîstî encamdanyan le arada buwe. Ew yasayane her le derde komelayetîyekanî wek tilyak kêşan û bedmestî û şerûşor û kêşekanî cutyaran û jinanî degirtewe ta meseley xiyaret le nîştiman, herçende hendê le yasakan legel rewî şaristanîyet da nedeguncan, legel eweş da dîsan ewane awirdanaweyek bû bo çareser-kirdinî kêşekanî naw komal, be pêyî eqîyêti barudoxekanî ew kat.

Pêş ewey kotayî bem beşe bênîn çak waye nirxandinekey kongirey sêhemî Hizbî Dîmokratî Kurdistanî Êran bixeyne pêş çaw:

“Temenî komar tenya yanzde mang bû belam her lew mawe kurte da beşêkî girîng le awatekanî gelî kurd hate dî, gelî kurd çarenûsî xoy be destî xoy wergirt, zimanî kurdî be zimanî resmî nasra, ferhengî netaweyetî kurd be xêrayî destî be pere estandin kird û bo perwerdekirdinî kadir hendêk le lawan bo derewe nêrdiran, çend rojname û govarî kurdî be rêkûpêkî bilaw-

kiranewe, tîatrî kurdî pêkhat, jinî kurdî le jîyanî sîyasî û ferhengî beşdar bû (hêzî millî). Supay gelfî Kurdistan pêkhat û şiwênnewarêk le polis û jandirmekanî zordar nema. Komarî Kurdistan peywendî dostanîyetî û hawkarî legel hikumetî millî Azerbaycan ke maweyek bû pêkhatibû damezrand û bereyekî berîn le hîzbe pêşkewtûwekanî Êran pêkhat ke Hizbî Dîmokratî Kurdistan yekêk bû le kolegekanî û bem core Kurdistanî Êran bû be binkey azadî û cêy hîway azadîxwazanî Êran.

Komarî Kurdistan her lew kate da nîştimanî hawderdî û hawkarîyî netewey kurd bû le hemû parçekanî Kurdistan, Kurdistanî Êran, têkoşeranî kurdî Îraq, herweha xebatkaranî Kurdî Turkîya û Sûriya le bawêş girt komar be dilewey pêşwazî le mîwanane dekird û rêzî lêdegirtin. Belam le berdem ew hele mêjûye da mîwanekan nebûne hoy natebayî û ajawe û destwerdane karûbarêk ke lêpîrsirawanî hîzb û hikumet lê nerazî bin. Belkû hemû tiwana û hêzekanyan xiste berdem serkirdayetî Komar û Hîzb. Bem çeşne Cumhûriyetî Kurdistan bûbe binkey azadî û cêy hîway netewey kurd le hemû parçekanî Kurdistanîş..."⁽¹⁰⁾

Perawêz û serçawekanî ev beşî

1. Hêmin, serçawey nawborî la 24
2. Dr. Kemal Mezher Ehmed, Têgeyîştinî Rastî û Şiwênî le rojnamenûsî Kurdî da, çapî Bexda/1978
3. Govarî Gelawêj, jimare 3 / salî 3 Martî 1946
4. Dr. Kemal Mezher Ehmed, s.n.
5. Dr. Kemal Mezher Ehmed, s.n.
6. Dr. Kemal Mezher Ehmed, s.n.
7. Eegleton, W. op. Cit. P.10
8. Eegleton, W. s.n.
9. Eegleton, W. s.n.
10. Kongirey Sêhemî Hizbî Dîmokratî Kurdistan (Êran), Eylulî 1973. la 11.

Pirsa Sereke di Pirsgirêka Kurd de

Îsmail BEŞÎKÇÎ

wergerandina ji tirkî: Roşan Lezgîn

Li Tirkiyê derbarê Pirsgirêka Kurd de zêdetirîn mijara ku tê qisetkirin 'çareserî' ye. Bêguman her tim kurd li ser 'çareserî'yê diaxifin, kurd 'çareserî'yê munaqeşe dikin. Lêbelê beriya 'çareserî'yê pêwîst e ku ev mijar zelal bibe: Gelo sedemên bingehîn ên vê pirsgirêkê çi ne? Ev pirsgirêk ji kengî ve pirsgirêk e? Ev pirsgirêk ji kîjan qonaxa dîrokî hasil bûye? û hwd.

Di vê axiftinê de ez dê hewl bidim xwe da ku li ser vê mijara bingehîn rawestim. Qonaxa bingehîn a dîrokî ku Pirsgirêka Kurd jê hasil bûye, qonaxa Şerê Cîhanê yê yekemîn e, yanî qonaxa pevçûna parvekirinê û piştî wê ye ku meriv dikare bi kurta hî bibêje, qonaxa danîna Cemiyeta Miletan jî. Tê zanîn ku *Mîsaka Cemiyeta Miletan*, wek beşa sereta ji peymanên aştiyê ye ku li Konferansa Aştiyê ya li Parîsê hatibû nirxandin. *Mîsaka Cemiyeta Miletan* li mêjûya 10. 01. 1920 ligel Peymana Versailles dest bi jiyane kiribû.

Li salên 1920-1921an di çarçoveya Cemiyeta Miletan de dewletên nû li ser xaka Împaratoriya Osmanî ya erebîaxêf û kurdîaxêf hatin danîn.

Iraq û Urdun û Filîstîn wek dewletên manda li jêr fermanrewayiya Brîtanyaya Mezin bûn. Sûriye û Lubnan jî wek dewletên manda li jêr fermanrewayiya Fransayê hatin danîn. Meriv dikare têgeha 'manda' wek cureyek kolonî jî fam bike. Li vir pirs derbarê kurdan de divê ev be: Gelo ji bo çi Konferansa Aştiyê ya li Parîsê yan jî di çarçoveya Cemiyeta Miletan de pêş li danîna Kurdistanê hatiye girtin? Digel daxwaz û têkoşîna kurdan, dîsan jî li hember danîna Kurdistanê hatiye rawestin? Ji bo çi li hember Kurdistanekê ku dê li bin fermanre-



İsmail Beşikçi

wayiya Brîtanîyaya Mezin an jî Fransayê bûya hatiye rawestîn, ji bo çî nehîştine ku Kurdîstaneke kolonel (manda) jî were danîn? Di wê demê de çima Kurdîstaneke manda, wek dewletên manda yê Iraq û Sûriye, wek Filîstîn û Urdun û Lubnanê nehate danîn? Digel ku wê demê kurdan di bin pêşengiya Şêx Mehmûd BERZENCÎ de têkoşîneke sext ji bo danîna Kurdîstaneke serbixwe dane jî belam dîsan jî nehêlane Kurdistan bête danîn lê di navbera dewletên Iraq û Sûriyeya manda û Tirkiyeya ku teze hatibûn danîn de hatiye parvekirin. Bi vî awayî Brîtanîyaya Mezin (Iraq), Fransa (Sûriye) û dewleta Tirkiye bûne cîranên hev. Ev, tê wê wateyê ku Kurdistan wek welat û wek netewe hatiye daqurtandin. Di deheyên 1920an û 1930an û 1940an de Tirkiye bi Iraqê re, yanî bi Brîtanîyaya Mezin re, bi Sûriyê re yanî bi Fransayê re bûye cîran. Her du dewletên emperyal jî fişareke tund li ser kurdên di bin fermanrewayiya xwe de dane meşandin. Gelek bi baldarî tevgeriyane da ku daxwazên netewî yê gelê kurd neyêne cih. Ji vê çendê politikaya parçekirin û parvekirinê li ser kurdan encameke wêranker, encameke giran pêk aniye. Ev encam, wek parçekirina laşê însanekî, wek pelçiqandina mejiyê însanekî ye. Ji Şerê Cîhanê yê yekem re dibêjin pevçûna parvekirinê jî. Di rastiya xwe de di piroseya vî şerî de û li dû wî jî kurd û welatê wan Kurdistan hatiye parçekirin û parvekirin. Di pêvajoya Pevçûna Parvekirinê ya yekem de û piştî wê ev yek li ser xaka Osmanî ya erebîaxêf jî pêk hatiye.

Ereb, wek dewletên cihê û wek dewletên manda hatine danîn belam kurd, ji bo ku navê wan ji ser zar û zimanan û ji dîrokê bête maliştin hatine parçekirin û parvekirin. Ji vê çendê ew politikaya klasîk a "Parçe bike-Îdare bike" li ser kurdan wek "Parçe bike - Îdare bike - Tune bike" hatiye meşandin. Lewre jî, Konferansa Aştîyê ya li Parîsê û Cemiyeta Miletan ji bo ku aştîya navnetewî pêk bînin hewl didan xwe, di meseleya Kurdistanê de berovajîya istîqrar û aştîyê tevgeriyane! Çünke, li gor vê biryarê salên pişt re gelek surîştî ye ku kurd dê ji bo bidestxistina mafên xwe, ji bo azadiya xwe hewl bidin xwe û di encamê de helbet dê pevçûn derbikeve.

Ez di wê baweriyê de me ku li dawîya sala 1919an heta bi destpêka sala 1921an ku teqriben ev dike 18 meh, li Brîtanîyaya Mezin; li Wezareta Karûbarên Kolonîyan û li Wezareta Karên Derve û li Wezareta Birêvebirina Hindîstanê û li Wezareta Karên Şer û Hêzên Hewayî, li pişt derîyan derbarê kurdan û Kurdistanê de gelek guftugo û munaqêşe hatine kirin. Ev guftugo û munaqêşe li Bexdayê, li Qahirê, li Delhiya Nû, li Londonê û li Stenbolê jî hatine kirin. Ez wisan bawer dikim ku di encama van guftugo û munaqêşeyan de ji bo fermana kurdan biryar hatine stendin û çarenûsa kurdan hatiye pelçiqandin. Meriv bala xwe bide ser dokumantên îngilîzan dê ev qonax derkeve ber ro-nahiyê.

Wek tê zanîn, Kurdistan li sedeyê 17. (1639) bi Peymana Qesrî Şîrîn di

navbera Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Îranê de hatiye parvekirin. Û dişan tê dîtîn ku li çaryeka pêşîn a sedeyê 19. qismek ji xaka bakur a Kurdistana Rojhilatê di encama şerê Rûsyaya Qeyser û Îranê de daxilî nav sînoren Împaratoriya Rûsyayê dibe, her wiha di encama Peymana 1828an de ku di navbera van her du dewletan de pêk hatibû, Kurdistana Qafqasyayê ketiye bin fermanrewayiya rusan.

Birîtanîyaya Mezin û Firansa... Ev her du dewletên emperyal, hêzdarên çaryeka sedeya 20. her dem li dijî kurdan reftarî kirine, polîtîkayêke li dijî kurdan meşandine. Ev yek bi awayekî zelal di pêvajoya Pevçûna Parvekirinê ya yekem de li Peymana Sykes-Picot ku li Gulana 1916an hate îmzekirin û her wiha, li Konferansa San Remo ku li Nîsana 1920an pêk hatiye tê dîtîn. Çi hukûmetên ku di van her du dewletan de ji salên 1920an û vir de hatine serkar, tim di helwesteke li dijî kurd (antî-kurd) de bûne. Te divê bila inuhafe-zekar, an lîberal an jî çepgir û komunîst werine serkar, qet ferq nekiriye. Belam bi dewletên ku kurd xistine bin nîrê xwe re jî tim di nav reftariyêke dostane de bûne. Ger em bala xwe bidin ser, dê bête dîtîn ku derbarê kurdan de polîtîkaya Yekîtiya Sovyetan a li salên 1920an jî ji polîtîkaya van dewletan hiç ne cihêtir e. Te divê ew 14 xalên ku serokê DYA Woodrow Wilsonî ku ji bo tayînkirina mafên çarenûsa wan milletên ku di bin fermanrewayiya dewleta Osmanî de bûn, an jî te divê ew mafê tayînkirina çarenûsa netewan ku ji aliyê rayedarên Sovyetan ve dihate ziman, tu car jî bo kurdan nehatine karanîn. Pêwendiyên

Yekîtiya Sovyetan bi wan dewletên ku kurd xistibûn bin nîrê xwe re jî her tim xweş bûye.

Helbet divê ku polîtîkaya kurd a van her du dewletên emperyal bi teferuat bête vekolîn. Ev gelek eşkera ye ku ev polîtîka, bi îdareyên ereb û fars û tirk re hatiye danîn û geşkirine. Dema ku ev mesele bête vekolin helbet divê meseleya ermenan û meseleya aşûrî-suryanî-keldanî, her wiha pêwendiyên Mudafaeya Millî (li Tirkîyê) û Yekîtiya Sovyetan jî ji ber awiran dûr nemîne.

Ew milletê ku bûye hedefê polîtîkaya "Parçe bike-Îdare bike" bêguman miletekî xwedî zeaf e. Hêzên emperyal û yên dagîrker bo parçekirin û îdarekirina wî gelî û welatê wan helbet ji zeafên wî gelî îstifade dikin. Lêbelê, bo numûne, ew xasîyetên ji hevûdin re destnedanîn an jî nenaskirina otorîteya hev ku di kurdan de tîn dîtîn di ereban de jî hene, ger em rastiye bibêjin ev yek di hemû civakên ku hîn di heyama eşîrtiyê de dijîn tê dîtîn. Belam ev rewş ji bo dewletbûna ereban, ji bo danîna dewletên cihê-cihê yên ereb nebûye asteng!

Girêdayî bi vê pirsra bingeîn ku me piçek berê îfade kir, em dikarin çend pirsên din jî bikin. Brîtanîyaya Mezin ji bo hemû koloniyên xwe rêvebiriyêke xodmuxtar ava dikir. Li Hindistanê, li Afrîqaya Başûr, li Rodezyaya Başûr (Zambiya), li Rodezyaya Bakur (Zîmbabwe)... Digel ku di Tebaxa 1921an de dema ku rêvebiriya manda ya Iraqê dihate danîn, ango dema ku Feyselî li Bexdayê taca qraliyê dida serê xwe,

hingê Cemiyeta Miletan hin normên ku tê de ji bo kurdan otonomî hatibû dayîn jî danîbûn, belam dîsan jî Brîtanîyaya Mezin li Mosilê, ger hîn bi awayekî rasttir bête gotin, li Kurdistanê rêvebiriyeye xodmuxtar ava nekir. Digel ku kurdan otonomî taleb kir, digel ku Cemiyeta Miletan vê yekê pêşniyaz kiribû, dîsan jî Brîtanîyaya Mezin qet bersiveke erênî neda van daxwazan. Helbet divêt ev rewş bi hûrbîni bête vekolîn. Di wan salan de li Kurdistanê têkoşîneke sext hebû. Digel ku Şêx Mehmûd BERZENCÎ hate girtin, cezayê îdamê lê hate birîn û bo Hindistanê (1919) hate nefîkirin jî, lê têkoşîna danîna Kurdistanê her berdeham bû. Piştî ku Şêx Mehmûd BERZENCÎ ji Hindistanê vegerandin (1922) û wî danîn ser rêvebiriya kurd, dîsan jî têkoşîna danîna Kurdistanê her berdeham bû, lêbelê tevayî raperîn û têkoşînên kurdan bi xwîne hatin fetisandin. Kurdistan bû qada temrîna çekên teknolojîk ên Hêza Hewayî ya Qraliyeta Îngilîz. Hasan YILDIZ di kitêba xwe ya bi navê *Fransîz Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul Üçgeninde Kürdistan* (genişletişmiş 4. baskı, Doz Yayınları, 2005) de têkoşîna Şêx Mehmûd Berzencî bi dorfirehî qîset dike.

Li Konferansa Lozanê meseleya neqebên deryayî yê li rojavaya Tirkîyê, rewşa Stenbolê, meseleya hindikahiyan (ekaliyet) û gelek meseleyên din jî hatine qîsetkirin. Yek ji meseleyên girîng ên ku li vê konferansê hate axiftin meseleya Mosilê bû. Di rastiya xwe de li ser navê meseleya Mosilê Pirsgirêka Kurd dihate muna-

qêşekirin, belam Mosil wek ku bi awayekî qanûnî parçeyek ji xaka dewleta manda ya Iraqê be dihate rojevê, raperîn û serhildanên kurd ên li herêmê hîç li ber çavan nedihatîn girtin, li hember rewşa kurdan, li hember xwestekên kurdan xwe kerr dikirin. Wek objekteke siyasî ya xwedî daxwazan li kurdan nanihêrin lê kurdan wek bîrovekê dihesibînin. Ji ber ku bi vî çavî li kurdan dinihêrin lewma jî her tim wek kategoriyeke ku divêt bête berterefkirin, ji holê bête rakirin hewl didine xwe. Rastî ew e ku ev herêm welatê kurdan e. Tevayî serjîmareyên ku ji aliyê Brîtanîyaya Mezin ve û her wiha, yê ku ji aliyê Tirkîyê ve hatine kirin de jimareya (nufûs) kurdan her tim ji ya ereb û tirkman û suryanî û keldaniyan zêdetir bûye. Di wê raporta Komîsyona Cemiyeta Miletan de ku di 30ê Êluna 1924an hatiye pêkanîn de jî ev yek tê îsbatkirin. Ev raport li kitêba *Musul Kerkük Sorunu ve Kürdistan'ın Paylaşımı* ku têde beşek bi sernavê "Milletler Cemiyeti Belgelerinden" heye, hatiye weşandin (Med Yayınları, Eylül 1991, İstanbul, s. 236 vd.).

Lêbelê li Konferansa Lozanê nûnerên kurd nîn in. Li Konferansê nûnerên ku daxwazên kurdan binin ziman jî nîn in. Gelek bi baldarî tevgeriyane da ku ev nûner li konferansê cihê xwe negirin. Berpirsiyarê delegasyona tirk İsmet İnönü'yî gotiye "Em nûneriya kurdan jî dikin..." belam her tim daxwazên tirkan aniye ziman û xwedî li dîtinên ku li dijî kurdan e derketiye. Esasê wê, li dawiya sala 1919an nehiştine ku nûnerên kur-

dan beşdariya Konferansa Aştiyê ya li Parîsê bikin. Brîtanyaya Mezin û Fransa ku li vê herêmê zal bûn, pêşî li her du nûnerên Şêx Mehmûd BERZENCÎ girtin ku dê beşdarî Konferansa Aştiyê ya li Parîsê bûbûna. Her du nûnerên kurd ku dê ji Sûriyê bi riya deryayê biçûna Fransayê, ji aliyê rayedarên îngilîz û fransîz ve hatine astengkirin, pêşî li wan hatiye girtin. Refîk Hilmî di kitêba xwe ya bi navê "Anîlar, Şeyh Berzenci Hareketi" (Nujen Yayincilik, Istanbul, Temmuz-1995, r. 21, 43-44) de derbarê vê yekê de agahiyên hêja dide me. Şêx Mehmûd BERZENCÎ du nûnerên xwe yê bi navê Zekî Kaban û Seyid Ehmed dixwaze bişîne Parîsê. Namyek ku têde daxwazên kurdan hatiye nivîsandin di destê van her du nûneran de ye. Ev nameya ku daxwazên kurdan têde heye divêt bikeve destê Şerîf Paşayê ku li ser navê kurdan beşdarî Konferansa Aştiyê ya li Parîsê dibû. Dema ku ev her du nûnerên Şêx Mehmûd digihên Helebê, hingê ji aliyê îngilîzan ve pêşî li wan tê girtin. Ji bo ku nehêlin ev her du nûner xwe bigihînin Konferansê bi derewên wek "Rewşa hewayê ne baş e, keştî xirabe ye, keştî xistine tamîrgeyê û hwd..." hatine xapandin. Pêwendiyêke organîk a Şerîf Paşayê ku li Konferansa Aştiyê ya li Parîsê gotibû "Ez nûnerê kurdan im" bi kurdên herêmê re nîn e. Ev her du nûnerên kurdan, piştî ku Şêx Mehmûd ji aliyê îngilîzan ve hate girtin, hîn bo Kurdistanê hatin vegerandin.

Digel ku yek ji meseleyên bingehîn ên ku li Konferansa Lozanê hatibûn

qîsetkirin meseleya Mosilê bû û dîsan, digel ku li herêmê raperîneke xurt a kurd hebû jî, gelo ji bo çi li Konferansê nûnerên ku daxwazên kurdan bînin ziman nîn bûn? Gelo ji bo çi beşdariya nûnerên kurd bo Konferansê hate astengkirin? Gelo ji bo çi kurd wek objekteke siyasî ya xwedî daxwazan nayê dîtin lê wek bîrovekê ku bandoreke nexweş li ser her kesî dike tê hesibandin? Bi pirs sereke ve girêdayî divêt ev pirs jî wek pirseke muhîm ku pêşî li pirs sereke ya Pirsgirêka Kurd vedike bête hesabandin.

Ger li salên 1920an di çarçoveya Cemiyeta Miletan de wek Iraq û Filîstîn û Lubnanê wek dewleteke manda yan jî kolonî Kurdistan bihata danîn, hingê dê wek "Kurdistana manda" yan jî "Kurdistana kolonî" bihata binavkirin, pirtirîn dibe ku bigotana "Kurdistana manda ya filan dewletê" yan jî dê bigotana "Koloniya bêvan dewletê" û hwd. Ev, di radeyê nizm de be jî, dîsan statuyêke siyasî, şexsiyeteke siyasî bi şanî me dide. Ma ev "Iraq Mandaya Îngilîz" yan jî "Sûriye Mandaya Fransîz" statuyêke siyasî bi şanî me nade? Lêbelê li salên 1920an kurd ne xwediyê piçûktirîn statuya siyasî ne jî! Gelek bi baldarî tevgeriyane da ku kurd bêstatu bimînin. Ji vê çendê Kurdistan tew ne kolonî ye jî. Li vir divêt mirov bi baldarî li ser vê edata "jî" bi xwe jî bisekine!

Ji bo zelalkirina pirs sereke mirov dikare pirseke din jî bike ku ev jî derbarê Yekîtiya Sovyetan de ye. Li sala 1923an, li navçeyên wek Laçîn û Kelbajar û Qubatlu û Zengilan ku di navbera Ermenistan û Qerebaxa Jorîn de diman bi navê Kurdistana Sor min-

tiqeyeke otonom hatibû danîn. Ev diyarde heta sala 1928an jî jiyana xwe berdewam kir. Li sala 1928an ev diyardeya otonom hate felîşandin. Tê divê bila pêwendiyên li navbera Yekîtiya Sovyetan û Tirkîyê baş bin an jî te divê bila xirab bin, em dibînin ku her tim kurd ji Qafqasyayê ber bi Asyaya Navîn ve têne nefîkirin. Nefîkirin li salên 1937 û 1944an her berdewam bû. Ev mijarek girîng e ku divê baş bête vekolîn bê hela çima Kurdistanê Sor hate danîn û dû re hate felîşandin?

Li ser meseleya kurdan hêlsengandina salên 1920an, di navbera qewimînên ku bi awayekî fiilî pêk hatine û vekolîn û analîzên ku hatine kirin de berovajîyeke (zitbûn) mezin heye. Kurd, wek ajan (sîxur) û hevkarên emperyalîzmê têne îthamkirin. Belam li wê demê di navbera kurdan û Brîtanîyaya Mezin de pevçûneke sext heye. Brîtanîyaya Mezin arezûya kurdan a bo serxwebûna Kurdistanê yan jî bo xodmuxtariyê qebul nake, ji bo pelçiqandina vê arezûyê çî ji dest tê texsîr nake. Hêza Hewayî ya Qraliyeta Îngîlîz li deheyên 1910 û 1920 û 1930 û 1940an pirtirîn li Kurdistanê hatine karanîn. Ji vê hêlê ve hêja ye ku meriv bala xwe bide ser têkoşîna Şêx Mehîmûd BERZENCÎ. Belam digel ku hîç caran Kuvayî Mîlliye (bizava tirk) bi Brîtanîyaya Mezin re neketiye nava pevçûnekê, dîsan jî wek ku li dijî emperyalîzmê têkoşiyabe tê nîşandan. Li salên bi dû re jî ev rewş hemî wisan e. Kurdan bo alîkariyê carinan serî li Brîtanîyaya Mezin û Fransayê dane belam ev alîkarî hîç caran bo kurdan nehatiye dayîn. Derbarê nedana

alîkariyê bo kurdan de nivisarên wan jî hene. Belam Kuvayî Mîlliye mîna ku li hember emperyalîzmê be tê nîşandan, dîsan jî ji van her du dewletan alîkarî xwestiye û ev daxwaza wê jî her dem bîcîh hatiye. Dema ku em diyardeyên salên 1920an hildidin dest û em van diyardeyan analîz dikin divê em van nakokîyan jî bidin ber lêpîrsînê.

Ji aliyê siyasî ve dema ku em bala xwe didin salên 1920an hingê sê kategoriya mezin ên wek Brîtanîyaya Mezin, Firansa, DYA û Yekîtiya Sovyetan hene. Di kategoriya duyem de dewletên serbixwe yên wek Tirkîye û Îran hene û her wiha dewletên manda (kolonel) ên ku bi dewletên emperyal ên wek Brîtanîyaya Mezin û Fransayê ve hatine girêdan hene. Tê dîtîn ku dewletên serbixwe yên wek Tirkîye û Îran jî ji aliyê aborî ve ketine bin nîrê dewletên kategoriya yekem. Di kategoriya sêyem de jî gelên ku nebûne xwedî dewlet, ger rasttir bête gotin, gelên ku mafê dewletbûna wan hatiye xespkirin hene. A gelê kurd jî, miletekî wisan e. Ewên ku li ser pêwendîya di navbera dewletan de analîzan kirine her dem têtîkîyên dewletên kategoriya yekem û duyem hildane dest, gelên ku di kategoriya sêyem de ne, her tim li derve hiştine. Ev gel jî aliyê dewletên kategoriya duyem ve her dem wek bîrovekê hatine hesabandin. Her dem tê gotin ku, ev gel jî bo ku dewletên kategoriya duyem lawaz bixînin, pêşî li mezinbûn û serketina wan bête girtin dewletên kategoriya yekem ên wek Brîtanîyaya Mezin û Fransayê wan ajotîne meydanê. Bo numûne, dewletên

ku kurd di bin fermanrewayiya wan de ne, dewletên ku kurdan di bin fişarê de dihêlin her dem bi têgehên wek "eşqiya", "mêrkuj", "qerwaşên emperyalîzmê", "piyonên emperyalîzmê", "hevkarên emperyalîzmê", "sergerde", "paşvemayiyên feodalîst", "serhişkên têtikiliyên kovî yê li dijî modernîteyê", "kevneperest û îrticaperestên li hember dewletên modern û laik" kurdan îtham dikin û wisan didine nişandan. Her tim gelek bi baldarî tevdigerin ku hem bo rayagiştî ya hundirîn û hem jî bo rayagiştî ya derve kurdan bi van têgehên bidine nişandan. Lêbelê, ev gelên ku di kategoriya sêyem de hatine hiştin, bo numûne, gelê kurd wek objekteke siyasî xwedî daxwazên siyasî û xwedî îradeyê siyasî ye, belam arezûyên vî miletî, bi taybetî ji aliyê dewletên kategoriya duyem ve bi awayekî sext di bin fişarê de têne hiştin. Ji bo ku daxwazên wî pêk neyên teroreke sext a dewletî tê karanîn. Carînan ev gel li hember vê terorê hawara xwe digihîne dewletên kategoriya yekem, bo numûne, li dewra rejîma Sedam Husênî ew operasyonên Enfalê ku di radeya komkujiyê (jenosîd) de pêk dihatin rewşeke bi vî rengî ye, belam tê dîtin ku di rewşên bi vî rengî de jî hawara wan nehatiye bihîstin. Îcar, berovajîya vê rewşê, dewletên ku di kategoriya duyem de ne ji bo ku gelên kategoriya sêyem hîn pirtir di bin fişarê de bihêlin û wan bipelçiqînin, îradeya wan a siyasî û her wiha, daxwazên wan ên siyasî bêne şikêrandin her dem ji dewletên kategoriya yekem daxwaza alîkariya ekonomîk û polîtîk û leşkerî kirine, ev daxwazên wan jî bi awayekî giştî hatine bicihanîn. Li vir bi kurtasî

be jî tiştê ku ez dixwazim bibêjim ev e. Te divê analîzên li ser Rojhilata Navîn dibin, te divê bi awayekî giştî analîzên li ser pêwendiyên navdewletî dibin, gelên ku di kategoriya sêyem de ne, divêt ew jî tevî analîzê bibin. Ne ku wek "bîrovekê", na, divêt wek objekteke siyasî ku xwedî daxwazên siyasî û xwedî îradeya siyasî ne, wisan daxilî analîzê bibin. Li gor qenaeta min pirs a bingehîn ne ew e ku, "Gelo kurd dixwazin dewletekê ava bikin an na, dê kengî ava bikin?", na, pirs a bingehîn ev e ku, "Digel ewçend jimareyî (nufûs) gelo çima kurd heta bi roja îro dewletekê ava nekirine?" Dewletek wek Luksemburgê ku jimareya xwe 450 hezar e, gelo çawan dikare paşeroja miletekî ku li Rojhilata Navîn xwedî jimareyê 40 milyonî ye, gelo çawan dikare paşeroja gelê kurd tayîn dike? Gelo kurdan çima nikaribûye vê nîzama navnetewî ya li dijî kurd bi awayekî ciddî rexne bikin? Reftariya li dijî kurd a dewletên ku kurdan xistine bin nîrê xwe tê famkirin, belam divêt bi baldarî li ser vê mijarê bête rawestîtin ku bê hela Demokrasîyên Rojavayê çima li dijî kurd in?

Gelê sedemên ku rojavayî (ewropî) ewçend li dijî kurdan e, çi ne? Ez ne bawer im ku pêwendiyê vê dijberiyê bi komelkujîya ermenan a li sala 1515an ve hebe. Dibe ku hin kes ji kurdan di wê komelkujiyê de tetikçîtiyê kiribin. Û her wiha dibe ku di nav unsûrên ku ji aliyê Teşkilat-i Mahsusa ve hatibin rêxistinkirin de gelek kurd jî hebin, lêbelê ev ne îrade yan jî daxwaza kurdan e. Îrade, ya Îttîhad we Teraqiyê ye, ya hukûmeta

Osmanî ye. Kurd bi tenê tetikçî ne. Heta ku meriv dikare bibêje ku Îttîhad we Teraqî û Teşkilat-i Mahsusa ji bo ku kurdan bikin hevparê tawana xwe halan didan kurdan û wan li hemberî ermenan sor dikir û digot, "Her çawan dibe bila bibe, ger hûn ermenan ji gundên xwe, ji taxên xwe bidûrxînin, hûn wan tune bikin hingê dê mal û milkê wan, pez û dewarên wan, xanî û dikanên wan ji we re bimînin..." Belam divêt ev bête zanîn ku ev tişt hemû bi îradeya Îttîhad we Teraqî û Teşkilat-i Mahsusa çêdibûn.

Dibe ku ev dijberiya rojavayiyana li hemberî kurdan ji rûyê wê serdegirtina asûrî û suryanan be ku ji aliyê Bedirxan Begî ve pêk hatibû. Dema ku Bedirxan Begî di deheyê 1840an de li hember Împeratoriya Osmaniyan serî hildabû, hingê ji asûrî-suryaniyên ku li herêma desthilatdariya wî niştecih bûn, ji wan doza bacê kiribû. Wan jî pişt xwe bi rojavayiyana ve girê dabû û vê bacê nedabûn. Di encama vê prosesê de bi hezaran asûrî-suryanî telef bûbûn...

Meriv dikare wê dijberiya rojavayiyana li hemberî kurdan ta ji dema seferên xaçparêzan jî bide destpêkirin. Ewê ku pêşî li xaçparêzan girt Selaheddînê Eyubî bu. Rojavayî dizanin Selaheddînê Eyubî, yê ku xaçparêzan ji ber deriyê Qudsê paş ve vegerand, ew qomutanekî kurd bû. Piştî Mutarekeya Mondrosê (30ê Kewçêra 1918an) artêşa îngilîz Sûriyeyê dagîr dîke. Wê demê jeneral Allenby li Şamê diçe ser gora Selaheddînê Eyubî û bi qîrîn dibêje, "Rabe Selaheddîn, ev e, em dîsan

hatin!" Rafik Scamî, di romana xwe ya bi navê *Sineksagan* (Kabalci Yayınevi, Çev. Saffet Günersel, Mayıs 1999 s.129) de qala vê meseleyê dîke. Herçendî Rafik Schamî Selaheddînê Eyubî wek ku qomutanekî ereb be behsa wî dîke jî belam rojavayî dizanin ku ew qomutanekî kurd e.

Nîzama ku di çarçoveya Cemiyeta Miletan de li Rojhilata Navîn hatiye danîn encameke wisan derxistiye holê: Ji ber ku Kurdistanê bi awayekî muşterek kontrol dîkin, di navbera Brîtanyaya Mezin (li dû wê re Iraq) û Fransa (li dû wê re Sûriye) û Tîrkiye û Îranê de pêwendiyên qewî pêk hatine. Te divê di gelek warên din de ev dewlet li hember hev di nava pevçûnê de bin jî lê dema mesele tê ser meseleya kurdan, bi hev re dikevin nav hevkarîyeke gelek qewî. Ev hevkarî, gelek eşkera ye ku li dijî kurd e. Li navenda Rojhilata Navîn istîqrar bi vî awayî hatiye danîn. Lêbelê ev yek jî eşkera ye ku van dîmenên "Îstîqrarê" bêistîqrariyekê jî derxistiye holê. Çünke, çî dema ku kurd fîrsenda xwe dibînin her tim bo bidestxistina mafên xwe û bo azadiya xwe dikevin nav têkoşînê. Ev rewş jî, gelek eşkera ye ku her tim dibe çavkaniya bêistîqrariyê.*

* Birêz İsmail Beşikçi vê gotarê li "Konferansa li Tîrkiyê Pirsgirêka Kurd, Stenbol, 11-12 Adar 2006" pêşkêş kiriye.

DI MEM Û ZÎNÊ DE ÊZDIYATÎ

Hecî CEFER

Yek ji sûd û qezencên çîrok û dastanan ew e ku rewîşt û tîtal û baweriyên miletan tê de têne parastin. Xanî jî di *Mem û Zînê* de bo me çend rewîşt û tîtal û baweriyên kevn ên kurdan parastine, hindêk ji wan pêşzayîne bi hezar salan in û hindêk jî dizivirin serdema îslamê. Ew rewîşt û tîtal û baweriyên pêşzayîne, mirov dikare di dastan û çîrok û çîvanokên kurdan de jî bibîne û her wisan, di nav komela kurdên êzdî de tên dîtin. Ev ên li jêr jî, çend wêneyên êzdiyatîyê ne ku Xanî di *Mem û Zînê* de kar anîne. Em jî dê li ser biaxifin û raxînin pêş çavên xwendevanan.

1. Roj, Agir û Ronahî

Xanî bi pîrozî roj û agir û ronahiyê di *Mem û Zînê* de kar anîne, ev jî ne kêmasî ye, çunke peristina rojê kevintirîn peristin bûye di nav toximê

mirovî de, bi taybet di nav nîfşê Arî de⁽²⁾. Bigre ji misriyan, yewnaniyan, efrîqiyan, sumeriyên, babilîyan û asûriyan. Heta ku digihe îtaliyan û kaşîyan û îlamîyan jî. Hemûyan rojê perisitine⁽³⁾. Îşaret hene ku li welatê Yemenê jî roj hatiye peristin. Qurana pîroz dibêjit, "Bi navê Xwedayê mezin û dilovan. *Wecedtuha we qewmeha yes-cudûne lil-şemsî min dînî -Ellaî:* Min dît ku ew û qewmê xwe bo rojê secde dibin, ne bo Xwedê⁽⁴⁾. Li Hindê û Çînê jî roj hatiye peristin. Êl, xêl û eşîretên Arî jî gelek bi rojê ve girêdayî bûn, wan jî buhayê rojê zaniye, lewma ariyan rojê peristiye û kirine xwedawendê xwe, ku digotinê "Mîtra" yan jî "Xurda"⁽⁵⁾. Hêjayî gotinê ye ku bibêjim, mirovan roj neperistine heta ku negihîştine qonaxa çandinê, di wê qonaxê de roj hatiye peristin⁽⁶⁾. (Şê)şimsîyan xwedawendê Şems, ku xwedawendê xêr û rizq û serbestiyê

ye, bi mezintirîn xwedawendê êzdiyan tê jimartin.⁽⁷⁾ Belê, êzdiyan roj peristîye û kirine xwedawendê xwe⁽⁸⁾, heta îro jî dema roj hil tê êzdî dest û çavên xwe di şûn û qesta wî cihî dikin, ew cihê ku rojê lê daye, berê xwe didin rojê û daxwaz û dua jê dikin û paşê ew erdê ku rojê lê daye, sê caran wî erdî maçî dikin⁽⁹⁾.

Bi hizra min dema ku Xanî di *Mem û Zînê* de gotiye:

Hin roj perist û hin şeb evrûz

Hin xise revîn û hin xem endûz⁽¹⁰⁾

Mebest ji gotina "hin roj perist", kurdên êzdî bûne, yan nîşan bûye bo wan, çunke nêzîktirîn komela rojperist bo Xanî êzdî bûn. Li nik êzdiyan xwedawendê rojê digihe pileya Tawisî Melek, hindek caran jî digihe dereceya Xwedê⁽¹¹⁾. Xanî vî wêneyê êzdiyatîyê kar tîne, dema ku dibêje Xwedê:

Şems ne ji qismê nûr û narî

Şems ji eyan, Tu perdedar î⁽¹²⁾

Dema ku êzdî daxwaz û duayan dikin, li pêşberî rojê radwestin û bo xwe daxwaza dilovaniyê (rehmetê) jî rojê dikin.⁽¹³⁾

Xanî jî dilovaniyê di kevlûjanka rojê de dibîne, dema ku dibêje:

Hukam bi batin û bi zahîr

Bêşubhe muşabih in bi agir

.....

.....

Rehmê ku dikin ji rengê roj in

Qehrê ku dikin cihan disojin⁽¹⁴⁾.

Agir, hêmaya rojê ye li erdî, lewma kurd bigiştî êzdî bitaybetî agirî pîroz dikin, hemû rojên çarşemê û îne, êzdî agir li malên xwe û ciyên dînî hil dikin⁽¹⁵⁾. Xanî jî bi gelek rengan bêhtir ji bîst caran agirî di *Mem û Zînê* de kar

aniye, bi hemû rengan jî bi pîrozî berê xwe daye agir û mamleyeke êzdiyane li gel kiriye. Xanî di *Mem û Zînê* de nexweştirîn aloziyê di tengtirin delîvê de bi agir çareser dike, ku dibêje, "*Xelk agirî bi avê divemirîne, ez avê bi agirî dikûjim...*" Ev jî nîşaneke dî ye, ku agir çendî li nik Xanî pîroz e. Xanî bi helbestê dibêje:

Xelk vedikujit agirî bi avê

Ez dê vekujim bi agirî avê

Mala xwe ji rengê qewmê Zerdeşt

Da agir û gaziya xwe raheşt.⁽¹⁶⁾

Xanî rayeka cuda ji dustûra îslamê re di vî malika jêrîn de dide, agirî li ser axê çêtir dibînit, dema ku dibêje:

Zîn nûranî ye, ne av û xak e

Mîranî ye ew, ji neslê pak e

Nûranî ye ew, ne ab û xak e.⁽¹⁷⁾

Xanî li vir dibêje, Zîn ji axê nebû ye, ango ne ji Ademî ye belkî ji ronahiyê dirust bûye (çêbûye). Xanî dema agirî li ser axê çêtir dibîne, ew wê pêwendiya xwe ya berdewam li gel agirî dide xuyakirin, ev jî diyar dike ku heta çî radeyê Xanî bi agirî daxbar bûye. Li nik min, ew nimûneyên ku min anîn hemû nîşan in ku Xanî bo ola kurd a kevin ku ola êzdiyan a niha ye.

2. Îblîs

Pêşî em biçin nav babeta xwe ku pêwîst e, em bizanîn Îblîs kî ye?

Îblîs, di ola îslamê de yek ji melekên Xwedê bû, lêbelê bi fermana Xwedê nekir, dema daxwaz jê kirî, wî got, "Sucedeyê bo Adem nabim! Çunke

te ez ji agirî çêkirime û Adem ji axê..."
Vêca Xwedê wî kire şeytan û ji buhiştê derxist.

Di Tewratê de "Mar" şûna "Îblîs" digre⁽¹⁸⁾ û di Encîlê de, "Şeytan" wek hêza şerrî hatiye⁽¹⁹⁾. Li nik îraqiyên kevin Tiyamat hebûn, ku hemû îblîs û dêw bûn, xwedawend bûn û xelkî ew diperistin⁽²⁰⁾. Li nik misriyan Seth mîna Îblîs bû û xwedawendê wan bû xelkî ew diperistin⁽²¹⁾. Li nik hindiyên, Mara û Sîtala mîna Îblîs bûn, xwedawendên wan bûn û xelkî wan diperistin⁽²²⁾. Di dînê Zerdeştî de, Ehrîmen mîna Îblîs bû, xwedawendê şerrî bû beramber Ahura Mezda disekinî⁽²³⁾. Li nik êzdiyan peyva Îblîs, yan jî Îblîs bi xwe tune ye, ew xwe ji vê peyvê tûre (aciz) dikin. Belê hindek dibêjin, "Êzdî Îblîs diperêsin, ji bo ku xwe ji şerrê wî dûr bixînin û xwe jê biparêzin!" Her çend peyva "Îblîs" yan jî "Şeytan" li cem êzdiyan kar nayê, lê dema mirov sebeqên wan dixwîne, Ezazîl û Tawîsî Melek bi rengekî xêrê cihê vî navî digrin û li nik êzdiyan Ezazîl û Tawîsî Melek yek in⁽²⁴⁾.

Li nik Xanî jî Îblîs, Şeytan, munafiq, Mar, Bekir û Ezazîl hemû yek in. Ya li ber mijara gotina me peyva Ezazîl e, ku li nik Xanî û li nik êzdiyan dubare bûye.

Êzdî dibêjin:

Ezazîl jî yek e ji heft melean û ew e, yê ku şîreta Xwedê ji bîr nekiriye çaxê gotiye wan "Sucdeyê bo Ademî bibin!" Ewî gotiye "Sucde bo Te bi tenê ya fer (ferz) e, ezîzê min". Vêca Xwedê kire serokê melean (melayiketan), navê wî ji hingê ve bû Tawîsî Melek (Melik Tawîs)⁽²⁵⁾.

Di vê parçeyê de diyar dibe ku hizra êzdiyan û musulmanan hev nagirin. Ehmedê Xanî di *Mem û Zînê* de navê Ezazîl mîna yê Şeytan biriyê, dema ku li ser saloxên (xasîyetên) pîs ên Bekir dixafe û dibêje:

*Ew kîne welê xebîsê mudebir
Yanî Bekirê bi dilmizewir
Xewfa wî hebû, bi xef ji Tajdîn
Dayîm di dilê wî de hebû kîn*

.....

.....

*Xef bi ademiyan wekî Ezazîl
Mehza xereza wî kizîb û teswîl.*⁽²⁶⁾

Ji van malikan derdikeve ku Ezazîl "Şeytan û Îblîs" e, Xanî jî mîna musulmanek berê xwe daye Ezazîl, lêbelê ji aliyekî dî ve bi çavê êzdiyatîyê navê Ezazîl hîna ye.

Bi gotineke din:

Xanî bi du çavan berê xwe daye Ezazîl; bi çavê musulmanan û bi çavê êzdiyan! Bi çavê musulmanan Xanî Îblîs kire Şeytan û nekir Tawîsî Melek, berovajîya baweriya êzdiyan. Bi çavê êzdiyan berê xwe daye Ezazîl, çunke Xanî negot, "Xef bi ademiyan wekî Îblîs", got "Xef bi ademiyan wekî Ezazîl", ango Xanî navê Îblîs bi navê Ezazîl bir, her wekî ku êzdî dibêjin.

Navê Ezazîl di Quran û Tewrat û Encîlê de nehatiye, lê di sebeqên qewlên êzdiyan de hatiye, heger tîhna xwedevanan bi vê çendê neşkê, em dê du nimûneyên din bihînin ku diyar bikin, çawan Xanî rehên êzdiyan di *Mem û Zînê* de kar anîne:

1. Baweriyên êzdiyan wisan bo diçin ku jêderê xêr û şerran yek e, ew jî Xwedê ye... Duayeke êzdiyan dibêje: "Ya Rebbî xêran bide şerran wergerîne⁽²⁷⁾". Û kurdên musulman jî

dibêjin, "Derd û derman li nik Xwedê ne".

Li nik Xanî jî Xwedê jêderê xêr û şerran e. Îblîsî çî guneh nîn e⁽²⁸⁾. Xanî dema li gel Xwedê diaxife, dibêje:

*Meqsûd û miradê dil Tu şa yî
Ema Tu tezil men teşa yî*

.....

*Bê sucde te ey cenab mabûd
Adem kire qublegeh û mescûd*

Îblîs feqîrê bê cinayet

Hîndî te hebû digel înayet

Her roj dikir hezar taet

Lewra te dawî istîtaet

Wî sucde nekîr bo xeyrî mabûd

Gêra te ji ber derdê xwe merdûd.⁽²⁹⁾

Di van malikan de diyar dibe ku Xanî Xwedê dike jêderê xêr û şerran, wî çî bivê dike, (*Tezil men teşa we tehdî men Teşa*: Tu kê bixwazî ji rê derdixînî û tu kê bixwazî hîdayet dikî). Her wisan Xanî Îblîsî bêguneh dike, çunke sucde ji bo xeynî Xwedê nebiriye.

2. Hizra dî ya ola êzdiyan, ya ku Xanî hînaye di *Mem û Zîna* xwe de, ev e:

Mîranî ye ew ji neslê pak e

Nûranî ye ew ne ab û xak e.⁽³¹⁾

Ev malika *Mem û Zînê* li gel vê ayeta Qurana pîroz hev digirin: *Bismillahîrrehmanîrrehîm. Qale mamene' etke ella tescude îz emertuke, qale ena xeyrun minhu xeletenî min narin we xeletehu min tînin*: Bin avê Xwedayê Rehman û Rehîm. Got, "Gava ku min emrê te kir, çî tiştî nehişt ku tu biçî secdeyê?" Got, "Ez ji Wî (Adem) çêtir im. Te ez ji agirî çêkirim, wî ji herriyê.⁽²³⁾". Mirov wisan têdigihe ku meqseda Xanî ev e, bibêje ku Zîn ji wê jêderê dirust bûye, ya ku Şeytan jê

dirust bûye, ku agir û ronahî ye, ne ku mîna Adem ji axê dirust bûye.

3. Birayê Axretê

Fer e (gîrîng e) li vir em vê pîrsê bikin, birayê axretê çî ye û çî wate li nik êzdiyan dide?

Bersiva vê pîrsê nameyeke Pîr Xidir Silêman e ya ku li roja 26.06. 1995 de ji min re nivîsiye û dibêje:

Li cem me du cûreyên "Xwişk û Bira" hene: 1. Xwişk û birayên ji dê û bav, yan ji dayê bi tenê yan ji babî bi tenê, ev dibin xwişk û birayên dinê, lê li cem me; 2. "Xwişk û Birayên Axretê" jî hene û ev cûre pîroziyek tê de heye, lewra di sebeqeke duaya hêvarê de ev bi yek ji pênc ferzên heqîqetê tê danîn:

Ya xwedê tu me bidî xatira şêx, pîr, hosta û merebî, yar û birayên axretê. Ew in her pênc ferzên heqîqetê. Îro li dinê û sube li bangê axretê. Fer in bo me û çendî sunetê.

Lewra her êzdiyek hebe çî kur çî keç, divê yan xwişka axretê yan birayê axretê hebe. Kur ji xwe re birayê axretê digre, keç ji xwe re xwişka axretê digre, car heye heger keçê birayê ji day û bab nebe, ji xwe re birayê axretê digre û kur jî wisan ji xwe re xwişka axretê digre.

Divê xwişk û birayên axretê ji çîna wî, ango heger şêx bû, divê ji tayê şêxên xwe yên ku jin û jinxwazî di nêva wan de heye negre, her wisan tayê pîran jî nabe ku xwişk û birayan ji wan bavikan bigre, yên ku jin û jinxwazî di nêva wan de heye. Vêca murîd, xwişk û birayan ji çîna şêxan, yan pîran digrin û şêx û pîr jî xala ku

me li serî bas kirî raçav dikin...

Nameya Pîrî dirêj e, lêbelê xala herî girîng bi dîtina me ev e, ya ku dibêje:

Di mîtolojiya êzdiyan de, xwişk û birayên axretê mîna şêx û pîrên kesê mirî bi hana wî diçin û daxwaziya sivikkirina barê mirî dikin, da ku Xwedê rehmekê pê bike û zebanî giyanê wî neazirînin. Lewra fer e, her êzdiyek xwişk û birayên axretê hebin.

Heger em berê xwe bidin nameya Pîrî em dê bikarîn bibêjin:

1. Birayê dinê li nik êzdiyan wek birayê hemû miletan in, ew e, yê ku Xwedê kiriye birayê mirovî.

2. Birayê axretê, ango birayê roja qiyametê.

3. Birayê axretê li nik êzdiyan ew e, yê ku mirov bi dilê xwe ji xwe re dibi-jêre, li pey destûra êzdiyan.

4. Her êzdiyek divê birayê axretê hebe.

5. Armanc ji bijartina xwişk û birayên axretê ku li roja qiyametê harîkariya mirovî bikin.

6. Navê birayê axretê bi pîrozî di sebeqên qewlên êzdiyan de hatiye.

Bi hizra min Xanî agahdarî van zaniyariyên jorîn bûye, li ser birayê axretê, lewra dema di *Mem û Zînê* de kar aniye, wî jî du rengên birayan diyar kirine, ku birayê axretê û birayê dinê ne. Xanî di *Mem û Zînê* de bo Tajdîn birayê axretê dirust kiriye, ku Mem bûye. Mem ne bi tenê birayê axretê bûye, belkî birayê axretê û dinê bûye, ev malikên jêrî di *Mem û Zînê* de bi eşkera ola êzdiyan nîşan dikin, dema dibêje:

*Nageh sihrê ji rojê heştê
Rezwan meşîya ji nêv buhiştê*

*Mem hêj wisan li ber derî bû
Dayîm wî ser li ser berî bû
Hêja ewî mesken Astan bû
Rojan û şevan we pasepan bû⁽³⁸⁾*

4. Çilrojî

Di ola êzdiyan de, dîndar çil rojên çilê havînê û çilên zivistanê bi rojî dibin⁽³⁹⁾. Ev çil rojiyên ola êzdiyan, Ehmedê Xanî bi vî rengê li jêr veguhastine nav rûpelên *Mem û Zînê* û dibêje:

*Çil rojî nexwar, ne xiwab Zînê
Ser rane dibû ji girînê
Xûna dilî bû xeza û xwarin
Hêstir bi xwe şerbet û vexwarin.⁽⁴⁰⁾*

Li gor min ev jî nîşan bûye, Ehmedê Xanî daye ola êzdiyan, ku rojîgirtin bûye.

5. Duaçî

Duaçî, ew kesê dinî ye, yê ku karê wî daxwaz û dua bo xwe û xelkê dike. Di ola êzdi de duaçî heye, ew jî "Babê Çawîş" û "Micêwir" e. Di tewafkirinên êzdiyan de dema ku xelk li ber qubeyê kom dibe, Micêwir li ber dereceka qubeyê rûniştiye, dest bi duayan, dirozan, qewil û beytan dike⁽⁴¹⁾. Babê Çawîş ku pîr e ne ku koçek e, jinê nayne û hemû jiyana xwe di xizmeta Lalişê de (Mala Şêx Hadî) dimezêxe (xizmetê dike) û karê wî yê herî girîng dua ne, ew bi xwe jî duaçî ye⁽⁴³⁾.

Xanî vî wêneyê ola êzdiyan veguhastiye *Mem û Zînê* dema li ser zarê Sitî û Zînê dibêje:

*Ev reng e, bêje wan hebîban
Mecmûyê mewalî û xetîban*

*Hindek ji we re bibin rîçaçî
Hindek ji me re bibin du'açî
Belkî kiribe Xwedê muqeder
Wesla me û we bibe muyeser⁽⁴⁴⁾*

Wisana diyar e, ku di ola kurdan a kevin de (êzdiyatî), duaçî hebûne, karê wan daxwaz û dua bûye.

Ev kes jî divê damanpak û paqij be, eger na, daxwazên wî bi cî nayên.

6. Vexwarin (Noşîna Meyê)

Xanî di *Mem û Zînê* de wêneyek ji koçka mîrê Botan digre. Xanî vî wêneyî şanî me dide ku vexwarin wê demê li koçka mîrî tiştêkî asayî bû. Bi gotineke dî, Xanî wisana mirovî tédigihîne ku ev ne wêneyê koçka mîrêkî mu ilman e, belkî koçka mîrêkî êzdiyan e.

Nexwe çawan dibe vexwarina hemû rengên şerbet û şeraban li koçkê hebin û mela, şêx, mîr û axa... hemû tê de beşdar bin? Xanî li ser zarê Mîrî dibêje:

*Mecmû'ê mela û şêx û mîran
Axa û ekabîran û feqîran
Vêk re bi devê xwe wan sena kir
Têk de bi dilê xwe wan du'a kir
Mîr go, "Bikutin dev û rebaban,
Bînin hemî şerbet û şeraban
Da bezmeke şadîmane danîn
Îro ye, ku subhe em nizanîn
Dê şibhetî vî demî di xweş bin
Ya dê bimirîn û yan nexweş bin"⁽⁴⁵⁾*

Ne her ev e, belkî hemûyê koçkê sekran û serxweş dibin. Xanî dibêje:

*Saqî şewişn bi abî hengûr
Mîtrib herişn bi hît sentûr
Qewal û muxenî û xezelxwan
Mexmûr û siyah û mest û sekran.⁽⁴⁶⁾*

Ne ku carekê bi tenê koçka Mîrê Botan vê rewşê dîtiye, belkî di hemû helketinan de koçka Mîrî vê xemlê di ber xwe kiriye... Bo nimûne, dema Mîr ji nêçîrê vedigere û tîye koçkê, Xanî dibêje:

*Saqî şerab û şem'ê xwestin.
Dîwaneke hakîmane bestin.⁽⁴⁷⁾*

Fer e bête pîrsîn, vî wêneyî çî pêwendî bi êzdiyan ve heye? Bi dîtina min pêwendiyek muhkum (qewîn; berdewam) pê ve heye:

1. Vexwarin li nik êzdiyan ne heram e, li vê koçkê jî (Koçka Mîrî) heram nebûye.

2. Her çend ev koçk a mîrêkî musulman bû, lêbelê wêneyê koçka mîrêkî êzdiyan dide.

3. Xanî diyar kiriye ku qewal di vê koçkê de bi rex şêx û mela û mîran ve rûniştî bûn. Qewal jî têgeheke taybet e, bi ola êzdiyan ve. Ev e, hemû nîşan in ku Xanî çend girêdayî reh û rîşalên êzdiyan bûye. Her wisana Xanî bibêje yan nebêje, li vê derê wê hizrê pesind dike, ya ku dibêje, "Mîrên Cizîra Botan bi regez êzdî bûn û ji eşîreta xalidiyan bûn"

7. Tewq-Toq-Tok (Girîvan)

Li pêşiyê fer e, em bizanin "Tok" (Tewq; Toq)çî ye. Hêja Corc Hebîb dibêje, "Ji rewîştên kevin û herî resen li nik êzdiyan ew e, kirasên bi tok li ber xwe dikin, lêbelê divê toka vekirî nebe, ev jî nîşan e ku êzdî dorpêçkirî ne bi toka Xwedê (Êzî), tok divê gelek xirbûyî (çirrandî) be, lê birrandî nebe⁽⁴⁸⁾. Mêjûnivîs Rezaq el-Huseynî jî dibêje, "Dema ku êzdî kirasê xwe didirûn, xwişka axretê kuna kirasî

vedike û xir (çîrr) dike, ji vê kunê re dibêjin, 'Toka Êzî' ango evîna "Êzî Toke" bi stûyê wî yan wê ve⁽⁴⁹⁾. Û Dr. Xelîl Cindî dibêje, "Tok, kuneke taybetî ya cilkên êzdiyan e. Mêr û jin û zarokên êzdiyan li ber xwe dikin, kerkirin û dirûna wî cilkî divê bi destê êzdiyan be... Ev nîşanên mirovê êzdî ne, kuna xir û taybet, 'Toka Tawisî Melek' an jî 'Toka Êzî'⁽⁵⁰⁾".

Li nik êzdiyan Tok û her tiştekî dî yê ku bi Tokê biçê, pîroz e: Wek Toka sitûyê Marê Reş, Gêra Êzî û Xirqeya li stûyê feqîran.

Xanî vî wênayê pîroz ji ola êzdiyan wergirtiye û di *Mem û Zînê* de kar aniyê. Xanî li ser zarê Mîrî dibêje Zînê, "Ciwanîya te bû Mem kiriye giriftar / Evîna te bû Mem kiriye birîndar / Ew kil te di çavan de kêşa / Heta tu nedîtî dil neêşa..." Paşî dibêje wê, "Ew Tewq(Tok), te li gerdena wî danî..." ango eşq û evîna Zînê bi tokeke pîroz zaniye ku wek "Toka Êzdiyan" a pîroz e. Xanî dibêje:

*Tewqa te li gerdena wî danî
Dava te veda li qelb û canî
Çawa vekirin te her du ahû
Berdane feqîrî her du cadû.*⁽⁵¹⁾

Dûr nîn e mebesta Xanî li vir peyva "Feqîr" bi wê ramana giştî nebe, ya ku em dizanin, belkî mebest pê feqîrê ola êzdiyan be, ku dîndarekî hêja ye di Komelgeha Êzdî de, bi taybet heger em bizanîn peyva "Cadû" dijî peyva "Feqîr" e, yek tacirê şerrî ye ku cadû ye, yê dî tacirê xêrê ye ku feqîr e.

8. Derazînk (Derçîk)

Derazînka xanî (malê) li nik hemû kurdan pîroz e, bi taybet li nik kurdên êzdî pîroztir e, bitaybet jî derazînka qapiyê gorra Şêx Hadî û xasên êzdiyan li Lalişê.

Mêjûzan Rezaq el-Huseynî dibêje, "Sala 1947 ez çûme seredana Lalişê, min şiya ziyareta mezargeha Şêx Hadî bikim. Babê Çawîş gote min, 'Pêlavên xwe pêxe, beriya ku bikevî ciyê pîroz û piyê xwe daneyne ser derazînkê (derçîkê)⁽⁵²⁾'. Heta îro jî dema ku êzdî diçine Lalişê, pêlavên xwe derdixînin û derazînkê maçî dikin, paşê di ser re derbas dibin, ne tenê ew derazînk pîroz e lê hemû derazînkên xasên êzdiyan pîroz in.

Derazînk li nik Xanî jî pîroz bû, bi taybet derazînka koçka Mîrê Botan ku hêlîna Zînê bû. Xanî dibêje bayî, heger tu gihiştî qesra ku Zîn tê de ye, beriya hemû tiştî here derazînkê maçî bike. Xanî dibêje:

*Carek here sidre el-seadet
Gavek here sidre el-nihayet
Ewel tu bibûse astanê
Paşî here pêşî dilistanê.*⁽⁵³⁾

Xanî nehêlaye ku "Ba" bigihe Zînê heta ku derazînka xanî maçî neke, çunke maçîkirina derazînka xênî, hîma xêrê ye... Careka dî Xanî dibêje "Ba"yî, ger tu ji nik Zînê zivirî, hindek axa dergehê xaniyê Zînê ji min re bîne, çunke ew ax dermanê derdê min e.

Bi hizra min axa dergehê xanî, li vir her mebest pê derazînk e (Êzdî jî dema ji ziyareta Babçak û xasên xwe vedigerin hindek axê bi xwe re ji

nexweşên xwe re tînin mal), ku Xanî dibêje:

*Ey badê seba, bi heq mabûd
Gava wekû tê ji pêş meqsûd
Zinhar hinek ji xakê dergah
Bîne ji me re di gel xwe hemrah
Toza ku ji rengê tûtiyan e
Bîne bi xwe re ku kîmyayî ye.*⁽⁵⁴⁾

Ji bilî van wêneyên ku Xanî ji ola êzdiyan wergirtine û di *Mem û Zînê* de kar anîne, hindêk nimûneyên din jî hene, mînak: "Mar", "Çîna Şêx", "Mîr", "Murîd" û her wisan "Şevberat", "Xidir Zinde" û hwd. Xanî van wêneyan bi ciwanî û hunermedane di *Mem û Zînê* de kar anîne.

Encam

1. Rewişt û tîtalên kurdên êzdî û kurdên musulman gelek çaran yek in û hevûdin digrin.

2. Kurdên musulman hindêk ji van rewîşt û tîtal û bawerîyan jî bîr kirine lê di nav kurdên êzdî de mane.

3. Her çend Xanî sofîyekî musulman bûye lê baweriyên ola êzdiyan li cem mabûn.

4. Di demekê de ku kurdên musulman êzdî bûne, li ser dînê Ezdan bûne.

5. Xanî berztirîn sembolên ola êzdiyan di *Mem û Zînê* de kar anîne: Wek peristina rojê, Ezazîl, Tok, xwişk û birayên axretê...

6. Rewişt û tîtalên kurdên êzdî ku Xanî di *Mem û Zînê* de kar anîne, pîr-raniya wan heta serdema Xanî li nav kurdên musulman mabûn.

7. Baweriyên êzdiyan di nav

demarên Xanî de hebûn, lewma nikariye xwe jê biparêze.

8. Xanî di *Mem û Zînê* de, roleke hêja û pîrr buha daye baweriyên êzdiyan.

9. Xanî bi çavekî pîroz berê xwe daye ola êzdiyan.

10. Xanî diyar kiriye ku miletê kurd bigiştî û êzdî bitaybetî hîn jî girêdayî baweriyên xwe yên kevnare ne.

11. Xanî derbarê ola êzdiyan de sareyayek baş bûye.

12. Xanî, êzdî kurd zanîne, lewma baweriyên wan kar anîne, bê ku navê wan bîne ser zimên.

13. Xanî sût û qezenc ji çîrok û çîvanokan kiriye ji bo wergirtin û karanîna bawerîyan, bi van bawerîyan Xanî yekîtiya neteweyî û derûnê kurdan parastîye.

Jêder-Çavkanî:

1. Demelogî Sedîq, *Êzdî*, Mosil-1949, r. 303, "Êzdî dibêjin ola me dizivire serdema Birahîm Xelîl".
2. Dilkovan B.Ş., "Roj di Baweriyên Kevin de Heta Niho", Govara Lalish jr. 2-3, Duhok-1994, r. 129
3. Dilkovan B.Ş., "Roj di Baweriyên Kevin de Heta Niho", Govara Lalish jr. 2-3, Duhok-1994, r. 129
4. Qurana Pîroz, *Sûret el-Nemil*, Ayet-24
5. Mizhir, Silêman, *Çiroka Olan*, r. 71.-177.
6. Aleksander Hicretî Girab, Rîcme Ruşdî salih, Zaniyarî folkilor, r. 33.
7. Cindî, Dr. Xelîl, *Ji Bo Zanîna Ola Êzdiyan Xelaka Yekem*, Almanya-1992
8. Zêbarî, Mihemed Salih, Govara *Lalish*, jr. 1, Duhok-1993, r. 67.,
9. Cindî, Dr. Xelîl, "*Duayên Êzdiyan*", Govara *Lalish* jr. 1, Duhok-1993, r. 70.
10. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 151.
11. Govara *Lalish*, jr. 1, Duhok-1993, r. 67.
12. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 21.
13. Cindî, Dr. Xelîl, "*Duayên Êzdiyan*", Govara *Lalish* jr. 1, Duhok-1993, r. 70.
14. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 92.
15. Cindî, Dr. Xelîl, "*Ji Bo Zanîna Ola Êzdiyan Xelaka Yekem*", Almanya-1992, r. 12.
16. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 121.
17. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 128.
18. Cindî, Dr. Xelîl, *Ji Bo Zanîna Ola Êzdiyan Xelaka Yekem*, Almanya-1992, r. 16.
19. Cindî, Dr. Xelîl, *Ji Bo Zanîna Ola Êzdiyan Xelaka Yekem*, Almanya-1992, r. 16.
20. el-Ehmed, Samî Seyid, *Êzdî*, Berg-1. Bexdad-1971, r. 20.
21. el-Ehmed, Samî Seyid, *Êzdî*, Berg-1. Bexdad-1971, r. 20.
22. el-Ehmed, Samî Seyid, *Êzdî*, Berg-1., Bexdad-1971, r. 21.
23. el-Ehmed, Samî Seyid, *Êzdî*, Berg-1. Bexdad-1971, r. 23.
24. Silêman, Xidirê, *Gundiyaî*, Bexdad-1985, r. 27.
25. Silêman, Xidirê, *Gundiyaî*, Bexdad-1985, r. 27.
26. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 90.
27. Cindî, Dr. Xelîl, *Ji Bo Zanîna Ola Êzdiyan Xelaka Yekem*, Almanya-1992, r. 25.
28. Resûl Dr. Îzedîn Mistefa, *Ehmedê Xanî (1650-1707) Helbestvan û Zana*, Bexdad-1979, r. 296.
29. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 132.
30. Silêman, Xidirê, *Gundiyaî*, Bexdad-1985, r. 199.
31. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 128.
32. Qurana Pîroz, *Sûret el-E'araf*, Ayet-11.
33. el-Ehmed, Samî Seyid, *Êzdî*, Berg-1., Bexdad-1971, r. 22.
34. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 85.
35. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 49.
36. Resûl, Dr. Îzedîn Mistefa, *Ehmedê Xanî (1650-1707) Helbestvan û Zana*, Bexdad-1979, r. 427.
37. Demelogî Sedîq, *Êzdî*, Mosil-1949, r. 70.
38. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 87., û Rûdînkî, *Mem û Zîn*, Moskow-1962, r. 94.
39. el-Huseynî Rezaq, *Êzdî Demê Niho û Rabirdû*, çap-7, Bexdad-1980, r. 81.
40. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 196.
41. Silêman, Xidirê, *Gundiyaî*, Bexdad-1985, r. 18.
42. Babê Çawîş ji çîna pîran e, ne ku ya koçkan, her wekî ku min bi şaşî li "Govara *Lalish* jr. 5, Duhok, r. 73." nivîsandiye.
43. Govara *Lalish*, jr. 5, Duhok-1994, r. 166.
44. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 143.
45. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 146.-147.
47. Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Hewlêr-1968, r. 120.
48. Hebib Corc, *Êzdî Bernayê Oleke Kevnar e*, Çap-1, Bexdad-1978, r. 60.
49. El-Huseynî, Rezaq, *Êzdî Demê Niho û Rabirdû*, çap-7, Bexdad-1980, r. 106.
50. Cindî, Dr. Xelîl, *Ji Bo Zanîna Ola Êzdiyan Xelaka Yekem*, Almanya-1992, r. 24.
51. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 335.
52. el-Huseynî, Rezaq, *Êzdî Demê Niho û Rabirdû*, çap-7, Bexdad-1980, r. 33.
53. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 218.
54. Osman, Emînê, *Mem û Zîn*, r. 222.

PÊDAÇÛNEK LI SER ZARAVASAZIYÊ DI ZIMANÊ KURDÎ DA*

Reşîd Findî

Transkirîpekirin: Mamoste Fehmî

Zarav (term; têgeh; kavram) di zimanî da peyvek e yan jî peyvekê pêtir diyarkirina ramaneka taybetî û xumalî didet û armanceka diyarkirî digihênet. Lewra "zarav" ramaneka dûrtir û kûrtir ji ramana peyva asayî xuya dike û mewdiwayekî berfirehtir werdigre û ciwaniyeka baştir didête.

Hebûna zarava di nav her zimanekî da nîşan û sifeta hizr û şiyar û pêvehatîna wî zimanî ye û kevnaî û rese-naî û werar û geşbûna berdeewama wî zimanî diyar dike. Lewra "zarav" an "zanistî zarava" tayekî zimanî ye û rengêkî diyar ê rehwanbêjiya wî ye.

Kurdî jî mîna hemî zimanên resen û xwedan werar û geşbûn ên dewlemend, bi hemî rengên zarava û hêjayê vekolînê ye di derfetê zaravan da.

Babetê destnîşankirin û datiraşîn û çêkirina zaravên her zimanekî karekî girîng û fire û mezin e, ji ber rolên wan ê sereke di her zimanekî da. Ev karê

girîng û mezin hemî li bin sîbera zanistekî çêdibin, ku dibêjin "zaravasazî" yan bi erebî "îlm el- mesteleh" an jî bi înglizî dibêjin, "terminology".

Û ev zanist di hindek jêdera da tête nasîn (ev zaniste yê xwendina peywendiyar diket di navbera têgehên zanist û zaravên ziman da ewên derbirînê jê diket).

Anku li pey vê boçûnê, divê ew zaravên bêne danîn ji kakila zimanî derkevin an hatibine datiraşîn û çêkirin û jêkirin û çî çewtî di derheqê ziman da neken û li heman demê jî derbirîna têgeheke zanistî biken ku gelê me bi başî têbigihê. Ziman û ew kesê di vê delavê da kar biket divê di zimanî da şareza be.

Derbarê zimanê me yê kurdî jî ew kesê fire kar bike, şarezaiyeka baş di zimanê kurdî da hebî, nemaze di hemî zarên (lehçe; diyalekt) kurdî da yan jî çî nebe şarezayî di her du zarên serekî de hebin da bişêt zaravasazî bike û mifayê (feyde) ji van zariyên ha bigre

* Akademi, Kovarî Korê Zanyarî Kurdistan, jimare 1, 2702 Kurdî, 2002 Kurdistan, Hewlêr, L. 71-85

bo dîtîn û çêkirina zaravê pêdivî. Me got dîtîn û çêkirin bo çi? Dîtîn, anku şarezayîya wî/wê kesî/ê di nivîsinên kurdîyên kevn da bişêt zaravên kurdîyên kevn helbijêre û bizane ka bo çi mebestî bikar hatine ku di gel evroya zimanê kurdî biguncîne, bêguman ev kar sanahî nîn e û pêdivî ye kesê "zaravesaz" edeba kurdî ya kevn baş xwendibî û şareza bibit da bişêt ciwantirîn û li bartirîn zarav digel evroya kurdî bi guncînit. Ne şarezayî di edeba kevn a kurdî da anku dabirîn di navbera duhî û evroya kurdî da û qutkirina mêjûya me ya edebî. Bo wî mebestî dibêjin hinde "zaravesaz" hene bi tenê li zaravên evro dinêrîn û hindekên keşefirêt dihelbijêrin ku digel muzîka zimanê kurdî naguncin û neşazekî di muzîka zimanê kurdiya şîrîn da peyda diken. Yan jî demê zarav dibînin û di helbijêrin her bi tenê yek zarav li bîra wan e û li ber ronahiya wê şemalek bi tenê, wî karê mezin encam diden.

Çêkirina zaravan karek dibête temamkerê karê di tenê. Çunke jiyana şaristanî di îro da hêrîşa rojaneya şoreşa teknoloji li vê serdemê çendîn zarava dihavête beriya me ku fire em bizanin dê çawa serederiyê digel biken û dê çawa şiyên van zaravan bindest biken û nerm biken, da bi sanahî bînine nav baxçê zimanê me yê kurdî. Millet bi xwe baştirîn davdan e bo wergirtina zaravê serkeftî û rêzkirina wan di nav rêzên zimanî da û ne wergirtin û havêtina zaravên ne li bar û dest nexweş û dariştina çi yasa û qanûnan, vî çendî li ser milletê me naspînin

anku yasa neşên çi zaravên lawaz û seqet biçespînin û neşên çi wan baş durust biket û baştirîn rê bo vî çendî dîtîn û çêkirina zaravên ciwan, da millet werbigre. Û bi sedan nimûne li ser vî çendî hene.

Pêdivî ye em karekî mezin encam biden û gelek bi hêşyari û zîrekî kelepura xwe ya kevn vekolin û berhemên nivîsiyê milletê xwe li ber çav daynin. Ewên berê çend çerxekê hatine nivîsîn û heta niha, da ciwantirîn zarav û peyvan jî derbiçînin û ji layekî va ew durr û mirrarî berze nebin û ji layekî di va mîfayê ji hebûna wan wergirin. Û divê ev kar jî di nav hemî zarên kurdî da bête kirin û hemî pêk va kom bibin, her wusa fire bo berhelîstî û berberkaniya şoreşa teknolojiya evro. Em bi zîrekî karekî wusa encam bideyn da zimanê me yê kurdî bêbar nebit ji vî lêfana zaravên hemî cûr di xardana şaristaniya evro da, da zimanê me pêtineka serkeftî digel zaravên evro biket û bişêt zaravên li bar û guncayê bo zanistî pir leq û çavê evro bibînin.

Divê vê rastiyê jî jibîr nekin, ku şoreşa teknolojiya evro, pêtirîn hêjmar ji zaravên biyanî dixê nav ferhenga zimanê me. Zarav hene divê em zaraveke kurdî ya ciwan li cihê wî bibînin û bi çi renga neşiyin wusa bihêlin. Zarav jî hene yên bûne zaravên cîhanî û baştir e ger wek xwe bimînin, da em ji pencereka kurdî cîhana evro bibînin.

Erê hinde zaravên wek "sînema, televîzyon, radyo, kompîtur, satelayt, dîcîtal" wek xwe bihêlin, an jî wek hinek zimanzanên ereb, bo nimûne, hewl biden peyvê xumalî bo wan

bibînin, her wekê wan jê ra dîtî û datiraşên û paşê kesî guh nedaye û ew peyv bi ber avê da çûn. Bo nimûne, wan peyvên "el-meşwaf" bo televizyon danîne yan "el-mezya" bo radyo û "el-hesub" bo kompîtur û "el-hefum" bo hamburger. Li dû hizra me em jî dê tûşî xeletiyeka berçav bibin ger wek wan biken û bila ew zaravê cîhanî wek xwe bimînin. Çünke milletê me bi baştir û sanahî têr werdigre.

Hinek peyvên din jî hene her di binyata xwe da biyanî ne, lê kurdan jî bo sanahîkirinê livînek (herke) danê, da bo wan nerm bibêt û qalibê muzîka kurdî wergire, mîna peyva "tirumbêl" bo otomobîl û hwd.

Bêguman hinek nivîsên kurdî hebûn berê bîst salan hewl dabû mîna ereban, li ser nezmê "seyare" navê tirumbêl bikene "gerîn" lê ser negirt û zû winda bû. Lê bêguman kurdan zîrekane hinek peyv bo çêkirên nû dîtine mîna "balafir û şîmendîfer" bo "teyare û qetar."

Herwusa xaleka dî jî heye, dema em li zaravê xwe yê kevn digerin divê em jibîr neken, şaîr û nivîsar û zanayên me yê berê heta pileyeka pêşkeftî şarezayî di zimanên rojhelatê da hebû, lewma em jî zaravayên farisî û erebî û tirkî di nivîsinên wan da dibînin. Her yek ji van zimanan jî egera xwe hebû, farisî li serdemeke dirêj zimanê rewşenbirî û şîr û edebê bû, nemaze vî zimanî gelek kar li ser şaîrên me yê kevn kiriye, herwusa erebî jî zimanê dîn (ol) û peristinê bû (el-ibadet). Lewma hêjmara zaravên erebî jî di kultura me ya kevn da zêde ye, çünke tirkên Osmanî bo pêtir ji çar

çerxan desthilatdar bûne li Kurdistanê. Lewra hinek peyv û zaravên tirkî jî di kultura me da hene. Lê rêjeya (hejmar) tirkî kêmtir e ji farsî û erebî.

Dê bila bo xweşwergirtina navero-kê li kultura xwe ya kevn biden û berperên hinek nivîsinên kevn têk va daynin, da bizanin ka zanayên kurd çî zarav bikar anîne bo derbirîna hizr û birên xwe li wan rojan.

Bo nimûne çend zaraveyan li cem Cizîrî (1567-1640) bibînin ku di hozana (helbest) wî da hatine:

Afirand: Çêker, xûlqandin, jêderê wî dibête "afirandin" ku niha jî bo ibda' di nav nivîsaran da li kar e.

Alistin: Alastin, bi zimanê tirkî "yalamak".

Aşêvkin: Bi ramana xeparekirin têt, anku "toprağı çapalamak" ya bi tirkî.

Avis: Jina bi hemil.

Avisbûn: Bi ramana "döl tutmak, tirkî" niha jî li kar e.

Awar: Helaw, herwusa heta niha jî bo mirovekî têkvedanê dike û arêşa li navbera xelqê çêdikin, dibêjin "darekî aware" wusa diyar e, darek hebû awar pê têkva dida lewma ew nav girtiye.

Axafit: Mirovek digel mirovekî diaxivit.

Axift: Miroveka axeft.

Ayîne: Zaravek bo "xwedêk" yan "qewdek" bi kar tî, herwusa eynik, neynik, awêne jî li kar in.

Aza kirin: Azad kirin, gerdên aza kirin.

Bac: Bi ramana "gümrük vergisi" ya bi zimanê tirkî niha jî li kar e.

Bardar: Bo jina bihemil (hamile kadın: tirkî) bi kar aniye.

Bê dadî: Zilm, cebir, ez bê dadiyê qebûl nakim, anku zilmê qebûl nakim.

Bê wajî: Lawaz, yan zext.

Bê wecî: Bê xêr, bê mifa, bê fayde.

Bêdar: Heşyar, ne nevest.

Bêgav: Bi ramana "meçbûr" bikar aniye û zaravekî gelek ciwan e û li cem me nemaye, wusa baş ser ji nû bikevête di nav axaftina me da, ez "bêgav im" wate "ez meçbûr im".

Belaş: Herwe, yan ji xwe, yan badîhewa, yan bê beramber.

Berevajî yan berûvajî: Bi ramana "ters yüz, tirkî" têt, bi kurmançiya jorê dibêjin: Re'ya min berevajiya te ye anku eksê wî ye.

Beyhûde: Bê mifa, bê feyde, pûç, belaş, ji xwe.

Bi kutekî: Bi zorê "bi kutek" anku bi zor.

Bihatîn, pêhatîn: Zaravakî bi ramana "zuban" bikar aniye û di kurmançiya jorê da "bihujin" jî heye, lê bi ramana "... " têt.

Bij: Bi ramana zilif têt.

Bijwîn: Paqij, bijwînkirin anku paqj-kirin.

Birajtin, biraştin: Bo "... " bikar aniye, niha jî li kurmançiya jorê li kar e û li kurmançiya xwarê "birjandin" li kar e.

Birek: Bi ramana "testere, tirkî" têt û zaravakî ciwan e bo wî hacetî.

Biryan: Biryana xwarinek e, niha jî heye ku goştê wî tete biraştin û sûrkinin. Parêv.

Bişaftin: Bi ramana helpişawtin bo maddeyekî kîmyayê li kar e, niha jî her du kurmançiyên serê da heye.

Bitperest: Senemperest.

Canewer: Xwedan ruh, candar, bo heyvanan pêtir li kar e.

Cerg: Bi ramana çîger bi kar hatiye û niha jî her wusa ye û li axaftina Hewlêrê her "cerg" maye, lê li Silêmanê bûye "çîger".

Cirrenêx: Micadile, gêre, şewîn li kurmançiya xwarê.

Civat: Meclis, niha jî li kar e.

Çavnas: Bi ramana arif, midrik têt. Zaravakî ciwan e bo wî mebestî.

Çekme: Anku cizme, çekmesor, wate cizmesor.

Çiçek: Guleke biçûk, jê ra dibêjin "Gulçiçek", niha jî heye û li kar e.

Daberistin: Bi ramana civîndan yan civîndan yan xeber gotin bikar aniye û daberistin heta niha jî li kar e. Daberist anku xeber gotin.

Damayî: Bi ramana xemgirtin yan hezîn bikar aniye û ev zaravaniya jî li kurmançiya jorê gelek belav e. Mirovekî dama ye anku xemok e.

Dijwîn: Zaravakî bo tiştê qirêj bi kar tê û niha jî li kar e, her çend zaravakî kêmbelav e.

Dirav: Bo pere bikar aniye, yan bo naqit û niha jî li kar e, di kevin da pere bo curekî diravê bikar hatiye. Bi farisî pare anku parçe her çend di kurdî da niha pere cihgir bûye.

Dojeh: Dozex, cehenem.

Êwergêh: Bi ramana mekan bikar hatiye, niha jî li kurmançiya jorê maye û gelek di nivîsên Mela Mahmûdê Beyazîdî da bikar hatiye.

Êwirîn: Bi ramana sekinîn an niştcebûn li kar e û berê çend rêzeka peyva "êwirgeh" ya borî.

Farî: Derê rê, bi ramana derkeftin ji rê têt, herwusa bi ramana dûrkeftin jî têt. Anku "sapmak, uzak durmak, bozulmak" yên bi tirkî.

Fereng: El-efrenc.

Fezelyan: Dirêjbûn, keftin, li kar e.

Firûz yan firwêz: Zaravakî ciwan e û niha jî li kar e, lê kêmbûye û ramana "fêt" yan "fêk" didet.

Gav: Bi ramana xetaw bikar aniye, ya diyar e heta niha jî li kurmançiya jor "gav" bo heman mebestî li kar e û li kurmançiya xwarê "hengav" e li kurmançiya jorê pêngav jî heye lê diyar e her du kurt bûne û bûne "gav". Bêguman li kurmançiya jorê "gav" bo

demê jî li kar e, dibêjin: Gavêka dî tēm, anku demêke dî, diyar e ev jî her yek ramana digel "gah" a farisî û di kurmanciya jorê da bûye "geh" jî anku "dor" yan "ser".

Geh geh: Car car, dem dem, gav gav, herwusa peyva "geh" bo "mafsel" jî li kar e.

Geleh: Gilî, gil û gazinde, gelî, li kar in.

Genim reng: Bi raman "esmer" bi kar hatiye.

Gerew: Bi ramana rehîn li kar e. Di kurdiya evro da bi zarê kurmanciya jor dibêjin: Ez ketime gerewa wî. Herwusa li kurmanciya xwarê jî dibêjin: Were gerew dikeyn.

Giftugo: Dan û standin, gengeşe.

Gilî: Bi ramana "şikayet veya yakınma" bi kar aniyê û niha jî heye û di kurmanciya jorê da dibêjin: filan kes gilî û gazind diket. Em ji bo çî vî zaravî bo "suç duyurusu: tirkî" ya dadgehê bi kar naynin?

Giramî: Farsî ye û di kurmanciya jorê da "gerav" li kar e, anku bi biha û qedir giran. Eşiretek li Kurdîstana Bakûr heye jê re dibêjin "gerav".

Guhan: Bo giyaneweran li kar e û di kurmanciya xwarê da "guwan" jê ra dibêjin anku "meme" bi tirkî.

Gurçik an gurçêk: Bi ramana "böbrek: tirkî" bi kar hatiye û niha jî her wusa ye, lê li devera Behdînan jê ra dibêjin "gulçêsk" û li kurmanciya xwarê "gurçêl" e.

Hejandin: Bo rec bikar hatiye, zaravêki ciwan e, niha jî li kar e û bo karê lêker dibêjin: hejiya, dihejin, bihejîne, hate hejandin, hejandin jêder e, di henek zaravokên kurmancî da dibêjin: "hejiya, hejandin... hwd".

Helbaskin: Rabûn ber singê yek bo karê şer.

Hemyan: KAMERA zêran.

Henek: Yarı, laqirdî, anku geme, galte, wazî.

Her wusa çend nimûneyan ji ferhenga "El-Hediyet'ul Hamîdiye" wekê vana.

Her wusa şairê navdar Xanî yekemîn ferhenga "Erebî/Kurdî" da bi navê "Nûbihar" ku li sala 1683 danaye, hinek zaravên ciwan bi kar dinîn. Em hinek nimûne ji wê ferhengê jî bibînin karekî baş e:

Herwusa binêre van nimûneyan ji deqekî Memê Alan ê folklorî:

Herwusa ger li nivîsîneka din a kurmancî binêrin çendî zaravên ciwan ji me ra diyar dibin. Ew jî bo nimûne nivîsîneka Mela Mehmûdê Bazîdî ye ku li nîva yekê ji çerxê nozdeyê jiyaye.

Ew nivîsîn bi rengê ferhengek û her du şîweyên "Hekarî û Bazîdî" ji xwe ra kiriye nimûne û ev babeta hêja pirofîsor Meruf Xeznedar di pirtûkekê da belav kiriye bi navê "Le Babetê Mêjûyê Edebê Kurdiyewê"⁵ Hêjayî gotinê ye ku Bazîdî zimanzan bûye ji bilî hinek ku mêjûnivîs û nivîser jî bûye. Dê bila çend nimûneyan ji zaravên wî jî wergirin:

Hunijîn, punijîn: Bi ramana xewa sivik bi kar aniyê.

Kelaştin: Zaravakî ciwan e bi ramana "şeqkîrin" li kar e û niha jî heye û demên karê "lêker" dibîne.

Kerixîn: Gelek westiyar, reqbûn, zor mandibûn.

Kevir: Berê mezin.

Kezî: Zulf.

Kiwararê: Embara arê, mexzen, kog.

Kum: Kelaw.

Lêb: Hîle, fir û fêl.

Lêbandîn: Xapandin, hîle lê kirin, di ser da birin, fêl lê kirin.

Lêbuk: Teqlîdker, teraneker.

Mak: Bo "dayik" bi kar aniyê heta niha jî di kurmanciya jorê da heye dibêjin

"biramak" wate ew birayê ji dayikê va digihête, anku kurê dayikê ne lê neyê babekî ne. Herwusa dibêjin: Berxê bide ber makê, wate ber guhanên dayikê da şîr bimije. Her dîsan di kurmançiya jor û xwarê da peyva "maker" li kar e, anku "mak ker" wate maka ker yan dayka ker.

Mêhder: Bi ramana şefact bikar aniyê û peyveka gelek ciwan e ku niha li cem me nemaye û ji ber kartêkirina Îslamê her "şefact" li kar e, baştir e ger mêhder bikar bînin.

Mêrxas: Şerhengev, şerengêw, şerengêz, egît.

Mezaxtin: Xerckirin, "harcamak: tirkî"

Mifreq: Bi ramana sefer anku "mes" bikar anîne. Bi kurmançiya jorê dibêjin: Filan tişt req e, tu dibêji "pula û mifreq e".

Next: Rojên baran û ewr.

Perkende: Bi farsî jê ra dibêjin "perakende" anku pert û belav.

Pertal: Tişt, anku "döküntü" bi tirkî.

Pesn: Bi ramana medh têt.

Pişk: Beş, di kurmançiya xwarê da herwusa li demê lêkvekirina tişteki dibêjin: dê pişkeyn, yan dê pişkê havînin.

Pizdan yan Pistan: Anku "memik an çiçik" pêtir bo mirovan li kar e.

Pur: Bi ramana pirç têt, pirsûr anku pirçsûr.

Qela: Bi ramana "... " bikar aniyê. Ku bi kurmançiya xwarê jê ra dibêjin, qurquşim.

Qêvar: Sitrî, kerbeşk, giyayekî bi sitrî ye.

Qilupank: Teqle.

Rewal: Bi ramana "Delikanlı ya tirkî" "cehêl" yan "sinêle" bikar hatiye û niha jî di kurmançiya jorê da maye.

Sazende: Zaravek bo wî kesê bikar aniyê yê ku sazê lê dide, herwusa li nav kurdan sazband, şazband, şazbêj jî li kar e.

Solbend: Anku nalbend, ewê nalên dewaran çêdiken.

Suba: Bi tenê, niha jî di kurmançî da heye, dibêjin filankes "sert û suba" ye anku bi tenê ye û bê girêdan û kar û peywendî ye, dibêjin filan jin a şuba ye, wate zarokên biçûk nemaye û bi tenê ye û karê wê kêmbûye.

Surmedar: Çavkildayî, çav bikil.

Şal: Şuwitka hîrî, heta berê çend salan jî li nav kurdan ya ku belav bû.

Şepal: Zaravek bi ramana ciwan, xweşik, şeng û şox li kar e.

Şilan: Mezummat, xwarina belaş, dibêjin şilan li tekya şêx heye, anku li tekya şêx xwarin bi belaş diden.

Şimik: Solên jinan, ew pêlavên didine ser pê xwe. Bi tirkî "terlik" jê ra dibêjin.

Tazî: Rûs, rût.

Temer: Kakul, guwik. Herwusa ew kuvikên bi situyê hespê datînin yan bi zîne da şor dibin. Min bawerî heye navê "temer" jî her ji hindî hatibit.

Temirandin: Anku vemirandin yan kujandinewe.

Tepsî: Sînî, qap, niha jî li kar e, lê ew xwarina di wî amanê da têtê çêkirin navê amanê girtiye.

Tîrêj: Tîroj, tişk.

Vala: Bo "boş: tirkî" bi kar hatiye û li kurmançiya xwarê "wala" dibêjin. Lê bi ramana vekirî têt, li kurmançiya jorê her bi ramana berê maye, aman di valan e, anku "qapekan betal in".

Vêk êxistin: Bi ramana tertibkirin, yan komkirin li kar e, karê wî "fe" dibête vêk bixe.

Virek: Derewîn, dirozîn, li Kurdistana Bakur li kar e.

Virr: Derew, niha jî li Kurdistana Bakur li kar e.

Xanêmal: Mela Mahmûdê Bazidî bo "mitbax, kîler" bikar aniyê û hizra

min zaravekî ciwan e û heta niha jî me girifta wî heye bo navkirina mit-baxê, hinek dibêjin, lêngangê yan lêngangê, lê ciyê xwe bi durustî negir-tiye û "xanîmal yan xanêmal" baştir e.

Xeste: Nesax, nexweş, xestexane, anku nexweşxane.

Xubar: Curekî xetê ye her dîsan peyvên reyhan, dîwan "sulûs" muselsel jî wek curên xetê erebî li cem Cizîrî hatine û hinek ji wan li cem Xanî jî hene.

Xuya: Diyar, eşkere, aşîkar.

Zerbav: Bav zer.

Zexel: Bi teşqe, bi hîle.

Zox: Kêm û edav, avê pîs ji birînan têt.

Zuha: Zaravakî ciwan e, her mîna niha bi ramana "nêv-heşk" bikar hatiye, hejî gotinê ye ku her du peyvên "zuha û kizir" niha jî li kurmanciya jorê li kar in û ramana hindî diden, ku erd an cilk an her tiştêkî dî, ji qonaxa "ter" yê derbaz bibin û hêj bi baş heşk nebibin, je ra dibêjin "zuha" yan "kizir". Zuha: pêtir bo cilka bikar têt, kizir: bo erdê.

Encam

Em giheştine wê encamê ku "zaravasazî" îro zanisteka hewir e û dar-îştina zaravan karekî bi sanahî nîn e, îro berê her rojekê dê fere ji me ra em li piştê li zaravên kevnên kurdî binê-rin, ewên heta niha mane di nav perêt edeba me ya kevn da. Em bi ciwanî lê bigerin û sax bikeyn. Herwusa piştê hingî em bi şeweyek zanistî û dûrbînî û şarezayî karê digel zaravên îro biken û li dû yasa û destûrên zimanê kurdî refarê vir biken û pê ra şaristanî jî li navbera xwe û cîhana îro bihêlin ji bo mifa wergirtinê ji wê şaristaniyê. Da zimanê me yê kurdî ji aliyekî va

mifayê ji kultura xwe bigre û bi aliyekî din va mifayê ji îro û sibêya şaristaniya cîhanê bike.

JÊDER Û DEHMEN:

1. Findî, Reşîd, *Kovara Rewşenbîrî Nwî*, jimare 111, Bexda, *Gotarê Zaravê Edebî di Mem û Zîna Xanî da*, L.303
2. Qasimî, Dr. Elî, *Muqaddime fî Îlmîl Masketah, El-Mevsu'a Es-Saxîra*, 169, Bexda, 1985, L.17-18
3. Doskî, Tehsîn Îbrahîm, *Dîwana Melayê Cizîrî*, Berhevkirin û Vejartin, Hewlêr, 2000
4. Bahaeddin, Sadiq, *Nûbihara Seydayê Mezin Ehmedê Xanî*, Xirvekirin û Lidûcûn, Tuwîjandina Bexda, 1979
5. Xeznedar, Dr. Meruf, *Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe*, Bexda, L.390-406, 1984
6. Jêderê borî, L.377.
7. Mukrî, Dr. Muhamed, Ziyaeddin Paşa, Xalidî Meqdisî, *El-Hediyetul Hamîdiye Fî Luxatul Kurdiye*, Tehîq, Çapa Duyemin. Lubnan, 1987

REFLEKSÎF DI KURMANCÎ DE*

Ergin ÖPENGİN**

Di hejmara duyem a rêzepirtûka ZENDÊ de birêz Samî Tanî gotarek derbarê refleksîfa kurdî de nivîsîbû û hin bikaranînên bi arîşe destnîşan kiribûn. Lêbelê tesbît û raveyên xwe bi tu rêzikan ve neçespandebûn. Ji bo hin mînakên bi forma refleksîfê ku di hin deveran de têne bikaranîn, gotibû ku 'şaş' in. Bersivên pirsên wek çima û li gor çi şaş in, di gotarê de nebûn. Di warê zimannasiyê de divê mirov ji normatîfbûnê bi dûr bikeve, lêbelê di nîrxandinên navborî de nivîskar wek grameryenekî tevdigere û "rastî" yan jî "şaşî"yên mînakan bi boçûnên subjektîf dinirxîne. Ez jî dixwazim di vê xebatê de hewla hin agahiyên gelemperî bidim li ser teoriya bayndîng a sîntaksê ku bi vê mijarê re eleqedar e. Paşî, ligel mînakên wekî 'bi arîşe' hatine destnîşankirin, li ser hin mînakên din ên vê teoriyê li kurmançiyê bisepînim.

1. (a) Zîrek çû nik wî.
- (b) Zîrekî xwe brîndar kir.
- (c) Zîrekî got ku ew xwe nexweş hîs dîke.
- (d) Zîrek li hêviya wî bû ku baştir bibe.
- (e) Ew li hêviya Elî bû ku baştir bibe.
- (f) Wî got ku Elî xwe baştir hîs dîke.

Navdêrên li jorê ji hev cuda ne:

- i. Nav (full noun phrases), mn. Zîrek, Elî
- ii. cînavk, mn. ew, wî
- iii. elementên vegerok (refleksîf); mn. xwe

Navdêrên wekî "Elî" referansa xwe bi awayekî serbixwe digirin. Anku ciyê

* Ji bo şêwr û pêşniyarên wan spas bo birêz Îbrahîm Seydo Aydoğan û Prof. Dr. Meltem Kelepir û ji bo pêşkêşkirina daneyên devera Meletiyê spas bo kak Mahmut û kak Murat (E.Ö.)

** Beşa Mamosteyiya Ingilîzî ya Boğaziçi Üniversitesi

kesekî (bûnewer) digirin. Herwiha cînavk bi awayekî serbixwe referansê nagirin.

Mesela li cînavka /wî/yê binêrin: taybetiyên navdêrî ên (+yekjimar) û (+nêr) lê hene. Anku ev taybetî referansên ku ew cînavk dikare bigire bisînor dike; herwiha û jê wêdetir, mirov nikare her bûnewera (kesê) yekjimar û nêr ji bo "wî" wekî referans diyar bike. Mînak (1a), "wî" nikare "Zîrek"î nişan bide.

Di (1b) de, "xwe" bi navdêra kirde "Zîrek" ve têkildar e. Xaleke calib, dema em (1c) û (1d)'yê muqayese dikin xuya dibe ku: Di (1c) de em dikarin bibêjin ku cînavk "ew" û kirde "Zîrek" hevreferans in (yek in, heman kesî dinimînin); herwiha di hevoka (1d) de em nikarin vê hevreferansiyê bibînin. Anku "Zîrek" û "wî" ne yek kes in, divê wekî du kesên serbixwe bêne sêwirandin. Sebebên vê dijayeti-yê qaydeyên sentaktîk in.

Niha li mînakên (1c) û (1f) binêrin. Di (1c) de, kirdeya hevoka sereke 'Zîrek' dikare bi kirdeya hevoka pêreyî 'ew' re hevreferans bibe. Di (1f) de, ciyên navdêr 'Zîrek', û cînavk 'ew' hevguherîne û êdî nikarin hevreferans bibin. Anku di (1c) de kirde û cînavk ji bo heman kesî tîn bikaranîn lêbelê di (1f) de tişteki wiha ne mumkûn e.

Li mînakên jor diyar e ku şirovekirina biwêjên navdêrî (noun clauses-mn. cînavk, navdêr) di destê rêzikên sîntaktîk de ye. Di (1a) de, 'Zîrek' û 'wî' bi tu awayan nabin hevreferans; gramer vê sînorkirinê lê ferz dike. Di mînaka refleksîf a (1b) de, gramer li refleksîvê ferz dike ku bi 'Zîrek' re tê-

kildar be. Di (1c) de, gramer dihêle ku 'ew' û 'Zîrek' hevreferans bin; herwiha di (1f) de, nahêle ku bi heman awayî bêne şirovekirin.

Modula ku rêzikên biwêjên navdêrî diyar dike, 'teoriya bayndîngê' (binding theory (teoriya pevgerîdanê?)) ye. Ev teorî, rêzikên (formulasyon) gramerî yê li ser biwêjên navdêrî diyar dike. Sê rêzikên (principal) 'teoriya bayndîngê' hene. Rêzika A, B û C yê. Her yek ji bo yek ji sê cûre navdêrên biwêjî ye ku me di destpêkê de diyar kiribûn. Li vir em ê li ser rêzika A'yê bisekinin. Rêzika A, rê û rêzikên şirovekirina elementên (hêman) hevreferans diyar dike; mn. refleksîf. Rêzika A diangêje ku refleksîf nav qadekê (doamin) de bi navdêreke biwêjî re têkildar e. Ev qad wekî 'qada bayndîngê' (binding domain) tê binavkirin. Di nav vê qadê de, navdêreke biwêjî (NP) dikare bandorê li refleksîfê bike, û pê re têkildar bibe. Mesela di (1b) de, divêt ku refleksîf 'xwe' bi 'Zîrek' re têkildar be. Bi gotineke din, divêt ku 'Zîrek' bandorê li refleksîfa 'xwe'yê bike.

Layê dîtir, rêzika B bi şirovekirina cînavkên kesane; û rêzika C jî bi ya hêmanên serbixwe re wekî Zîrek, Elî re eleqedar e. Di beşên dawî de, bi kurtî jî be, em ê rêzika B'yê jî hindekî rave bikin û hin mînakan pê analîz bikin.

Refleksîf:

Di vê beşê de em dê hewl bidin ku formulên şirovekirina refleksîfan, wekî 'xwe'ya kurdî, 'himself'a ingilîzî û 'kendi'ya tirkî biçespînin. Di kurmancî de yek element heye ku bi wezîfeya

refleksîfiyê radibe, û di rêzimanê kurdî de wekî 'cînavka vegerok' tê binavkirin.

2. (a) Ez xwe di + bîn + im
kirde refleksîf dem+raya lêkerê+ qertafa kesê
(b) Elî xwe di + bîn + e
kirde refleksîf dem+raya lêkerê+ qertaf kesê

Di kurmancî de yek şeklê refleksîfê heye, 'xwe'. Nêtar e, anku ji bo kes, hejmar û zayendê nayê tewandin an jî qertafekê nagire. Kurmancî zimanêke split-ergatîf e (ergatîfa qismî-nîvergatîf) (Durroei:2001), mîna zimanê hîndî; û di hevokên demên borî ên bi lêkerên têper hatine çêkirin de, lêker bi bireserê re hevaheng e. Lê, di hevoka (3a) de ku bireser lê refleksîf e, lêker her gav li gor biresera yekjimar tê kişandin, anku qertafa yekjimariyê hildigire. Ev yek nîşan dide ku herçend refleksîf 'xwe' ji bo hejmarê qertafekê negire jî, wekî hêmaneke yekjimar tevdi gere (Sami: 2005).

3. (a) Me xwe di televîzyonê de dît.

Wek ku diyar e, lêker li gor biresereke yekjimar hatiye kişandin.

Di kitêba xwe ya bi navê 'Syntaxê de Donna Jo Napoli (1993) diyar dîke ku, divê ku taybetiyên zayend, hejmar û kes ên refleksîf û hevreferansa wê (li vir 'me', di 3a de) yek bin. Ne zehmet e ku mirov têderxîne ku ew formulasyonên Napoli têra ravekirina mînaka li jor ku bi taybetiya ergatîfiyê hatiye sazîkirin, nake; lewre kirde (me) pirjimar e û li gorî rêzikên li jor divê refleksîf (ku ew her du hevreferans in) jî pirjimar be û bi vî awayî lêker jî li gorî biresera pirjimar bê kişandin. Lêbelê di kurmancî de taybetiya

ergatîfiyê ku me li jor rave kiribû vê yekê qebûl nake; herwiha bikaranîneke aktîf a bi wî rengî, jixwe tune. Lêbelê lêkera me li gorî biresera yekjimar hatiye kişandin. Ev yek, wekî ku diyar e, divê zêdetir bête binkolkirin, anku mijara lêkolînê kûr û berferehtir e.

Her wekî me berê jî gotibû, refleksîf nikare referansa xwe bi xwe diyar bike. Divêt ku hêmanek pêş wê de were; ew hêman jî 'antîsîdent' (antecedent) e. Antîsîdent pêş wê tê û bi vî awayî bandorê lê dîke. Anku, antîsîdent bandorkerê refleksîfê ye. Ligel navdêrên serbixwe, cînavk jî dikarin bibin antîsîdent.

Mînak: Wî xwei brîndar kiriye. (i'ya piçûk nîşana hevreferansiye ye. Anku 'wî' û 'xwe' heman kes in.)

Divêt ku antîsîdenta refleksîfê nêzîkî refleksîfê be. Ev nêzîkî bi terma 'qada lokal' (local domain) tê binavkirin.

4. (a) [Elî xwei brîndar kir.]

(b) Wê dît [ku Elî xwei brîndar kir.]

*(c) Wêi dît [ku Elî xwei brîndar kir.]

Li vir qada lokal hevokên pêreyî ne ku di nava goşebendan ([]) de hatine nîşandan. Ji mînakan diyar e ku divêt refleksîf û antîsîdent nava heman hevokê (an jî heman hevoka pêreyî de) de bin. Di (4a) û (4b) yê de, antîsîdent di qadeke lokal de ye; lewre hevok gramatîk in. Lêbelê, di (4c)'yê de, antîsîdent 'wê', derveyî qada lokal de ye. Ji ber vê hindê jî nikare ji refleksîfê re bibe antîsîdent, bi gotineke din nikare bandorê li refleksîfê bike; bi gotina populer a lînguîstîkî refleksîf ne li-sanskirî ye.

Em dikarin Teoriya Bayndîngê wiha rave bikin:

Divêt ku X (refleksîf), antîsîdentê X'ê (bandorker) û kirdeyek, di nav qadeke lokal de bin. Qada lokal ew qad e ku tê de bandor li refleksîfê tê kirin. X, û antîsîdentê X'ê hevreferans in (Haegeman:1994)1.

5. (a) Zîrek dizane [ku Zerî her roj xwei dixemilîne.]

(b) Zîrekî dizane [ku Zerî her roj xwei dixemilîne.] (Ev () nîşan, "şaşiyê" dinimîne)

Heke em bendên xwe li wan mînakên bîsepînî: 5(a)'yê de, refleksîf (xwe) û antîsîdenta wê (Zerî) di nav heman qada lokal de ne ligel kir-deya hevokê. Herwiha antîsîdent bandorê li refleksîfê dike û hevreferans in. Di hevoka 5(b) de, antîsîdenta ku bi refleksîfê re wekî hevreferans hatiye nîşandan (bi îşareta i' yê(i ya piçûk)) di nav heman qada lokal de nîn e. Derveyî wê qadê ye; lewre ji layê gramerê ve ne durust e ku em jê re dibêjin "agrammatikal".

Di gotara xwe de Samî Tan balê dikêşe ser mînakên li jêr û digihe encama ku ew karanîn xelet in.

6. (a) Bavê xwe kî ye?

(b) Navê bavê xwe çi ye?

Li gor rîzîk û qaydeyên me li jor behs lê kirî, arîşeyên di van hevokan de eşkera ne. Ev mînak dijî qaydeyên şîrovekirina refleksîfan tevdigerin. Li gorî formula me em berê (i) li refleksîfê (xwe) dinêrin; (ii) paşî li antîsîdenteke ku di qadeke lokal de bandorê li refleksîfê bike digerin

Niha em van bendan li hevokan

bîsepînî:

i. refleksîf 'xwe' di hevokan de heye.

ii. Antîsîdenteke refleksîfê tune. Anku xwe di nav hevokê de bi hêmaneke din re têkildar nîn e. Lewre li rîzîkên me nayên.

Bîrêz Îbrahîm Seydo Aydogan li ser vê mijarê wiha dibêje:

Ji bo ku mirov karanîna hin fenomenên kurmançiyê fahm bike, divê mirov li cudahiyan devokan jî binihêre. Wek mînak, li gora devoka Meletiyê, mînaka (6a) û (6b) guncaw e û bi hêsanî tê gotin. Di kurmançiya Meletiyê de her cara ku em bibêjin, "Navê bavê te çi ye?" em dibêjin, "Navê bavê xwe çi ye?", gava ku em bixwazin bibêjin "Navê te çi ye?", em dikarin bibêjin "Navê xwe çi ye?". Li gora vê, di devokên din de jî "Navê bavê xwe bibêje" gelek tê bikaranîn. Di vê mînakê de divê mirov "[Tu] navê bavê xwe bibêje" fahm bike. Antîsîdenta "xwe" li gora "ekonomiya axîstîne" berşê (veşartî) hatiye hiştin. Hingê ji bo şîrovekirina mînakên kurmançiyê, mirov, heta ku li hemû devokan nenihêre, nikare bibêje "rast" an "xelet". Wek di mînaka 7. de diyar dibe, "xwe" dikare şûna cînavkan bigire.*

Nivîskar (bîrêz Samî Tan), vê bikaranînê wekî 'xelet' dinirxîne. Lêbelê lînguîstek (zimannas) nikare li ser xeletî û rastiya formekê ku di zimanekî de heye û tê bikaranîn biryaran bide. Heke formek di zimanekî de hebe, raveyeke wê ya lînguîstîkî jî hetmen heye; lewre rîzîkên lînguîstîkî

* Bi rêya peyamên şexsî

diyar nakin ka formek divê di zimanekî de çawa be, lêbelê ew tenê bi analîzên zanistî terîf û teswîr dikin ka ew form çawa di wî zimanî de pêk tên. Heke teoriyên lînguîstîkî nekarin bikaranînên zimanekî rave bikin ew ne xema (problem) zimên e, lêbelê a teoriyê ye. Divê ku teorî bête modîfîyekirin. Ê me jî em dibêjin ku ew form li rêzikên ku me heta niha pêşkeş kirine ve nayên, hevûdu nagirin.

Îcar divêt rêzikên berfirehtir hebin ji bo ravekirina vê formê. Di wan hevokên awarte de (6) pêdivî bi antîsîdentekê heye ku bandorê li refleksîfê bike û bi vî awayî hebûna wê meşrû bike. Lînguîst vê yekê bi bicîkirina "pro" yê di nav hevokê de çareser dikin. Ev pro ne diyar e, lê wezîfeya antîsîdentê di nava hevokê de dibîne (Haegeman: 1994). Hebûna proyê ku li pêş refleksîfê û wekî kirde tê ferz kirin, hebûna refleksîfê di hevokê de meşrû dîke, lîsansê dide wê. Niha em hevokeke mişkul li vir dubare bikin û bicîkirina 'pro'yê bibînin.

7. (a) [Bavê xwei proi] kî ye.*

Di berde wama gotara xwe de nivîskar hevokeke din li hevokên 'bi arîşe' zêde dîke.

8. (a) Bager û bavê xwe çûn bajêr.

Li vir, ligel ku nivîskar bi eşkerayî dibêje ku hevok li layê watenasiyê (semantic) ve zelal e jî; dipirse ka bi awayê 'Bager û bavê wî çûn bajêr' rast

* Li jor me antîsîdent wekî hêmana ku li pêşiya refleksîfê tê, diyar kiribû. Ew pêşdehatin bi mebesta strûktûra hevokê a bîngêhîn (deep structure) e. Anku ne di rêza hêmanan de pêşdehatin. 1 Ji bo çavkaniyê berfireh bnr. Chomsky (1998)

tir û tîkûztir nabe?

Em dîsa rêzikên xwe bîsepînin:

i. Refleksîf: **xwe**

ii. Antîsîdentek ku di nav qadeke lokal de bandorê li refleksîfê dîke:

Bager

Pirs û rêzikên me bersivên xwe peyda kirin; lewre em dikarin bibêjin ku ev hevok li gor rêzikên teoriya bayndîngê durust e.

Heta li dijî wiya bi ya me, angaştî nivîskêr a ji bo hevoka duyem hem li layê watesaziyê û hem jî li layê sînteksê ve ne durust e.

Layê watesaziyê:

9. (a) ez û bavê min (b) ez û bavê xwe

10. (a) tu û bavê te (b) tu û bavê xwe

11. (a) ew û bavê wî (b) ew û bavê xwe

Di her du mînakên ewil (9, 10) ên li jor arîşeyê ku maneyê lê nehêle tune. Em tîdigihin ka mijar çi ye. Lêbelê di mînaka 11(a) de em nikarin rasterast bibêjin ku 'ew' û 'wî' eynî kes in. Dibe ku 'ew' kesek be û bav, bavê yekî din be. Lê di 11(b) de, bê şik e ku bav, bavê wî (ewî) bi xwe ye.

12. (a) Ew û hevalên me çûn malê.

(b) Ew û hevalên we çûn malê.

(c) Ew û hevalên wan çûn malê.

(d) Ew û hevalên xwe çûn malê.

Li vir jî dîsa di hevoka (c) de em nikarin baş tê derxin ka 'ew', û 'wan' heman kes in, an kesên cuda cuda ne. Yek dikare bibêje ku 'ew' û 'wan' kesên cuda ne. Hevoka (d) rasterast diyar dîke ku 'heval', hevalên 'ew'an in; lewre ev bikaranîn wateya ku em li dû ne, çêtir dide. Di (a) û (b)' yê de

arîşeyên bi wî rengî nîn e. Di van hevokan de heke mirov di şûna cînavkên duyem de "xwe" bi kar bîne, wateya hevokê tê guhertin.

Layê sînteksê: Ji bo ku baştir bê famkirin em hevoka mijara guftugoyê li vir dubare bikin.

13. (a) Bager û bavê wî çûn bajêr

Li gor rîzika B ya teoriya bayndîngê (binding theory), ku li jor nav lê borî bû, divêt ku cînavkek di nav qada lokal de serbixwe be. Anku ji layê hêmanekê ve bandor lê neyê kirin. Di vê hevokê de, Bager û cînavk 'wî' di nav eynî qada lokal de ne. Herwiha 'Bager', antîsîdenta cînavkê (wî) ye, û bandorê li cînavkê dike; lewre jî rîzika serxwebûniya cînavkan binpê dike. Bi gotineke din, di nav heman qada lokal de cînavk hevreferansan qebûl nake; di vê hevokê de Bager, wekî hevreferansa cînavkê hatiye bikaranîn. Lewma jî bi ya me angaştê Samî Tanî ligel bikaranînên aktîf ên zimên û teoriyên sîntaktîk li hev nakin.

Herwekî ku tê zanîn form û strûktûra zimanê kurdî zêde jî nekevtiyê nav dest û lepên teorî û formulasyonên sîntaktîk ên gerdûnî. Divêt ku zimanê kurdî jî êdî li wan teoriyan bê ceribandî; bi vî awayî dê rê û rêçik li zimên zelaltir bibin û bi heman awayî ew teorî jî dê bi saya zimanê kurdî cardin bêne ceribandî û gerdûnîtiya (universality) wan an dê bête piştrastkirin an jî dê cardin bête guftugokirin. Di vê xebatê de me hewl da ku formên zimên li teoriyên sîntaktîk bispênin û bi vî awayî hin mijaran analîz bikin. Me dît ku nîrxandina

form û karanînên ku di zimên de hene bi boçûnên subjektîf têr tesel nayên analîzkirin. Herwiha formeke ku li standardên zimên (ku ew standard jî ji aliyê pisporên zimên ve hatine diyarkirin) neyê, ne 'xelet' e ; heke di zimên de hebe muheqeq bîngeheke wê ya lînguîstîkî heye.

Çavkanî:


- Chomsky, N. (1988) Language and Problems of Knowledge. The Managua Lectures, Cambridge, Mass. : MIT Press.
- Heagman, L. M. V. (1994) Introduction to Government and Binding Theory, Weşanên Blackwell
- Duroei, S. R. (2001) <http://www.cogsci.ed.ac.uk/~siamakr/Kurdish/KURDICA/2001/3/ergativity>
- Napoli, J. D. (1993) Syntax Theory and Problems, Newyork : Weşanxaneyê Oxford Universityç
- Tan, S. (2005) 'Hin taybetiyên cînavka vegeroke', *Zend*, 2, 26-27

FERHENGA BIWÊJAN A ENSTÎTUYÊ

Roşan Lezgîn

Ferhenga Biwêjan a ku Mustafa Borak amade kiriye û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê li Pûşpera 2005an çap kiriye, 1005 rûpel e û teqîriben li dor 11-12 hezar îdyoman (biwêj) e.

Herçendî ku birêz Mustafa Borak di *Pêşgotinê* de dibêje, "... xebatên wer, xebatên saziyên bi rêkûpêk in. Xebatên kom û ekîban in... Ev lêkolîn û lêgerîn pêwist e ji hêla komek zanyar ve bên darivandin û tasnîfkirin. (r. 23)" lê ji ber ku berhem bi xwe ji destê enstîtuyekê çap bûye û ev sazî (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê) bi van gotinên xwe jî piştrast dike ku ew wek ekîb li ser xebitîne, ku di *Pêşkekê* de dibêje, "... hevala me Aysel Çetin jî nêzî pênc mehan li ser sekinî û ji aliyê ziman ve jî sererast kir û ediland. Li aliyê din hevalên me Zana Farqînî û Samî Tan jî, ji bo amadekirina vê berhemê şêwirmendî kirin. (r. 5)" ji vê çendê, niha muxatabên vê nivîsê pêşî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê (birêz



serok û berpirsiyar û şêwirmend û redaktor û endamên hêja û zana...) û dû re jî, danerê *Ferhenga Biwêjan* birêz Mustafa Borak e.

Ji serî de ez vê bibêjim ku kes, kom an jî sazî, dema ku xebateke rast û zanistî li ser zimanê kurdî bikin, ev yek ji bo pêşketina zimanê me û pê re jî, ji bo neteweya me dibe xizmeteke baş û helbet meriv dikare bi kêfxweşiyeke ji dil bibe minetkar, lê bi wî şertê ku xisara xwe ji kara xwe zêdetir nebe!

Xebatên nivîskî yên ku li ser zimên bi nezanî bêne kirin, ji ber ku piştî weşandinê dibin belge, dibin referans, hingê şaşiyên xwe jî dibin şaşiyên gelemperî, ji vê çendê qet çênebin çêtir e. Çünke ji bilî kesên zana û ehlên wî warî, ku dikarin şaşiyên bibînin, wekî din hemû muxatab û xwendevanên sade û xêşim; kesên ku bibin muxatabê wê enformasyona nivîskî, dê jê bawer bikin û ji xwe re bikin çavkanî û referans(*). Tew mebjîn ku ev berhem bi mohra (logo) sazîyeke zanistî⁽¹⁾ hatibe çap- kirin: Berga xwe çermî, rengê reş,

*Ez bawer im, kesine ku navê wan di vê ferhengê de derbas dibe ew jî di vê baweriyê de ne. Ger ez şaş bim jî, kêmtir, hêviya min ev e. Lêbelê bi çi awayî bûye, ez nizanîm, lê ev eyan e ku derxistina vê ferhengê ya bi vî awayî bêciddiyetîyek li ber çavan e, û tu xizmetekê ji zarê kurmancî re nekiriye ji bilî zêdekirina teşqe û tevlihevî û lewitandinê!... Her wilha, digel ku rola Enstîtuyê di gelek berhemên ku bi logoya xwe weşandine de bi tenê roleke basît e, ji rola weşanxaneyê weşet jî kêmtir e, lê ew refleksên amadekirin û weşandina vê ferhengê di gelek berhemên din de jî xwe didin der: Jixwe kurd naxwînin lê bila bête dîtin ku em çi kitêbên stûr (îllahîm stûr!) amade dikin!... Ev awa xebat dibe ku di demeke kurt de payeyekê (!) bexşî meriv bikin lê bi dirêj bûyina demê re dê sergoyeke genî bi ser vê kêfxweşiya erzan de raxînin!...(Derdê min? Dilê min bi halê vî zimani dişewite...)

¹ Meydan Larousse, Enstîtû maddesî. (Enstîtû i. (fr. Institut) Bilîmsel aşturma, inceleme ve yayın yapan bağımsız kuruluş: Folklor Enstîtüsü. Bazı eğitim kurumlarına verilen genel ad. Bknz. ANSİKLOPEDİ.)

nivîsên zêrhelî, 1.350 kg giran, 1005 rûpel, 24x16.5 cm ebad û helbet buhayê xwe jî 40 YTL be, hingê hukmê xwe dibe wek hedîsekê, dê kîjan kes bikaribe yan jî curetê bike û rabe ji sehîhbûna wê bikeve nava şik û gumanan?!...

Birêz Mustafa Borak mutewazîbûna (!) xwe bo me dide nîşan û dibêje, "Ji bo ku pirtûk zêde stûr nebe, gelek biwêjên hemwate bi kurtenivîsa bnr. hatine nîşankirin. (r.23)" lê ez viya bibêjim, bila ciwanmêrî û qenciya wî ji wî re be! Çünke vê yekê li ser stûrbûn an jî tenikbûnê bi qasî nîvrûpelî jî tesîrek nekiriye. Wekî din her tiştî; dirêjbûna berhewa ya pêşgotinan, sistematîka îzehetê, mîzanpaj, -versiyon ne tê de- bi çend awayî nivîsandina îdyomekê, ji sedî nod (% 90) îdyomên çêkirî yên sexte, ewên ku motemot an jî bi awayekî şaş ji tirkî hatine wergerandin, li ser navê îzehetê di nava wateyê de îllahîm dubarekirina îdyomê ya bêwate... her tişt bi eşkerayî bang li me dike, bê hela çawan ji her hêlê ve zorê li xwe kirine ku pirtûk stûr be. De bila stûr be!

Çima stûr? Lewre, di hişmendiya kes an jî civakên paşdemayî de naverok û qelîte û sehîhbûn qet ne muhîm in, kitêb çendî stûr be, paye û rûmeta xwe jî ewçend zêde ye! Belkî hûn jî pê hesiyên, nivîskarekî me yê hêja çawan xwe nepixandibû û gotibû, "Romana herî stûr min nivîsiye!..." (Bijî!) Êdî kî dikare li ber camêrî xeber bide! A hîkmeta stûrbûnê ev e...

Ji min re wisan dixuye ku ne hemû lê di bingeha xeletî û şaşiyên vê pirtûkê de ev nexweşiya stûrbûnê heye.

Birêz Mustafa Borak derbarê xebe-
ta xwe ya berhevkirina îdyoman de
tiştêkî balkêş dibêje, "... Min di van
civînan de yên di dest xwe de xwendin
da ku bên bîra wan û ew jî yên nû
bidin ser. (r. 12)" Niha ez viya bibêjim,
berhevkirina folklorê bi tena serê xwe
dîsîplînek e; xebateke ewçend hesas e
ku pisporî û meharet û qabîliyeta tey-
bet jê re divên. Lêbelê ger bi kurtasî
bête gotin, berhevkirina folklorê li ser
xwestekan nayête kirin; yanî, ne dirust
e ku meriv civînan li dar xîne û ji
kesekî re bibêje, "Ji kerema xwe re bo
min çend îdyoman an jî çend gotinên
pêşyan bibêje û ez ê jî berhev
bikim..." (Ev ne darehirmî ye ku em
bihejinin û hirmî jê birijin!...) Çunke,
folklor -bi taybetî jî îdyom- di nava
zimên de wisan kelijîne û dirûv girtine
ku bes dikarin bi axiftineke xwezayî
rast werine gotinê. Ger ji axiftinê
werin berhevkin, hingê divêt
berhevkar jî guhdarekî bédeng be,
berhevkarîya xwe qet nede hîskirin û
tiştê ku hatiye gotin, ji xwe re bi
awayek qeyd bike. Na, ger te ji yekî
xwest ku bo te îdyomekê bibêje, hingê
ew qalibê otantik difelişe. Nexwe, pişt
re jî tu yê rabî wateya îdyomê jê
bipirsî. Îhtîmaleke mezin, dê ew bi
xwe wateyê jî şaş îzeh bike, jixwe êdî
kes nikare ji nêv derbikeve!...

Di serî de ji îfadeyên camêrî
dixwuye ku ew qet jî ne şarezayê
berhevkirina folklorê ye û ev kar, ji her
hêlê ve ne karê wî ye! Karê ku meriv
baş ji heq derneyê, mebêjin ku ev
zimanek be, meriv qet destê xwe pê
neke hezar qat çêtir e ji kirinê.

Birêz Mustafa Borak di destpêkê

de nêzîkî 20 rûpelî tiştin qiset dike;
gotinê virde-wêde digerin, bi dehan
mînak ji gotinên pêşyan û îdyoman
dide lê rasterast û bi awayekî zelal
nikare bibêje îdyom çî ye. Lêbelê ji bo
ku bibe xwedî kitêbeke stûr, hema çî
ketiye ber an jî çî hatiye bîra wî; çiqas
karibûye li hev bîne, li ser navê îdy-
omê tiştin li dû hev rêz kirine,
şêwirmendên Enstîtuya Kurdî ya
Stenbolê jî wan tesdîq kirine (!) û wek
Ferhenga Biwêjan pêşkêşî me kirine.

Dema ku camêr dixwaze bo me
îdyomê tarîf bike, gelek tiştên şaş
dibêje. Ji vana yek ev e, ku dibêje :

"Biwêjek li gorî rewşê hin caran
rengdêr e, hin caran navdêr e, hin
caran jî dibe lêker. Mînak:

"Stûxwar" (rengdêr),

"Stûxwarî" (navdêr),

"Stûxwar bûn" (lêker)

Lê her sê jî ji aliyê wateyê ve biwêj
in. (r.22)"

Di zimanê kurdî de jî û di zimanên
din de jî gelek peyvên hevedudanî yên
wisandî hene ku bi tena serê xwe jî û di
nav hevokê de jî nabin îdyom. Di lêk-
erê de jî, wisandî dixuye ku ferqa di
navbera "bûn" û "bûyin"ê de jî
nehatiye zanîn! Mesela ev rengdêr bi
vî awayî nabe îdyom:

"Stûxwar bûn (stûxwar man)

Bê çare li holê man. **Ew qas ewledê
wî jî hebûn, lê jina wî ku mir, mêrik
stûxwar bû û li holê ma.* (r. 840)"

"Stûxwarbûn/stûxwar bûn" nabin
îdyom. Em bibêjin, "kezîzer, kezîkur,
gulîbirr, rûreş..." tev heman tişt in
(*rengdêr an navdêr* û te divêt bila *lêker*
bin); du peyvên hevedudanî ne. Heke
"stûxwar bûn" îdyom be, divêt

"kezîkur bûn" jî bibe îdyom! Her wiha, di kurmanciyê de bi hezaran peyvên wisan hene, çima ên din negirtine ferhenga xwe? Lêbelê ger îllahîm em rabin ji van her du peyvên îdyomekê bixuliqînin, hingê divêt wisan bête nivîsandin:

stûyê xwe xwar kirin: li ber gerîn; lava kirin, rica kirin; xwe reben kirin; belengazî, teslîmîyet an jî bêçaremayîna xwe nîşandan

keziyên xwe kur kirin: şînî bûyin, şînê gerandin; li dû yekî mirî xweşikbûna xwe xirab kirin; dev ji xwebedewkirinê berdan

Bo numûne, dema ku em bibêjin, "Ew yekî stûxwar e", di vir de wateya xwe ya rasteqîn ew e ku, stûyê wî kesî xwar e, ango stûyê wî ne rast e. Bi vî awayî ne îdyom e, bi tenê rewşekê dîyar dike (navdêr?), wek ku em bibêjin "Ew yekî rîhspî ye". Îcar, dema ku em bibêjin "Ew yekî stûxwar e" (ji ber ku *jina wî mirîye?*), ev jî manaya rengdêrekê (sifet) nîşan dide, wek ku em bibêjin "Ew yekî xemgîn e". Bala xwe bidinê, yek peyv e, du wateyên cihê ne lê her du jî ne îdyom in, bi vî awayî nikarin bibin îdyom! Lê çî dema ku em bibêjin "Wî stûyê xwe xwar kir", a li vir dibe îdyom. Çima? Çunke, di vê hevoka dawîn de îbareya "stûyê xwe xwar kirin"ê di wateya mecazî de ye, ango di wateya tabîrê de hatiye karanîn. Newxe, şertekî bîngêhîn a îdyom bûyîne jî divêt di wateya mecazê/tabîrê de be!...

Niha ez jî dizanim ku xebatên bêqusûr nîn in. Ger xebatek nîvenîv jî xwedî qusûr be, meriv dikare bi fesal xwe lê nêzik bike lê ger berhemek ji

çar paran sê par û sê ribên xwe şaş be hingê ez jî nizanim ku meriv bi uslûbeke çawan û bi kîjan metodî kirîtkê bike? Ev *Ferhenga Biwêjan* ku di warê xwe de tekane ye û ji aliyê qewareyê (hecm) ve jî (bênezêr bel!) gelek stûr e, ger ez rabim hemû xeletiyên wê binivîsim, hingê divêt kêmtir deh-panzdeh hezar rûpel bêne nivîsandin! Ji wê çendê ez dê ne bi awayekî sistematîk lê di ser re çend numûneyan pêşkêş bikim. Lê beriya wê, ji bo îddîayên "Ev ferhenga biwêjan di warê xwe de tekane ye. (r. 5)" û "Di xebatên ku heya niha hatine weşandin de kesî biwêj wek vê xebatê bi wate û bi mînak nenivîsîne. (r. 11)" ez dixwazim xwendevan li kovara Vate, hejmarên 17, 18, 19, 20, 21, 22... û sala weşandina wan, her wiha, li berhemên weşanxaneyê Vateyê jî binihêrin. Çunke gelekê kurdan pir hewesdar in ku dîrokê ji xwe bidin destpêkirinê, wek îddîaya nivîsandina romana yekemîn a kurdî!...

Mînakî Ji Şaşîyan

Digel ku îdyom ruh an jî kakilê zimên in lê zimanê camêrî ne zimanekî xas û xwezayî ye; tu bêhn û tahm û ekla zimanê kurdî jê nayê, seranser zimanekî çêkirî û naylon e; tu hevoka ku li gor qaydeyên gramera kurdî rast hatibe nivîsandin nîn e, ne xwedî tu stadardekê ye; ne di yê berhevkirî yan jî wergirtî de, lê di axiftina wî bi xwe de heman peyv bi çend forman hatiye nivîsîn û her wiha, îdyom li gor sistema rêzkirina alfabetîk jî nehatine rêzkirin... Lêbelê ez

dê bêhtir li ser mentiq û wateyê bisekinim. Em ferz bikin, ji îdyoman yeke wiha:

"Di kulekê de ketin

Bêrûmet bûn. *Ez çûm mêvaniya wan lê te digot ez di kulekê de ketime, wekî merî û însanan li min nenihêrîn. (r. 290)"

Di kulekê de ketin (bacada dūşmek), ne ku ji kulekê de yan jî di kulekê re ketin, li nava kulekê ketin e. Û tişteki wisan jî ne mumkûn e, çunke kulek ne meydana beza hespan e ku meriv tê de bimeşe û bikeve! Bes meriv dikare jê bikeve. "Têdeketin" û "Jêdeketin" du kiryarên cihê ne. "Bacadan dūşmek = Di kulekê re ketin/Ji kulekê ketin" e. Û her wiha wateya xwe ya tabîr/mecaz an jî îdyomki/biwêjki jî, ku camêrî gotiye "Bêrûmet bûn", lê ji ber ku camêrî ji binî ve şaş e, lewma jî ev îdyom bi vê şaşbûnê dîsan jî tu eleqeya xwe bi "Bêrûmet bûn"ê ve nîn e! Her wiha, ew hevoka ku camêrî ji bo zelalkirina wateyê lê zêde kiriye jî, ji bilî şelokirinê tu wateya "bêrûmet bûn"ê jî nade! Çunke dibêje, "...wekî merî û însanan li min nenihêrîn." Yanî, ji mentiqê ve hevokê ev tê famkirin ku "di kulekê de ketin" kesî nake bêrûmet; qusûr ne yê ketî ye, ewên ku lê dinihêrin xwedîqusûr in, lewre wan wekî merî û însanan li wî yê ku **di kulekê de ketiye** nenihêrîne!

Ev "Bêrûmet bûn" di çi wateyê de hatiye karanîn? Çunke, wateya "Onursuz oldular" a tirkî dide. Lêbelê wisan dixuye ku wan ne di vê wateyê de xebitandiye, ez guman dikim ku di wateya "Onursuz bir duruma dūşmek" yan jî di wateya "Onursuz

olmak" de hatiye karanîn. Ger di wateya "Onursuzlaşma" de bûya, divêt "Bêrûmetbûn" bihata nivîsandin û ger di wateya "Onursuz olmak" de bûya, hingê diviyabû wek "Bêrûmet bûyin" bihata nivîsandin.

Wateya wê îdyomê ne "Bêrûmet bûn" e, belkî meriv bikarîbe wisan îzeh bike:

di kulekê re ketin: ji derdora xwe bi qasê ku heq dîke qedr û qîmet nedîtîn; neheqî lê hatin kirin (Hesenî ji birayê xwe re got, "Tu çima para min înkâr dikî, ma **ez di kulekê re ketime?** Wate: Ew dê û bavê ku tu jê ketiyî, ez jî ji wan ketime, heqê te çiqas be, yê min jî ewqas e!)

Lêbelê, ne ji peyv û hevok û îzehetên qaşo vê îdyoma ku camêran wisan şatopato rêz kiriye lê ger meriv piçekî serwextê folklor û kultura kurdî be, îcar ji bo îzeheta îdyoma wan jî, teqrîben dê têbigihê ku îdyomeke wisan heye:

segê nevwendî bûyîn: xwendî yan jî mêvanê ku bêyî vexwendinê (ji ber xwe ve) çûbe şahiyekê yan jî mêvaniyê bûyîn (Ew **segê nevwendî ye**. Wate: Kesî ew venewendiye, ji ber xwe ve hatiye dawetê, xwe daxistiye sewîyeya segekî, rûmetê medine wî! Yan jî, tu dibêjî qey em **segên nevwendî** ne, tew mazûbanan li rûyê me jî nenihêrîn, tu rûmetekê nedan me!...)

Seranser bi vî awayî, tu îdyomeke heqîqî ya ji folklorê kurdî bi awayekî rast û tekuz di vê qaşo ferhengê de cih negirtiye, her wiha, tu îdyom bi awayekî rast îzeh jî nebûye. Ger ji bo îdyomek a ji Ferhenga Biwêjan evqas

şîrove bête nivîsandin, ku helbet divêt li ser gişan bête nivîsandin, çunke ji bo ku ez dirêj nekim min ewa kêmtêşqele hîlbijart, ê de hûn felaketê texmîn bikin!...

Peyvên Balkêş

"Atar anîn serî (yekî)

Dek û fen li yekî kirin. *Serhat atar anî ser me lê bi ser neket. (r. 51)"

Ez vê peyvê (atar) hîn nuh di zimanê me de dibînim. Ji îzehetê têdigihêmin ku wateya xwe neyînî (menfî) ye. Em ferz bikin ku me vê peyvê (atar) û vê îdyomê qebûl kir. Lêbelê, îzeheta wê hişê min tevlihev kir! Bala xwe bidinê, di îdyomê de dibêje "atar anîn serî" lê di îzehetê de dibêje "atar anî ser me". Ez dizanim ku di zimanê kurdî de "serî" û "ser" du peyvên cihê ne, her wiha "anîn serî/anîn serê yekî" û "anîn ser/anîn ser me" jî du wateyên ji hev cihê ne, tu pêwendiya wan bi hev ve nîn e. De werin safî bikin!

Ji aliyê din, di zimanê kurdî de kes nabêje "dek û fen" lê wek qalibekê "dek û dolab" an jî "fen û fût" bi hev ve têne gotin. Heke îdyom be, ew îzeheta ku hatiye kirin belkî îdyom be, ne ku îdyoma camêrî! Meriv dikare wisan bibêje:

li serê yekî dek û dolab gerandin: li yekî hîle kirin, xapandin; derheqê yekî de bi nihênî amadekariya tiştên xirab kirin

Ev wisan, lê dema ku min wê îdyoma li binî xwend, hişê min ê tevlihevî xirabtir bû! Çunke di wê îdyomê de jî ev peyva "atar" îcar bi

wateyeke erênî (musbet) hatiye karanîn. Bala xwe bidinê, dibêje:

"Atara (yekî) li serê (yekî) bûn

Ketin rewşeke erênî. *Atara min li serê te be, tu derd û kulan nebînî. (r. 51)"

Xulasa min fam nekir, gelo ev "atar" çi ye? Tiştêkî baş e yan xirab? De werin vî kerî di vî bihurî re derbas bikin!

Îdyomên Çendbarebûyî

Versiyon ne tê de lê bi sedan, belkî jî bi hezaran îdyomên çendbarebûyî hene. Ez nikarim hemûyê wan nîşan bidim lê ji wan, mînakek jê wisan e:

"Av di gerdênê de xuya kirin

bnr. Av di sûret de xuya kirin (r. 51)"

Li jêrî vê îdyomê îcar dibêje:

"Av di gerdena (yekê) de xuya kirin

Pir bedew û spehî bûn. *Gurî li devê derê qesrê li ser kursî rûniştiye, bala xwe daye Gulperiyê qîza Hesên Axa, avê ku vedixwe, di gerdena wê de xuya dike." Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl (r. 51-52)"

Ez têngiham ku cihêtiyeke çawan di navbera van her du îdyoman de heye ku dubare bûne û her wiha, yekî îzeh kiriye lê ji bo ewa din dibêje "bnr. Av di sûretê de xuya kirin". Û li jêrê wan jî dibêje:

"Av di qirika (yekê) de xuya kirin

bnr. Avê di sûretê (yekê) de xuya kirin (r. 52)"

Ji bo ku ez lê binihêrim, min her du bnr. jî nedît. Lê ev îdyoma li jêr hebû:

"Av di sûretê (yekê) de xuya kirin

Pir bedew bûn. *Maşelah bûka Zero

wisa ne ku av di sûret de xuya dike. (r. 52)"

Her sê jî ne wekhev in:

"bnr. Av di sûret de xuya kirin (r. 51)

bnr. Avê di sûretê (yekê) de xuya kirin (r. 52)

Av di sûretê (yekê) de xuya kirin (r. 52)"

Di hevoka îzehetê de "av"ê nekiriye bold. Li gor sistema camêrî, ger em "av"ê hesab nekin, em dê ji ku bizanibin ku di sûret de çi xuya dike? (Tu sîstem û standard nîn e, hema elelkeyfê!) Em viya jî bidin aliyekî, ez dixwazim bipirsim bê çima ji bo îdyoma jorîn gotiye, "Pir bedew û spehî bûn." lê ji bo ya jêrîn bi tenê dibêje, "Pir bedew bûn.", heke "û spehî" jê kêmbê, çi ferqa xwe çêdibe? Û ez tînegihêrîm ku însan avê vexwe, çima di sûret de dixuye?! Di gerdenê de xuyabûna avê - tabîr/mecaz- hebe jî ev yek dikeve serê meriv, çunke riya avê ye (tabîr/mecaz ne bêmentiq in!), lêbelê ez nizanîm av çawan di sûret (rû) de dixuye! Baş tê zanîn ku dema însan avê vedixwe, ne ku bi aliyê sûret/rû de berjor diherike, na, di gewriyê re berjêr diherike. Îcar çi îşê avê di sûret de heye?!

Ferhenga Biwêjan a stûr wisan bi tevliheviyên komîk dagirtiye ku gelekê caran ji hêrsbûnê wêdetir êdî kenê meriv tê, eynî wek lîstika zarokan e. Mesela dibêje:

"Av ku di ser de qelaptî, ya bihostek, ya çartilî

Mirov ku nok bû nav, kêmbê an jî zêdebûn êdî ferq nake. **Av di ser de qelaptî, ya bihostek, ya çartilî.*" Zana Farqînî (r. 52)"

Wek ku dixuye, camêrî li binê hin îdyoman navê nivîskarekî nivîsandiye

lê çavkaniya xwe nedaye xuyakirin. Lewma jî, nayê zanîn gelo bi rastî jî vî nivîskarî hevokekê yan jî îdyomeke wisan karaniye yan na? Heke karanibe, gelo di sohbetê li ser piyan an jî di belegeyê nivîskî de? Heke belge be, ev kîjan e? Niha ez ji vî hevoka lihevhatî ketim gumanê! Gelo îdyomeke wisan heye yan na? Çunke ez dizanîm ku îdyomeke wisan heye: **Ger meriv kete avê ha li çokê ha li navê!** Lê di *Ferhenga Biwêjan* a hêja û stûr (!) de tune ye. Sedemên din ên gumankirina min jî hene ku, ya pêşî ev e: Di yekê de "ku"yek zêde ye yan jî di ya din de "ku"yek kêmbê, çima? A duduyan jî, ez nizanîm gelo di çavkaniya xwe de peyva "çartilî" di wateya "çar tilî" de hatiye xebitandin û li vir wek xeletiyê teknîkî bi hev ve zeliqiyê, yan jî, di rastiya xwe de peyveke xweser ya wek "çartilî" (pîvan) heye? Her wiha, min viya jî fam nekir ku di îzehetê de dibêje, "Mirov ku nok bû nav". Ev, tê çi wateyê, çawan *mirov bûye nok nav?* (Mirov ku nok bû nav; Însan/kîşî ki nohut oldu ad/iç,) *Noka* çi, *navê* çi? Ez baş nizanîm, gelo xwestiyê bibêje, "Noqî avê/navê bûyin; noqavî bûyin (bi tirkî: suya batmak)" an jî tiştêkî din?

Çend rûpel bi şûn de jî dibêje:

"Avê ku da serî, çi bihostek çi çartilî

Mirov ku kete nav êdî ji wê şûn de ne xem e. *Êdî ji min re derka wê nîn e, jixwe ketime nav. Avê ku da serî, çi bihostek çi çar tilî. (r. 58)

Ji serî de bibêjim ku ev "derka wê" çi ye, gelo peyveke wisan (derk) heye?

(Peyvek ji peyvên balkêş!). Gelo "derketina ji nava wê" bûye "derka wê"? Û her wiha, *av çawan dide* yan jî *daye serî*, ku *çi bihostek* *çi çartilî* yan jî *çar tîlî*, *êdî ji wê şûn de* *dê nebe xem?* Li jor gotiye "ferq nake", lê di viya de dibêje "ne xem e" û her wiha, di îdyom an jî wê hevoka lihevhatî ya jorîn de dibêje, "Av ku di ser de qelaptî," gerçê ji aliyê gramerê ve şaş e, lê qet nebe ji aliyê wateyê ve kêm-zêde tê famkirin ku bê hela dixwaze bo me *çi bibêje*, lê di îdyoma jêrîn de dibêje, "Avê ku da serî," û her wiha, îzehetên wan jî ne wekhev in. Ez dixwazim fam bikim ku gelo *çi ferq* di nava wan de heye û dîsan, ez dixwazim bînim ber *çavê xwe*, *gelo av çawan dide serî*, yan jî *av dayîn serî* wateyek an jî termeke (têgeh) çawan e? Heram be ku tiştêk hatibe ber *çavê min* an jî wateyek/îzehetek hatibe bîra min! Ez nizanîm *çi navî* li vê kirinê daynim?!...

Ji aliyê din, çima ew peyva "çartilî" li jêr ji hev çûye û bûye "çar tîlî" û dîsan, di îdyoma jorîn de "çi bihostek, *çi çartilî*" lê di ya jêrîn de "çi bihostek *çi çartilî*" hatiye nivîsandin, yanî di yekî de vîrgul (,) heye lê di ya din de nîn e, çima? Lewre, tê zanîn ku vîrgul (,) ji ber keyfîyetê nayê xebitandin!... Dibe ku camêr bibêjin, ev tişt-miştên hûrik in! Lêbelê, ewên ku ji zimên fam dikin, divêt teqdîr bikin ku di nêv hevokê de ne bi tenê hebûn û nebûna wî, ew cihê ku vîrgul (,) tê danîn jî dikare wateyê ji binî ve biguherîne, mebêjin ku ev jî ferhengek be!

Ez naxwazim serê we biêşînim, digel ku ne qabilî tehemulê ye lê ji kerema xwe re sebr bikin, hema bi

kurtahî ez dê bala we bikişînim ser çend îdyomên balkêş û tevlihevî û şaşiyên din:

"Avrî avêtin (Awir avêtin)

bnr. Awir dan

Avrî (awir) li (yekî) dan

Di demeke kurt de bi bandor li derekî yan jî li tiştêkî nihêrîn. **Em gihîştin rasta xwendîngeha wê û ez bi tenê hêlam, berî li derî berze bît, avriyek li min da û çû...*" Îsmet Mehemed Bedel

Awir pê ve dan

bnr. Awir dan

Awir tê de çûn

Bi awayekî baldar lê nihêrîn. **Awirên min wisa di wê de çûn ku pê aciz bû û rûyê xwe guhest.*

Awirên şewat avêtin

Bi awayekî xemgîn û keser nihêrîn. **Dema ku di hucreyê zindanê de ez bi wî half dîtim, awireke şewat avête min.*

Awirên tûj avêtin

bnr. Awriyên tîrş avêtin

Awirên xwe jê dûr xistin

bnr. Çavê xwe jê revandin

Awirên xwe ji ser hilnedan

Xistina bin bandora xwe. Tim şopandin. **Min çawa kir, Canxwas awirên xwe ji ser min hilnedan.*

Awirên xwe tûj kirin

Bi armanceke neyînî yan jî xerab li kesekî nihêrîn. **Sosinê awirên xwe tûj kirine, dixuye ku dê tiştinên xerab bibêje.*

Awir (avrî, avrû) lêdan

bnr. Awir dan

Awirên tîrş avêtin

Bi awayekî xerab û bi niyeteke nebaş nihêrîn.

**Salo wisa awireke tîrş avêtê ku Temo (r. 59-60)"*

Peyva "guhêst⁽²⁾" di çî wateyê de hatiye karanîn, di wateya "bada" yan jî "fetiland" de? Çünke, "guhastin" di wateya "taşmak" a tirkî de ye. Yanî, dema ku em vê hevokê wergerînin tirkî tiştêkî wisan derdikeve "... aciz bû û rûyê xwe guhest: ...rahatsız oldu ve yüzünü taşıdı." Meriv rabe qesten zimanê kurdî xirab bike jî ewçend biser nakeve. Her bijî!...

Zimanzanî ne pêwîst e, hema xwendevanek ku piçek aşînayê/a vî zimanî û kultura kurdî be, heke bala xwe bide ser van çend îdyomên (!) ku min jê hildane û awayê nivîsîn û îze-hetên wan û ew zimanê ku hatiye karanîn, hingê ez bawer im dê têbigîhê ku ev çî ferhengeke hêja ye(!). Bala xwe bidinê, dibêjê "bnr. Awir dan" lê ez di temamê vê ferhenga giranbuha de geriyam, mixabin, min nedît, "Awir dan" nîn bû ku ez lê binihêrim bê hela ew çî ye? Û jixwe, heke "awirdan/awir dayin (bakma/bakmak)" jî îdyom be, hingê "avdan" û "xeberdan" û "bazdan" û "pêvedan..." jî îdyom in! Gelo evên hanê çî qebêhetî kirine ku di vê ferhenga zêrîn de cihê wan nîn bûye?

Em dizanin ku di zimanê kurdî de "tûj nihêrîn" heye û ev peyva "tûj" ne di wateya "acı" ya tirkî de lê di wateya "keskin" de ye. Gelo we kesî "awirên tîrş" tahm kirine? Xwedê me bisi-tîrîne, ger "awirên şor" jî hebûna me

² Hejar (Evdirehman Şerefkendî), Ferhengî Kurdî-Farisî, Çapî Sevjom, Intişarati Siroş, Tehran-2003, r. 537 (Veguhastin: Rragiwêzan, le şiwênêk bo şiwênîtir çûn; intiqa) û Farqînî, Zana, Türkçe-Kürtçe Sözlük, İstanbul Kürt Enstitüsü yay. İstanbul-2000, (taşıma/taşımak maddeeri) s. 1103-1104

dê çî bikirana?!... Û niha ez ji dilê xwe yê xas dipirsim, gelo we kesî bihistîye ku di nava kurdan de ji "awir (nihêrîn; mêzekirin)" re "awrî", "avrî" yan jî "avrû" hatiye gotin? Camêrî hevoka "Em gihîştin rasta xwendîngeha wê û ez bi tenê hêlam, berî li derî berze bît, avriyek li min da û çû..." ji bo vê şaşîya xwe kiriye bîngeh, lê ji ber ku çavkanî ne dîyar e, lewma jî em dê nizanibin gelo Îsmet Mehemed Bedel peyveke wisan karaniye yan na? Ger karanîbe, şaşîyeke teknîkî ye, yan jî ew ne ser-wextê zimanê nivîsandinê ye, lewma? Dibe ku zimanê (qelem; pênûs?) camêrî bi xwe negeriyaye ku bikarîbe bibêje "awirek", lewma jî gotiye "avriyek", çünke li gundê me jî camêrêkî zimangiran heye, wan çendê berê di çamûrê de mabû û gazî dikir, digot "Welliiin, şalltîgê m' ketne şamûllê! (Weriin, lastîgên min ketine çamûrê!)", nexwe, ger birêz Mustafa Borak bibihîstana dê viya jî wek îdyomê bixistana Ferhenga Biwêjan û Enstîtuya Stenbolê jî helbet dê çap bikirana!...

Zimançepelî

Birêz Mustafa Borakî seranser zimanekî çepel karaniye û wisan cîhanê feş û çors radixîne ber çavan ku li gor vê ferhengê, meriv dikare sond bixwîne û bibêje, di mîletê kurd de ji binî ve ne esalet û medeniyet, ne edeb û terbîyet û ne jî nezaket heye! Ji vê cîhanê çend mînak: **"Diya Serfirazê neviyê min avpîvazî kiriye diya wî dike nake tiştêkî naxwe. (r. 13), *Remezana yekî bêbav e, ji ku hatiye û kurê kê ye ne kifş e. (r. 95), * Fazilê qebrax helbet*

germ nake. (r. 101), * *Boçika Eysa Nado lê dixure, dîsa ji pey Seyadê Kemal naqete.* (r. 164), * *Piştî wan gotinên xwe yên şeliş Mexpûle kengê ku li çav Berfo diket, wê watrê ku bi bin erdê diket.* (r. 110), * *Hezîma qîza Nîsoyê Hêlik Çortan.* (r. 123), * *Çilêya Qûnsepê wê deh boçikan ji pê ve girê bide wisa bibêje.* (r. 164) * *Dîsa qîza Kemalê Çîpxwar boçika xwe li ba dikir û hemû xortên taxê bi pey xwe dixistin.* (r. 165), * *Xatûna çî ye, hema bûye avrûya mênên taxa me.* (r. 169), *Karê wî bênamûsî jî wekî darika hewedelê tev-dan e.* (r. 170), * *Çî ye dîsa vê jinikê dawa xwe daye ser serê xwe, derketiye meydanê, ma xwediyên vê tune ne?* (231) * *Ew qas xvarinên xweş hebûn, lê Xanê ji zotikê xwe carekê jî devê xwe pê nekir.* (r. 266), * *Nizanim Derdo çî bi Gewê kiribû, diya Gewê devê xwe girt û qûna xwe vekir.* (r. 270)"

Ji vana gelek fehştir hene ku min hilnedane.

Ma ev ne listika zarokan e, ev Ferhenga Biwêjan e! Enstîtuyekê çap kiriye û dê ji milyonan kurdî yan jî kordologên ku hene û yên ku hîn dê bêne dinê re bibe referans, bibe çavkanî, bibe babeta tez û lêkolinan...

Ma ewqas hêsan e ku meriv rabe webaleke wisan bigre stûyê xwe?!...

Îdyomên ku ji Tirkî Hatine Wergerandin

Bêguman di navbera gelek zimanan de û her wiha, di navbera zimanê kurdî û tirkî de jî danûstendina peyvan, îdyoman û hwd. çêbûye, yan jî, gelek qalib di gelekê zimanan de di formeke wekhev de ne. Lêbelê dema ku tiştek bi kurdî yan jî tirkî be, meriv çawan jî bike, dîsan jî ew tişt jî

dirûv û mentiq û taybetmendiyên xwe bi eşkerayî aîdiyeta xwe bellî dike. Ji aliyê din, ger îdyomên me bi awayekî rast bêne berhevkirin û qeydkirin, tu pêwîstiya me bi îdyomên tirkan nîn e. Îdyomên tirkan di tirkî de, yên kurdan jî di kurdî de xweş in. Her wiha, her kes dizane ku gelek hêjahiyên kurdan hatine talankirin, hatine dizîn; di serî de muzîk û gelek tişt jî folklorê kurdî li zimanê tirkî hatine wergerandin...

Jixwe, talan û dizî ji karên pis ên zaliman in. Îcar, heke mezlûm xwe bizane, ew şeref û heysiyeta mezlûmiyê hezaran car jî selteneta zaliman birûmettir e, lê na, heke mezlûm jî xwe tenezulî van karên pis bike, ku bi ser jî nakeve lê rûmeta xwe dadixîne sewiyeya zalim û jixwe êdî, ew zilma ku kişandiye jî ji kîsê wî diçe! Lewma jî, diziya îdyomên tirkî belkî ferhengê stûr kiribe lê tu qîmetek nedaye folklorê me, tew di ser de jî mentiq û sistema zimanê kurdî herimandiyê!...

Îdyomên ku motemot yan jî bi awayekî xirabkirî (ji bo ku rêçê ji ser xwe bide windakirin, çewt wergerandine!) hatine wergerandin gelek in. Lêbelê ez dê wek numûne vana nişan bidim.

"Ba çandin, bahoz çinîn

Mîrov ku xerabiyekê bike, dê rastî xerabtirînê bê. * *Zû nebe jî lê gelek caran kesên ku ba biçînin, wê bahozê biçînin.* (r.65)"

Tirkiya wê:

"Rüzgar ekip fırtına biçmek: Yaptığı kötülüğün çok daha büyüğü ile karşılaşmak.⁽³⁾"

³ Bezirci, Asım, Deyimlerimizin Sözlüğü, Gendaş Yayınları, İstanbul-1991, s. 311

"Aqilê xwe revandin

bnr. Aqilê xwe winda kirin (r. 46)"

Tirkiya wê:

"Aklını kaçırmak: 1) Delirmek, deli gibi olmak. 2) Çılgınca, yersiz işler yapmak. (4)"

"Ew çi çavê diya xwe ye, ... (r.261)"

Tirkiya wê:

O ne anasının gözüdür.

İdyomeke din a balkêş:

"Baş li me nagerin, pîs jî ji me venagerin (danagerin)

Kesên baş na, lê yên xirab dev ji yekî bernedan. **Lê mixabin, baş li me nagerin, pîs jî ji me venagerin.* (r. 73)"

Tirkiya viya jî ev e: "İyisi bizi bulmaz kötüsü bizden vazgeçmez".

Jixwe, tu pêwendiya vê gotina ku şehar çocixderiyên Diyarbekirê dibêjin bi îdyom bûyinê ve nîn e, lê her çawan bûye, bi awayek gihaye ber guhê birêz Mustafa Borak, lêbelê wek ku tê dîtîn, jî ber ku wergera wê xirab çêbûye lewma jî di kurdî de tu wateya xwe nemaye û her wiha, îzeheta xwe jî, heman tişt bi du awayî hatiye îfadekirin, ewqas!

Kultura Siyasî Û Pîvanên Exlaqî

Kesin hene, ji ber ku di nav qalikê xwe yê cematbûnê de asê mane û heke kultura wan a siyasî li ser esasê fânatîzmîyê şêkil girtibe, êdî di têkilî û pêwendiyên xwe de, di xîtabkirinê de û tew di xebatên zanistî (!) de jî nikarin binhiş û refleksên xwe ji wan hisên çors û bêedeb xalî bikin...

⁴ Bezirci, Asım, Deyimlerimizin Sözlüğü, Gendaş Yayınları, İstanbul-1991, s. 30

Xebata li ser zimên û amadekirina ferhenga biwêjan karekî zanistî (ilmî) ye. Bêguman zanistî objektîvî ye, meyla xwe bi hîzb û komik û komel û partiyên siyasî û îdeolojiyan nîn e.

Ev çend mînakên li jêr derbarê kultur û zîhniyet û exlaqê siyasî yê amadekarên Ferhenga Biwêjan de fikrekê didine me, ji kerema xwe re baş bala xwe bidinê:

"Bêxêr û bêoxir bûn

Jê xerabî û nepakî hatin. *Ev Mistoyê Berzan mirovekî bêxêr û bêoxir e. Roja ku derkeve pêş mirov, ew roj reş dibe. (r. 100)"

"Berzeqî bûn

Li hemberî mezinan di nav helwestek neyînî de bûn. *Ev lawê Berzan wisa berzeqî bûye ku derdê wî nayê kişandin. (r. 93)"

Û li beramber vana jî, ev hene:

"Bêje bimire bimire, bimîne bimîne.

Tu car ji gotina yekî derneketin. *Serokê tevgera azadî ya kurd, çi bibêje ew e, bêje bimire bimire, bimîne bimîne. (104)"

"Mora xwe lê xistin

Bandor lê kirin. **Di wê pêvajoya xeter de dîsa jî Serok mora xwe li rojevê xist.* (r. 677)"

"Berzeqî bûn" çi ye, min nebihîstîye û ez nizanîm lê "Mora xwe lê xistin" jî tirkî hatiye wergerandin (damgasinî vurmak).

Em viya li vir bihêlin, *Mistoyê Berzan* ê ku li gor Enstîtuya Kurdî(!) ya Stenbolê *mirovekî bêxêr û bêoxir e* jî em bidin hilekê û her wiha, em *lawê Berzan* jî, ku li gor xwediyên vê ferhengê *li hemberî mezinan di nav helwest-*

ek neyînî de ye û derdê wî nayê kişandin
 bidin hêleke din! Lê ev peyva "Serok"
 li vir ne navekî taybet, rengdêr e. Û
 em dizanin ku di nivîsîna kurdî
 (Latînî) de bi tenê navên taybet bi
 herfa mezin dest pê dikin, ne ku
 rengdêr (sifet)! Her wiha, ihtîmaleke
 mezin li nêv kurdan bi dehan, dibe ku
 bi sedan, heta ku bi hezaran serok
 (başkan; reys) hebin. Nexwe, her kes
 rabe ji bo serokê xwe vê peyvê bi herfa
 (S) mezin binivîsîne, gelo dê tu
 qaydeyek bo nivîsandinê bimîne?

Wek Encam

Xulasa, gelek kes û sazî hene ku bi
 zimanê kurdî re mijûl dibin an jî bi
 kurdî dinivîsînin, ez nizanim derdê
 wan çi ye lê tam hay ji xwe nîn in ku
 çi dikin, lewre bi van xebatên xwe re
 hezar gelemşê û teşqeleyî dixînin nava
 zimên û edebiyata me; lîteratura me
 diherimînin û dihêlin! Jixwe, dema ku
 ziman biherime êdî tu tiştêk paqij
 namîne!...

Ev berhemên bi vî rengî siberojê
 dibin referansa şaşiyên mezintir û her
 wiha, felişîna sîstem û mekanîzmaya
 zimanê me. Û ji min re wisan dixuye
 ku sed kes (kesên bi rastî jî zana) sed
 sal li ser bixebitin, dîsan jî ez ne bawer
 im dê bikaribin vê texrîbata bûyî bert-
 erêf bikin. Niha dî roja îroyîn de ji me
 ve naxuye lê bi qasî pêncî sal bi şûn de
 ji rûyê van xebatên bi vî awayî, (heke
 axiftvanên wî hebin!) lewitîna vî
 zimanî tê ber çavê min û pê re jî girîn
 dikeve gewriya min.

Heyf ku çi heyf!...

RADYOYA KURDÎ LI YÊRÊVANÊ Û BINGEHDANÎNA WÊ- II

(Bona 50. Saliya Radyoya Kurdî ya Yêrêvanê)

Prof. Celîlê Celîl

YÊRÊVAN XEBER DIDE:

-Hevalên radyoguhdar, em dest bi xeberdana bi zimanê kurdî dikin...

Pêncî sal e her roj xeberdana kurdî ji Yêrêvanê bi peyvên "Yêrêvan Xeber dide" dest pê dike. Radyoya pêncî salî di jiyana xwe ya nîv sedsalî da şahidê gelek bûyerên girîng bûye, yên ku li dinyayê qewimîne, di jiyana gelê kurd û Kurdistanê de cî girtine. Di nava van pêncî salan da bi dehan rewşenbîrên kurd; ahil û cahil bi hev ra pişt bûne û dengê radyoya kurdî bi xurtî belavî ser hemû parçeyên Kurdistanê kirine. Her rewşenbîrek ku bi dirêjîya salan li radyoyê kar kiriye, gorî karîna xwe, bi armançekê rabûye û rûniştîye; ji bo ku xizmeta çanda gelê xwe bike, barê ku girtiye

ser milê xwe, bi serfirazî bi cî aniye. Navê van xebatkaran hêjaye yek bi yek bê bibîranin û ji ber emeka wan a rêtî em bibêjin "Spas ji we ra, bona keda we ya helal û welatparêziyê". Xebatkarê radyoyê evan bûne: Casimê Celîl, Nûra Egît Polatova, Ordîxanê Celîl, Xelîl Mûradov, Mirazê Evdo, Hamoyê Rizgo, Mîkayêlê Reşîd, Şikoyê Hesen, Emerîkê Serdar, Wezîrê Eşo, Fêrîkê Ûsiv, Sêvaza Evdo, Eznîva Reşîd, Egîtê Cimo, Ahmedê Gogê, Sîma Semend, Nûra Cewarî, Tîtalê Efo, Cemîla Celîl, Bariyê Mehmûd, Keremê Seyad, Hesenê Mehmûd, Gulîzera Casim, Lûsîka Huseyîn, Îşxanê Eslan, Cemalê Ûsiv û yên mayîn.

Pirraniya van rewşenbîran nek her tenê karkerê radyoya kurdî bûne,

lêbelê, ewana bi berhemên xwe yên giranbiha li edebiyat û zanistîya kurdî ciyê xwe yê hêja girtine.

Cewhera radyoya kurdî ew para stran û awazên kurdî ye. Dîroka avakirina vê "Fonda Zêrîn" a taybetî ye. Bi vê fondê va girêdayî gelek muzîkkar û hunermendên ku di nava gel da pirr naskirî û hizkirî ne: Efoyê Esed, Şeroyê Biro, Karapêtê Xaço, Memoyê Silo, Mecîdê Silêman, Aramê Tîgran, Egîtê Têcir, Sûsîka Simo, Mehmedê Mûsa, Ahmedê Mîrazî, Gulîzera Etar, Aslîka Qadir, Zadîna Şekir, Belga Qado, Kubara Xudo. Ji muzîkaran Şamilê Beko, Egîtê Cimo, Wezîrê Usiv, Xelîlê Evdile, Taharê Emer û yên mayîn.

Radyo, bi saya keda van dotên kurdan û camêrên ronakbîr û hunermend di nava van pêncî salên derbasbûyî da bûye xweyê nav û deng, dewra xwe ya hêja lîstîye di xwehesîn û xwenasîna gelê kurd da.

Zanyar û rewşenbîr û nivîskar ên kurd û ne kurd lêkolînên xwe ser kurdan ji bona weşandina radyoya kurdî dişandin. Ser pirsên dîrokê, ziman û êtnografyayê, edebiyat û folklorê kurdan bi radyoyê va Qanatê Kurdo, Heciyê Cindî, M. B. Rûdênko, Emînê Evdal, Ordîxanê Celîl, Karlênê Çaçanî, Celîlê Celîl, Şekroyê Mihoyî, Şerefê Eşîr û yên mayîn bi nivîsarên balkêş va pêş da dihatin. Navê radyoya kurdî ewqas bi deng bû ku li sala 1957an Prof. V. F. Mînorskî ji Londonê meqaleyêke taybetî bi zimanê kurdî bi navê "Mîdî Pêşbavê Kurdan in" şandibû ji

Qanatê Kurdo ra, wekî ew bişîne radyoya Yêrêvanê ra.

Gava xeberdan tê ser radyoya kurdî nabe ku bê spasdariya mezin keda axaftarê emekdirêj û şuhretpirr Keremê Seyad neyê bîranîn. Ew yek ji wan karmendên radyoyê yên kêr hijmar e, ku jiyana xwe bi giştî diyarî radyoya kurdî kiriye. Dengê wî dehan sala rewşa radyoyê ya geş bûye. Têkstên ku wî dixwend, him bi kurdî bûn, him baş dihatin guhdarkirin û him jî pê ra marîfeta retorîkayê, fena axaftinê hebû. Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, di rojên dijwar û teng da, wî xwe da ber ku radyoya kurdî jiyandar bimîne.

Dewra axaftaran bona radyoyê û têlêvîzyonê pirr girîng e. Bona ku radyoguhdar naveroka têkstên ku têne xwendinê baş serwest be, bandora hostatiya xwendinê, rast teqlandina ziman û zelaliya fonêtîkayê gelekî girîng in. Îro navên hemû axafter-spîkêrên radyoya kurdî divê bî ser zar. Ji axaftaran, dota kurdan a pêşîn, xanima Nûra Egît Polatova bû, paşê Eznîva Reşîd, Sêvaza Evdo, Gulîzera Casim, Lûsîka Huseyîn, ji mêran Ordîxanê Celîl, Emerîkê Serdar, Keremê Seyad û yên mayîn.

Berpirsyarê radyoyê Casimê Celîl, Xelîl Mûradov, Ahmedê Gogê bûne û nika jî Keremê Seyad e.

Pêncî sal, demeke domdirêj e. Niv sedsalek ji bona jiyana radyoya kurdî li Yêrêvanê. Radyo ji roja bingehgirtina xwe, bi taybetî li salên pêşîn rastî gele dijwariyan hatiye, lê bi serfirazî ser wan astengan ra der-

baz bûye. Asteng bi du awayî bûn: Astengên taybetî û astengên ku ji rewşa sîstêma Sovyetê peyda dibûn.

Be daxawa (mixabin) di wê demê hebûn merf ji me kurdan, bona kur-siya serokê radyoya kurdî bigrin destê xwe, astengên taybetî pêşda danîn. Wana bi dexesî dehan nameyên şikayetê ji KGB, Serokê Partiya Komunîst a Ermenistanê, serokatîya radyoyê ya giştî ra dinivîsîn, ava zelal şêlû dikirin. Car jî dibûn, ku kevir davîtin stranên me, dinivîsîn, goya hinek ji wan stranên ser axa û began in, ser dijminê sinifê xebetkaran e, yan jî digotin bi radyoyê pesnê kol-xozê nayên dayîn, behsa çêlekdoşan nayê kirin... û hwd.

Evîna mezin ber çanda gelê xwe (Casimê Celîl bi xwe distra, li bilûrê dixist), ew astengên ber perdê û pişt perdê, hêza karkirina wî kêr nedikirin.

Her tenê di nava wan neh salên ku wî di radyoyê da kar kir, bi destê wî 700 stran û awazên kurdî hatin dengnivîsandin û bûne bîngêha fonda kurdan a stran û awazên zêrîn⁽⁷⁾. Piştî Casimê Celîl, Dewrêşê Efo (2 sal), Nûra Cewarî (2 sal) bûn rêdaktore para muzîka kurdî, paşê ji sala 1967an Cemîla Celîl karê bavê xwe berdewam kir heta sala 2003an.

Hilweşîna Sovyetê xirab geriya bona çarenûsa kurdên Sovyetê. Ji

⁷ Peyva "Fonda Zêrîn" ev gotina bavê mi ya hizkîrî bûye. Pirtûkên kurdî gava sê û zêdetir nusxe dikirî danî malê, nav kaxeza sipî dipêça, bi benekî taybetî ku ji çapxana pirtûkan peyda kiribû, girêdida, ser de jî dinivîsî, "Fonda Zêrîn, bona nevî û neviçkên mi."

hemûyan bêtir rewşenbîrên kurd perîşan bûn, bê sitar û bê piştgirtin man. Radyoya kurdî jî mîna ocaxên çandê yê mayîn zeyîf û jihevketî bû. Ji saet û nîvekê dema wî kurt bû, îro gihîştîye nîv saetî, nîv saetê dinê jî dane dengê êzidiyan. Hêza pêlweşîne (moc) kêr bûye. Nika dengê radyoya kurdî nagihîje hemû aliyên Kurdistanê.

Lêbelê, radyoya kurdî zindî ye, ji ber ku dengê wî nika ser şîrît û kasêtan di nava gel da digere.

Hurmet û rêz ji hemû kedkarên radyoya kurdî ra, navê kê me hilda û yê kê jî me ji bîr kir, bira biborin.

Sal derbaz bûne, dewran hatiye guhertin. Ji Sovyeta berê her tenê bîranîn mane. Ji wê demê karê baş bi şukirdarî tê bîranîn, karê xirab bi nîfir û dilêşî. Bona ku bîranînên ser radyoya kurdî, bi taybetî ser bîngêhdanîna wê neçin wînda nebin, ji çend karkerên radyoyê yê wê demê bîranînên wan ên ser şîrîtê hatine girtin⁽⁸⁾.

1. Bîranînên Arêvîk Davtyan

Ji sala 1951ê li Radyoya Ermanîstanê berpirsîyara cabdar a para weşandina xebardana bona walatên der bûye.

Arêvîk Davtyan dibêje:

"Ez dixazim ji dûrahiya salan demê wî mîrê xas, sifetê wî xweş-mêrî bînimê ber çavan. Helbet gele


⁸ Van bîranîna Cemîla Celîl li salên 2000-2005 li ser şîrîta dengnivîsokê girtine.

dijwar e. Xeber hindik in, wekî dêmê wî mêrê layîqî pesnê bi her aliyan bidim nasandin. Bona berhevkerin, xweyîkirin, propagandakirin û dewlemendkirina çanda gelê xwe Casimê Celîl nefsa xwe bîr kiribû. Meremê wî ew bû, dengê xwe bigihîne gelê kurd ê bindest li Tirkîyayê. Timê ev bû xiyala wî.

Ez Casimê Celîl zû va nas dikim. Nav me da firqeke mezin hebû, ew emir da ji min mezin bû û em tim bi hurmet û bi qedir nêzîkî wî dibûn. Ew bi xwe xizîneyek bû. Û bûyera ku layîqî bîranîne ye, ew danîna hîmê Fonda Muzîka Kurdî bû. Wê hênê li me gele ecêb dihat, wekî bona dengnivîsara muzîka ermenîyan komê dewletê yê hazir dihatin radyoyê û gele pere ser vê yekê dihat xerckirin, lê ya kurdan komê usa tunebûn.

Em îdfî ji xaniyê radyoyê yê berê ser meydana Lênîn cîguhastî bibûn, hatibûn li vê xaniyê ser kuçeya Sayat-Nova, xaniyê ku mecalê studyoyên xwe va pîrr dewlemend bû. Rêdaksiyona xeberdana kurdî di wê demê ne ku mijxul bû, ku rêdaksiyona xwe rêk û pêk bike, lêbelê, çawa dibêjin, rûnê xwe da diqijilî û fonda muzîkayê ava dikir. We ra rast bibêjim, wê hênê femdariya rêdaksiyona kurdî tunebû, her Casimê Celîlek hebû.

Temamiya kurdên Ermenîstanê ser rûyê dinyalikê her Casimê Celîl nas dikirin. Ji wan ra ew her tişt bû. Li wê rêdaksiyona nûbişkivî da, ku îsal 45 saliya wî tamam dibe, ew him serkarê wê rêdaksiyonê bû, him berdestî bû, him rêdaktor bû, him



Casimê Celîl û dota wî
mûzîkar Cemîla Celîl (Sal: 1961)

meqaledar bû, him meqala werdiğerand, him mîrze bû, ji ber ku têsxtan bi destnivîsar dixwend û bi van giraniya xebatê, ewî pê ra digîhand fonda muzîka kurdî ava bike, stranan binivîse. Lê ser sazkirina fonda mûzîkayê hinekan, nizanim çawa bibêjim, merivên bêaqil û nezan, bi şikayat digotin, ev çi kar e, çûye ji serê çiyê meriyek girtiye aniye... Lê kirinên Casimê Celîl, bi teybetî wê hênê, dema Şahên Tatûryan berpîrsiyarê xeberdanê bona walatê der bû, pîrr mezin bû, pîrr girîng bû. Xeberdanên kurdî pêşiyê 15 deqîqe nek tenê ji bona bineliye Ermenîstanê dihatin waşandin, lê usa jî bi pêla kurt diçû ber bi Rohilata Nêzîk û Navîn, radyoguhdar gele gotin û xwestinên qenc ji me

ra dinivîsîn. Name bi erebî dinivîsîn. Ew name-na hatine xweyîkirinê yan dane Casimê Celîl, nizanîm. Zanim, wekî qanûna dewletê bû, ew arşîvan mehê carekê berhev dikirin, mor dikirin dişandin arşîvê. Ew namana şadetiyeke bêhempa bûn dereca kar û barê Casimê



Dehol Memoyê Sedo, zurne Şamilê Beko, zurne Şeroyê Biro Sala 1936

Celîl da û ne bêbingeh bû ku zaroyê wî, her du kurên wî, du dotên (keç) wî riya bavê xwe dane pêşiya xwe. Hergê zanyariya akadêmîk bavê wan ra tunebûya, ewî nikaribû zaroyên xwe bianya ser vê rê.

Du kurê wî xwendina bilind standine, doktor in, bi zanyarî, bi helalî xwe pêşkêşî lêkolîna pirsên filologiyê û yên tarîxê kirine, helbet bi maştabên fire. Mala Casimê Celîl dereca çanda kurdî da kar û barê mezin kiriye. Hema em tenê navê kitêbên dota (keça) wî Cemîlê yên çapkiri hildin, yên ku ewê ser stranê kurdî nivîsîne. Cemîle, xwendina xwe Konsêrvato-riya Ermenîstanê ya Dewletê stan diye. Bi gilîkî zaroyê wî ji bavê derbaz bûne. Lê Casimê Celîl heta bîna dawiyê nek tenê zaroyê xwe ra bav bû, lê ew wana ra usa jî dersdar bû. Wê malbatê da wana ser pirsên zanyariyê da timî şewra xwe hev ra kiriye. Hinekî dostaniya min wê malbatê ra heye. Cemîle, hevala min ya salan e. Ez wê rind, zaf rind nas dikim. Dostê wê malê bû usa jî zanyarê folklorî ermenîyan doktor Artaşês Nazînyan, yê ku diaxivî,

meha Oktobira (cotmeh) sala 1999an çû ser dilovaniya Xwedê.

Radyoyê da gava me komê kurdan bi kumê mezin ser serê wana ber radyoyê civiyayî didît, ew gundiyan ku ji serê çiyayê Elegezê def û zurne destê wan da dihatin, me hinekî bi qerf ser wana dinihêrî û em bi pozê xwe da dikenîyan. Casimê Celîl ji ku wan peyda dikir? Çawa digeriya û didît? Dêmek serê wî de her ew fikr bû ku stran û awazên milletî xilas bike. Ew karekî mezin e. Û ez, wek qîza folklorîst û zanyara çanda ermenîyan sêrîne vê pirsê da kirinên Casimê Celîl rind fam dikim û qîmetê didim. Û ya here seyr ew bû ku Casimê Celîl maşûqê stranên gelêrî bû. Carna dikete mitala û ber xwe diket gava stranên ermenîyan, îlahîm stranên Ermenîstana roava dibihîst. Û carna gava hinek pirsên hucetê pêş da dihatin, ewî digot, "De zanin çi, em her du cimet cimetine cînar in, dostê hev in, gele sala em rex hev jiyane..." diya min jî usa digo. Niha Casim ber çavê min e...

Em gerek bîr nekin nimûnê

helaliya Casimê Celîl. Mesela 7-8 xebatkarên me berev dibûn diçûne bal Şahên Tatûryan⁹ şikayat ser Casimê Celîl, digotin: "Ev çi hal e, ewana muzîkkarên profesyonel nîn in. Şahên Tatûryan caba wana dida, digo, komê wan ên profesyonel tunene, evî camêrî diçe, diçirçire, digere dengbêj û sazbandan bi çetînayî tîne tê, parçê sazbandiya gelêrî ji windabûnê xilas dike, hema bona vê kirinê lazim e em ji Casimê Celîl pîrr û pîrr razî bin. Çima em ha kirina wî bêqîmet bikin?" Ji kurdên we jî hinekan bi şikayet û kirinên neqenc dixwestin riya Casimê Celîl bigirtana lê ew ne mumkin bû. Ez rast divêjim Şahên Tatûryan bi heqî, mêrkanî piştî Casimê Celîl digirt. Pey Şahên Tatûryan dewsa wî profesor, filosof Xirlopyan hat. Ewî ber meriyan dikeniya lê alîkarî nedikir. Wê hênê Casimê Celîl nedixebîf.

Şahên Tatûryan digot, "Em gerek stranan binivîsînin çiqas dikarin, çi ku Casimê Celîl dike. Û Casimê Celîl diçû dengbêjan dianî, dibire mala xwe nan, av, xwarin, ciyê razanê dida wan, ceribandina stranan li mala xwe dikir. Dengbêjan du-sê roj, hergê lazim bûya heftêk mala xwe da xwedî dikir, çinke ji gundê dûreke dihatin. Mêrê mîna wî, ku bona gelê xwe usa xwe pêşkêş bike, usa rehî û helal be, niha kêr hene, diha rast tunene. Destê wî da kêr bû, lê ruhê wî bê kener bû. Merivê mîna Casimê Celîl xasên ji milkê merivatiya cîhanê ne. Ewana ne

bi gotin lê bi şuxul, bi helalî xizmet dikin bona dostiya gelê dinyalikê. Meriyê usa gerekê nava miletan da hebin û ser meriyê usa divê biricifin. Û ez şa me ku ewladê Casimê Celîl dereca zanyariyê da û bi xeysetê xwe va bûne peyhatiyê bavê xwe yê hêja. Tu çilkeke nasyonalmê nava wan da tuneye, lê heye serbilindî bona gelê xwe. Û ew ji Casimê Celîl, ji bermaliya wî ya qedirbilind Xanima Cindî tê, ya ku şikir zindî ye."

Axaftina bi kurdî li radyoyê pêşiyê 15 deqîqe bû, lê zûtirekê, salvegerê da ew bû saetek, saetek û nîv. Dirêjîya dema axaftinê heta gihîşte saet û nîvekê, ev hema usa bi hêsanî dest neketiye. Tê de hêz û hereketa berpirsaryê wê Casimê Celîl hebûye. Ser vê mijarê çêtir merivên wê demê şedetiye didin. Arêvîk Davtyanê berdewam dike, "Demekê, wexta Casimê Celîl tik û tenê karê xeberdana radyoyê 15 deqîqe dimeşand, ewî hêdî-hêdî wextê xeberdana kurdî zêde kir heta saet û nîvekê. Ew prob-lêmeke mezin bû bona radyoyê bi temamî. Wext, deqîqe radyoyê da pîrr bi nirx bû, dest nediket, em bin bandora Moskovayê bûn. Tê bîra min hêna serokê radyoya Ermenîstanê Ayvazyan Hakob Rafayêlovîç da bû. Demeke çetin bû. Casimê Celîl ra diketine hucetê, lê bi kurahiya xwe va ew hucet hucetine bê kîn, bê ziyar bûn. Casim, ku tu kesî ra xebereke tahl, xebereke tîrş negotibû, pîrsa wadê zêdekirina weşandina xeberdana kurdî da, xwestinên xwe da dibû yekî hişk û ji gotinên xwe tu car paş

⁹ Şahên Tatûryan wê demê radyoyê da serokê para xeberdanên ji bona welatên der bû.

va nedikîşîya. Hema dibû civata organîzasyona partîaya radyoyê, di civînên partîayê da problêmên wade nedihatine enenekirin, pirsên usa nedihatine lênihêrin. Ew wade, ew saet îdî hatibûne parvekirin. Lê Casimê Celîl di civatên partîayê da jî radibû gîlîk, dudu ser pîrsa wê rojê digot û xeberdan dîsa dizivirand ser problêmên xwe, ser kul û derdê cimeta xwe. Yanê 2-3 deqîqe jî digot ser xeberdanê para kurdî zêde bikin, hine wextê rêdaksiyona me jî zêde bikin. Em gişk bi kêf şa dibûn û bi sidqê qenc dikenîyan, wekî Casimê Celîl tu mecal û momênt destê xwe bernade, wekî wextê xeberdanê para kurdî zêde bikin. Nizanim, hizkirin, hurmet, siyanet hebû ber bi Casimê Celîl û me wî dibexşand. Kirinên wî, xwestinên wî me ra famdar bûn, ku em ermenî jî dikarin xwe usa pêşkêşî gelê xwe bikin çawa Casimê Celîl bû. Me hêdî-hêdî wadê xeberdana rêdaksiyayê zêde dikir, îlahîm cejnan da. Casimê Celîl digot, "Ez nikarim wadeke usa hindik da xeberdana xwe biweşînim, min ra wext hindik e!" Tê bîra min ji Moskovayê komîsyon hatibû Yêrêvanê şuxulê me dinihêrî, me kontrol dikir. Komîsyon berk bû, hemû kirinên me da nasyonaltîzm didîtin. Tatûryan gazî me kir, got "Di riya Xwedê, usa bikin Casimê Celîl pênehese wekî ji Moskovayê komîsyon hatiye, bikin ku ew neyê civatê. Te hew dît..." Belê me didît, wekî Casimê Celîl hemû civatan der radibû jî derd û kulê rêdaksiyona xwe xeber dida..."



Egîte Cimo, mûzîkar(Salên 1950-1960).

2. Bîranînen Egîte Cimo

Sazbendê kurdan ê bi nav û deng, ji sala 1955an xebatkarê radyoya Emênîstanê bûye û ji roja roj da xwe radyoya kurdî va girêdaye.

Egîte Cimo dibêje:

"Sala 1955an bû, ez rojekê hatim malê, pryomnîka⁽¹⁰⁾ min hebû, min jî ew pryomnîk tim dida ser Îraqê. Xeberdanên Îraqê yên kurdî gelek bi min xweş dihatin, kilamên wana ji min ra hewaskar bûn. Min rojekê pryomnîka xwe pê va kir, nişkê va, ji cem me kurmancî hate xeberdanê. Dengê Ordîxan, Nûrê Polatovayê bû. Paşî hingê jî em bibêjin 15 deqîqe bû wadê wê. Kilam hate dayîne, dengê Egîte Têcir û bilûra Taharê Emer, ki-

10 Radyoya bêtêl.

lama "Xecê û Siyabend" bû. Tê bîra min, gelek, pirr bi min xweş hat. Min jî xwe ra go, 'Camêr, eke radyo jî kurmançî xeber dide û kilamên me didel...' Ez nizamim çî cûreyî şa bûm. Wê êvarê heta sibê ez hema usa duşurmîş dibûm. Min go, ez gere herime radyoyê, kanê em bêjin ew xeberdan çawa tê hazirkirinê. Ez xwe bi xwe jî sazband im, dikarim gele miqamên sazbandiyê lêxim.

Ez sibetirê rabûm, dûz çûme radyoyê. Ez çûme radyoyê, min pirs kir, para kurdî kî derê ye? Gotin, 'Para kurdî qatê sisêya ye.' Ez çûm, min derî xist, Apê Casimê rehmetî derî vekir:

- Xortê delal, kerem ke. (Ez çûm.)
- Kerem ke rûnê. (Ez rûniştim).

Min go:

- Bibexşînin, ez jî sazband im. Min di radyoya vira, kurmançî bihîst, gele şa bûm. Ez jî dikarim sazbandiyê bikim, lêxim. Sazbandiya min jî wê kêrî we bê.

Go:

- Kerem ke, em jî hema merivên mîna te digerin.

De Apê Casim jî merikî laqirdçî bû. Me hinekî xeber da, virda-wêda, xulase Apê Casim ez teklîfî radyoyê kirim.

Go:

- Tu gere bêyi, dengbêjên me hene, sazbandiya te heye, em gere studiya hildin dengê we binivîsîn (qeyd bikin), pê radyoyê bidin.

De ez jî pirr şa dibim, dengê min dê li radyoyê derkeve, li dinyayê bela bibe.

Xulase, li wê rojê jî min dest usa pê kir. Eleqetiya min û Apê Casim zaf rind bû, orta me xweş bû, ez teklîfî

mala xwe kirim. Wî gele wexta, çawa dibêjin, sazband dianîn, dibirin. De cî tunebû bona cêribandinê, di mala Apê Casim da me cêribandina xwe hazir dikir. Apê Casim wade hildida, me diçû dinivîsî.

Usa, em bêjin salek, dudu, sisê, çar, pênc, xulase çend salan hema usa mijûl bûn, dengê min radyoyê dihate dayînê, ez jî firnax dibûm, wekî dinya dengê min dibihê. Min jî têra qeweta xwe komekê (alîkarî; yarmetî; ardim) dida Apê Casim.

Apê Casim roja radyo vekirin, heta kutasiya emrê xwe hîmdarê radyoyê bûye. Hîmdarê sazbandiya radyoyê bûye. Eke em nişkê va bihatana, kilam, miqam hazirkirî, stûdya nedana Apê Casim, Apê Casim diçû şerê teva. Ew temam zanê da, ermenî xwe bi xwe jî wê temam zanê da. Digo, 'Çawa, divê, eke dengbêjê me, sazbandê me ji gunda hatine, ji çiyê hatine, niha em çawa dikarin paşda bidin. Gere hûn zapîsê⁽¹¹⁾ xwe derxin yê me pêşiyê binivîsîn'. Usa jî dihate nivîsarê.

De îdi orta min û Apê Casim gele xweş bû. Apê Casim go, 'Tu dikarî îdi cem me bixevitî, kar bikî'. Hilbet, em bêjin mecalê ştatê⁽¹²⁾ tunebûn. Hetanî 9-10 sala çawa wî cûreyî ez diçûm-dihatim. Honarara⁽¹³⁾ min ra dinivîsîn, min mal da distand. De ew jî hindik.

11 Zapîs: Peyva rûsî ye, yanî, dema dengnivîsandinê.

12 Ştat: Kursiya kar di dayrê de.

13 Dirava pêş kedêke rêti.

Apê Casim paşê teşkîl kir, go, 'Egît, gere cem me bêyî hildanê ser kar'. Ez usa jî ketime ser xebatê, pêşiyê niv ştat dane mi bona sazbandiyê, paşê jî niv ştat opêretoriyê dane mi. Eva tamam bi hunerê Apê Casim bû.

Çaxê em diçûne mala Apê Casim, mala Apê Casim heke ne ku tenê hîmdarê radyoyê, usa jî em bêjin çîqa xwendkarê walatê derekê; ji Îraqê, ji Îranê, ji Sîrîfaê, ji Turkîyayê vira Ermenîstanê hîn dibûn, timê danî mala xwe, mala xwe da cî-war dikir, guhdariya wî ser wan bû. 'Em kurd in, timam yek in, birê hev in...' Eva gotinên Apê Casim bûn. Timê em mala Apê Casim da van xwendkara ra dibûne nas. A bi vî cûreyî ew maleke usa emekdar e, ne ku tenê sazbandiyê da, lê usa jî emekdar e, çewa mala pêşin bi hizkirin û bi zanîn, ku em kurd in, gere dereca walatê xwe, sazbandiya xwe dewlemend kin û hemû dereca da. Usa jî em bêjin mala wana tamam xwendekar; Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Apê Casim. Nivîsarê wî van paşwextiyê ez dixûnim, kitêbê wî, dîna xwe didimê, mi gele kitêbê mayîn jî xwendine, lê kitêbê Apê Casim qîmetlî ne. Em bêjin şiyêrê wî, nivîsarê wî vekirî, erke çî cûre hebe tamam, çewa em bêjin ji bîna ruhê cimeta me derketiye. Meriv çawa gerekê qîmet neke emekê Apê Casim, bona hemû dereca da, îlahîm aliyê sazbandiyê da, ew tamam emekê Apê Casim e.

Hîmdarê radyoyê, Apê Casim, komandîrovke⁽¹⁴⁾ dida mi ez diçûme

gunda, mi dengbêj dibijartin danî mala Apê Casim. Me cêribandina xwe mala Apê Casim da hazir dikir. Em dihatin. Apê Casim îdî derengî nedixist, digot, tenê hûn hazir in? Tu bona stûdyayê duşurmîş mebe. Eke stûdyaya zanî (mejxûl) be jî, wê sehetê Apê Casim pêşiyê digirt, digo, 'Na, cimeta me, dengbêjê me hatine, gere bê nivîsarê'. De îja ewa heseb ke, em bêjin ne kilamek e, ne dudu ye, eva heta hezar, du hezar kilamî, fonda radyoyê. Eva tamam vî cûreyî hatiye nivîsandin. Bi qeweta, merîfeta Apê Casim tu wexta em zadêrjke (eglekirin) nekirine, hizkirin hebûye. Ez dikarim meselekê bêjim. Apê Casim carekê dema zapîsê hilda, mi gerekê tenê miqama lêxista. Îskoyê rehmetî defçiyê mi bû, egle bû. Ez ser kuçeya Ginûnî dimam, nêzîkî radyoyê. Apê Casim hate mala me. Ez hinekî, weke 10 deqa derengî ketim. Mi dîna xwe dayê Apê Casim hate malê. Go:

- Lê em hîviya we ne, me stûdiya hildaye!

Mi go:

- Apê Casim, hazir im, hîviya Îsko me.

Îsko jî hat. Xulase em rê ketin.

Hatine radyoyê. Defa Îsko jî defeke mezin bû, rast mala Xwedê, Apê Casim def avîte milê xwe û kete orta şoşê da⁽¹⁵⁾, nek ser trotvarê (peyarê). De Apê Casim merîkî maqûl, galûs - tûk (grafêt), sîlîndir, niha cimeta lê dinêre. Camêr, eva merîkî ha, ew çî defeke mezin avîtiye milê xwe, orta rê da diçe? Ez jî divê, 'Apê Casim, tu çima defê nadî Îsko, tu merîkî

¹⁴ Çûyina derekê bi armanca karê resmî.

¹⁵ Riya erebeyê/seyareyê.

maqûl î, bira Îsko defê hilde, ew defa mezin te avîtiye milê xwe, ne baş e!

Go:

- Na, kurê mi, defa me mezin e, em jî mezin in; miletê me jî mezin e, kurd jî mezin e!

Usa def hilda heta hema em hatine radyoyê. Radyoyê jî hilkişya stûdyayê. Eke tenê cimê bizanibe wekî Apê Casim, hizkirina wî dereca sazbandiya xwe de çi cûre qîmet dike, defa defçî jî hildida."

3. Bîranînên Karapêtê Xaço

Dengbêjê bi nav û deng dibêje:

"Gelî xelqê kurmancê zane, heke file be, heke bisilman be, heke êzidî be. Roja ewilî, gava çûme radyogomîdê, şuxulê dewletê, ewilî ewilane çûme mala Casimê Celîl. Zêdî wî pêştir kesek tunebû radyogomîdê de. Mezin ew bû. Wî naka asasê wî danî. Ewî şuxul çêkir û xelqê civand, dengbêja, heke kî hebû, kî tunebû temama anî, dengê wî stand, da xelkê. Temamî ewilê ewilan ewî camêrî kir. Ewê ku dibêjin pişt ra, ew başqe bû, hîmkê⁽¹⁶⁾ wî, ewil, asasê wî Casimê Celîl danî. Rehma Xudê lê be. Ewîlî mi wî nas kiriye, ewî jî mi nas kiriye, zêdî wî pêştir evê din tunebûn, kesekî din tunebû. Mezin ew bû. Ewî radyogomîdê çêkir û para wî ew bû, para kurmanciyê ew bû. Û welle me jî çend kilama got, ewî jî dida dinyayê. Stranê ewil mi "Zembîlfiroş" gotiye."

(Karapêt dest bi strana Zembîlfiroş dike.)

Kurê wî navbiriyê dide û bi zimanê ermenî dibêje:

"Bavê mi gilî dikir, gava dihate radyogomîdê bistirê, mala Casimê Celîl da dima. Du kurê wî hebûn Ordîxan û Celîl, ji bavê mi pirs-pirsyara dikirin û stranên wî jê dinivîsin".

Paşê Karapêt dixwaze wekî gotinên wî cî bigrin, ji wî bawer bikin, dîsa dibêje:

"Gelî cimeta, ez rastgo me, yanê tiştê ku ez zanim zêdeyî kurmancî tiştêk nizanîm. Mi ewilî ewilan, vêga go, gava ev radyogomîdê li welatê ermeniya da çêbû, Casimê Celîl, zilamekî şande pey mi, ez çûm. Hema ez feqîr bûm, banvor [karker] bûm, çûm. Çûme mala wî camêrî. Ewî ez birime radyogomîdê. Welle radyogomîdê ewî çêkir. Hingê yekî din tunebû. Pişt ra ewî camêrî şuxulî, ewî camêrî çêkir, timama ewî kir. Û heyra, em diçûne radyogomîdê, ji xwe pê ra, e diçûm, êvarê jî dihatim mala wan radizam. Mi nanê xwe jî li wir dixwar, şevbihêriya xwe jî li wir derbaz dikir, em mijûl dibûn weke edebê dinyayê. Û Casim bû, kulfeta wî Xanim bû. Bi hizra Xwedê her du jî ji mi mezintir bûn. Belkî Xanim weke mi be, lê Casim ji min mezintir bû. Û lao, me bi hev ra xeber dida, me şevbihêrka xwe derbaz dikir. Em kurmancî mijûl dibûn, zêdeyî kurmancî tiştêk bal mi tunebû. Her du kurê wî jî, Xwedê wan bihêle, Ordîxan û Celîl, her du keçikê wî jî

¹⁶ Hîmk: Peyveke ermenî ye, yanî bingeh, hîm.

eva Cemîle, eva jî Zînê, çûçik bûn. Me bi hev ra derbas kir, me hev nas kir, pêncî salî me hev ra derbaz kir.

Rastî, ez zû va neçû-me mala wana. Ez zanim mala wana kû ye. A hira-ba ragê (meydan) dikevî jor, aha diçî, ne usa? Zêdeyî mala wana kesî mi tunebû. Mi kesî nas nedikir ez biçûma wira.

Kesî mi nas nedikir. Na! Kurmancî dibên, bi xêra laoqa (helaw). Bi xêra wînakî [bi xêra Casimê Celîl] ez jî bûme dengbêj, bûme naskirî nava kurda temama da. 05. 02. 2000, Sovxosa IV.

4. Bîranînên Varûjan Voskanyan

Rojnamevan û xebatkarê radyoya Dengê Ermenîstanê dibêje:

"Navê Casimê Celîl hê di biçûktiya xwe da mi li Gurcistanê, kê derê ez ji dayka xwe bûme, ji radyoya Ermenîstanê bihîstiye. Ew şayîr, zan-yar û berevkirê zargotina kurda bû, dostê ermeniya û Ermenistanê bû. Pêşiyê wî jî mîna ermeniyê ji Ermenîstana roava ji ber şûrê Romê xilas bûyî koçber bibû. Ewî hêsîriya ermeniya û êzdiya rojê buhurî da dîtibû, ewî bi ruh û can xwe pêşkêşî mehkemkirin û qewînkirina dostiya ermeniya û kurda kir. Mîna bava nêzikî xortê kurda û ermeniya dibû. Ewî timê şêwrê qenc dida wana, ku bi biratî hev ra bijîn, bi biratî berbîr



Casimê Celîl tevî karmendên radyoyê, ji destê çepê H. Badalyan

hevdu bin, komekê bidine hev, ku dostaniya me her du cimeta diha qewîn be.

Çewa mi go, Casimê Celîl, rewşenbîr, şayîr û zanyarê zargotina kurda bû. Ewî tevî zanyariya zargotinê, alîkariya berevkirina, lêkolîna, rêdaktorîkirin û çapkirina zargotinê kiriye. Bi van kirina xizmeta Casimê Celîl xilas nabin. Ew kesê pêşin bû, ku hewa Ermenîstanê da xebera kurdî weşand, yanê ew bû hîmdarê radyoya kurdî li Ermenîstanê. Hemanî sê sala ew tiktenê xebardane radyoya kurdî diweşand û pê ra jî fonda muzîka radyoya kurdî danî. Û îro, gotinê mi her rastî ye, ez venaşêrim, gava rêdakşyonê xebardane para kurdî û yê êzdiya weşanê xwe da ew fonda behra bêbin propaganda dikin û bikar tînin, ew keda Casimê Celîl e.

Casimê Celîl merîkî xwedî rehm û destfire bû, merîkî hevalhiz û mirovhiz bû, çawa divêjin, ew biçûka ra biçûk bû, mezina ra mezin bû. Ew bû, wekî kurd û êzdî, usa jî ermeniyê

ku hema carekê wiya bidîtana pê ra dixevitîn, berbirî wî dibûn çawa dostekî zû va, zef zû va, çewa merikî gelekî nêzîk, wek pismamekî û hogirekî.

Casimê Celîl emrekî dirêj kir, lê rind dibû diha dirêj bijiya, wekî hereketa xwe, zanebûnên xwe diha dirêj gelê xwe ra, gelê me ra bikar baniya û mîna çirê zimanê kurdî û dewlemendiya çanda kurdî pêşkêşî gelê xwe bikira. Bi cûrê xwe, bi karîna ku her Casimê Celîl "Casimêabar (Casimane)" dikaribû dostaniya cimeta bide hebandin û propagandakirin.

Dostaniya êzdiya û ermeniya, eger wana serpehatiya xwe da karekî jî nekiriba, wana ew dostanî şerê Deşta Sardarabadê da, himberî eskerê Romê yê bi telîm û tertîb wergirtî da xuyakirin. Siyarê Cangîr Axa û şervanê ermeniya tevayî ew serketin mor kirin. Meriv dirêj dikare ser rehmetyê Casimê Celîl da xever bide, giliyê xweş bêje, lê em gerekê bîr nekin û carekê jî bêjim, wekî "Fonda Zêrîn" a muzîka kurda, ku ewî damezirandiyê, gelekî ferz e û kêrhatî ye. Hergê bi radyoyê her maleke kurda, her maleke êzdiya jê feyde distîne, wekî usan e, meremê Casimê Celîl miyaser bûye. Xebatçiyê radyoya Ermenîstanê ew fond navkirine "Fonda Casimê Celîl". Rehme li wî mêrê dilfire, mêrê mezin, mêrê aqil, dostê me yê bi qedir, bi hurmet, şayîr û zanyar Casimê Celîl be. Gotinê mi wê nivçî bima, helbet çiqas jî bêjim hemû nikarim bêjim, hergê mi negota wekî

Casimê Celîl nek tenê bajarvanekî pêş bû, çawa ermeniyê roavayê divêjin, "Xwendî, zanyarê edebiyatê û çanda gel bû, lê ew dikaribû bibiya nimûne". Mal da ew bavekî zêde bû. Eva gotina mi kirinê zaroyê wî îsbat dikin. Her du kurên wî bûne doktorên tarîx û edebiyata gelê xwe vedikolin. Lê Cemîla me ya hizkirî, qedirgiran wextê da bû alîkar û piştovanê bavê xwe. Ewê, wek ez zanim, yek ji wan kurdan bû ku li Konservatoriya Ermenîstanê ya Dewletê xwendina xwe ya muzîkayê bilind stand û niha jî kar û barê bavê xwe, eva bû 33 sal, li radyoya kurdî da dimeşîne û ji radyoya Ermenîstanê muzîka kurdî radyoguhdara ra pêşkêş dike.

Mi got, wekî Casimê Celîl dereca hazira da gelekî xemxwur bû. Ewî firqî dananî eva ermenî ye, eva kurd e, eva ûris e... Ew her aliya da camêr bû, her aliya da înternasyonalîst bû û eger yekî xwendî, nexwendî pîsekê va berbirî wî biya, ew cî bi cî nek tenê caba pîrsa wî dida, yanê jî alîkariya wî dikir, lê usa jî hergê rêwî bû, ne bineliyê bajêr bû, dibire mala xwe hurmetê jê ra dikir, siyanetê jê ra dikir û paşê oxira xêrê jê ra dixwest. Hergê perê riya wî jî tunebû, perê rê jî dida. Ez bi xwe şede me. Ewî tim şêwr dida xortê kurda, rêdaktoriya nivîsarê wana dikir û piştovaniyê li wana dikir, ku nivîsarê wana çap bibin."

5. Bîranînên Emerîkê Serdar

Rêdaktorê rojnama *Riya Teze*, rewşenbîr, nivîskar û rojnamavanekî emekpîrr.

Dibêje:

"Me cahila Apê Casim ra, Casimê Celil ra digot 'Apê Casim'. Eva ne tenê qedirgirtina emrê wî mezin bû, lê usa jî qedirgirtina wî, emeka wî bû, ku ewî salê sîhî da dest pê kirî hetanî dawiya jiyana xwe bona lîteratûr û çanda kurda rêtibû. Hela salê sîhî da Apê Casim kete nava goveka lîteratûr û çanda kurdê Ermenîstanê, ew jî bû hîmdarekî lîteratûra kurda yê teze, çanda kurda ya li Ermenîstanê.

Gava salêd hezar neh sed sîhî li Yêrêvanê têknîkoma kurda ya pişt Qavqazê ya pêdagogiyê vebû, Apê Casim bû dirêktorê wê yê pêşin. Pey wê derê ra gava neşireta Ermenîstanê ya Dewletê da para neşirkirina kitêbên kurdî vebû, Apê Casim serkarî li wê parê kir û bi seda kitêbê dersa, yê bedewetiyê, tercume da çapkirinê.

Emekeke Apê Casimî mezin jî ew bû, wekî ewiya ne tenê rêdaktoriya berevoka folklorê kurda ya mezin a sala 1936a kir, lê usa jî alîkariya gelekî mezin da çapkirina wê kitêbê.

Ya dinê. Emeka Apê Casimî mezin ez wê yekê hesab dikim, wekî ewî hela salê 30î da xerîtê bi zimanê kurdî dide çapkirinê û ez niha bawer nakim, wekî çikî mayîn ew xerîte hebin, xên ji arşîva Apê Casim, wê derê ew tê xweykirinê.

Ji salê sîhî da des pê kirî hetanî nîveka salêd 60î Apê Casim bi aktîvî tevî hazirkirin û neşirkirina berevokê şair, nivîskarêd kurdê Ermenîstanê bûye. Ji ya pêşin da girtî hetanî bawer bikî ya dawiyê.

Usa jî salêd sîhî da Apê Casim nek tenê bi efrandinêd xwe yê bedewe-

tiyê pêş da hat, lê usa jî ewî gele afrandinêd şayrê ermenî û ûris tercimeî kurdî kir û da çapkirinê. Hema berevoka serhatî, şiyêr, poêmê Pûşkîn, ku bi tercima Apê Casim neşir bû, dawiya salê 1940î, xweber şedetiya gele tiştî dide.

Ez hûrgilî xeber nadim derheqa efrandinêd Apê Casim ê bedewetiyê da, çimkî ew têmeke gelekî mezin e û lêgerinê mezin lazim in, bona karibin temamiya kemala efrandinêd Apê Casime bedewetiyê bînine ber çava. Ez ê tenê êpîzodekê bînim, wekî xweber şedetiya gele tiştî dide.

Xwendevanê me rind zanin, wekî cimeta ermenî xweyê tradîsiyêd lîteratûrîê yê dewlemend e. Lîteratûra wan ji qurna pêncê da dest pê bûye û heta roja îroîn heye. Wekî usan e, qîmetkirinê lîteratûrzanê ermenî, çewa dibêjin, ew giliyê badîhewa nîn e.

Tê bîra mi, hela ezî xwendkar bûm, gava dersdara me ya lîteratûraê doktora ulmê filologiyê, profêsor Arşalûys Babayanê wextê dersê, wexta gilî hat ser lîteratûra cimetêd diniyaê, ewê meseleke şiyêreke Apê Casim anî hat, "Dezmal" û ew hesab kir çawa şiyêreke kilasîk e.

Wekî usan e, eva qîmetkirin nek bi devî lîteratûrzanê kurdên teze pêşdihatî tê gotinê, lê bi devê lîteratûrzanê ermeniya ya gelekî eyan dihate go-tinê. Û eva xweber şedetiya dide derheqa kemala efrandinêd Apê Casim ê bedewetiyê da. Ez îda derheqa wê yekê da navêjim, wekî hema berevokeke Apê Casim ya şiyêr û poêma neşir bû, her tişt alîkî danî, gelekî nêzikî dilê min e, sernivîsara wê, "Kofiya Diya Mi". Eva ruhê kurmanciyê tamam hema nava wê

xeberê da tê gotinê: Kofîya Diya Mi. Ji wiya zêdetir bawer bikî mi tu tişteki maîn nedîte. Ez îda navêjim derheqa wan berevokê Apê Casim ên bi zimanê ermenî, kurdî, rûsî, bi zimanê avropayê mayîn da çapkirî.

Gava efrandinê Apê Casim bi berevoka neşir dibûn bi zimanê ermenî, rojnamên ermaniya da rêsênziyae gelekî giranbiha, gelekî qîmetlî dihatine çapkirinê.

Apê Casim, bextê mi lêdaye, wekî sê sala mi tevî Apê Casim radyoya Yêrêvanê ya kurdî da kar kiriye.

Êz zanim, wekî Apê Casim bûye hîmdarê, bîngêhkirê xebêrdanêd radyoya Yêrêvanê ya kurdî. Ew sero-kê wê yî pêşin bû û ez zanim, wekî ew fonda niha dengxana Radyoya Yêrêvanê ya sazbandiyê da tê xweyî-kirinê, para kurdî, kilam, miqamê kurdî, ew bi saya Apê Casim hatiye sêrî. Ewî kir, ewî dest pê kir, ewî da dewlemendkirin. Û mi xwe-xwe ber çavê xwe dîtiye, wexta dengbêjek, sazbandek dihatê radyoyê, Apê Casim çi cûreî berbirî wana dibû, ça dilovan, ça xêrxaz, ça bira-pismam rê nişanî wan dida. Xwe-xwe fîqeke gelekî rind lêdixist. Wexta sazband lêdixist, cîkî yan şaş dikir, yan şaş diçû, Apê Casim dida sekinandinê û digotê wekî çi cûreî gerekê bê kirinê.

Bona her miqamekî, bona her kilameke kurdî Apê Casim diqicqicî.

Rind tê bîra mi rehmetyê Ahmedê Mîrazî, wekî emir da îda mezin bû, wextê da dengbêjekî gelekî eyan bûye, hat radyoyê û kilamê wî nivîsîn. Rast e dengê wî îda ketibû, emrê wî îda mezin bû, lê Apê Casim ser wê qutiya şîrîta dengnivîsara Ahmedê Mîrazî nivîsî, "Fonda Zêrin, destê xwe ned-

inê, gere bê xweyîki-rinê!" Û ez çiqas fem dikim gerekê awqa merîfeta xebatkarê radyoyê hebe, rastî jî ewê Fonda Zêrin vî cûreî xwey kin.

Apê Casim usa jî xebatçikî mexlû-qetiyê yê gelekî aktîv bû. Nava emrê kurdê Ermenîstanê da tu qewimandineke usa tunebû, wekî Apê Casim tev nebiya. Tê bîra mi salên 90î gava rojnama me *Rîya Têze* çap nedibû û me dîwanê ra name dinivîsî, şikyat dikir, gazinê xwe dikir, hîvî dikir, Apê Casim ji wan meriva bû, yê ku pêşiya gişka bin wan kaxaza da qol dikir, wekî rojnema me bê xweykirinê.

Rind tê bîra mi tişteki maîn jî. Wan sala, wekî ne ronaî hebû, tiransport nedixevitî, zivistan, sur-serma, rê-dirb dihatine girtinê, berf gelekî ketibû. Em vira rêdaksionê da berhev dibûn, mi ra têlê xist go, 'Çi dikin?' Mi go, 'Em vira rûniştîne, xeber didin.' Go, 'De ez ê niha bêm.' Wê emrê mezin, îda devdevî 90 salî bû, wextekî mi lê nihêrî Apê Casim derî vekir hate hundir. Gele kaxazê nivîsarê anî, hatiye. Divê, 'Eva bira aliyê mi da bive alîkarî, wekî rojnama me bê xweykirinê'.

Ez îda navêjim derheqa wê yekê da, wekî bawer bikî tu rewşenbîrekî kurd tuneye li Ermenîstanê, wekî ev kirinê Apê Casim, xêrxaziya Apê Casim nedîtîbya. Wekî şîrhelal e, gerekê bişêkirinê, gerekê bêje.

Gava ji nivîskarê ûrisa yê mezin M. Gorkî pîrsîne, wekî kîjan e sertaca efrandinê te yê bedewetiyê? Ewî bersiv ha daye, "Maksîmê kurê mi!"

Mi hevekî pêş da xeber da derheqa efrandinê Apê Casim ê bedewetiyê da, lê ez texmîn dikim, sertacê efrandinê

Apê Casim ê sereke ew ewledê wî ne. Ew Ordîxan e, ew Celîl e, ew Cemîle ye, ew Zînê ye.

Apê Casim, meta Xanim çar zaro mezin kirine, xwendina bilind dest anîne. Ordîxan doktorê ulmê filologî-yê ye, profesorê Ûnîversîta Lêningradê ye û hurmeteke mezin miletê me ra tîne. Ewî û Celîlê bira xwe bi temamî pêşkêşî berevkerin û lêgerîna zargotina me kirine. Çiqa berevokê wan ça Yêrêvanê da usa jî Moskwayê da, Lêningradê da, welatê dereke da derketine. Bona her afrandineke me ya zargotinê, ewana, çewa divêjin, xûdanê dirêjin, wekî ew winda nebe, bê berevkerinê, bê nivîstarê, bê naskirinê.

Xevata Ordîxanê birayê qîmetlî ew "Xanê Çengzêrîn (Dimdim)" e, wekî van axiriya jî ewî varîyanteke wê ya teze dîtîbû rojname "Novî Kurdîstan"ê da derketiye. Mi xwend, dîsa çewa rewşenbîr mi gelekî xweş hat û mi dît wekî rastî jî ewana emekeke çiqas mezin dirêjin.

Derheqa Celîlê bira da ez tenê karim tişteki bêjim. Em hevalê hev ê nêzik in, em mînanî bira ne, lê fikra mi dereheqa Celîl da ne aqasî aliyê hevaltiyêda ne, çiqas aliyê ulmdariya wî da ne. Celîl ew ulmdar e, yê ku tu wexta fikira xwe ra qelptiyê nake, yê ku tu wexta guh nade wan meriya, yê ku dixazin ziyânê bidin tarîqa me, miletê me. Rind dizanim ez, kitêbeke Celîlê bira îda hazir bû bona çapkirinê, îda wê bişandana çapxanê, gava çend ulmdarê miletçî daw kirin, wekî Celîl çend fikrê xwe biguhêze, wê rê bidin wekî ew kitêb bê çapkirinê. Celîl qail nebû. Ew temam xebata hate kirinê wê derê, Ermenîstanê da bona

çapkirina wê kitêbê girtin avîtin avê, nehiştin wekî ew kitêb vira çap be, lê şikir Xwedê, wekî ew kitêb bi zimanê rûsî Lêningradê hate çapkirinê û hurmeteke mezin miletê me ra anî. Wekî Celîl jî mînanî, wa gotî, hine ulmdarê me biya, wê pê re-pê re qayil biya, wê heynese hevekî hîlekarî bikira, wê usa bikira, wekî ez bêjim him dilê wan ulmdarê miletçî xweş biya, him jî ez bêjim, wê wî ra baş biya. Lê Celîl ew çetînayî hilda ser milê xwe her tenê bona wê derê, wekî ziyânê nede tarîqa me, ziyânê nede mexlûqetîya me kurda. A ewledê ha mezin kirine.

Ez îda derheqa Cemîla xûşk da nevêjim, wekî temamiya emrê xwe pêşkêşî sazbandiya me kiriye. Eva çendik çend sal e ew serkariya sazbandiya radyoya Yêrêvanê ya kurdî dike. Çiqas berevokê wê Yêrêvanê, Moskwayê, walatê dereke da çap bûne, çiqas kilamê me bi nota hatine nivîsarê. Û eva xiznek e, wekî niha em qîmetê wê nizanin. Pêncî sal, sed salê din şûn da ew silsiletê teze rabin wê zanibin qîmeta van xevata, çimkî naka em xaziya xwe tînin, wekî gelo sed salî pêş da, ez divêm kilameke me, wekî niha winda biye çûye, gelo çi cûreyî bîye. Lê bi saya serê Cemîlê, saya xabata wê ya kirî ew dimîne. Ew dimîne û silsiletê paşwextiyê wê bi destî wê nivîsarê karibin qîmeta wê bidin, yan jî zargotina me bînine ber çava.

Paşê, em pîrseke mayîn jî bîr nekin. Nava wê sazbandiya me da, nava wê zargotina me da pîrsên usa hene, wekî paşwextiyê da dikarin bîvin kilît bona vekirina gele pîrsê tarîqa me, gele pîrsê

riya me derbaz bûyî, em naha tê der-naxin, lê îjar silsiletê paşwextiyê dikarin tê derxin, dikarin vê yekê bidin xevatê. Usa jî derheqa xûşka Zînê da dikarim bêjim, wekî ewê jî emekekî mezin rêtiye bona pêşdabirina kûltûra me, çanda me.

Ez ser wê fikirê me, wekî nava ne tenê kurdê Ermenîstanê da, bawariya te Xwedê hebe, derew neyê, kurdê temamiya dinyayê da wê arşîveke dereheqa kurda; çanda wan, litêratûra wan, erfûedetê wan, êtnografîa wan da tunebe, çawa ku ez bêjim mala Apê Casimê Celîl heye. Ew dewlemendiya me ya lape mezin e. Ji xîşir girtî, ji xemla kulfet girtî, ji xemla mêra girtî, ji hûr-mûrê nav malê girtî, ji dokû-mêntê nivîsar girtî, ji kitêbê degme girtî, îdî ez nizanîm çî bidime rêzê da girtî, her tişt wê arşîvê da heye. Û ezê gelekî şa bûma, wê rast biya jî, eva wê rastiya objêktîv biya, wekî wextekê, wekî bi silametî Kurdistan aza bive, bive dewleta serbest, muzêya ser navê Apê Casim bê vekirinê û ev qiniyatê têda jî wê derê çiyê xwe bigrin û evê rast be. Evê qîmetê rast be.

Ez tenê karîm tişteki dawiyê da bêjim, eferim neferê mala Apê Casimê Celîl ra, wekî rastî ewana tradîsiyayê bavê xwe ra amin in.

Apê Casim wexta kurdek didît, hewasa wî kurdî ra dihat pê re disekinî bi seheta xeber dida, pê dihiya ji kî derê ye, çî derd û kulê wî heye, çî xem-xiyalê wî hene, usa jî ewledê Apê Casim usan in û bira çewa kurmancî divêjin, Apê Casim ber mîrê xwe duaçiyê wan ewledê xwe be.

Wexta Apê Casim çû rehmetê, meytê wî birin çûn nav merzelê me

kurdê êzdiya kirine çel, bi şêx û pîr, bi xêr û xêrat, bi dua-dirozge, bi qewl-beyt. Û naha jî heykelekî usa ser mexberê Apê Casim çêkirine, wekî merî zendegirtî dimîne. Û rastî jî ew heykel anegorî mezinaya Apê Casim e.

A eva ew mal e, a eva ew tradîsyon e, wekî Apê Casim, meta Xanim wê malê da danîne. Û badîhewa nîn e, wekî hetanî neviyê Apê Casim, neviçirkê Apê Casim xwe wê riya kurdîtiyê girtine, qulixî kurda dikin, qulixî kûltûra me dikin, qulixî derecê me başqe-başqe dikin." 01. 09. 2000, Yêrêvan

6. Bîranînên Hovhanês Badalyan

Dengbêjê eyan, hozanvanê Rêspûb-
lika Ermenîstanê yê emekdar dibêje:

"Berê ez ji zarotiya xwe dest pê bikim. Hemêdiyê yek ji taxa Bexdaê ye, îngilîsa firogeh li wir ava dikirin. Bav û birê mi li wê derê kar dikirin. Em jî miletekî mihacir, me ji Ûrmiyê bar kiribû. Em xût ji Ûrmiyê ne, rex kenarê behra Ûrmiyê.

Cara yekemîn ez li taxa Hemêdiyê rastî êzdiya hatim. Her sal, ez nizanîm bi mena kîjan eyda êzdiya em ermenî diçûne deşt û êzdiya eyda xwe derbas dikir. Strana digotin, serê xwe dihe-jandin. Ez wî çaxî sêsalî bûm û mi dix-ast bi rengêki dostaniyê bikira kurdê êzdiya ra, çimki ezî bê dîn bûm. Zar (zarok) bûm, lê ezî ne awqayî nêzîki xaçparêziyê bûm, bavê mi Têr Ohanês jî keşîş bû, lê mi qanûnê xaçparêziyê qebûl nedikir, dêrê da her tenê muzî-ka xweşî mi dihat. Diçûm, mi guh dida muzîkayê.

Agirparastina (agirperistina) êzdiya, ku dînê me ermeniya berê bûye, xweşî mi dihat. Mi didî wekî dînê agirparastinê dînekî diha rast bû bona me ermeniya û bona êzdiya, çimkî em hênê hê qewet bûn, padîşê me hebûn. Xaçparêzî me ji van pîrsa hinekî dûr xwey kir, çimkî ew dînekî diha merivhiz e, ez bêjim dereca cînarê te, hevalê te diha rehm e, yan diha bi dostanî berbirî cînarê dorberê xwe dibe, lê agirparastin dînek e, ku eger dijmin biketa welatê te cimeta agirperest mehkem bona parastina sînorê xwe bi mêrane disekinî.

Le bextê mi anî, sala 1946 ez hatime welatê Ermenistanê. Salêd 1956-57an çaxê me radyokompozîsya Hovanês Şiraze "Sîamed û Xecazerê" çêdikir, Aram Mêrangûlyan wê hênê serkarê koma me bû, ew ser hîmê wê poyemê muzîka nivîsî û min û Ofêlya Hambarsûmyan me wek dengbêj stra.

Hema vî çaxî bû ku mi nasiya xwe da Casimê Celîl. Mixabin ku rehmetî îro ne me ra ye. Ez bi hurmet berbirî wî mirovî bûm, çimkî mi farisî zanibû û kurdî nêzîkî zimanê Farisî ye, ewî hîvî kir çend stranê kurdî bona radyoyê tevî wê ansamblê bistirê. Û me tevayî kar kir. Casimê Celîl yan strana danî yan jî dengbêja danî, mi guh dida strana û stran dikirine nota. Ewî xebera rast dikir, çimkî ew bi xwe nivîskarek û şayîrekî berz bû. Û mi bi muhbet û bi dilxweşî Casimê Celîl ra kar kir heta sala mirina wî.

Hurmeta min a mezin hebû li hember wî camêrî û nek tenê ber bi wî camêrî, lê usa jî ber bi rêdaksiya kurda û êzdiya û ez divê heta Ermenîstan hinekî bi ser xwe da bê, hinekî qewet

be, dibe em pîrsa kurda jî safî bikin. Ez bawar im, dibe li wan sala ez tunebim, lê dîsa divêjim, ez bawer im ev gotinên mi wê bêne serî, çimkî em cimetine biran e, em gele nêzîkî hev in û me strana "Hoy Narê, Hoy Nazê, Romanî" tevî Rûzanna Vardanyan stra û bi vî rengî ez rêdaksiya kurdî va hatime girêdan û heta roja îroyin jî girêdayî me. Bawer im, eger mecal hebe, yanê ansambla me eger tezedan bê ser hev, rast e em nika ser vê pîrsê disekinî, lê qeweta berê nîn e, ew cûre karkirina berê nemaye, yê hêna Mêrangûlyan da hebû, yê ku salê 50-60 hebû. Ez soz didim, dîsa çend strana, bi alîkariya wê bistirê û pêşkêşî gelê me yê kurda, gelê me yê êzdiya bikim.

Cemîle: Lê tu çewa gotinê strana hîn bûyî?

Hovh. Badalyan: Ew bi xwe Casimê Celîl ez hîn dikirim. A li vê otaxê rûniştî, gotin yeko-yeko digo, mi jî pey wî diwekiland. Eger sewta gotinê çenedibû, digo, "Na, nebû! Mesele herfa "q". Ez Bexdayê hinekî erebî hîn bibûm. Herfa wan a "q" heye, ew herfa mi karibû baniya ser ziman. Gele kêfa wî dihat, şa dibû, wekî wa gotina mi dikaribû baniya ser ziman.

Cemîle: Bona me jî şabûneke mezin bû, wekî tu pê qaîl bûyî, te bona gelê me stranên kurdî straye.

Hovh. Badalyan: De ez divêjim, mi biçûkatiya xwe da muzîka kurda hiz kiriye, kurda hiz kiriye, çimkî mi texmîn kiriye, êzidî tim ermenîa ra girêdayî bûne. Bextê wan jî mîna bextê ermeniya bûye.

Ez bawar im, wekî biranîna Casimê Celîl û nivîskarê mîna wî êzidî tim wê bîra me da be, bîra gelê

me da be, xisûsî bîra nivîskarê me da be, çimkî nivîskarê me ermeniya dostaniya wana jî tevî nivîskarê êzidî ra heye, dostaniyê hev ra dikirin.

Ez guman im dostaniya me wê her hebe û em ê tevayî vê Rêspûblîka xwe ye zor saz bikin û rojê hatî eseh wê geş bin. Em rojê xwe ye hatî nav gelê we dibînim. Ez bi dil divêjim, çimkî hûn bi jimar pirr in. Hûn pirr pirr in, gelê kurd yeketî û xwehişiyarbûnê dijî.

Ez spasiya xwe divêjim bona vê rasthatina xweş û bîranîna Casimê Celîl gere timê geş bimîne dilê mi da, çimkî ez pê re gele-gele sala xevitîme.

7. Bîranînên Taharê Emer

Doktorê îlmên dîrokê, mamoste, dîrêktorê dibistanên kurdî li gundên Sîçanlû û Tilikê (nehîya Telînê, Komara Ermenîstanê), dibêje:

"Hatina min a radyoyê, wê derê va girêdayî ye, ez rastî qîza birê xwe Cemîla Casim hatim, mi zû da nedîtîbû. Cemîla Casim silav-kilava, dîtina mi va muhbeta mi gele bilind bû, bîranînêd kevn ketine fikira mi, destebirakê min î wextekê, zehmetkêşê miletê me Casimê Celîl hate ber fikira mi û teze ez ber xwe ketim bona Casimê rehmetî, wekî eva çend sal e hesab bike mecbûr bûme, mi ra miyesser nebûye herime mala wan, em hev bivînin, xeber bidin çewa ku lazim e. Îlahîm wekî roja definkirina wî ezî balnîsê (nexweşxane) da bûm. Balnîsê da mi bihîst mirina wî. Ez, usa jî nexweşên millet, em gele ber xwe ketin, me wira îçke jî îzin tunebû em bidin xevatê, lê me hilda îçke anî nexweşxanê, me kas hilda bona

rehmetiyê Casim. Rehma Xwedê lê be, mêrê usa!...

Casimê Celîl mêranî bû, steyrka xo va, xeberdana xo va, dilê xo va. Bawer bike mi gelek kê mêrê usa emir da dîtine. Hevtê pênc sal emrê min e, ez gele camêra va girêdayî bûme, mêra va, maqûla va, nivîskara va, ulmdara va lê dilê nola dilê Casimê Celîl ez nikarim bêjim, mesele dilekî başqe himberî dilê wî bikim.

Carekê kulfeteke êzdiya li çiyê girtîbûn. Mala wê da çek dîtîbûn, çî kirîbûn, mi cab da Casim, Casim mala me da bû, timê diçû dihat, [Sîçanlû] hesab dibû gundê wî. Mi go, wekî şuxulekî ha qewimiye.

Casim lêda çû milpêtra, dataxazra [serokê polis], yê din ra gele şuxul kir, hetanî kulfeta êzdiya ji kelê derxist hilda anî gund. Ew [bûyer] tenê nîbû.

Casim ne kubar bû, tevî pala, tevî gundiya timê dixwar, vedixar, xwe usa qure nedigirt, xwe kubar nedigirt, nav millet da bû, nav cimetê da bû.

Gele cara dihate mêvanya me. Pilaş [sako] xwe dikir, barana gur dihat, de tomerî hema usa kewşen da digerya û gul, gupika va mijûl dibû, emrê miletyê va mijûl dibû. Carekê yekî pis-mamê mi hesp digerya, hespê wî winda bibûn. Casimê rehmetî gazî kir, "Roryo, roryo!..." Hêrs bû ser da. Ewê êzdî, ku zar bû xoxo jî. Casim go, "Hela çika natirse, çika dilê wî çewa dil e?" Lê ewî êzdî gava cava xo sert da, Casim hilda, "Wey!" Go, "Lê tu birê mi kirîbî!"

Dilê wî dilê millet e, dilê kurdan e, dilê êzidiyan e.

Casim gele milethiz bû. Derdê wî, ruhê wî, emrê wî milethizî bû. Usa jî nav gunda timê digerya. Hîmdarê

radyoyê bû.

Bîra mi tê, wekî nivîsara radyoyê destnivîsar, zarnivîsar bû. Hildana kilama "Kerr û Kulîkê, Silêmanê Silîvî, Mem û Zînê, Xecê û Syabend". Mi bilûrê lédixist, Egîtê rehmetî jî distira, pêşiyê, berî gişka ew aliyê Casimê Celîl da hatiye hildanê.

Casim usa jî ruhê xwe, emrê xwe girêdayî bû miletê xo ra. Hizkirina wî tevî milet bû. Sivê heta êvarê ew kurê xo va, ew zarê xo va digeryan bona folklorê milet, bona berevkirina guharên zêrîn, wekî wînda nebin, bimînin çewa ku lazim e.

Casim wexta yekî kesîv didît, bawer bike hêsir çewa dihatin, çima kesîbîyê da ne, çima belengazîyê da ne, çima dereca wî baş nîn e çewa ku lazim e.

Aha bona Casimê Celîl, bona hizkirina wî bona navê wî, mesele gundê me da gele zar hatine navkirinê bi navê Casimê Celîl. Hema yek jî mala xûşka mi, usa jî mala kurapê mi, zarê wî nefera va: Casim, Ordîxan, Celîl, Zînê, Cemîle, mal va temam navê Casimê Celîl in, bona mêraniya wî, bona navdengê wî, bona muhbeta wî.

Ew timê bîranînê mi da ne. Mi gelek cara mala wî da nan xariye, vexariye, derbaz kiriye, bêrikandiye. Ew nek tenê pîsmamê mala mi biye, usa jî tomeriya gundê me, cimeta Telîmê, gişk Casimê Celîl va girêdayî bûne çewa hizkiryê me, çewa nivîskarekî eyan, muhbet, buhurtiye miletê xwe, xêrxazê miletê xwe. Ew miriye, lê hesav bike nav û dengê wî, qedir-qîmetê wî wê nav cimete, miletê me da bimîne heta hetayê.

Hîmlî wexta teze Ermenîstanê da

pirsa listikê, pirsê radyoyê danîn, yê ewlînka ku mijûl dibû gunda da, komêd bedewetyê, xwe afrandinê, topkirina wan va hîmlî Casimê Celîlê rehmetî derbaz dikir. Ew xoxo jî, tevî komê, kom hîn dikir, wî yaşê xwe, wê dereca xwe, wê bilîndaya xo, hesab bike gişk bi kîsî wî dibû: tiransport, avto-bûs... çik hebû ewî danî. Kom cîkî dibire cîkî dinê.

Gele miqam miqamê Casim in, miqamê wî ne, hînkirinê wî ne. Gelek mijûl bûye komêd me da. Cimet, usa jî ew listikçî bêqedir verê nedikirin. Kîsî xwe temam, ji beriya xwe temam, perê xwe temam. Gele dengbêj danîn mala xwe, roja mala wî da dîman, hurmet, siyanet, qedir, qîmet verêdikir bi muhbeta bilînd, bi qedrê miletîyê lapî kûr, usa jî yek paş da nedîma ji giliyê Casim, dereca wî, muhbeta wî, gilî-gotin.

Heyneyse ew listikêd miletîyê mehkemiya wana, kilamên radyoyê ye ji ewlînka heta îro jî qeweta xwe wînda nekirine, temam hesab bike payê pirrê aliyê Casimê Celîl da hatine kirinê. Loma Casim nayê bîrkirinê. Kilama da jî, strana da jî, komêd bedewetyê yê xweefrandînê miletîyê da jî û her dereca da jî cimeta me bîr nake Casimê Celîl.

8. Bîranînên Ahmedê Gogê

Nivîskar, jûrnalist, demeke dirêj serokê radyoya kurdî bûye, dibêje:

"Hurmet û siyanet ji Casimê Celîl re. Îro temamiya cimeeta me ya li Ermenîstanê zane, wekî sala 1955 radyo, wekî bi zimanê kurdî hate dayînê ji Yêrêvanê, hîmdarê wê Casimê Celîl bû. Ew Casimê Celîl, yê ku salêd şîhî da bawer bikî temamiya emrê xwe,

edebiyat û medeniyata me ra hate girêdanê û ser hemû kitêba bawar bikî nivîsiye, wekî rêdaktorê wan Casimê Celîl e.

Casimê Celîl bi vê fikirê hesab dibe mezinayî nava gelê me da. Çima?

Casimê Celîl cara ewlîn kilamê me, miqamê me nivîsîn, îjar nava qewlekî çewa da?

Wî çaxî qewl, mecelêd nivîsara kila- ma awqas tunebûn, ewî temamiya dengbêja, temamiya sazbanda danîne mala xwe û bi roja mal da xwey dikirin, wan ra mijûl dibû û kilamê wan û gotinê wan, miqamê zurnê, fiqê meyê nivîsîn ser qeytana magnîtafonê, ji windabûnê xilas kirin. Navê Casimê Celîl ra dêmek girêdayî ye hîmdanîna fonda kilamê me, kîjan heseb dibe "Fonda Zêrîn" û îro, niha, li Radyoya Ermenîstanê ya miletiyê têne xweyî- kirinê. Bona wê yekê hurmet û siyanet Casimê Celîl ra.

Casimê Celîl wekî sala 1918 li Qersê mihacir bû, dê û bavê wî alîyê dijmin da hatine kuştinê, ew hat vê derê, saya zimanê ermenî hîn bû, bû merivekî mezin, nivîskarekî gelekî eyan, şayîrekî gelekî hizkîrî û em vê gavê û her gav dikarin mala Casimê Celîl hesav kin çewa merkezeke kurdzaniyê navûnîşan e.

Casimê Celîl du ewledê xwe dane ser dereca kurdzaniyê here bilind. Mesele Celîl, wekî hurmet û siyanetê me ra tîne. Mesele Ordîxan, wekî kubariya miletê me ye. Cemîle wekî eva çil sal e para xebirdanê kurdî da dixevite û dîsa riya bavê xwe da diçe, pîrsêd berevkirina kilam û miqamêd me va mijûl dibe û hurmet û siyanet wê malê ra. Em gerekê şa bin, wekî

mînanî Casimê Celîl hene, yêk mînanî ewledê wî hene, wekî bê westandin xwe pêşkêşî edebiyat û medeniyata me kirine, xezma berevkirina nimûneyêd folklorê me, wekî niha îdî winda dibe. Wana xebateke gelekî mezin kirye, wekî nimûnê folklorê me ya miletiyê ji windabûnê xilaskirine û ew kirinê malê heta hetayê û heta ew nimûnê folklorê dijîn, navê Casimê Celîl wê hebe, navê ewledê wê malê wê hebe. Loma jî em dibêjin, şikir mala Xwedê ra, wekî Ermenîstanê da saya alîkariya cimeta ermeniya ye bêqelp, maleke usa heye û malêd mînanî wê jî hene, lê ez te ra rast bêjim, emekê Casimê Celîl gelek e.

Mesele, ew miqamê Şamilê Beko, miqamê Egîtê Cimo, kilamêd Şeroyê Biro kilamêd me yên kilasîk e; mayin ew saya Casimê Celîl mane malê nemirî, zanî. Eva hebûna me ye, evana me ra lezetê tînin hemû gava, hemû wexta û kilam û miqamê me me ra bûne rêber, rê nîşanî me didin, bona em haş xwe hebîn, wekî em kurd in û ew merivêd ku qelemê yan pênûsê hiltînin dijî Casimê Celîl dinivîsin, ewana nezan in, ewana nexwaş in, wana gotî bivine ber malê yanê jî bivine xastexanê derzî bikin, wekî ewana ser hişê xwe da bîn. Merivê usa hemû dema da bûne qerfa miletê me, bûne pêkenîn. Em timê wan kenyanê û em nika jî dikenin. 16. 02. 2000

MUSTAFA PAŞAYÊ YAMOLKÎ: JÎYAN Û ROLA WÎ YA DI NAV HÊZA NETEWA KURD DE

Rebwar Fatah

Ji îngilîzî: Herşen Farqinî

Şahek, di dinya îroyîn de, wek şahê santrancê bû.
(Şukrî Fazil)

Gelek şexsiyetên kurd hene ku neheqî li wan hatiye kirin, çiyê ku ji bo doza gelê xwe bes piştgirî nedane. Lê Mustafa Paşayê Yamolkî ne yek ji wan e. Ne hewce ye mirov hinek navên ku li ser wan gelemşê hatiye kirin bîne ziman, jixwe dîrok biryarên di cî de dide.

Bi vê sedemê, ev gotar, dê qala hinek kîteyên meçhûl ên jiyana Yamolkî û danasîna wî navê birûmet, lê ev çend jî jibîrbûyî bike. Kifşkirina agahdariyên meçhûl ên derbarê Yamolkî, watedar û zehmetek hêja bû. Ez ji dil ji malbata wî bawerim ku ew nasê min in û li



ba min pir biqîmet in.

Naverok

- Pilandûva malbatê,
- Perwerde,
- Jiyana leşkerî û meslekî,
- Rola di Qraliyeta Kurdistanê de (li Silêmanî).

**Pilandûva Malbata
Mustafa Paşa
Yamolkî**

Berê mirina xwe (25ê Gulan 1936, derdora Bexdayê li al-Wazirya), xwestibû ku ev riste li ser kêla wî bîn nîvîsandin:

*Ez ditirsim ey weten bîmrim, nebînîm bex-
tiyarî to.*

*Bîniwsîn ba le ser qebrîm, weten xemgîn û
mîn xemgîn**

Ew û gelek navdarên kurd, li goristana Silêmanî li ser Girê Saywan binaxkirîne. Heta mirinê, Yamolki bi netewa kurd şanaz mabû. Yamolki li Kurdîstana Başûr, li Silêmanî, 25ê Rêbendanê, ji malbateke rewşenbîr bû. Ew, li herêma Silêmanî ku ev herêm ji kevneşo- piyan yek e, li taxa Sabûnkaran, li hemberê hemama navdar, Hemamî Muftî, dijiyan. Yamolki, bi niştimanperwerî, wêrekî û aqilmendiya xwe navdar bû. Yamolki ji eşîreta hêzdar Bilbazan bû, ku eşîreteke kurd e.

Di 3yê Gulana 1888 de Yamolki, bi Safya Xanima Xandanzade re zewicî, ku ew keça Husên Paşa û xweha Seîd Paşa bû. Ew malbateke kurdên navdar in û li Stenbolê li devera Uskudarê dijîn.

Yamolki û jina wî, xwedî kurek û sê keç bû:

- Mîralay Azîz Yamolki, di Gelavêj a1982 de li Bexdayê wefat kiribû.

- Zahra Yamolki (bi Îzzet Begê Cafî re zewicîbû) di 1972 de, li Bexdayê wefat kiribû.

- Dr. Anjom Yamolki, di 1968 de, li Parîsê wefat kiribû.

- Melîha Yamolki.

Perwerde

Di dema Yamolki de, piraniya xelkê Rohhilata Navîn cahil bûn. Digel vê, ew wek serbazekî, bi tecrûbe û qalîteyeke berz perwerde bibû. Bi

kurdî, tirkî, erebî û farisiyeke herikbar dipeyivî. Ew, hem diçû dibistana sere-tayî hem jî li mizgeftê ders dixebitî ku li vê demê adet bû. Du mamos-teyên wî yên olî, Mele Fetah û Mele Îrfan, di Mizgefta Seîd Husên de ew perwede dikirin, ku hê temenê wî biçuk bû. Yamolki, li Bexdayê, dest bi dibistana leşkerî ya bi navê Ruşdiya al-Askarya kir. Pey re, wî neqlê dibis-tana leşkerî ya Stembolê kirin ku ew wek Medresa Herbê dihat nasîn. Li peytexta Osmaniyan, Yamolki, ji saziyên perwedehiya bilind û cema-etê rewşenbîran derfetan bi dest xist.

Jiyana Meslekî û Leşkerî

* Di sala1888an de ji Akademiya Serkantiya Giştî ya Stenbolê, wek naqîb, bi serfirazî mezûn bû. Ew, ji bo rêvebirina beşa Hîcazê ku girêdayê Osmaniyan bû, wek leşkerekî payebilind tayin kirin.

* Di sala1893an de li Slimas û Xoy, Urmiye ku ev bajarên Kurdistana Rohhilat in wek endamê komîsyonê hatibû tayînkirin û ew li bajarê Rohhilata Kurdistanê, li Senandajê jî endamê komîsyona ticaretê bû.

* Di sala 1899an de tayinî Bexdayê bû wek wekilê serek ê Serkantiya Leşkerî ya artêşa şeşem a Osmaniyan.

* Di sala1904an de wek endamê komîsyon a ku dê sînorê Îran û Îraqê destnîşan bikira, hat tayînkirin.

* Di sala1908an de wek serekê beşa leşkerî, tayinê Enqereyê bû.

* Di sala 1909an de wek tuxgeneral terfî kir û ji bo serektiya artêşa bîstûyekem a li Bexdayê hate tayînkirin û piştê salekê bi rutbeyekî

hevminan transferê Azerbêcanê bû.

* Di sala 1911an de, dema herba îtalyan û tirkan, wek fermanarê artêşa pêncem hate tayînkirin.

* Di sala 1917an de ji bo serekiya artêşa Osmaniyan a li Bexdayê hate tayînkirin.

* Di 3yê Berfanbar a sala 1918an de, ji bo idarekirina artêşa Osmanî - yan a li Sêwasê hate tayînkirin.

* Yamolkî helbest jî nivîsandine. Pirtûka wî ya helbestê, piştî mirina wî, di sala 1956an de li Bexdayê hate weşandin.

Di Qraliyeta Kurdîstanê de Rola Yamolkî

Împaratoriya Osmanî di 31 Cotmeha sala 1918an de agirbest xwest. Wilayetên Ereban ên ku ji dest çûbûn, bi peyman a veşartî ya Sykes-Picot (1917) di navbera Fransa û Brîtanîyayê de hatibûparvekirin; Fransa, tenê ne Suriye û Lûbnan, Cilicia (navê kevin ê başûrê Tirkîyê ye) jî dagîr kir.

Îtalyanan daxwaza Nozdeh Giravan (li behra Egê) kirin. Yunanîstan jî heweskar bû ji bo herêma Îzmîr û Rojhilatê Trakya.

Yekîneya leşkerî ya her du dewletan teugavan û Stenbolê îşxal kirin û bêçekkirina leşkeran xwestin. Her du hêzan li Bakurê Rojhilatê Anatoliya, damezirandina dewleta Ermenî (di bin parastina Brîtanîya de) û, li rojhilatê başûrê jî dewleta kurd (di bin parastina Fransa de) niyet kirin. Ji bo dewleta tirk li aliyê çepê cihekî piçûk mabû.

Sultan Vahdedîn, ku di Tîrmeha 1918an de hê derketibû ser text, di

demek nêz de xwe di nav meseleyên împaratoriye de bêçare dît û paytexta wî jî di bin her du hêzan de dagerkirî bû.

Lehengê Gelîbolîyê Mustafa Kemal, li herêma Enqerê yekîneyên tirkan organîze kirin, îdareyeke hevdemî damezirand û hêzên Osmaniyan jî di artêşa tirk de reorganîze kir. Mustafa Kemal bi sozê ku damezirandina cumhuriyeteke kurd-tirk ava bike, piştgiriya kurdan jî bidest xist. Di 1920an de, Dewletên Îtilaf di Peymana Sevrê de, ku parlemena Tirkîyê tu car tasdîq ne kiribû, şertên dijwar teklîf kiribûn.

Di sala 1921an de Fransa ji Cilicia (Kilîkya) vekîşîya; cepha dewletên Îtilaf jihev bûn. Hêzên Mustafa Kemal di şerê Sakaryayê de (1922) yewnanan mexlub kir; û di sala 1923an de wan jî Îzmîrê derxistin. Îtalî jî vekîşîyan. Bi awakî leşkerî şer dawî bû. Cumhuriyeta tirk a hevdemî, bi Peymana Lozanê re (1923) naskirina navneteweyî bi dest xist.

Piştê dawîya Şerê Yekemîn ê Cihanê, Yamolkî ji bo mehkemeya legal a Iraqê hat tayînkirin. Pişt re , ji bo ku Mustafa Kemal û hevalên wî bêne darizandin, ji aliyê Ferîd Paşa ve wek serokê mehkema leşkerî hate tayînkirin.

Ew grup ji Mustafa Kemal, Fuat Paşa, Fewzî Çeqmaq û Husên Rauf Beg pêk hatibû û bi raperîna li dijî xîlafetiya Stenbolê di hate îthankirin.

Ji bo Mustafa Kemal û hevalên wî, di 20ê Nîsana 1920an de, bi emrê Yamolkî, hukmê îdamê li wan hate birrîn.

Di sala 1920an de li Tirkîyê, axir

Mustafa Kemal, Hikûmata Stembolê a ku înzakarên Peymana Sevrê bûn, têk bir. Hêzên Kemalîst ên ku bi alîkariya gelê kurd li Erzromê derketin meydana, ji serî de bi fermî mebesta xwe ji bo cumhuriyeteke modern a ku mafê etnîkî yê wekhev dê bida gelê kurd û tirk, îlan kiribû. Kemalîstan, Peymana Sevrê a ku ji bo kurdan adîl bû û garantiya mafê serxwebûn û tayînkirina çarenûsê dida, red kir.

Bi hinceta yekîtîya netewî, di her rewşê de jenosîda kurd û Kurdistanê, yanî tirkkirina Kurdistanê, dewam kir. Xwînrijan-din hê ji nerawestiyaye.

Di 17yê Pûşbera sala 1921an de, piştê serketina Ataturk, Yamolkî vegeriya welatê xwe ku li wê derê, di demeke nêzik de bi serokatiya Şêx Mehmed Berzencî li Silêmanî Dewleta Kurdistanê hatibû damezrandin.

Wextê Yamolkî vegeriya Kurdistanê, Şêx Mehmed Berzencî, li Kurdistana Başûr, ji bo çêkirina dewleta kurd, serokatiya gelê Kurdistanê dikir.

Di 10ê Kewçêra sala 1921an de, paytexta Kurdistanê li Silêmaniyê, ji bo çêkirina hikumeta kurd daxuyaniyek hat danîn. Şêx Mehmed Berzencî xwe wek qralê Kraliyeta Kurdistanê deklare kir. Endamên qabîneya wî ev kes bûn:

- Wezîrê malîyê:

Abdulkerîm Alaka

- Wezîrê gumrikê:

Ahmed Begê Fetah Beg

- Wezîrê dadiyê:

Hecî Mele Seîd Kerkukî

- Wezîrê Kar û Xebatê:

Hema Abdulah Axa

- Wezîrê perwerdehî:

Mustafa Paşa Yamolkî

- Serekwezîr:

Şêx Qadir Hefîd (birayê Şêx Mehmed e)

-Wezîrê karê hundirîn:

Şêx Mihamed Garib

-Wezîrê parastinê:

Zekî Sahîbqran(artêşa kurd, bi navê artêşa netewa kurd bû) Şêx Mufîdê Şêx Qadir, wek Serekê Serkantiya Giştî hat tayînkir û tuxgeneral Sadiq Qadirî (birayê Yamolkî) wek Mufetîşê Giştî yê Artêşê hat tayînkirin. Şêx Mehmed Berzencî her çiqas merivek dîndar jî bû, ji bo peywira wezîrê darayî, yekî xirîstiyayin kir. Ev jî nîşan dide ku civata kurd çiqas çêştdar û ji her fikrê re vekirî ye.

Cemiyeta Kurdistan

Di 21ê Tîrmeha sala 1922an de komek rewşenbîrên kurd û pêşengên civakî, bi pêşengiya Yamolkî Cemiyeta Kurdistan damezrandin. Endamên damezrêner ev in:

- Ahmed Behced Efendî

- Alî Efendî yê Bapîr Axa

- Faîk Arîf Beg

- Hecî Axa Fethulah

- Îdham Yuzbaşî

- Refîk Hîlmî Ahmed Beg

- Salih Qeftan

- Şêx Muhamed Gulan

- Şukrî Aleke (kurdekî xirîstiyayin e)

- Tofîq Beg

Cemiyeta Kurdistan, ku di nav armancên wî de, yek jî, piştgiriya serokê dewleta Kurdistanê Şêx Mehmed Berzencî bû, di 21ê Tebaxa 1922an de komelê, bi kurdî, tirkî û

farisî hejmara yekem a rojnameya *Bangî Kurdistan* weşand.

Qraliyeta Kurdistanê (Şêx Mehmed Berzencî) ji alî Îngilîzan ve nehat hilweşandin, li şûna qralê kurd Îngilîzan qralekî ereb, Faysalî, empoze kirin. Yamolkî, Bexda terk kir, di 28ê Rêbendan 1926ê de, ku li wê derê dest bi weşana rojnamê kiribû.

Di 1ê Kewçêra sala 1924an de, Cemîyeta Kurdistanê, nameyek şand bo Cemîyeta Neteweyan, bi vê nameyê Tirkîyê protesto kir ji ber sedema daxwazên wan ên li ser Musulê û tevgerên wan ên li dijî gelê kurd ên Bakurê Kurdistanê.

Rêçên dîrokî di vê rêxistinê de, ji bo meşrûkirina daxwazên Peymana Sevriê û daxwaza serxwebûnê, girîng in.

Di Hilweşandina Qraliyeta Kurdistanê de Rola Îngilîzan

Qraliyeta Kurdistanê zêde demam nekir, bi saya Hêzen Hewayî yê Qraliyeta Îngilîzan ku li ser navê hikumeta Bexda ya quqla tevdiqerîya. Îngilîz, ji kurda re nazik nebûn. Zanîneke çewt e ku tê parastin li dijî kurdan yekem car rejîma Saddam Huseyîn gazên jehrî kar aniye. Ev çewt e. Rejîma yekem ya Îngilîzan e, ku dijî kurdan li Başurê Kurdistanê gaz kar anîne.

Noam Chomsky di pirtûka xwe ya "Demokrasiya Pêxîmker" de serweriya Îngilîzan li Başurê Kurdistanê wiha şayeser dike: Di sala 1919an de fikra Sekreterê Wezîrê Herbê Churchill ew bû ku wek tecrûbeyekê, li ser erebên serkêş, bi destê Fermandarê Rojhilata Navîn çekên kîmyewî bikar bîne. Û

li dijî Îtîrazan wî wiha gotibû:

Ez van lewçeyan fêhm nakim ku dijberên karanîna gazê ne. Tercîha min a teqez, li dijî qebîleyên barbar karanîna gazên jehrîn e. Lê hewceya gazên kujendetir nîn e; belam li dijî yên ku astengiyên mezin derdixin, terorê belav dikin, bandora wan li ser gel zêde ye û dev ji van tevgerên xwe bernadin gaz tê karanîn.

Churchill pê ve kir:

'Di derbekê de ji bo qedandina aloziyan, ku ev yek dê te li herêma serdest bike, karanîna sîlehên mevcut guncan e. Sîlehên kîmyewî di şerê modern de bes tedbîqateke zanistî ya Rojava ye. 'Favoriyên Churchill, li dijî qebîleyên barbar û erebên serkêş angokurdan û afganan bikaranîna gazên jehrîn û hêzên hewayî bû. Supriz nîn e, di sala 1990an de, William Waldegrave ê ku berpirsiyarê hikumeta John Major bû, emir da ku ji dosyayên Public Record Officeê (arşîva koloniyên Îngilîzan e) hinek teferûat bînin derxistin ku ev teferûat derbarê yekîneyên Îngilîz ên li dijî kurdan gazên jehrîn kar anîbûn.

Bi gotineka dî, neteweyekî ku ji bo rêvebirîya xwe daxwazkar bû, di sînorê jenosîdê de hat çewisandin. Qralê wan ji alî hêzên Îngilîzan ve lawaz ket û qralekî "îthal" ê ku bi temamî ji çandekê cuda bû anîn li ser wan.

Dîrok ji aliyê gelên stemkar ve bi xwîna gelê stembar tê nivîsandin.

Karekî hê jî teze ye ku netewan bi têgehên "medenî û barbar" ji hev vediqetîne. Di pirtûka mezin a dîrokê de, hê jî, ji gelê zor ta' dedîtî xwîn diherike. Dîrok bi awayekî hevgerî, dazananîna jana stembaran de ne serketî ye. Bi gotinek dî, ev têgeha ku "medeniyet" jê re tê gotin, divê em bi xwe ava bikin.

NIVÎSÎN Û ALFABE DI NAV PÊŞIYÊN KURDAN DE

Mamoste QEDRÎ

Nivîs û alfabe ne karê rojekê ne. Ji ser wêneyên ku li rûyê diwarên şkeftan, li ser kevir û kevalan (lewhe, tablet) hatine çixêzkirin heta alfabeya ku 1000 sal beriya zayînê ji aliyê fenîkiyan ve hatiye icadkirin û ji aliyê yewnaniyan ve tipên dengdêr lê hatine zêdekirin bi hezaran sal derbas bûne. Ji destpêka nivîs û alfabeyan û xebitandina wan a di warê perwerdeyê de, nîqaş û pêşniyazên li ser pêşvebirin û standardkirina wan jî dest pê kirine. Di van hezar salan de gelo kurdan çi kirine? Rewşa nivîsê li cem wan çawa bûye? Kîjan xet û nivîs û alfabeyê şixulandine? Bi wan çi berhem nivîsandine?

Ez ê li vê derê li bersîva van pirsan bigerim.

1. Nivîsa Mixî

A	Ba- be- bo	Ca- ce- co	c^a- c^e	da-de do	E	fa	Ga	go	ha he	Ja- z^a
Je	Ka	Ko	l	Ma	me	mo	na-ne	No	O,u	pa
Pe	Po	Ra- re	ro	sa- se-so	Şa-şe- şo	ta-te	To	t^a- t^e- t^o	Va	ve
Xa	ya- yo	Za- ze- zo	bomîş bûm zemin	Beğ beğî xuda	Ahura- mazda	xêşaye êyêşah	Dehyu walat	dawî		

a) Di vê nivîsê de du heb "t" û du heb "z" hene. b) Ez di vê nivîsê de jî rastî dengê "ğ" nehatim ku Celadet Bedîrxanî jî negirtiye alfabe ya xwe. c) Her şeş nimûneyên dawîn bêje ne.

Di hezarsala sêyemîn a beriya zayînê de li dergûşa kurdan Mezopotamyayê ango di navbera çemên Dicle û Firatê de qewmên Sumer û Elam jî rûdiniştin. Van qewman "Dewletên Şaristanî" ava kirin, avzêmk ziwa kirin û dest bi çandinî û ajalkedikirinê kirin. Di vê konseptê de mehsûl û ajal dihatin kirin û firotin, bac dihat berhevkirin. Ev kirin û firotin pêwîstiya xwe bi qeydkirin û nivîsandinê hebû. Loma, wan jî kirin û firotinên xwe berê li ser kevirên piçûk bi şiklê wêneyên besît qeyd kirin û wekî belgeyan di nav xwe de bi kar anîn. Paşê, ji heriya kilê hinek keval (tablet, lewhe) çêkirin û çend çuwal dexl an jî çend serî heywan kiribûn an jî firotibûn li ser wan kevalan bi şiklên geometrik û hendeseyî çixêz kirin. Îro li Iraqê li herêma "Urûk" bi hezaran ji van kevalan hatine dîtin û derxistin.⁽¹⁾ Ji nivîsa wêneyî ya ku sumeran bi vî awayî bi kar anîne re îro tê gotin "pîktogram".

Di sistema pîktogramê de divê ji bo her tiştê wêneyek bi temamî bihata çixêzkirin. Ango her wêneyek wezîfeya bêjeyekê didit. Nexwe çiqas tişt ewqas jî wêne. Bo numûne, ji bo ku hevoka "Hesp çû malê" bête nivîsandin divê wêneyên hesp û malê bi tevayî bihatana çixêzkirin. Di mekteban de dersdayîna bi vî awayî ne hêsan bû. Loma, ji wan wêneyan parçeyên ku ne girîng bûn hatin avêtin û parçeyên ku girîng bûn man. Wêne ewqas hat besîtkirin ku gava lê bihata nihêrîn êdî nedihat zanîn ka ew wêneyê çi ye. Zanyarên Ewropî navê "kuneiform" ango "nivîsa mîxî" li vê sistemê dikin.

Navê zimanê sumeran ê gelemperî "Eme-si-sa" ye. Lê paşê çend diyalekt jê çêbûne ku navê wan di ferhengên Babîlî de derbas bûne. Mînak: "Eme-gal" (zimanê mezin), "Eme-sukud" (zimanê bilind), "Eme-sux" (zimanê bijartî), "Eme-udul" (zimanê şivanên pez), "Eme-nu-eşa" (zimanê kahinên dînî). Nivîsa mîxî ya sumeran berê ji jor ber bi jêr ve dihat bikaranîn. Lê sumeran pişt re hinek guhartin tê de çêkirine û ji çepê ber bi rastê ve xebitandine. Hinek bêjeyên sumerî yek kîte ne, hinek jî ji çend kîteyan pêk tên û di navbera hinek ji wan bêjeyan û bêjeyên kurdî yên niha de xalên wekhevî hene. Çend mînak ev in.⁽²⁾

¹ Février, G. James, *Historie de l'écriture* (Diroka Nivîsê), Editions Payot, 1984, r. 102

² Ehmed, Cemal Reşîd, *Zuhûru'l-Kurd Fi't-Tarîx*, çapa duyemîn, Hewlêr, 2005, l, r. 329-374

Bêjeya Sumeri

Ga-meş
Pa-bil-ga
Lu-kal
A-nê-nê
Gu
Gal
Mi

Bi Kurdiya İro

Gamêş
Bapîr
Mêrê kal
Awane
Guh, go
Gel
Mê

Nivîsa mîxî ya Sumeran jî 3000 sal beriya zayînê heya 600 sal beriya zayînê jî aliyê gelek miletên dinyayê ve hatiye şixulandin. Kurdistanîyên berê yê mîna Hurri, Mitanni, Kaşi û qewmên Med vê nivîsê xebitandine û li gor fonetîka xwe hejmara tip û dengên wê kêman jî zêde kirine.⁽³⁾ Bo numûne medan gava dest bi xebitandina vê nivîsê kirine tipên wê 36 bûne. Wan li gor fonetîka xwe 6 tip lê zêde kirine, bi vê zêdekirinê hejmara tipan gihaştiye 42an.⁽⁴⁾ Nivîsa mîxî hema hema jî tevayî dengên kurdi re bi kêr hatiye. Ango pêşiyên kurdan vê sîstemê li gor tevayî dengên xwe xebitandine.⁽⁵⁾

Li gor ku Hazim Hacanî di kitêba xwe ya erebî ku bi navê "Sefehatun Min Tarîxi'l-Kurd we Kurdistan" (Çend Pel Ji Dîroka Kurd û Kurdistanê) de neqil dike, qismek jî belgêyên herî kevin ku bi nivîsa mîxî bi zimanê kurdi hatine nivîsandin û gihaştine roja me hinek keval in ku behsa tofana Nûh dikin. Ev kevalên han niha di "Muzeya Londonê" de tên muhêfêzekirin û di vî warî de di rojnameya "Sewtu'r-Rafideyn" (Dengê Mezopotamyayê) de di hejmara 53. sala 1984an de meqaleyek jî hatiye weşandin.⁽⁶⁾

2. Alfabe ya Yewnanî û Aramî

Li gor Cemal Reşîd Ehmed, kurdan piştî hilweşîna "Împaratoriya İxmîni" di dawîya sedsala 4an a berya zayînê de dev jî nivîsa mîxî berdane û dest bi xebitandina alfabe ya Yewnanî û Aramî kirine.⁽⁷⁾ Tekstên kurdi yê ku bi van alfabeyan hatine nivîsandin û gihaştine roja me "Nivîstekên Hewramî" ne. Ango

³ Ehmed, *Zuhûru'l-Kurd Fi't-Tarîx*, I, r. 122

⁴ Hasan Kaya, Zana Farqînî, Samî Tan, *Em Zimanê Kurdi Binasin*, Weşanên Enstîtuya Kurdi ya Stenbolê, çapa yekemîn, Stenbol, 2001, r. 41.

⁵ VARLI, Abdullah, *Dîroka Dugelên Kurdan*, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997, derpêç 1, r. 20, 29, 38

⁶ HACANÎ, Nazim, *Sefehatun Min Tarîxi'l-Kurd we Kurdistan*, çapa yekemîn, Hewlêr, 2002, r.181

⁷ Ehmed, Cemal Reşîd, *Zuhûru'l-Kurd Fi't-Tarîx*, II, r. 329-374

hinek nivîstek in ku bi kurdiya hewramî hatine nivîsandin. Di lêkolînên derbarê van nivîstekên ku hem zanyarên Ewropî hem jî dirokknasên kurd gelek bi girîngî li ser wan sekinîne van tespitan kirine:⁽⁸⁾

Di sala 1909an de li Hewramanê di şkeftekê de hinek nivîstekên bi kurdiya hewramî, bi xetên yewnanî û aramî hatine dîtin. Dr. Seîd el-Kurdistanî 3 heb ji van nivîstekan birine Biritanyayê û teslimî arkeolog Prof. Minns kirine. Ev her sê nivîstek berya zayînê li salên 88, 22 û 11an di dema Aşkaniyan de hatine nivîsandin. Yek ji wan bi alfabeya aramî, du heb jî bi alfabeya yewnanî bûne. Prof. Minns derbarê her duyên Yewnanî de lêkolîn kiriye û encamên lêkolîna xwe di sala 1915an de di kovara "*Lêkolînên Helenîstîk*" de daye weşandin. Minns nivîsteka bi aramî jî ji A. Cowley re şandiye ku ev zanyar wê demê li ser zimanên samî pîspor bûye. Cowley wergera vê nivîstekê di sala 1919an de di kovara "*JRAS*" de weşandiye. Nivîstek ji 8 rêzan pêk tê. Cemal Reşîd Ehmed hem orjînalê wê nivîstekê hem jî bilêvkirina wê ya li gor Alfabeya Erebi di kitêba xwe ya bi navê "*Zuhûru'l-Kurd Fî't-Tarîx*" de qeyd kiriye. Ji 22 tîpên alfabeya aramî ya wê çaxê hew 14 tîp tenê di vê nivîstekê de hatine xebitandin. Loma di xwendina wê de hinek astengî derketine holê. Ji aliyê kurdolojiyê ve ev nivîstekên han gelek girîng in. Nivîstek ji peymaneke bazirganiyê pêk tê. Têde behsa kirîn û kirêkirina rez û baxçeyan tê kirin. Navê kesên ku bûne şahidê wê peymanê jî yek bi yek tê de cih digirin.

3. Alfabeya Bînû Şad û Masîsûratî

Ev alfabe ji 37 tîpan pêk tê û ji rastê ber bi çepê ve tê xebitandin. Tîpên "P, Ç, J, G" ên ku di alfabeya erebî de nîn in di vê alfabayê de hene. Tîpa "Ĝ" a ku di alfabeya Celadet Bedirxan de nîn e di vê elfabayê de heye. Tê de du heb "k", du heb "ç" û du heb jî "p" hene.

a-b-c-d-h-w-z(ز)-h-t-y-k-l-m-n-s-ç-f-s-q-r-ş-t(ت)-
s(ث)-x-z(ذ)-d(ض)-z(ظ)-ğ-p-ç-ç^ -k^ -g^-p^-v-?-j

Ji bilî kurdan tu miletekî di "Alfabeya Bînû Şad û Masîsûratî" nexebitandiye. Bînû Şad û Masîsûratî du eşîrên kurd

⁸ Ehmed, Cemal Reşîd, *Zuhûru'l-Kurd Fî't-Tarîx*, II, r. 329-374, 493-510

in. Kitêba herî kevin ku behsa vê alfabe ya kurdan a taybet dike, kitêba erebî ya bi navê "*Şewqû'l-Musteham Fî Ma'rifeti Rumûzî'l-Eqlam*" e. Nivîskarê vê kitêbê Ehmed kurê Ebubekir kurê Wehşiyê ye. Di literaturê de bi kurtasî wekî Ibnu Wehşiyê tê naskirin. Bi xwe keldanî bûye û bi zimanê kurdî jî zanibûye. Wî ev kitêba xwe li ser daxwaza hukumdarê Endelusê Ebdulmelikê kurê Ebdurrehman nivîsandiyê. Ebdulmelik xwestiyê ku bizanibe ka ji destpêkê heta dema wî çend cûre nivîs û alfabe hatine bikaranîn? Ibnu Wehşiyê li ser vê daxwazê vê kitêba xwe di sala 241ê koçî/856ê zayînî de nivîsandiyê. Nivîskar di bin sernavê "*Sifetu qelemîn axere mine'l-eqlamî'l-qedîme*" (Şiklê qelemek din ji qelemên kevin) de wiha dibêje: "Kurdên Binu Şad û Masîsuratî temamê berhemên xwe yên zanistî û hunerî bi vê elfabeyê nivîsandine. Tîp û şiklên ku di vê alfabeyê de ne pir xerib û kevnar in û di alfabeyên din de nayên dîtin. Min li Bexdadê di nav meqberên îsewîyan de 30 pirtûkên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsandin dîtin û du heb ji wan niha li Şamê li bal min in. Yek jê derbarê *edilandîna rezên tîrî û xurmeyan* de, yek jî derbarê *derxistîna avê ji bin erdê* de ye. Ji bo ku însan jê îstifade bikin min viya ji zimanê kurdî wergerand zimanê erebî. Çawa ku tu dibînî şiklê vê elfabeyê ev e...". Belê Ibnu Wehşiyê wiha gotiyê û orijînalê alfabeyê di kitêba xwe ya navborî de qeyd kiriye.⁽⁹⁾

4. Alfabe ya Avestayî

A	Â	Î	İ	U	Û	i	İ	İ
O	Ö	Ü	A	E	K	x	xw	G
Ğ	İi	Ç	C	Z	J	s	T	S
D	Z	N	P	F	B	w	M	Y
Y	R	V	V	S	Ş	ş	H	

⁹ Muhemmed Mela Ebdulkerîm el-Muderrîs nusxeyek jî vê kitêbê bi dest xistiye û fotokopiya rûpelên 134 û 135an ku di wan rûpelan de behsa vê alfabeyê tê kirin di kovara erebî ya bi navê "*Gulan*" de digel meqaleyekê weşandiyê. Navê meqalayê ev e: "*Kane li'l-ekradi eyden hurûfun yektubûne biha*" (Alfabe û tîpen Kurdan jî Hebûn û Kurdan Bi Wan Dinivîsandin). Hogir Tahir Tewfîq di pirtûka xwe ya erebî ya bi navê "*el-Elifbau'l-Kurdiyye*" (Alfabeyên Kurdî) de piştî hinek agahîyan ev her du rûpel digel alfabe ya navborî qeyd kirine. Ebdullah VARLI jî di kitêba xwe ya bi navê "*Diroka Dugelên Kurdan*" de heman tişt kiriye: Binêrin Muhemmed Mela Ebdulkerîm el-Muderrîs, "*Kane li'l-ekradi eyden hurûfun yektubûne biha*", kovara *Gulan*, Hewlêr, 1999, hejmar: 40, r. 97; Hogir Tahir Tewfîq, *el-Elifbau'l-Kurdiyye*, çapa yekemîn, Hewlêr, 2005, r. 16, 81; Abdullah VARLI, *Diroka Dugelên Kurdan*, derpêç 1, r. 38-40.

Avesta bi zimanek ku gelek nêzîkî kurdiya mukrî ye hatiye nivîsandin. Loma, ji kurdiya mukrî re "Diyalekta Avestayî" ji tê gotin. Alfabe ya Avestayî ji 44 tîpan çêbûye. Ev alfabe ne bi tenê malê komeleyekê ye. Belkî digel kurd û farisan komeleyên Îranî bi gelemperî vê alfabe yê xebitandine.⁽¹⁰⁾

Tîpên "P, Ç, J, G" ên ku di alfabe ya erebî de nîn in, di vê alfabe yê de hene. Tîpa "Ç" a ku di alfabe ya Celadet Bedîrxan de nîn e ji di vê alfabe yê de heye.

1. 5. Alfabe ya Pehlewî

Kurdiya Feylî di dema dewleta Sasaniyan de zimanê fermî bûye. Di navbera sedsalên sêyemîn û heftemîn ên zayînî de gelek kitêb û arşiv ên mîna *Zend Avesta*, *Dînerd*, *Bondhîşin*, *Pendnamegî Zaraduşt* û *Mînokî Xîred* bi vê diyalektê hatine nivîsandin. Li gor Cemal Reşîd Ehmed van kitêbên ku navê wan li jêr derbas dibin ji di dema Ebasîyan de ji diyalekta Feylî bo erebî hatine wergerandin lê eslê wan bi şaşîti wekî farisî hatine qebûl kirin:

Sîndbadê Behrî
Hezar û Yek Şev
Xudayname
Karname
Ayîrname
Kereteke û Demeneke (Kelîle û Dîmne).⁽¹¹⁾

6. Alfabe ya Sir

- Ji 30 tîpan pêk tê

**a (e)-b-p-t-c-ç-h-x-d- z(ذ) -r-j-s-ş- s(ص) -
d(ض) - t(ط) - z(ظ) - e(ع) -ğ-f-q-k-g-l-m-n-w- h(ه) - y**

Ev alfabe di nav kurdên Êzîdî de belav bûye. Ji ber ku kurdên neêzîdî û ereb û farisan di destpêkê de tiştek ji tîpên vê alfabe yê fam nekiriye jê re hatiye gotin "alfabe ya sir". Tê gotin ku her du pirtûkên pîroz ên êzîdîyan ên bi navê *Mishefa Reş* û *Cilwe*

¹⁰ VARLI, Abdullah, *Dîroka Dugelên Kurdan*, derpêç: I, r. 23, 44-46

¹¹ Ehmed, *Zuhûru'l-Kurd Fi't-Tarîx*, II, 126.

bi vê alfabe yê hatine nivîsandin. Alfabe ji aliyê rastê ber bi çepê ve tê xwendin û nivîsandin. Tîpa "J" carna di cihê tîpa "Z" de tê bikaranîn ku ev her du tîp niha jî di nav kurdan de yek li cihê ya din tê bikaranîn. Bo numûne hinek kurd dibêjin "ez jî" hinek jî dibêjin "ez zî". Her wiha di cihê "V" de "W", di cihê "Û" de jî "Y" tê xebitandin.⁽¹²⁾

Tîpên "P, Ç, J, G" ên ku di alfabe ya erebî de nîn in, di vê alfabe yê de hene. Tîpa "Ğ" a ku di Alfabe ya Celadet Bedirxan de nîn e jî di vê alfabe yê de heye.

7. Alfabe ya Erebi

Piştî qebûl kirina dinê Îslamê wek gelek milletên musulman kurdan jî di nivîsên xwê de alfabe ya erebî bi kar anîne. Ji sala 1000ê koçî/1591ê zayîni û pê ve helbestvan û edîb û zimanzanên kurd berhemên xwe yê kurdî bi alfabe ya erebî nivîsandine.

Kurdan jî bo standard kirina alfabe yê di nivîsên xwe yê kurdî de li gor fonetîka zimanê xwe di alfabe ya erebî de konax bi qonax hinek guhartin çêkirine. Ji bo van guhartinan hinek sebeb tîpên nîşandan. Ez dixwazim berê van sebebên û guhartinên ku kurdan jî bo van sebebên di Alfabe ya Erebi de çêkirine binînin ziman:⁽¹³⁾

1. Repertuara fonetîka zimanê kurdî ji 29 tîpên dengdar û ji 9 tîpên dengdêr pêk tê. Lê ji tîpên dengdar 7 heb di alfabe ya erebî de nîn in ku ew jî ev in: **(P, V, L, R, Ç, J, G)**

2. Ji 9 tîpên dengdêr ev 3 heb tenê -ew jî wekî nisbî- di alfabe ya erebî de hene: (a, i, u)

3. 3 dengdêrên kurdî yê pêş (î, ê, î) di erebî de bi tîpek tenê tîpên nîşandan ku ew jî (ى =y) ye.

4. 3 dengdêrên kurdî yê paş (u, û, o) jî di erebî de bi tîpek tenê tîpên nîşandan ku ew jî (و =v) ye.

5. Di bêjeyê de bihevbûna tîpan, hindikiya dengdêran û pîrbûna nuqteyan jî di xwendin û nivîsandina di demek kurt de wekî astengî hatine dîtin.

Di vê çarçove yê de kurdan di alfabe ya erebî de ev guhartinên gelemperî kirine:

¹² VARLI, Abdullah, *Diroka Dugelên Kurdan*, derpêç: 1, r. 24-25, 56.

¹³ Derbarê van sebebên û guhartinan de binêrin Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Din* (1918-1985), Weşanên Avesta, wergerên ji îngilîzî bo tirkî: İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Stenbol, 2005, r. 293, 516

1. Ji tîpên biyeknuqte li (ب b , جc, ز z du nuqteyên din zêde kirine û bi vê zêdekirinê ev tîp bûne (پ p), (چ ç), (ز z).

2. Nişanek danîne ser "kaf" a erebî (ك k) û wekî (گ g) bi kar anîne. Ev tîp di destnivîsên kevin de hatine xebitandin lê ji ber ku qalibê wan di çapxaneyên nav welat de tinebûn heya di gelek kitêbên ku di navbera salên 1920-1930'an de hatine çapkirin jî ev tîp nehatine xebitandin.

3. Li ف =f ya erebî du nuqteyên din zêde kirine û bi şiklê ف yê bi kar anîne.

Bi taybetî li Kurdistana Iraqê û li ya Îranê hinek tiştên ku di vî warî de hatine kirin ev in:

1. Berya bikaranîna morfeman ji bo derxistina dengê qalind (رر، و و) yê ev tîp hatin dubarekirin

2. Paşê morfemên mîna heft û heştên erebî (8·7) hatin bikaranîn. Mînak: (ڙ).

HELBESTVANÊN KURD HETA BABA TAHIR

Mamoste QEDRÎ

Dewra Zerdeşt û Avestaya Wî

Hinek nivîskar û lêkolînerên kurd ên mîna Pîremêrd, Reşîd Necîb, Tewfîk Wehbî û Feqî Huseyn destpêka helbesta kurdî digihînin Avestayê. Çawa ku tê zanîn, Avesta navê wê kitêbê ye ku Xwedê ji Zerdeşt Pêxember re şandiye. Zerdeşt, beriya zayînê di sedsala şeşan de jiyaye. Van nivîskarên navborî bal dikişînin ser helbestên Zerdeşt Pêxember. Ez dixwazim ji bo minakê sê rêzan ji helbesteke wî ji we re pêşkêş bikim.

*Yemm e xîşter awrûh e
Newît ewtem newît germem
Newît zor û newît mîrîtîyuş*

Ango;

*Cem padişahêk pîr navdar bû,
Dema wî ne sar bû ne germ bû,
Ne pîrbûn hebû ne mirin hebû*

1. Porapoj (330 Sal Beriya Zayînê)

Li gor ku nivîskarê kurd Enwer Maî di kitêba xwe ya bi navê "el-Ekrad fî Behdînan (Kurdên Badinanê)" de neqil dike, di van demên dawîn de du helbestên kurdî hatine dîtin, ku dema nivîsîna wan digîje salên navbera 330-320ê beriya zayînê. Yek ji xwediyê van helbestan Porapoj e, yê din hê nehatiye zanîn. Ji van her du helbestan du malik ev in:

*Xwezdî ez bi hev ra bun
Werdî bihîrîn kûtra bun*

*Bî hîv ra hîrîn xûrînî
Bangîk dîn bi hîv ra narînî*

Ango;

*Xwezî bi wan rojên ku em bi hev re bûn,
Em bi hev re diçûn ser çîyan*

*Were em bi hev re biçin derve
Em bi hev re kûlama Narînê bibêjin*

2. Xelîl Mendelîcî (640-641ê Zayînî)

Hê di dema vî helbestvanî de xelqê bajarê Şarezorê, ez dikarim bibêjim ku bi tevayî kurd bûne û hê li ser dîne xwe yê Zerdeştîyê bûne. Di wê demê de şerekî mezin di navbera artêşa ereb û kurdan de qewimiye û kurdan gelek zirar dîtiye. Helbestvanê kurd ku navê wî Xelîl Mendelîcî ye, li ser vî şerê giran helbesteke bi şewat gotiye. Çend rêzik ji vê helbestê ev in:

*Hurmuzgan raman aritan kejan
Wêşan şarduwe gewrê gewrekan*

*Zorkarê 'ereb kerdne xapûr
Genay paleê heta Şarezûr*

*Şin û kenikan we dil beşîna
Mêrd azar tîlî jî rûyê hewîna*

*Rewîştzerdeşte raman we bêkes
Bizîka nîka Hormîz wa hêwic kes*

Ango;

*Perestgeh xira bûn agirê wan vemirî
Mezinê mezinan jî xwe veşartin*

*Zorkerên ereb kirin xirabe
Ji gundan hetanî Şarezor*

*Jin û keçik dîl girtin
Mêrxas di nav xwîne da gevzîn*

*Dîne Zerdeşt bê xwedî ma
Hurmuz alikariya tu kesê nake*

3. Pîr Şalyar (786ê Zayinî)

Li gor ku Hazim Hacanî di kitêba xwe ya bi navê "*Sefahetun Min Tarîxî'l-Kurd*" de neqil dike, Pîr Şalyar kahineki Zerdeştî bûye. Bi kurdiyeke zelal gelek qesîde gotine. Lê nivîskar di vî warî de numûneyan ji helbestên wî nade.

Pîr Şalyar pirtûkek bi navê "*Merîfetname*" bi zimanê kurdî bi diyalekta hewramî nivîsandîye. Vî edibê han ji bêtifaqiya kurdan hê wê çaxê gazin kiriye. Ez dixwazim gotineke wî ya di vî warî de bi kurmanciya îro neqil bikim:

*Rûvî li ba rûvî, şêr li ba şêr, gur li ba gur, ker li ba ker dijîn;
Kurd! Çi hatiye serê we ku hûn ji hev balav bûne û nayên ba hev?*

4. Baba Rûx Hemedanî (841ê Zayinî)

Ev dem rastî çaxa Ebasiyan tê. Di vê demê de hinek şer û pevçûn di navbera kurdan û Ebasiyan da çêbûye. Helbestvanekî kurd bi navê Baba Rûx el-Hemedanî li ser van şer û pevçûnan helbestekê dibêje û ji bo yekbûnê bang li kurdan dike. Profesora Îzedîn Mistefa Resûl vê helbesta han ji kovara *Ronahî* girtiye û wergerandîye erebî. Ji ber ku min metna orijînal bidest nexist, loma jî ez dê erebiya ku Mamoste Îzedîn qeyd kiriye tevî wergera wê ya kurmancî bo we pêşkêş bikim:

يا كهول تعالوا مجتمعين
يا شباب تعالوا متكاتفين
لتمسك الأيدي المتنجس
والرمح و السلاح القاهر
لنذهب إلى المعركة كالأسود
ونتغلب على الأعداء
و ليصبح وطننا عيدًا
وربيعًا و أيامًا مزدهرة

*Werin li hev bicivîn gelî pîran
Hûn jî mîl bidîn hev û werin gelî xortan!*

*Bîla dest zeft bikin xencera ji sedefê
Û bîla zeft bikin mertal û silehê zorê!*

*Da em têkevin nav şer wekî şêran
Û em serefrâz bibin li dijî dijminan!*

*Ji bo ku bibe wek çeşnek welatê me
Û bîla bibe bihar û ronahî rojên me!*

5. Baba Tahir (938-1010)

Li gor agahiyên ku di "Ansiklopediya Îslamê" de derbas dibin Baba Tahirê Uryan (938-1010?) li Hemedanê seydayê medreseyê bûye. Di zivistanê sar de xwe tazî kiriye û ketiye nav hewzekê û heya sibehê di nav avê de maye. Loma leqeba *Uryan* (Tazî) lê hatiye kirin. Li gor menqîbeya ku Jukovsky neqil dike Baba Tahirê Uryan di wê şevê de gihastîye dereceya welitîyê û gava bûye sibe bi erebî wiha gotiye:

أُنْسَيْتُ كُرْدِيًّا وَ أَصْبَحْتُ عَرَبِيًّا = *Emseytu kurdiyyen ve esbehtu erebiyyen*

(Ez êvarê kurd bûm, serê sibê bûm ereb).

Ez dixwazim bi çarîneke wî ya watedar dawî bidim gotara xwe:

*Gula min çandî û vê ra birî xem
Ji roka min weşandî lê wekî çem
Li dergehê Îlahî ma dibîtîn!
Ew a mîn bit û bêhna xelq û alem.*

ÇEMKÎ ENDÊŞE

LE NÊWAN ŞÎKÎRDINEWEY DEQ Û ARASTEKIRDINÎ MEARÎFÎ DA

Ahmed QERANÎ

PÊŞEKÎ

Seraray girîngî çemkî endêşe, ke be regezêkî serêkî her karêkî edebî da-dînêrit, belam ta ku êsta le nîw dezga zanistîye mirovîyekan mandîye be gwûrey pêwîst bayexî pênedirawew, eger lêre û lewêş şitêk le barey pêgew karîgerî em regeze nusirabêt ewe le babetekî giştgîr û serbexo da nebuwe, belku be şeweyekî lawekî le nêw lêkolînekanî tir de hatuwe (be taybetî êwaney le biwarî xurpe û wêney şîrî-da emade dekirên)yanîş le perawêzî dîraskirdinî regezekanî tirî edebî da(bîr, soz, şewaz)şîkirawetewe, boye be pêwîst man zanî embase bo em babete terxan bikeyin, ke le pêname û wata û rolî endêşe dekolêtewe û erk û pêgey endêşe le nêw rêbaze edebiyate cîyacıyakanda dexateru. Le kotayîda le çonyetî peydabûnî endêşey mearifî û berawerdkirdinî legel endêşey selefî da dekolêtewe.

PÊNASEY ÇEMKÎ ENDÊŞE

Be pêy têrwanîniy rêbaze cîyacıyakanî edebî, wate û pênamey çemkî endêşe degordirêt, belam hemîşe xale hizirîyekanî hevbeş û binema hunerîyekanî lêkçu le nêwanyan da hen û eger cîyawaziyakîş hebêt, ewe ziyatir le rêjey girîngî pêdan û corî şîkirdinew da bedî dekirêt. Lêre da hendê lew têrwanîne weku nimune dexeyîne berçaw. Lewane: Endêşe tiwanayeke le tiwanakanî mêşk û le rêgay eweweşte û nibuwekan carêkî tir xoyan le nêw hesit û têrwanînekan man da denwênin(22/1). Belam be pêy boçûnî şîliy cîyawaziyeykî bineretî le nêwan mêşk û endêşe heye û lem barêyewe delêt: Bîrkirdinewe birîtiye le serjimêrî ew şitaney ke pêştir zanrawin, belam endêşe birîtiye le derkpêkirdinî behay em şitane be şewey tak binyanîş koyte-wawbin(74/8). Be hêman şewe le barey erk û karîgerî endêşewe deg-

witirêt: Endêşe hêzeke le hêzekanî derunî ademîzad. Wêjer behoyewe detwanî be wûşe û riste wêney huner-îşêwazî rewanbêjî sazbiakat û soz û helcûnî le babetekî da bigeyenête giwêgir û xwêner(159/8). Yanîş endêşe weku hokerêk becardêt bo destberkirdinî xoşî û hêminî ke berêgay ewewe hunerî edeb detwanin mêşkî mirov hêwir bikenewe wefebariyekêşî suktir biken(169/14). Pêtirîş Sokrates basî kirdiwew endêşey şair be (şêtafî bala) wesif dekat. Be hêman şêwe şair le lay Eflatunîş xawen kesayetiyeke berz nenu belkî bekesêkî şiwênketuyî dadena û lew bawereda bû ke ew giyaney şairan be şiwênyan dekewtin xêrmendibinya yan şeran-gêzbin belam Aristotales danîbewe dadena ke şair xawenî twanayekî endêşe amîje û êm tiwanayeşî berz denirxand, çunke şair detwanêt çendîn wêne kobikatewew herweha şayanî mecazişî heye (139/5). Tenanet hendê car wa mezin da dekirêt ke(endêşe detwanêt rastiyeke bidezêtewê) (122/13).

Bem şêweye endêşe regezêke le regezekanî karî edebî û kolegey binçî-nayeti. Diyarê em regeze karîgeriyeke gwrey le şîr da begîştî û wêney şîrî betaybetî heye(68/4). Endêşe serçaweyekî girînge bo diristkirdinî wêne hiziriyekan bo nimune eger bê bikirêt bo mawey çend çirkeyek xeyal le bonî gulêk yan tamî sêwêk bikeyt ême du haletî endêşey yanîş du wêney hest-pêkirawn, yekemyan be wêneyekî çêj-wergirtin dadenirî(320/3). Le ruy girîngî zanistîyewe Tayndal delêt: Endêşe ew endazyareye ke nexşe tiyorî fizîkiyekan dadenêt û pişt bew şitan

debestêt ke ezmun û têbinîye wîrd-ekan boy degozênewe(12/95). Begîştî detwanin bilên endêşe çalakîekî eqilîyew şarezayî ye xoyetiyeke mirovî têda azad debin û şewekanî giryanew wêne hiziriyekan û bera-wirdkariyekan werdîgirin belam ew rawboqunaney pêştir ke endêşe wek çemkêkî edebî şîdekenewe anku legel endêşey zimanewanî(LINGUSTIC IMAGINATION) Têkel deken ke corêke le corekanî endêşey xulqîner. Legel emeşî da dekirî-çemkî endêşe le didyay zanistî û felsefiyeweş pênase bikirêt û beşeweyekî tirşî bikirêtewe ke lêre da rastewxo peywendî be babetekemanewe nîye.

ENDÊŞEY XULQÊNER

Endêşe tiwanîyekî eqliye û ew têrwanîne hestiyekan berhem dênê ke taybetin be şitemadiye winebuyekan em tiwana eqliyeş du core: Yekemyan ew wêneyanen ke pêştir însan bînîwi-yew carêkî tir dênewe yad emeş be endêşey bebîr hênanewe yan geranewe newazed dekirêt. Duwemyan: Ew wênanen ke le wêne kone winbuwekanewe dirust debin, emeş pêy delên endêşey xulqêner. Lêre da endêşey webîrhêner weku le bîr kirdineweteke wêney şitekan dênêtewe yan dexatewe yad belam le bîrkirdinewe zîyatir hêwir û çeqîwew hemîşe be şiwên û kat bestirawetewew wênekan dewru-jênêt dûr lewey le çîwarçêwe bidirên. Anku le derewey baziney kat û şiwên demênewe.

Endêşey xulqêner le ser paşmavey- ne hestpêkir rawekanîke lekekiraw le

nêw bîrdan da dirust debêt cîhanêkî selîqadrî aydîyalî dewlemend û bêsinor pêkdênê û eger bayax be cîhanî rasteqîne bidet ewe dewlemendtir û ciwantirî dekat. Emeş tiwanayekî dahênerenêyew ziyatir le leyan hunermend û zane û serleşker û sîyasetmedar û bîrtîj û ronakbîran bedî dekrêt û le dêr zimanenew ta ku êstaş em tiwaneyê serataw destpêşxerî hemu dozînewew efirandin û dahênanî dinyayî ême ye(244/16).

Karkirdin û xaxerîk kirdinewey tawaw be endêşey xulqêner yekek yeşîma cîyakerewekanî edebî nuwexwaz buwe anku ew edebey wîstî binema serekîyekanî rêbazî klasikî bigorêtu şiwên pêy felsefeyekî nêw bikewêt ke cexit le ser azadî takekesî û ciwanî siruşêt dekat lem ruwewe detwanîn bilêyne ke bayexîdanî feylesofekan be endêşey xulqêner degerêtewe bo (Davîd Hume)le sedey hejdeyemî da boy dele ruy edebîyewe debêt meseley endêşey xulqêner le dîdgay rêbazî romansiyetewe seyr bikirêt çunke niwêxwazî lewe cuda nebuwe, belku berdewambunêkî firegirî û pir alozî ew buwe.

Hizirkirdin u bo çunî rêbazî romansî bayex û şwênêkî nuy be (xudzat)dedat, boye edebîş weku laynekanî tir pêwîstî be endêşeyekî xulqêner bu(6/86).

COREKANÎ ENDÊŞEY XULQÊNER

Endêşey xulqêner anku bîrkirdinewey endêşey (îmagînative thînkîng) mercêkî serekî ye le hemu dahênanêkî hunerî û edebî da û ruy duweme le

bîrkirdinewey waqîîye-Realîstîc Thînkîng.

Eger bîrkirdinewey waqîwî mamele le gelê dîyarde hestpêkirawekan dekat û be pêy pêwêre zanîstî lojîkîyekan heldese nigênîrêt û peyweste be helwête derekîyekanî mirovewe û hemîşe le jêr kontrolî eqil û rastîyekananda berceste da dekirêt... Ewe bîrkirdinewey endêşeyî (endêşeyî xulqêner) nakewête jêr kontrolî eqilyan le jikewew diyaredekanîşî be şewey wêne bînrarawekan berceste nakirên û eger çî ta êsta hemu laynekanî roşin nekirawnetewe belam be pêy karîgerî û derlawêştekanîyewe corekanî destnîşan bikirên ke emanen:

1- Endêşe kirdarî(pratîcal îmagînation): em core endêşeye ziyatir layenî xulqandin û efirandine pîşesazîyekan herweha berheme hunerîyekan weku musîqa û nîgarkêşî û peykertiraşî degirêtewe.

2- Endêşey zimanewanî (lîngustîc îmagînation): em coreş le lay şaîr û romannîvîs û nivîskaran bedî dekirêt û karameyan leweda bedyar dekewêt ke çend beser zimanda zalin.

3- Endêşe niwandin(Represantatîonal îmagînation): em core endêşeye pişt bew wênane debestêt ke le ber çaw man nîn, belam berêgay eqilewe debînîrên, çî ewaney pêştîr le rojevî jîyan inan da tomarkirawin, weku yadewerîyekanî serdemî mindalî yanîş ewaney bîstumane û detwanin mêşkî xomanda wênayan bikêşît, bo nimune weku şaxe befîrawîyekanî kîşwerî başûr.

ENDÊŞE Û FANTAZYA

Diway destnîşankirdinî cîyawazî le nêwan endêşe û bîrkirdinewey waqîwî haletêkî tirî nizîk le herdukyan heye ewîş(fantasy) be. Yan ewey pêy delên (bîrkirdinewey goşegirî) -autistic thinking- anku pena bo endêşe birdin le şêna û rakirdin û durketînewe le waqî. Emeş çend corî heye, lewane fantazy(fantasy) û qulbun le bîrkirdinewey xewneamêz(reveîre) û bîrkirdinewey arezumendane (wîshful thinking) û zîndexewn(daydreaming) da.

Cîyawazî le nêwan bîrkirdinewey goşegirî û bîrkirdinewey endêşey eweye, le yekem da: bîrkirdinewey goşegirî be tewawetî nêw xwaste derunînekanî mirov da sînardare, weku le xaletî pêdawîstî û arezûkirdin ruberubunewey rikaberîyekan da û nakewête jêr control mirovewe belam le duwem da: bîrkirdinewey endêşey be heman şêwe le xwestekanî mirovewe sercawe degîrêt belam be rêgay hokare derekîyekanewe dewrujirêt û be şêwey kêşe yan karêkî destnîşankiraw bedyar dekewêt û le jêr kontrolî mirov da ye.

ENDÊŞE Û RÊBAZÎ KLASÎKÎ

Zaraway endêşe bo yekem car ,le (Fîlustratus) da bekarhatuwe le serdemî Grekîyan da(69/9). Her weha le katî Arîstoteles amaje be karî nusîn dekat beşêweyekî way derdexat ke debêt core xeyalêkî awêtey le pêş karî edebî da hebêt û hemu şitêkî watedar çêjwergirtin berew verêjêkî hawseng û pesendkiraw bibat, çunke le bineret da

guftugo le çalakî ye hizrîyekanî huner-mend nakat, dîdwîhesît û xurpe û endêşe degîrêtewe belku bas le exbame babetîyekanî ew çalakîye hizrîyane dekat(60/9)

Belam be giştî le rexney edebîyekan da, way bo deçin ke nabê endêşe (xeyal) le şîir da bekarbêt belku debê layenî eqîl balî beser şîirda bikêşê û zîyatir bidirête pal rastîyekan nek soz û xeyal(69/4). Lem ruwewe feylesoffî klasîkîyekan hemîşe prensîbe rexneyîyekanyan legel têrwanîne hizrîyekanyan bo jîyan têkel dekird, bo nimune Eflatun û Arîsto be şêweyekî metafîzîkî û meerîfî û rewîştî mameleyan legel şîirda kirduwe. Be heman Asît (Horas)yiş le ser jêr xane û rêsa û şêwazekanî şîir karî kirduwe her benawî "*Hunerî Şîir*" kitêbêkî danawe ke teyda bo çunekanî Arîsto pesend dekat. Çunke ew bexoy şair buwe. Tiwanîwîyetî çemkekanî şîir be giyanêkî germ û gurtir dabirêjêt. Ke debê hemu şairêk pêwey pabend bêt. Em bo çunaney Arîsto û Horas berde-wambun û le serdemî rênîsa nisîşîda zîyatir pereyan sende û nuseranî weku Markî Gîrolame û Nicholas Biwîlyo heman rêçkeyan girt û her yekekîyan kitêbêkî be nawî *Hunerî Şîir* ewe dana, ke ziyatir şîirkirdinewey bîr û boçunekanî Arîsto bûn. Em rêbaze heye sere-tay sedey nozdeyem berdewam bû. Ke edeb be giştî û şîir be taybetî be diyardeyekî rewîştî dadeniraw kar û erkî şair be ronî destnîşan dekiraw. Le bazneyekî lasayîkirdinewe da dexulayewe(63/18).

ENDÊŞE Û RÊBAZÎ ROMANS

Diway peydabunî brayanî Şîlgil le Elmanya le kotay sedey hejdayem da û lew katey wirdizurit(1770-1850) û Kalirdic(1772-1834) honrawe lîrikîyekanyan le salî(1798) belaw dekirîwe, gelê helwêst û liizir û şewezekanî peywendar be hunerî romansîyetewe seyran heldabû. Emeş bizutneweyekî dubare bexodaçunewe bû, ke be dirêjayî sedey hejdayemewe le Arada bû (215/17). Her çende wirdizirit şîrî be helçunêkî xorşîkî dadedena ke hest û sozêkî bekole le wirujanewe heldeqolêw şaîr 'be proseyekî tazewe û be hêminî bo bîrdank û yadewewerekanî degerêtewe û dahênanêkî niwê le berhem dênêt. Belam le lay Kalirdic endêşe pêwaney ciwanî û binemay şîr buwe û be tewjîmêkî hêzdar benawdebatike le derunî şaîr da heye û detwanê penay bo bibat bo ciyakirdinewey şite derkpêkirawekan û şikirdineweyan bo efrandinekî niwê, emeş pêçewaney wehme(fancy) ke tiwanay serle niwê dar şitnewekî niwê nîye.

Kolirdic be kêk buwe le şaîraney ke destî be tiwêjînewey (prensîbî xulqên-erî) endêşe kirdu tiwana riwhyekes dozîyewe ke behêy ewewew le rogay şewazekanî huner da şaîr le xwedî xoy derdebîrêt. Felsefey Metafizîkî hêç rolêkî le karenwênekanî êstada nema-bû ke bayex be prensîbe edebîyekan deden û le astêkî nîzmî heqîqenda dekolnewe(188/9). Bem şeweyewey Kolirdic beşêkî le prosey ayabun bo (endêşey yekgirtu) dadena û be pêy felsefey (Kant) karî dekirî. Ke endêşe

rolekî lawekî debînêt le pêkhate bala-kanî têgeyîştin da û hemîşe elqey bestineweyewey le nêwan cîhanî hest pêkirdin û cîhanî derkpêkirdinî pemkekan da.

Diwatir be pêy çespendinî hengawekanî rêbazî romansî û perasendinî binemaw prensîbekanî rolê endêşe zîyatir bediyarkewt û çendîn nuser û şaîrî ser bem rêbaze geyîştine lutkey dahênan. Le wane Şatubiryân(1848-1768) ke endêşey kirdibuwe amrazî here binçîneyî dahênanî babetekanî û hemu soz û hest û hizrîyekanî tê da berceste dekirî û em haleta le ser Keats û Şîllî û Hovman û Byron... Hitid hawşewê debêt.

ENDÊŞEY RÊBAZÎ REXNEYÊ NÎWÊYEKAN

Diway peydabunî çendîn rêbazî tîrî edebî le nîwêy yekemî sedey bîstem da (cigele rêbazî realizmî ke le nîwêy sedey nozdeyemde peyda bû) be pê zorbûnî ew rêbazane rêçkew şewazî lêkolînewew rexnegirtinîş zor bûn. Û ew qutabxane rexneyîye niwênayes binemaw prensîbekanîyan be şeweyekî akademîk darêjrawnetewe weku rexney şewazgerî formalîstekan... Le nêw em dîrase qul û alozane da erk û rolê endêşe ciwantir şikrawnetewe. Her çende le nêw zanîste mirovîyekanî tîr da weku derûnnasî egeyîştibuwe karî teorî û zîyatir lenêw qonaxekanî geşekirdinî derkpêkirdin û zimanewanî da bas dekira bo nimune mindal ke le temenî (8-5) salê da ye zor hezî le çîrokekanî kurte balakan û çîrokekanî sîndebad dekat û derkê em

qonax be qonaxî endêşey azad nawezed bikrêt (222/3) belam le nêwan babet da (deq) girtuwe ke rolêkî peywestkarî degêrê le nêwan pêkhate watarekanî babet da ke be çend hêlêkî yektirbir da corî peywendîyekan destnîşan deket. Ke zor car em peywendîye diyalektîkiye yan lojîkiye yan Dezuleyî ye yanîş terîye helbeste em proseyeş ke têkelkêşkirdinî peywendîyekane le nêwan endêşe da encam dedrêt.

Diway ronani peywendekanî pêkhate watederekanî babet le nêwan endêşeda. Peywendî endêşa behestewa dest pê deket. Diwatir hest be watawew wata be babetewe(5/19) Lêreda meseleka le şîkirdinewey derunizîk debêtewe. Ke emro hemu qutabxane rexneyeyekan kem yan zor piştyan pê debestî.

Bem şeweyêş behoy endêwe babetî edebî debête pantayiyekî azadî dêr le her destêwerdanêkî derekî (ke gorankarî waqî degêrêtewe) yan gorankarî naw xoy (ke xodî mirov degêrêtewe) belku erkî tenha çêj wergirtine ke emeş peyamêkî berdewamew pêwîstî be pêdaçunewe heye.

ENDÊŞEY MEERÎFÎ

Legel pêşkewtinî teknelojyanî le nîwey duwemî sedey bîstem da sîma here ciyakirewew ew serdeme ewebûwe ke pere sendinî amrazekan xêratir buwe le pere sendinî pemkekan û gewretirîn dahênanîş lem biware da serkewtinî lêkolînewey Eînsteyn bûwe. Ke le encamyan da teorî rêjey danaw her weku xoy lew bawereda bûwe ke rojînewey teorî

rêjey le encamî ewe da hatuwe. Ke xoy be xeyal da legel tîşkêkî ronakî bexêratî (186000)mîl/çirkeda seferî dekirdu ewey Eînsteyn be dîdî eglewe bînî nakirêt le rêgay hizre teorîyekan şîb- kirêtewe yanîş ravebikirêt(383/15). Le barey endêşewe deygot: Merîfe sinurdare belam endêşe sînurî nîye.

Teorî rêjey biwe çerxanêkî gewrey le mêjuy mirovayetî da dirust kirdu, le ser herdu astî teorî û pratîkî da. Çünke bo yekem car bû eynisan bitwanêt kontrolî zemen bikat. Lêreda ew teorîyey ke endêşey le pêş zemenî dadena le nawçu meseleke pêşewane bû.

Eger Eînsteyn tiwanî bêt zemen xîbate nêwan qewareyekî belam le duway ew(Bill Gates) tiwanî zemanêkî niwê û ciya le zemenî baw buxulqênê û bibête pêşeng û birbirey şorişî zanyarî le cîhan da.

Em zemeney niwê ke nawnira (super zeman) hawterîp legel zemenî tir derwa belam mesafe têyda hiç behayek nageyenê û le nawçu. Çünke be pêş zemanî bawda û herweku yasay duwemî Nîwtin selmandî xêrayî yek-sane be encamî dabeşbûnî mesafe leser zemen:

Mesafe

Xêray = -----

Zemen

Belam legel teorî niwê xêray yek-sana be zemen: xêray = zemen çünke mesafe berew xalî kotay royîştu û ge-yîşte nizîkey nimrey(0). Helbete eger mesafe nemaewe cografyaş namênê.

Boye em şorişe niwêyey zanyarî tiwanî sê hengawî serekî binirêt:

1- Lenawbirdinî: Cografya=şiwên =mesafe

2- Benemanî cografya, waqîtîş namênê çunke waqît komele rudawêke le nêw cografya da rudedat û eger cografya nebû ewe waqîtîş namênê.

3- Hebûnî zemenêkî tir, ewe degeyenê ke waqîtêkî tiriş heye û rudawekanî le cografyayekî tir da rudedan û ew waqîte be pêy boçunî şoriş zanyarî nawnira(waqîtî girmiyaney). Lem waqîtîda rudawekan ru deden û cografya û zemanîş heye.

Lêreda pirsîyarêk ser heldedat: Aya em halete demangerênêtewe bo ew endêşeyey Einstein behs dekîrd?

Detwanîn welameke be (belê) û be (na) bideynewe.

Helbete ewey ru dedat endêşe ye belam endêşeyekî waqîtî û hestpêkiraw endêşeyekî meerîfî-bo nimune katê dadinîşim û şeş yan hewt seet le nêw teorî internêt degerêm ewe lew-maweye da min le cihanêkî tir û le waqîtîkî tir da dejîm, le layekewe-waqîtêkî endêşe amêze le layekî tir ewe waqîtêkî rasteqîne û hestpêkirawe.

Ew endêşeyey Einstein behs dekird endêşeyekî bo sinurew le pêşewey meerîfewe dêt belam ew endêşeyey şoriş zanyarî doziwiyetewe endêşeyekî meerîfî bo sinur û waqîtîşe emeş bo yekem car delê mêjuy mirovayetî da meerîfe le pêş endêşewe bêt.

Xalê serekî lêreda eweye ke du xeyalê (endêşe)y xulqêner hene: Yekemyan ewey taku êsta edeb pê denusirêt ke endêşeyekî xulqêner

bûwe belam berew cihanêkî nezani-raw neçuwe, belku berew cihanêkî zanraw (ke le naw hoşyarî destecemî dêrîn û nizîkî da heye) çuwe. Nimuneş le edebî cihanî da zorin, bo selmandinî em bo çune çî kon weku *Hezar û Yek şew* û nawerast weku *Don Kîşofî Cervantes* û niwê weku romanekanî Faulkner (7-1/11). Yanîş weku profesor Arser Walî delêt: Rabirduy nimuney toxmêkî berbila-wele nêw zorbey rêbaze felsefe çîniyekan da(36/14).

Endêşey yekem pêy delên "endêşey rabirduperês" belam endêşey duwem pêy degutirêt "endêşey meerîfî" û bunî em du endêşey "endêşey rabirduperês û endêşey meerîfî" debête hoy dirustbûnî qonaxêkî lêk ciyakerewe le edeb da kesîna û akamekanî hêşta be tewawetî diyar-nebûnetewe emeş degerêtewe bo ewey ke peresendinî amrazekan hêşta le pêşewey peresendinî çemkekane.

ENCAM

1- Legel peydabûnî deqî edebî endêşe regezêkî serekî ew buwew yekem car em zaraweye le nêw nusrawe girîkiyekan da hatuwe.

2- Le nêw rêbazî romansî da zor bayex be endêşe dirawew weku babetêkî serbexo dirasetkirawew cor û erk û rolêkî destnîşankirawin.

3- Le şikirdinevey deqda be pêy boçunî qutabxane rexneyiye niwêyekanda girîngî endêşe ziyatir berceste dekîrêt ke bizwênerî corî peywendî-yekanî.

4- Ta êsta em çekme nebote teorî-

yek û le nêw zanîste mirovîyekan da pêgey xoy negirtuwew le nêw babetekanî tir da bas dekirêt weku le bîr kirdinewew agay û hoş û dekpêkirdin.. Hitid.

5- Peydabûnî endêşey meerîfî qonaxêkî niwê le rêbaze edebîyekan da dirust dekat û gorankariş beser zor layen da dêt be taybetî ke arastekirdinî berew cîhanêkî nezanirawe belam hêştay le seretadaye û le nêw bizavêkî yasarêj da berceste nebûwe.

SERÇAWEKAN

- 1- *El asatir el arabîyye qablel Îslam*: Muhammed Abdulmecid . El Qahîre.(1944)
- 2- *Edebul Etfal-Dîrasa we tabîq* Dr. Ebdulfetteh Ebul Meel. Tab: 2 Amman(1988)
- 3- *Usul Îlmul Nefs*: Dr. Ahmet İzzet Racîh.Matbaa Eşbîliye:Bexdad.B.T.
- 4- *Binyatî wêney hunerî le şîrî kurdî de* . Serdar Ahmet Hesen Gerdi. Suleymanî(2004)
- 5- *Te'wîlî şî'rî we fusefetuhu Înde Sofîyye* (İbn Arabî)Erîn Ewda Şerîkeful Şarqîl Awsat Lîl Tabbaa. Umman(1995)
- 6- *El Haddese Tahrîr Malekum Bîradbirî we Cîyms Mekfarîln*. Tercume: Mueyyed Hesen Fewzî. El Cuzîl Senî Bexdad(1982)
- 7- *El Xiyalu Wel Etfal* . Dr. Qasim Huseyn. Salih. *Cerîde El Mede*. El Eded 282 Esene 2. El Sebr:25/12/2004
- 8- *Rexnesazî(Mêju û Peyrewkirdin)*, Dr. Kamîl Hesen Azîz Besîr. Bexdad(1983)
- 9- *Sinaatul Edebî* R. A. Cîms. Tercume: Haşîmîl Hindawî. Bexdad(1986)
- 10- *El suratul şîrîye* S. Dilwîs . Tercume: Dr. Ahmed Nasîful Cenabî We Axarun. Bexdad(1982)
- 11- *An Rîyawetil Waqîfîyye Raqamîyye* Muhammed Sanecîlet www. sanajlehadows.com)
- 12- *Fennul Behsî İlmî* A.B. Bivîrdîc . Tercume: Zekerîya Fehmî Tabîa:5/Beyrut(19869)
- 13- *Filmîzanîl Cedît Muhammed mendur*. El Qahîre.(1944)
- 14- *El Mueteme Fil Aqlî* Charles Mac. Tercume: Dr. İhsan Muhammedulş Hesen. Bexdad.(1990)
- 15- *Medxelul İlmîl Nefsî lînedo* L. Davîdov. Tercume: Dr. Seyyudul Tawab We Axarun Dar Makcuruhîl Lîl Neşîr El Qahîre(1983)
- 16- *El Mucemil Edebî Sabur Abdunnur*. El Tabîl Ula. Beyrut(1979)
- 17- *Newzuatîl Mustalaun Noqdî Yutercîmuhe Anil İngîlîzîyefî*. Dr. Abdulwahîd Lulua El Mucelled El Ewwel. Bexdad(1982)
- 18- *Naqdul Şîir ulufîyye Fikîrî* : Tercume : Natîq xawsî. Mucelletul Saqatetul Enebiyye . Bexdad El Aded:2 (2004)
- 19- *El naqdul Mewduatî El Usus Wel Wefahîm*. Dr. Muhammed Belluhî Mucelledul Mewquffîl Edebî Dîmeşa/El Aded(394).Şîbat/2004..

ARS POETÏKA

Mem BAWER

Helbest paceya vê cîhanê ye, tiştên ku li derveyî vê jiyânê û ne-xuyayî ne bi saya helbestê têne şîrovekirin. Hunermend bi riya dest û giyanên helbestê pace û gemariya vê jiyana gosirmet bi libitandin û peroşên xwe paqij dike. Nivîs vederkirineke pîroz e, nivîskar bi giyanê xwe têgehên vê jiyânê estetîze dike. Helbestkar bi riya rêzikên xwe, nexşeya derûniya xwe bi mirovan re parve dike.

Helbestkar gava ku helbesta xwe diafirîne bi şik û gumanan tevbigere û helbesta wî di nava geremola peyvan de bifetise; gotinên ku dixwaze bibêje kêm bin, kesên ku wê helbestê bixwînin dê di hişê wan de hêma û wateyên kêm bimînin...

Ger parsûyên helbestê ne jiyân bi xwe be, dê rêzikên şikestî derbikevin holê, dê wateyên şolî û nedîtbar li çola xwedê bi dengê wîlwîlokê xwe

vebêjin û tu kes dê tahma helbestê jê negire. Helbestkar di jiyana xwe de çî bijî divê wana bi rihê xwe biçilîne, nerm bike şiklê wî biafirîne.

Ez nabêjim bila tiştên gelek sivik çêbibin ku hema kê bi çî hawî xwend bila di cih de têbigihîje. Lêbelê divê ku em dereng nemînin û vî zimanê spehî bidin hezkirin. Ê ev yek jî bi riya berhevan tê kirin û bi destê estetîkê. Peyva estetîkê bingeha xwe jî bêjeya grekî ya "aîsthesîs" digire. Ev peyv jî tê wateya hest û heskirinê, an jî nêzwateya vê peyvê ku têgihîştin, serwextbûn û îdraqkirin bi xwe ye.

Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku heskirin jî, ji tiştên ku çoş û peroş di nava me de dilibitîne û hestên me radike pîkolê pêk tê.

Di helbestê de şibandinên bêrih û bêtahm kêrî tu kesî û tu tiştî nayên, li qada jiyânê betal dikevin û têk

diçin. Kesên helbestkar hewce ye ku mîna feylesofekê tevbigere. Jiyân û xweza mîna cama krîstalî zelal û lal, li ber destên wî amade ne. Helbestkar divê ku bibe hilm û bi wê hilma efsûnî şikl û şemala wê camê biafirîne. Û dawîya dawî bi peyvên xwe yên rengo-mengo û pola li ser rûyê wê bineqîşîne. Di vê jiyana zindî û mirî de helbestafirandin, bo vê yekê karekî qedîm e. Helbestkar cîhanê bi riya peyvan piçûk dike û ew bi riya rihê xwe şîrove dike. Xwendevan hewce ye ku ji derewên me yên hêmayî û henûn bawer bike. Horatius beriya zayîna Îsa di "Ars Poetika" xwe de wiha dibêje. "Ger ku bixwazî ez bigirîm, divê pêşî tu êşê bikişînî." Em qinyatê bi gotinên wî bînin de baş be, an jî dilopek xwîna xwendevanan jî dê ji bo me nekele, tu çoş û heyecan jî dê di rihê wan de nelibite.

Çawa ku wênesaz bi çavên xwe vê cîhanê saz dikin, helbestkar jî bi guhên xwe dangan kedî dikin. Lewre peyv hov in, mirovên ji rêzê di vê jiyânê de bêhay dijîn, lê kesên hunermend vê jiyânê tevlî giyanê xwe dikin û helbest di qirika wan de tê daûrandin. Tahma helbestan jî dişibe ya fêkiyan, hin helbest hene, mirov piştî ku wan dixwîne di mejiyê mirov de nîgaşeke şîrîn hêlîna xwe çêdike. Hin helbest jî tahma tahl di gewriya mejiyê me de dihêlin.

Li van salên dawîn di piraniya helbestên ku li kovaran tîn weşandin de hema-hema em dikarin bibêjin ku hemî hêmayên wan ên ku tîn afirandin, an bi peyva "dîl" an jî bi

peyva "çav" ve û bi mijara bêrîkirina welêt û bi parsûyên çûyînê ve tîn zeliqandin. Û ev dûvik û hêma tevlî wan peyvên qudimşikestî li erda wextê dibin tejane. Rexneyên ku tîn kirin jî di binê giraniya dilmayinan de dipelçiqin.

Pirtûkên ku tîn weşandin, an li ser wan rexne nayên nivîsandin, an jî kesê ku bikaribe rexne binivîsîne jî, çavên xwe digire. Peyva rexneyê tenê bi wateya xerabiyê hatiye fêmkirin û dibêjin mēyze ez ê "rexne" binivîsim ha!... Yanî ez ê xerabiyê bi te bikim ha!... Berhemên baş jî di nava yên xerab de bêdeng li refikên pirtûk-firoşan disekin.

Çirûsk û destpêka helbestê best e. Helbestkar Rilke rojekê dana êvarê li perava behrê dimeşe û ji nişka ve ev rêzika hanê tê hişê wî "Ger ku ez biqîrim, dê kî bibihîze dengê min ji qada melayîketan?" û ev rêza hanê dibe sedem ku pirtûka xwe ya bi navê "Zêmarên Daûno" binivîse. Mijar û kul û birînên her mirovî hene. Helbest heta radeyekê qalkirina hest û bestên mirov e. Huner ew e ku êşên xwe bi vegotîneke xwedawendî vebêjî. Ez di vê baweriyê de me ku nîfşeke nû dê derkeve û bi berhemên xwe yên bêhempa şîrmaqên xwedayî li ser rûyên hunermendikên me yên bêhiş bixîne. Ger ku tişteke wisa nebe jî ez ê şaşwaz bibim û helbestvanên me yên teral dê dîsa bi salan qala berhemên xwe yên hejar bikin. Û tu car jî haya wan dê ji *Sylvia PLATH* jî tunebe beriya ku xwe bi destên xwe bikuje nêzikî pêncî helbestan di nava mehekê de dinivîse, yan jî romanûs

Borîs VIAN ku romana xwe ya bi navê *Peqikên Rojan* di sê rojan de nivîsandiye. Ez bawer dikim ku dê ji Hasan Huseyin Korkmazgil jî fedî nekin ku di şevekê de bîst û pênc helbest nivîsandibû û di ser de jî dê rabin ji bo ku pirtûkên xwe çap bikin, ji bo xwe weşanxaneyan ava bikin.

Horatius dibêje "Ger ku bixwazî ez bigirîm, divê pêşî tu êşê bikişînî."

Helbestkar mîna kurmoriyan hêmayên xwe û rêzikên xwe hewce ye ku lib bi lib bar bike û hêmayên xwe heboheb saz bike. An jî di binê barê helbestê de dê têk biçê. Bingeha helbestê hewce ye ku zexm be. Helbesta nûjen ji kaniya berhemên klasîk sûdê werdigire. Û piştî ku ji wê kaniya arkaîk têr vedixwe jî, wê gavê ji bo poetikaya xwe ya resen zimanekî taybet ava dike. Ji bo pêşveçûnên nû ev yek hewce ye. Ev jî bi destê estetîkê tê kirin. *Pira Mala Badê* bi tenê ji bo ku mirov û wesayîti di ser re derbas bibin bihata çêkirin, huner û estetîka wê li pişt guhan re bihata avêtin, li qada jiyane 900 sal li ser piyan nedima û niha ji zû de ew hilweşiyabû.

Helbestkar çî peyvên ku bi destên xwe diafirîne û peyvên heyî bi hostetî nikaribe kar bîne dê guhên xwendekar bi muzîkên tevlihev bixetimîne, bo numûne ji dêlva peyva "qerwaş"ê, peyva "suxrevan" bi kar bîne li gor min ev peyv dê cihê xwe zexm neke. Ji ber ku peyva "qerwaş" di jiyana rojane de bêtir cihê xwe gir-tiye û him jî armaniya wê xweştir e. Û divê mirov ji jiyana rojane jî

rasterast bi dûr nekeve dê çêtir be. Hêmayên ku tînan afirandin jî divê ku zindî bin, berbiçav bin, hêmayên şolî di nava ecacoka wextê de winda dibin û tînan jibîrkirin.

Hey me qala jibîrkirinê kir, ez dikarim vê yekê jî bibêjim. Van salên dawiyê ji zimanê tirkî, pirtûkên helbestan tînan wergerandin. Heyfa tahba wan e. Van wergerên bêwate, li gor min, mînanî pûş û palaxê di gola jiyane de dê bixeniqin. Mixabin.

Di destpêkê de me gotibû parsûyên helbestê jiyana bi xwe ye, jiyana jî ji rihê peyvani hatîye çêkirin. Ji bo vegotinên nû peyvên nû hewce ne û peyvên heyî jî bi watîyên nû tînan jindarkirin. Rimbaudî bîlasebeb negotiye "Em ji bo çî dinivîsinin, eger ne ji bo guhertina jiyana me be?..."

Çavkanî:

1. Poetika- Novalis- Babil
2. Ars Poetika- Horatius- Wergêr: Prof. Dr. Erendiz ÖZBAYOĞLU
3. Felsefe ve Şiir- Schiller- Yaba
4. Estetik (Şiir ve Musiki)- Yard. Doç. Dr. Mazhar BAĞLI

EVÎN Û HESRET Û HIZRA BERGIRÎ DI HELBESTÊN OSMAN SEBRÎ DE

Mamoste Fehmî

Kurtejiyana Osman Sebrî

Ruknedîn, taxek ji taxên Şamê ya herî bilind e, di quntara çiyê de ye. Wek çiyayekî Kurdistanê asê ye, bê dar û ber e; rût e, lê bi taybet e, ku navê Şamê ne lê bûya, ji rûniştvanên wê, mirov dê bigotana qey Kurdistan e. Piranîya kurdên Şamê li wir bi cih bûne, li wir mal ava kirine û li wir dijîn. Di dilê hemûyan de hêvîya Kurdistanê azad heye û li wir kalek dijî; kalemêrekî bejinkurt, awirtûj, mêrxas û wek çiyayên Kurdistanê bi heybet¹...

Apê Osman Sebrî

Li paş Cegerxwîn şerê serê çiyayê Kurdistanê yê duyemîn Osman Sebrî² di sala 1905an de li bajarê Meletiyê li gundê Narincê ji dayik bûye. Di zaroktîya xwe de sêwî dimîne. Apê wî

Şukrî Begê serokê eşîra Mirdêsiyan lê xwedî derdikeve û di nav pêlên jîyanê de di sala 1922an de "Dibistana Ruştîye"yê kuta dike. Di şoreşa 1925an de her du apên wî, Şukrî û Nûrî Beg li Amedê têne darvekirin. Ev bûyer li Osman Sebrî tesîr dike û di bedena wî de hestên netewayetiye geştir dibin. Bi çend hevalên xwe ve dikeve nava doza netewayetî û ji bo serxwebûna gelê xwe xebat dike. Osman Sebrî ji ber xebatên netewî, ji aliyê hukûmeta tirkî ve tê girtin û heta sala 1928an li girtîgeha Denizliyê dimîne. Piştî berdanê dizivire Meletiyê û dest bi xebatên xwe dike. Dîsan dixwazîna wî bigrin lê ew xwe nade dest û di sala 1929an de derbasî Kurdistanê Suriyê dibe. Li Suriyê dikeve nava refên beşdarbûyên şoreşa 1925an.

Jiyaneke nû dest pê dike, ji aliyekî

ve siyaset û welatparêzî û ji aliyê din ve ziman û edebîyat. Têkilî bi XOYBUNê re datîne û ji Celadet Bedirxan dixwaze ku bibe endam û xebatkarê partîya XOYBUNê. Celadet Bedirxan bi daxwaza wî kêfxweş dibe jê re "Ji îro şûn de tu dikarî xwe wek lebatekî Xoybunê bizanî"³ Bi eşq û dilxweşî têkoşîna xwe berdeyam dike. Di salên 1930an de bi serokatîya Îhsan Nûrî Paşa li Agirîyê şoreş dest pê dike. Osman Sebrî ji bo tevlêbûna şoreşê berê xwe dide Agirîyê. Lê mixabin li Başûrê Kurdistanê tê girtin û heta tê berdan şoreşa Agirîyê ték diçe. Lê ew tu caran bê hêvî nabe û ji nû ve dest bi xebatên xwe dike. Bi kul û keser û hesreta wê şoreşê, helbesta AGIRÎ dinivîsîne.

.... Li serê te yê berz hat xemilandin,
Bi taceke gewr.
Ji wê rojê da tu xoşewîst î,
Li nik me kurdan,
Hingê tu bû qiblegah ji bo mirov,
Di nava cihan da...⁴

Di sala 1957an de bi hinek ronakbirên kurd re (ên mîna Dr. Nûredîn Zaza, Reşîd Hemo û Hemîdê Derwêş...) yekemîn partiya kurdî li Suriyeyê damezirand û serokatîya wê partiyê kir û bi salan ji bo serxwebûn û azadîya gel xebat kir. Di sala 1971ê de ji partiyê veqetîya û heta dawîya temenê xwe bi edebîyat û zimanê kurdî re mijûl bû.

Siyaset û welatparêzîya Osman Sebrî hêjayî lêkolîneke berfireh e. Bi kurtî "Apê Osman Sebrî; 18 car girtîxane û girtîbûn, bi qasî 10 salan li girtîxanan mayîn, 2 car bi salan, 7-8 car bi mehan... û di ser de çend car surgûnî..."

Lê em di vê xebata xwe de zêdetir li ser "Helbesta Osman Sebrî û hozana bergirî" disekinin. Bi gotina Hemreş û Nûredîn Zaza, Osman Sebrî xwendin û nivîsandina kurdî li cem Celadet Bedirxanê navdar û emekdar hîn bûye.⁶ Bi kovara Hawarê re dest bi nivîsandinê kirîye. Heta dawîya emrê xwe, mamostatiya zimanê kurdî kirîye û mala wî bûye dibistana zimanê kurdî.

Di sala 1943an de dizewice û şeş zarokên wî çêdibin. Di mêjûya 11.10.1993an de bi hesret û kesera welêt serê xwe datîne ser axa sar. Apê Osman, cihekî bi nirx û giranbûha di dilê gelê kurd de hiştiye û her dem di dilê wan de dijî.

Divê tu zanibî, ev bûne sê sal
Min nedît xwişk û bira, xelkê di mal,
Ne me dît axa welat, pîra diyan,
Ne vexwar kewsera gewr, ava çîyan⁷

Berhemên Osman Sebrî

1. Bahoz (1956)
2. Derdên me (1956)
3. Çar Leheng (1984)
4. Di gel ku wî du Alfabejên kurdî
5. Bîranînên Osman Sebrî, Weşanên Aram
6. Diwana Osman Sebrî jî, ji aliyê A.Balî ve hatiye berhevkerin.

Ekola Hawarê û Vejudina Çanda Kurdî

Piştî şikestina şoreşa Agirîyê, partiya Xoybûnê jî dipelişe û ji hev belav dibe. Ji nû ve xebatkarên Xoybûnê hewl didin ku komeleyeke welatparêz û xêrxwaz damezîrinin.⁸

Armanç û xwestek ji komeleyê; vekirina dibistanan û perwerde û fêrbûn û weşana zimanê kurdî. Lê mixabin ev hewl û xwestek pêk nehat. Lê kovara Hawar dest bi weşanê kir, ku di nav hedef û armançê wan de bû. Kovara Hawar di salên 1932-1943an de li Şamê 57 hejmar mehane, bi edîtorîya Celadet Bedîrxan hat weşandin. Zimanê kovarê kurmacî û frensî ye. Kovar giranî daye edebiyat û ziman û vejîrandina çanda kurdî. Çawan ku di hejmara yekemîn de armanca weşana kovarê dinivîsîne: "Hawar dengê zanîne ye. Zanîn, xwenasîn e. Xwenasîn ji me re rêya felat û xweşîyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin. Hawara me berê her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman şerta heyîne ya pêşîn e. Hawar jê pêve bi her tiştê ku kurdanî û kurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe..."⁹

Kovar di demeke kin de xwe gihand hemû kurdan û li seranserê Kurdistanê belav bû. Kovar transkripsiyona elfabeya latînî bo kurdî standard kir û bo modernîzasyona zimên hewl da û bo standardîzasyona zimên, diyalakta kurmançî esas girt. Xebatek di pîvanê Hawarê de heta îro çênebûye bo diyalakta kurmançî.

Kovar girîngî û taybetîyên xwe bi şopandina neteweperwerîyeke zelal digre. Kovar, diyalog di navbera hemû kurdên Surîyê de çêdike, çî axa û beg û entellektuel û karmend. Di hejmara 15an de nivîsa Haco Axa "Şêx û axa û mineweran" bo vî diyalogî girîng û balkêş e.

Ev diyalog bi rêberîya Celadet Elî

Bedirxan komek nivîskar û şaîr afirand, mina Kamuran Elî Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrîcan, Nûredîn Zaza, Qedrî Cemil Paşa...

Di her cureyên edebîyatê de berhemên nû, mîna çîrok, linguîstîk, helbest, stran, lawîj, gotar, werger, dîrok, erdnigarî... weşand û ekoleke nû pêk anî: Ekola Hawarê.

Osman Sebrî û Ekola Hawarê

Osman Sebrî bi weşandina kovara Hawarê re dest bi nivîsandinê dike. Vê hewldana xwe di heypeyvîna bi Firat Cewerî re wiha tîne ziman: "Celadet xwest Hawarê derbixîne, min jî dest bi nivîsînê kir. Hevalekî bi navê Qedrîcan di hejmara pêşîn de ji min re tişteke nivîsbû, di hejmara duduyan de min jî, jê re nivîsî. Wîlo me dest bi nivîsê kir."¹⁰ Gazîya Qedrîcan bo Osman Sebrî

...

*Hawara me vaya ye,
Xewa bêkêr bela ye
Qet şik têda nemaye
Di gotinên yaran da¹¹*
Qedrîcan

Osman Sebrî di hejmara duduyan de bersiv dide Qedrîcanî û helbestek bi navê Berdêlk (Ji Qedrîcanê canbira ra) dinivîse;

...

*Hawarê xweş awa kir
Dilê kurdan pê şa kir
Zar û ziman awa kir
Jin û xweşî bela kir.¹²*

Osman Sebrî

Osman Sebrî piştî Qedrîcan duye-
mîn kes e, ku ew bi nivîsên xwe
kovara *Hawarê* xemiland û di qada
edebyat û zimanê kurdî de li kêleka
Bedirxanîyan ciyê xwe girt. Bi rastî
Bedirxanîyan qedrê qelema wî zanîn.
Osman Sebrî jî, di hemû kovar û roj-
nameyên wan de nivîsî, mina Ronahî,
Stêr û Roja Nû. Hêjayî gotinê ye, ku -
li gor ku Mîr Celadet Bedirxan gotiye-
Osman Sebrî yekemîn kes bû, ku
ziman û nivîsandinên wî ji yên tevî
nivîskarên wê hingê tekûztir, rasttir û
xweştir bûn¹³.

Osman Sebrî çend cûreyên ede-
bîyatê de nivîs weşand mîna çîrok,
gotar, marş, helbesta bergirî û fabl...
Û giringîyeke mezin dida zimanê
kurdî û dixwest her kes bi zimanê xwe
bipeyive. Lewra di hizr û ramana wî
de ziman hebûna neteweyetîyê bû:
"Parastin û geşkirina xwendin û
nivîsandina kurdî li ser milê her kur-
dekî dilsoz û welatparêz e, bi taybetî
xwendayên me, çunkî ziman roleke
giring di jiyana her netewekî de
dimîne. Zimanê me jî gelekî li paş de
ye, û gerek e em bi zimanê xwe mijûl
bibin, hingê em qencyê li xwe
dikin..."¹⁴ Apê Osman heta dawîya
temenê xwe mamosteyî kir ji zimane
kurdî re. Kurd jî qedrê qelema wî
dizanin.

Helbesta Osman Sebrî û Hizra Bergirî

Hemû helbestên Osman Sebrî ji
alîyê A. Balî ve hatine berhevkerin û bi
navê "Dîwana Osman Sebrî" hatine
çapkirin ji alîyê weşanxaneya Apec ve.

Di vî xebatî de ez vê "Dîwan"ê bingeh
digrim û helbestên wî, ji alîyê bergirî û
hinek formên din ve jirove dikim.

Osman Sebrî di Eçola Hawarê de
bi Qedrîcan re pêşengîya helbesta
nûjen kir bi şewaza klasîkî. Helbestên
xwe yên klasîkî pirranî bi heft û heşt
bangî nivîsî. Çarînan bi dubeytî jî
helbest honandîye û gelek fabl jî
nivîsandîye. Di helbestê de gelek ser-
ketî ye û bi çend formên nû hozana
xwe honandîye. Mîna helbesta çîrok,
helbesta azad, helbesta klasîk, helbesta
pexşanî... Lê di hemû cûreyên hozana
wî de hizra bergirî û mêrxasî û welat-
parêzî naverok e. Bo numûne:

...

Dawî jê rabûn hin leheng serdarên

bêhempa

Ji bona doza niştiman ew çûne bin sehpa

...

Mêran ji bo azadîyê xwûna xwe rijandin

Hêvîya li nik gel nûrî ji nû vejandin

...

Tev şêr û piling pandîyê sînorê welat in

Piştî Xaneqîn çavdayê Agirî û Xelat in.

Hişyarî

Bi rêka helbestê hewl daye xizmeta
bizava rizgarîxwaza gelê xwe bike û bi
rêka helbestên xwe alaya miletê bin-
dest daye ser banê gerdûnê:

Rabe xortê serbilind, roya me wa hilat

Guh bide dengê kurd, têye ji rojhilat

Guhdarî têr nake, divê em xort û kal

Bi xebat, bi tebat tê bidin can û mal

...

Alaya xwe hilvedin, hilvedin her bi jor

Pêl bide şev û roj, gewr û zer, kesê û sor

Serbilind

Oryantalîstê fransî Tomas Bois derheqê şairê gewre de dibêje: Osman Sebrî bi riskî û bi çîrokên kurdiya kurmançî yek ji pêştirîn û zanatirîn nivîskar e.¹⁵

Dîwana Osman Sebrî

Helbestên Osman Sebrî di pirrê kovar û çapemenîyan de hatibûn weşandin. Mamoste A. Balî bi civandîna wan helbestan û çapkirina wan ji nû ve, xwedîyê kedeke mezin e. A. Balî, hemû helbestên şairê gewre di dîwanekê de kom kirin û ji aliyê weşanxaneyê Apecê ve di sala 1998an de li Stockholmê hatin weşandin. *Dîwan* ji çend babetan pêk tê û 215 rûpel e. Kurdologê mezin Îsmet Şerîf Vanlî bi navê "Mirovê Sîyasî û Wêjedar" pêşgotin nivîsiye. Bêguman ev xebat ji bo ferheng û pirtukxaneyê kurdi giranbuha ye. Naveroka Dîwanê ji van babetên jêr pêk tê:

- a. Marşên Kurdî: Di bin vê komê de heşt sirûdên netewî hene.
- b. Evîna Çîyan: Ev birr ji panzdeh helbestan pêk hatiye.
- c. Welatê Jîyan: Di bin vî navî de çil û pênc helbest berhev bûne.
- d. Dengê Lawiran: Ji donzdeh fablan pêk hatiye.
- e. Dengê Zarokan: Ji neh helbestan pêk hatiye.

a. Di "Marşên Kurdî" de Hestên Netewayetiye

Osman Sebrî di marşên xwe de daxwaza welatekî serbixwe dike, dixwaze çiyayên bilind bi alaya rengîn bixemilîne û yek rêyê dide pêşîya

ciwan û xortan ji bo serxwebûna welêt. Ew rê jî bi kolonyalist û dagirkeran re şerê çekdarîyê ye. Hemû ciwanê kurd dişibîne şêr û pilingan û ji wan daxwaz dike rojek zû welatê xwe di Asyayê de serdest bikin:

*Xortê çak rabe zû me divê dilşadî
Serxwebûn, aşî, serbestî, azadî
Van tiştan her divê pir xebat, west û xwîn
Berî me sed hezar, sed hezar tê da çûn
Koledar bûne har, wan divê ceng û şer
Marşa Aştîyê*

...
*Em leşkerine sondxwarî ne ji bona welat
Min jî navê bi bindestî, her divê felat
Marşa Felatê*

Piştî şer û serxwebûna welat, dixwaze bi alaya rengîn seranserê welat bixemilîne û zozan û newal û çiyayên Kurdistanê ji gel re bike seyrangê û welat di nav Asyayê de serbilind be:

*Min divê tu her bilind bi
Ala rengîn keske û zer
Him xweşî him ceng û rûmet
Tê zanîn ji sor û gewr
Dûr nêzik ez ê te hildim
Tu yî xemla banê min
Ala Rengîn*

....
*Me divê yekî û xurî, naxwezim bend û eşîr
Ji îro pêve di Asiya, serdestî dora meye*

Marşa Xortan

b. Di helbestên "Evîna Çîyan" de Hesret û Kesera Welêt

Osman Sebrî hemû berhemên xwe li derveyî welêt nivîsiye û bi hesret û

kesera welêt jîyaye. Şaîrê gewre, şaîrê surgûnê ye, hesretkêşê welat e. Di xeml û xewên xwe de hesret û kesera welatê bindest dihewîne. Şervanê serê çiyayên bilind e, rêberê helbesta bergirî ye. Di bîr û baweriyên şaîr de, çîya qada şerê azadî û serxwebûna welat e. Di helbesta "Evîna Çiyan" de bîr û bawerî û evîna xwe wiha dilorîne ji bo welêt:

*Çil sal kuta bûn ku ji axa welêt cuda me,
Dûrî heval û hogîran, him dost û bira me.
Wêlat çî xweş e, bax û bostan, tev çem û rûbar,
Lê ez bi xwe her evîndarê tehtên çîya me.*

...
*Min hêvî heye, carek din derkevim ser wan,
Bo doza welêt tê de bikim, an ne tewa me.
Yezdan!.. Bide min gorreke çak di serîya wan,
Nizam çîqas ez, bo daxwazek holê hêja me!..*

Evîna Çiyan

Şaîrê mezin di pirrê helbestên xwe de dijê qelsemêriyê derdikeve û alaya mêrxasîyê bilind dike û qet ji tu kesî bêminetî nake. Hemû ked û cada wî azadîya welat e. Xwesteka wî ya mezin ev e, ku ciwan di şerê serxwebûnê de şopa wî bipejirînin û dev ji îdeolojî û felsefe berdin, têkevîne nav têkoşîna welêt. Di helbesta "Hêviya Kalemêr" de fikr û ramana xwe ji bo Şoreşa Eylulê wiha diqire:

...
*Li Behdînan û Baban rabû şoreşa rengîn,
Bi lehengî şer dikin di cihanê bû dengîn,
Çavê dijmin şikandin bi hin tîfîngên jengar,
Leşkerê wî revandin ji hev kirin tar û mar.
Ez dibînim xortên me bi felsefe û qirên
Hemî dârî qada şer dipeyîvin, diçin tîn,*

...
*Bes divê xwe rave kin hemî xvedî "ÎDEAL"
Bi vê qelsokîya han ji me kambax kirin mal.*

*Ji bo îro me navê ÎDEAL û FELSEFE,
Divê doza gelê Kurd çend gavan bi pês
keve.*

Hêviya Kalemêr

c. Li Sirgûnê Evîn Çi ye? Evîna Dilê Şaîr Ki ye?

Şaîrê mezin Melayê Cizîrî di helbesta xwe de li ser evînê wiha dibêje. "Hubbê cismanî du roj in / Gerçî dil pir pê disojin".¹⁶ Bêguman Mela li dijî evîna cismanî ye. Ji ber ku evîn di dilê Mela de yekbûna bedenana e, yan jî di bedena Xwedê de windabûn e. Li gor felsefeya Tesawufê, Wehdetul Wucûd e. Li gor Osman Sebrî jî evîn, bêguman hezkirin û wîsala welat e. Lê mixabin heta dawîya temenê xwe negihîştîye armanc û meqseda dilê xwe. Dilê şaîr li biyanistanê bûye wek deryaya xemê:

*Hê warê ku biyan bû
Yanzde salan ji bo min
Ne hezkirina delalan
Ne serdilk ne yar û jin
Ew pêl ji emrê şîrîn
Borî di deryaya xem.*

...

Şaîr evîna dilê xwe hêjayî pesnê dibîne û wisa pesnê wî dide, mina îbadetxaneyêke pîroz û hêjayî seran-serê welat dewlemend dibîne:

...
*Me dît ji bo xwe sorgul
Weke Memê cîgerxwîn
Ji bo wî bûme bilbil
Demekê ez vehistim*

...

Hemî ji me revandin
Erdê ku wî tê geştê
Bo min dêra miqedes
Hêjayî Hind û Çîn e.

Gelo evîna dilê şair kî ye? Ku di helbesta "Evîn"ê de, evîneke wisan ji xwe re dixemilîne, ku Feqîyê Teyran jê re "kemberbestî" Ehmedê Xanî jê re "çavmat" û Melayê Cizîrî jî "lêv bigest" e.

...

Di rex wê de yek nefes
Leyla çi sermîzar e
Li pêşberî delalê
Zîn hingî pesndar e
Li pêşberî delalê
Me pesna wî ne qesd e
Nîn e şîrînzimarî
Ew rewşa şeng û oflaz
Çavmat dihêle Xanî
Heke Feqî bidîta
Dê dest li ber bibesta
Melê bi sed kul û derd
Wê lêva xive bigesta.

Şair, demeke kin bê hêvî dibe ji ber dûrketina evîna dilê xwe. Axîr dike ji felekê re ku wî ji yara wî dûr xistîye:

Ew jî ji bo me pir dît
Felekê, kir neyarî
Rahîst milê me avêt
Nav girava Sent-Marî
Lê sed girîn û hesret
Bilbil wê dem û gavê
Nedût ji bo xwe berbang
Dimk negîhand xunavê
Hê pirpirokê sermest
Çavên belek tu kuştin
Bigirî û xwîn birêje
Gelek dûr e giheştin
Evîn

Çavkanî û Jêder:

1. Cewerî, Firat, *Kultur Huner û Edebiyat*, Stokholm, 1996, r. 221
2. Kurdo. Qanat, *Tarîxa Edebiyata Kurd*, Ankara, 1992, r. 166
3. N.Firat-M.Ali, *Bîranînên Osman Sebrî*, İstanbul, 2004
4. Sebrî, Osmâ, *Dîwan*, Amedekarê weşanê, A.Bali, Stokholm, 1998
5. Uzun, Mehmet, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, Stenbol, 1995, r. 251
6. Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebiyata Kurd*, Ankara, 1992, r. 166
7. Sebrî, Osman, *Dîwan*, Amedekarê weşanê, A.Bali, Stokholm, 1998
8. Bali, A., *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, İstanbul, 2005, r. 249
9. Kovara *Hawar* no:1, Şam, 1932
10. Cewerî Firat, *Kultur Huner û Edebiyat*, Stokholm, 1996, r. 221
11. Kovara *Hawar* no:1, Şam, 1932
13. Konê Reş
14. Osman Sebrî, Kovara *Pêşeng*, hejmar 5/1984
15. Bois, T., *Nasîna Kurdan*, Beyrut, 1963
16. Cizîrî, Melayê, "Diwan" İstanbul (bê tarîx).

HELBESTA KURDÎ A MODÊRN Û DÎROKA WÊ

Berken BEREH

Sedsala nozdemîn li seranserî cîhanê bû despêka têkçûyina împaratoriyan û bi vê ve girêdayî hestên neteweyî wek kulîlkên biharê li her deverê cîhanê yeko yeko serî hildan. Li Ewropayê jî ev helwest û hewldanên neteweyî di heman demê de di qada wêjeyê de bû sedemê pêşveçûnên balkêş. Wêjevanan hewl dan ku tore û kelepora xwe bi awayek rêkûpêktir û bi teşe, şêwaz û naverokeke watedartir û rengîntir ji nû ve biafirînin. Vê pêla nuhbûn û veguheztinê gav bi gav xwe gihande her deverê û her wiha erdnîgariya kurdan jî.

Helbesta Nûjen Li Başûr û Rojhelat

Di dawiya sedsala nozdemîn û despêka sedsala bîstemîn de wek li her deverên cîhanê li nav kurdên rojhelat jî hewldanên ji bo guhertin û vegu-

heztina wêjeya kurdî ber bi asoyine nûjen hatine dest pêkirin. Di vê avakirinê de bê guman bandor û erka helbestvanê hêja Seyfî Qazî (1877-1944)-ku wek mamosteyê helbestvanê Mukriyan tê nasîn- heye. Evî zatî beriya mirina xwe weha gotiye;

"Pêwîste em zimanê xwe yê edebiyatê ji gundan û kesên kal werbigrin. Lewra zimanê kurdî yê pak û temîz li cem wan maye. Pêwîste em di edebiyata xwe ya nûjen de jî, kêşên folklorî bi kar bînin û zimanê resen û kevin ê ji nifşên berê bo me mayî, di têkistên xwe yên edebî de, tomar bikîn".

Di hemû berhem û afirandinên xwe de heta jê hat peyvên biyanî bikar neanî.

Nûjeniya naveroka wêjeya kurdî ya Rojhelat xwedî taybetmendiyek e *Xwendîngeha Mukriyan* bû, nûxwaziya di naverok û forma helbesta kurdî da

peyda bûyî, ne ku çavlêkirinek yan teqlîdek helbesta biyanî bûye, belkî van helbestvanên kurd vê şopê weke pêwîstiyek dîrokî dîtine, ne ku teqlîdek helbesta farisî, erebî an tirkî.

Her çendî destpêka vê qonaxê an ku ya Xwendingeha Mukriyan rohnî û zelal nîn e jî, lê em dikarin bêjin reng û rîşalên vê qonaxê digihin berî damezrandin û ragihandina Komara Kurdistanê a sala 1946an a li bajarê Mehabadê û belkî berî bizav û tevgera Komela Lawên Kurd, ya ku li 16/09/1933-37an hatiye damezrandin.

Bi rengêkî êşkere di sala 1942an de, komeleke helbestan ji aliyê Komela Lawanî Kurdan ve, bi navê "*Diyarî Lawan*" (Îbrahîm Ehmed) hate weşandin.

Nîfşê yekê yan jî damezrênerên Xwendingeha Mukriyan ji van kesan pêk dihat: Seyfî Qazî (1877-1944), Mamosta Hejar, Mamosta Hêmin, Seyid Kamilê Îmamî (Awat), Xale Emînê Berzincî (Xale), Seyid Tahîrê Haşimî (Suha), Abass Haqîqî (Mamosta Heqîqî) û Xalidê Husamî (Hêdî).

Van pêşeng û pêşrewan ji tevgera Xwendingeha Mukriyan di dema Komara Kurdistanê de û di dema şerê cîhanê yê duyem de serî hildan û berdewamî bi van cûre helbestan dan û karîna ji aliyê hişyariya netewî, bilind ragirtina nîrxên ziman û kultura kurdî ve xizmeteke jêhatî pêşkeş bikin.

Ji nav van raber û helbestvanan, bi zelalî ez dikarin bêjim ku mamosta Hêmin û Hejar Mukriyanî karîna bi şeweyeke rasterast roleke baş li Başûrê Kurdistanê jî bilîzin. Bi taybet piştî xûrtbûna agirê şoreşa Îlonê ya sala 1961an ku bi serokatiya serkirdeyê kurd Mela Mustefa Barzanî hatî dest-

pêkirin, mamosta Hejar Mukriyanî jî, yekser kete nav şoreşê. Piraniya helbestên wî yê welatparêzî, di vê demê de hatine nivîsin. Herweha di destpêka salên 1970an de bi taybet piştî *Beyana 11ê Adarê*, Mamsota Hêmin jî têkeliyeke xûrt bi kurdên başur re danî û ew weke helbestvanekî jêhatî li Başûr hat naskirin. Helbestên wî di nav gel de belav bûn. Bi taybet pirtûka wî ya helbestan a yekem "*Tarîk û Ron*" li Başûr bi şeweyeke berfireh di nav gel de hate belavkirin.

Dîsan di nivê salên 1970an de, pirtûka wî ya bi navê "*Naley Cûdayî*" gihişt Başûrê Kurdistanê. Di helbestên vê pirtûkê de, afirêneriyeke hîn xurttir di hate dîtin. Hêmin piştî vê pêngavê, bêtir wek helbestvanekî seranser û afirêner hat naskirin. Bandora wî bi zelalî, li ser helbestvanên piştî wî bû.

Qonaxa duwemîn piştî serhildana *Tevgera Ruwange* bi serkêşiya helbestvanê mezin Şerko Bêkes hate despêkirin.

Manîfestoya Ruwange ji bo tazekirina helbesta kurdî hawareke bi serê xwe bû. Mirov dikare bibêje ku ev manîfesto digel nûkirin û azadiya helbestê, nûkirin di ziman, raman, çîrok û nêrînine nû di civatê jî de bû.

Piştî vê tevgerê qûnaxeke nû li ser destê çend rewşenbîrên kurd, mîna Refîk Sabir, Ferhad Şakelî û Letîf Helme û hwd. xuya bû. Mueyed Teyîb, Xelîl Dihokî, Evdirehman Mizûrî, Muhsin Qoçan, Necîb Balayî, Hesên Silêvanî, Hêvî Berwarî, Nezîre Ehmed, Arîf Hîto, Beşîr Mizûrî û Selwa Gulî.

Hejarîno...

Ger we hest kir, dengê min yê we nîne.

Rengê min, yê we nîne.

Ger we hest kir, xema min ya we nîne.

Devê min yê we nîne.

Helbestên min bidirrinin.

Mîna peykerekê kirêt, min biherrifnin.

Ger we hest kir, mîna we ne birçî me.

Ger we hest kir, li dervey zinca we dijî me.

Ger we hest kir, burjuwazî me.

Navê min, mîna jenga parey birre nin

Ger we hest kir, mîna we zehmetkêş nîn im.

Mîna hewe kaniya xem, jan û êşa nîn im.

Ger we hest kir

Min di dilê xwe de bikujin

Bi hevokeka mezin binivîstin

Şairekî tirsinok û direwîn mir...

(Letîf Helmet)

HAWAR û Destpêka Wêjeya Nûjen

Kovara *Hawar* bi tenê pirojeyek roşenbîrî û netewî mezin bû, li gor slogan, rêbazî û naveroka wê. Di jimara yekê de, Mîr Celadet bi van peyvyan Hawar daye nasîn:

Hawar dengê zanîne ye.

Zanîn xwenasîn e, xwenasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedik e.

Her kesê ku xwe nasdike, dikare xwe bide naskirin.

Lewra ku ziman şertê heyîne pêşin e.

(Celadet Alî Bedirxan. Hawar, jimar 1.

15-5-1932 ê.Şam)

Bêguman Hawar ango tradîsyona nû, ji ronakbîrên cegerdar, zana û xwedî hişmendiyê zelal û nişîmanperwer pêk hatibû. Ji ber wê çendê her gavavêtin û hewldana wan bi gor metodolojiyê zanistane pêk dihat. Ewil-

în nûjenî di warê ziman de hate kirin û tîpên latînî ji bo kurmanciya şîrîn hate pejirandin. Ji ber ku xwendin û nivîsandina bi van tîpan hêsantir bû û ji alî dangan ve jî li zimanê kurdî digunciya. Li ber elfebeya kurdî, gramêr, rastnivîsîn û bingehên rêzimana kurdî jî hatiye nivîsandin. Her hejmarek Hawarê bi reng û xemleke nû derkete pêşberî wêjehez û xwendevanan. Di Hawarê de em rastî gelek cureyên wêjeyî tîn. Her wiha ji filklora kurdî bigire ta dîroka kurdan û li ser tenduristiyê nivîs hene. Hema di hemû hejmaran de giringî û rol û erka zimên di avakirina neteweyekê de çendîn lazim e xweş hatiye gotin. Dîsa berhemên me ên klasîk, kovar û rojnameyên kurdan û wergera berhemên biyanî jî ciheke taybet digire di Hawarê de. Hawarê ne tenê kurmanciya jorîn, her wiha cih daye kurmanciya jêrîn ango soranî jî. Di hin hejmaran de em rastî şanoyê jî tîn. Dîsa di hemî hejmaran de nameyên xwêneran jî hatine weşandin. Bi kurtayî Hawar stûneke di çand û toreya kurdî de û her wiha stêrkeke li ezmanê helbesta kurdî ku niha jî bi serbilindî diçirûse û aso û bergeha me ronî dike.

Derheqî nûjenkirin û tomarkirina hemî cins û rêgezên edebiyatê di Hawar ê de Mîr Celadet di hejmar(20) de, û di Sergotara xwe de weha dinivîse;

"Bi bîst hijmarên Kovara me ku heta niha belafbûn e, me dil dikir, em her awayê nivîsandinê bicerbînin û bêxin zimanê xwe.

Her wekî awayên bingehî, nezîm û nesir û çend şiklên nesrê kêr û zêde di Hawarê de belafbûn e.

Tenê awayê (Temaşayî) hebû neket bû

zimanê me. Mîna ku xwendevanên me di vê hijmarê de, dê bixwînin. Me ew şikil û awa jî ceriband û xiste Zimanê xwe"

Nivîskarên kurd yê wê serdemê ger nebêjin tevan, belkî piraniya wan berhemên xwe bi yek armanc di Hawarê de diweşandin, wek mînak bêjin ji bakûr;

Mîr Celadet, Dr. Kamîran, Dr. Ahmed Nafîz, Haco Axa, Qedrîcan, Cigerxwîn, Osman Sebrî Dr. Nûredîn Zaza. Elî Seydo Gewran û hwd.

Ji Başûr, kirmanciya jêrî;

Mamosta Goran, Ebdûlxaliq Esîrî, Mamosta Bêkes, Pîremêrd, Mamosta Pîrot, Şêx Selam û gelekên din.

Ji Badînan;

Mela Enwerê Mayî, Şêx Xiyasedînê Neqşbenî, Şêx Memdûhê Birîfkî, Salih Bamernî...htd, "Weke tê xweya kirin, ev deme, dema zêrîn û pêşîn ya ronakbîrîya herêma Badînan e."

Ji Rojhilat; Seyîd Huznî Mukriyanî, Mamosta Hêmin... Hejar htd.

Ji kurdên Sovyetê; Celalî

Dîsan Hawarê girîngî dida pirsên kurd û kurdayetiyê li her çiyekê vê cîhanê, wek nimûne bêjin, di hejmarên xwe de pêzanîna li ser rojname *Riya Têze* ya kurdên Sovyetê û radyoya kurdên Rewanê, herweha behsa Radioya Bexda û Beyrûtê yê ko bi zimanê kurdî weşana xwe dikirin û bi kurdî stran digotin dihê kirin, heya ko li ser şanoyên li Mehabad û Urmîyê, ji xebatên wê derê jî agahî hebûn, dîsan di hejmara xwe ya 19an de, Hawar behsa Zeradeştîyên li Hindistanê dike, kanê wan çewan di kovara xwe ya bi

navê *Iranlig* de behsê Serxwebûn û Dewlata Kurdan kirîye .

"Eskerê Boyîk ku ew bi xwe jî helbestvanekî gewre ê kurdên Sovyetê ye wiha nivîsiye;

HEWAR bû zanîngeh, ziyareta kurdewarî, ya heyîtiya gelê kurd.

Kê li wê zanîngehê ra derbaz bû, ji kaniya wê, ya zanîstî av vexwer, kê li ber wê ziyareta kurdawerî bi zarê dayka xwe dua kir, bûn sond xwariyê parastina navê gelê xwe, bi bîr û bawariyê here bilind jiyana xwe pêşkêşî azadiya gel, welêt û pêşxistina çanda wê kirin."

Di Hawarê de cara ewilîn di warê helbestê de nûbûnê xwe da der.

Qedrîcan û Helbesta Nûjen

Bê guman Hawar di qada wêjeya kurdî de ne tenê hewldaneke ji rêzê ye, her wiha mizgîniya helbesta kurdî a ber bi asoyeke rengîn, çêjdar û modêrnûnê ye. Wek ku bibêje em neviyê Xanî, Cîzîrî ne, em xwedî rewşenbîriyeke serbixwe ne ku, em dikarin bi kok û rehên xwe yê resen ala helbesta kurdî li lûtkeyên kokelên hevçerx daçikînin. Bi vê hişmendiyê Qedrîcan, ku nimûneyeke hêja ye ji bo xwendîngeha Hawarê ku bi pênu-seke nûjen xwe bera tîrada wêjeya kurdî da û bi navê "*Rêya Têze*" helbesta xwe nivîsand. Bi vê afirandina xwe şewaz, teşe û naveroka helbesta kurdî ji reh û dûvikiya helbestên mîletên cînanan birî û riha kir. Heger xwendevan li berhem û nivîsên wî hûr binêrin, ewê li peyvên nûbûn, nûjenî, nûkirinê varqilin. Roger Lesckot dibêje: "**Em dikarin helbestvan Qedrî**

Can sazkarê helbesta kurdî ya nûjen bibînin, digel Şêx Nûrî û Pîremêrd û Goran."

Bi vê helbestê Qedrîcan dest bi gulvedana helbesta kurdî kir. Ewî guhertinên bingehî di helbesta kurdî de kirin, berê helbestê da ber bi cîyêke nûtir. Helbesta kurdî ji kêşan û eruza erebî rizgar kir. Her wiha di heman demê de nûhbûnê xwe di raman, ziman, jiyana civakî û ramyariyê de jî da der. Tore û kelepora kurdî û mîto-lojî û jiyana civakî bi nêrîneke nû hate şirovekirin. Zimaneke hêsan, herik-bar, jîndar ku rasterast gel diaxîfî bi kar dianî. Ev cûre vegotin karî ku helbestên wî bibine stran û li ser zimanê gel bête gotin. Nemaze helbesta wî ya bi nav û deng "*Berzanî Berzanî*", "*Begê axir zeman*" û "*Loriya Bedirxan*", ya ku pir bi hostayî hatiye hûnandin.

Di sala 1944an de qûnaxeke dîrokî ya nû di raman û zanyariya Qedrîcan de dest pê dike. Nemaze piştî nasîna wî bi ramana komonîst re. Ev rastî di mijarên helbestên wî de xweş diyar in.

Helbestên wî yê pêşîn di sala 1930î de hatine nivîsîn, tev rengê klasîk in; mîna: "*Loriya Bedirxan*", "*Tabûta bi xwîn*", "*Cegerxwîn*", "*Şin li ser giyanê M. Seyda*"... û hwd.

Qedrî Can helbestin li ser beg û axan jî nivîsîne û şerê qata serdest kiriye; mîna helbestên wî: "*Begê axir zeman*" û "*Hesinker*"...

Gelek caran Qedrî Can helbestên biyanî û bîranîn jî dinivisandin; mîna: "*Name ji xortên Cizîrê re*", "*Xewna hişyariyê*" û hwd.

Bêguman hemû helbestên Qedrîcan li ser kurdayetî û niştimanperweriyê ne.

Piştî sala 1944an, wek me gotî, qûnaxeke nû di ramana Qedrîcan de dest pê dike. Ciwantiyên helbest li ser hin lehengên navdar nivîsandine; mîna: "*Berzanî Berzanî*", "*Şêr hat welat*", "*Serokê Komara Mehabadê*" û hwd.

Çend helbestên ku bi bûyer û demê ve têne girêdan nivîsîne; mîna: "*Çardehê gelawêjê*", "*Name bo êstegehê radyo Tehran*", "*Cejna Oktober*" û hwd.

Hin helbestên şoreşgerî û mîletperwerî jî nivîsandine; mîna: "*Gula Sor*", "*Niştîman Birîndar e*", "*Karwanê Demê*", "*Li zindanê şoreşa me*", "*Heyva sor*", "*Dadê*", "*Di Şorezarekê de*", "*Rêya Têze*" ya bi nav û deng û hwd.

Her wiha kesên mîna Cigerxwîn û Osman Sebrî jî nimînendeyên hêja ên qonaxa Hawarê û helbesta nûjen in.

Cigerxwîn yek ji gewretirîn helbestvanê hêja a dibistana Hawarê ye. Ewî yekemîn car di warê naveroka helbesta kurdî û ziman de pêşengiya nûjeniyê kir. Helbesta kurdî ku ta wê demê bêhtirîn li qesr û konaxa dihate pehtin û zimaneke berz û bilind û ji ya gel cudatir bikar dianî cihoka wê veguhazt û berê wê da gel. Mijar êdî ji qeyd û bendên kevnare filitîn û bi awayek azad ber bi asoyeke firehtir û zelaltir meşiya. Her tiştê li ser rûyê vê dinyayê ku rasterast bi jiyana civakê re di têkiliyêke diyalektîk de ye û bandorê li hev dikin bûne mijara helbesta Cigerxwîn. Bi kurtasî dikarim bibêjim ku ji Ehmedê Xanî bi vir ve Cigerxwîn yekemîn kes e ku bi rêkûpêkî netewa kurd ji hemî aliyên xwe ve nirxandine û paradigmayê wan têkûz kiriye bi rêya helbest. Dîwanên wî ne tenê ji alî afirandina wêjeyî, her wisa ji alî dîrok,

erdnîgarî, çand û kultur û hwd. ansiklopediya kurdan e.

Osman Sebrî jî li ber destê Celadet Bedirxan hînî zimanê kurdî dibe û di demeke kin de bi xebata xwe ya hêja dibe helbestvaneke Hawarê. Dema em bala xwe didine helbestên Osman Sebrî, em dibînin ku ji serî ta binî bi xeml û rengên modêrnizmê jê difûre. Osman Sebrî jî wek hevriyên xwe heta jê hat hewl da ku asoya helbesta nûjen firehtir û ronaktir bibe. Lê ev nuhbûn li ser bingeha zargotina kurdî û kelepura kevin, ango teqlîdek netewên cîran an Ewropa, mijarên xwe bi giştî wek hevriyên xwe ji jiyana rasteqîn hilbijart û xwest bi van helbestan gelê xwe yî jar û nezan hişyar bike û ji bo azadî û serfiraziya netewa xwe têbikoşe. Her wiha helbestên li ser sirûştê, evîne, tenêti, mişextbûn, aştî û bo zarokan nivîsand. Mînak, "Zozan", "Dibistan", "Yadê Bihar", "Berdêlk", "Bang" nimûneyine hêja ne. Dîsa bi helbesta xwe ya bi navê "Bahoz" nîşanî me da ku helbestvanê kurd bê çiqasî di afrandina helbestê de bi hêz û xwedî şiyaneke gewre ye. Her wiha ev helbest mînakeke herî xurt e bo inernasyonalizma kurdî. Dîsa tişteke balkêş heye ku divê ez bînim ziman ku helbestvanên me yên îroyîn li paşguhê xwe davêjin, ew jî ev e; van helbestvanan nirx û rûmeteke hêja didan zargotina kurdî û berhemên xwe li ser wê bingehê ava dikirin. Bi vê helwestê jî hêmayine xurt û karîger diafirandin. mînak;

"Me dît kapa bextê me
Du mîr hate vê carî"

(Diwan, Osman Sebrî, r; 70)

Osman Sebrî yekemîn ji wan kesan e ku bûyer û qewimînên sirûştê şiban-diye tevgera însanan;

"Zozan têne guhertin zû
Mîna cilên bûkên di nû"

(heman Dîwan, rû;63)

Lê pêla nûjeniyê ya ko helbestên hemû zimana dabû ber xwe weha helbesta kurdî jî dabû ber xwe ko di van salên dawî de bi dehan, eger em nebêjin bi sedan nav derketin. Ji wan Ehmed Huseynî, Tengezarê Marînî, Fethulla Huseynî, Rizoyê Xerzî, Jan Dost, Hekîm Sefqan, Royarê Amedî, Diya Ciwan, Arşevê Oskan, Nezîr Palo, Rûxweşê Zîvar, Mihemed Hemo, Axîn Arif, Ferhadê Îcmo, Hoşeng Broka, Jana Seyda û hwd. Gelek navên din hene ko xwedî berhemên çapkîrî ne, bê guman, ev nav hemû hêjayî lêkolîn û nirxandinên rexneyî ne. Dibe ko valabûna meydana rexnekirinê bûbe yek ji sedemên tevliheviya ko îro di helbesta kurdî de li dare.

Di Helbestên Dibistana Hawarê de Naverok;

1- Daxwazên gelê kurd ên rewja ji bo azadî û serfiraziya xwe.

2- Li hember şêx, mela û nivîşt ku gel ji bin tehekuma wan derkeve û bes bê xapandin.

3- Dijberiya li hember axa, beg û sistema fîodalî û sermiyardarî.

4- Agahdarkirina gel û haydana wan ji bo xebatên neteweyî, çînî û dijî zordestiyê.

5- Haydana gel û civaka kurd, ji bo meşa wan a li ser rêya zanîn û zan-yariyê.

7- Bilindkirina drûsmên taybet, ji bo mafên jinan û destekkirina jina kurd ji bo pêşketin û berz ragirtina bihayên xebat û tevgera jina kurd.

RÊYA TAZE

*Ew perdeya reş-tarî
Ku ji şevên reş diyarî
Min...ji rûyê xwe kişand...
Li ber çavê xwe çirand
Û avêt...
Avêt paş sed çiyayî...
Nava hezar deryayî...
Min, gemara guhê xwe bi zemzemeke nuh şûst;
Û mikrobên canê xwe bi dermanekî nuh kuşt...
Ew zinagara di mejî,
Ku mejyê min dimijî
Min...bi kêrê xeritand.
û bi agir şewitand
û paqij kir...
Paqij kir ji serê xwe
Min avêt ji derê xwe
Bi çavekî bê perde, bi guhekî bê gemar,
Didim ser rêka taze, bi mejîkî bê zingar...*

*Ew kufika tifêlî,
Ku di dilda diçêrî,
Min...ji kokê de rakir...
hêlîna wê xera kir...
û belav kir...*

*Li rojên derbas bûyî, li rastiyên kevnare;
Li hevalên ne hemrah, cara pêşîn selav kir;
Min ew pelên rizyayî, ji deftera xwe çirand,
Di rûpelekî nû de, ayetên taze civand.*

*Êdî...bi dîtina xwe
û bi bihîstina xwe...
bi vîna xwe û bi mejî
bi rêveçûna xwe jî
Ez bûm însanekî nû, pîreşêşê olek nû,
Û di bajarê dil de min ava kir holek nû...
Şam; 25.5.2944
(Ronahî, hejmar; 26, sal; 1944, Rû; 17)*

Li Sovyetê;

Li nav kurdên Sovyetê ji berê de hewldanên hêja hebûne di warê wêje û toreya kurdî de. Bi weşana roj-nameya kurdî *Rêya Têze* gelek kurdan rahişt pênûsê êş, jan û daxwazên gelê xwe bi çêsnên cur bi cur anîne ziman. Bi kurtayî mirov dikare bibêje ku *Rêya Têze* di dîroka weşangerî û helbesta kurdî de stûneke hêja û saxlem e. Kesên mîna, Casimê Celîl, Celalî (Hawar; 27), Eskerê Boyîk, Fêrik Egît, Fêrikê Ûsiv, Qaçaxê Mirad, Karlanê Çaçan, Mikayilê Reşîd, Tosinê Reşîd, Şikoyê Hesen. Bi saya vê rojnamê karîna helbestine hêja diyarî gulistana helbesta kurdî bikin. Tiştê dilxweşker ev e ku van hemî helbestvanan di avakirin û hûnandina helbesta xwe û ruxsarî û naveroka wan spartine zargotina gelêrî. Her çiqas guherîn û pêşketinên li Sovyetê (di warê helbestê de) bandor li ser wan kiribe jî û sûd wergirtin tenê di hêla şewaz û teşeyê de tê dîtin. Lê bingeh jiyan û çanda kurdewariyê ye. Van helbestvanan bi ya min di modernîzma kurdan a parçên din de jî roleke baş listine. Ji ber ku em zanin gelek ji van helbestvanan berhemên xwe di kovarên di Hawarê de û vê dawiyê jî di Ronahî, Gelawêj, Gurzekgul, hwd. de weşandine.

BI TENÊ NEBÛM

*Bi tenê nebûm...
Şev... li tenîsta min, termekî razay bû
Dem... tem, mij û nalîn bû
Welatê min jî
Misteka toza ber bay bû
Li bejna roha min alya bû*

*Bi tenê nebûm
Agirek bûm
Nihênîyan geş dikirim
Pirtûkek bûm
Deryayê dixwendim.
(Refik Sabir)*

Rewşa Helbesta Kurdî Li Ewropayê

Piştî salên pêncî hin bi hin kurdan berê xwe dane Ewropayê û li wira rêxistin û komeleyên çandî ava kirin. (Komela Çandî a Xwendekarên Kurd-1956). Bi van komeleyan dixwestin ku gelê kurd û daxwazên wan li dinê bidine nas kirin. Yekem kovar (Çiya-1966) a bi kurmanciya bakur hate weşandin. Lê piştî demekê weşana wê rawestiya. Bi giştî di salên 75-80 yî geşedana weşangerî û rêxistinbûna kurdên Ewropa şax vedan. Gelê kurd xwe bi zimanê xwe perwerde kir û nivîsandina pirtûkan wek helbest, çîrok, roman kete rojeva wan. Hêjayî gotinê ye, ku piştî sala 1995an, bi peydabûna kenalên televîzyonî yên kurdî û beşdarbûna kurdan di tora înternêtê de, mirov nema dikare cudahiyê têxe navbera wêjeya kurdî li welat û li Ewropayê û li rewşa wan wek du babetên têvel temaş bike. Pirtûkên ku li Amed û Ürmiyê tînin nivîsandin roja din digihên Oslo; nivîsarên ji Laçîn û Efrîn zû digihên Berlîn. Bi taybetî rola tora înternêtê di jiyana kurdan de roj bi roj girîngtir dibe; ev hêman dibe sedem, ku ew bend û çeperên ku dagîrkerên Kurdistan li ser çand û kelepura me danîne êdî bînin hilweşandin û bê bandor bimînin.

Mijarên Wêjeya Kurdî li Ewropayê:

- 1- Niştimanperwerî û evîna welat.
- 2- Siruşt û bedewiya Kurdistanê.
- 3- Bandora çand û wêjeya gelên Awropayî.
- 4- Bandora surealîzmê li pexşan û helbesta kurdî.
- 5- Bikaranîna êstêtkî û erotîzmê di pexşan û helbestê de.

Pelê Payîzê

*govendek destpêdike li bilindahiyê
xwe li ba dike pelekî ji rengê hemû zer û
soran
li ber bayê sar î payîze*

*tenê lertz e ew
li vê berêvara dereng*

*li jêr dinêre
li axê
li jor
li asîmanê ji ewrên rengerisa tikandî dinêre
ne dest ji darê dibe
ne dikare li hember gaziya axê xwe ragire
werr
dudil dimîne demekê
paşê
xwe ber dide
bi giranî datê xwarê*

*li jor dinêre careka din
li asîmanê bilind
li pelên mayî*

*bi keser radimûse axê û
pişta xwe dide bayê hênik
hiltîne serê xwe
dige
di dil de xembariya refên çivîkên koçer
(Mem Ronga-Mehmed Tanrikulu)*

LI BAKUR

Li bakur mixabin piştî avakirina komarê bêdengîyeke diltezîn û navbir- eke xembar kete bexçê geşedana wêjeya kurdî. Piştî salên şestî her çiqas di derbarê bi destxistina mafê netewî hewldan hatibin kirin û kovar û roj- name derketibin jî mixabin bi zimanê kurdî hema bibêje tu nivîs nehatine nivîsandin. Têne bi navê *Rev* em rastî helbestekê tên ku di miting û şevên siyasî de hatiye xwendin ku Edo Dêran nivîsandiye û helbesteke Kemal Badîllî û yek jî a Rojen Barnas. (*Li Bandeva Spêde*). Lê piştî salên heftêyî bi geşbûn û hêzbûna kurdan êdî em rastî nivîsên kurdî tên. Di sala 1979 an de yekemîn car kovareke xwerû bi kurdî û bi du zaravayan ku bi navê TÎRÊJ derdikeve. Ev hewldan jî mixabin rastî darbeya Îlonê tê û cardin bêdengîyeke dûvedirêj dikeve dîroka wêjeya kurdî. Di despêka sala 92 de bi navê *Nûbihar, Tewlo, Welat*, rojname derdikeve û piştî kovara *Rewşen, Azadiya Welat, Jiyanê Rewşen, War, Pelîn, Kevan; Nûza, Kulîlk, Gulîstan*, kovara W, û kovara *BÎR*. Di van salên dawiyê gelek xortên kurdan dest avêtin pênuşê û di behra helbesta kurdî de avjeniyê dikin; Rênas Jiyan, Kawa Nemir, Cîhan Roj, Recep Dildar, Îrfan Amîda, Şêxhmûs Sefer û gelekên din.

Helbesta Kurdî di çi Rewşê de ye û bi kû ve diçe?

Helbesta kurdî xwedî keleporeke giranbûha ye. Nemaze helbesta me ya klasîk têra xwe dewlemend e. Wek li jor jî hate diyarkirin helbesta me ya

nûjen li Başûr û Rojavayê Başûr ta qonaxeke diyar têkoşaye û xwedî gencîneyeke hêja ye. Lê di van salên dawiyê de diviyabû helbesta me êdî ji her alî ve dest bi hewldaneke modêrn- tir bikira. Lewre rewşa civakî û çand û kultura me rastî veguherînên berbiçav tên. Li Başûr hema bibêje bingeha komareke serbixwe hatiye avakirin. Bajar bi reng û xemlên modernîte dirûv û teşe girtiye. Têkiliyên civakî li gor bazara kapîtalîzmê pêk tên. Li bakur hema bibêje gund nemane. Gelemperî kurd li bajar û bajarokan civiyane. Ev rewşa ne siruştî di çand û têkiliyên civakî de rastî kartêkirina tevliheviyekê jî bi xwe re anî. Mixabin li gor vê prosesa nû helbesta kurdî hê bi peyv û hevokên gundiyane tên nivîsandin. Em rastî dîmenên bajar- vanî û çêj û tahma civakeke rêk û pêk nayên. Ango hel- bestvanên me hê li ser mêrga Hawarê dibezin û tiştine ku wan pêk anîbû wek benîştê dicûn. Jixwe helbesta me ya klasîk wek suc- darekî ku her kes jê direve û tew tu nirx û rûmetê jî nadinê. Ez bawerim piştî demekê wê tu helbestvanên klasîk êdî di qada kurmanciya bakur de nemînin; ew ê ku helbesta klasîk binivîsîne jî, wê wek "kevoka li şûn refê xwe mayî" lê bê temaşekirin.. Sedemên vê rewşê jî ev in:

a- Bandora wêjeya zimanên serdest û Ewropayê li ser wêjeya kurdî.

b- Helbestvanê kurd berî ku hay ji rêziman, hevoksazî û rastnivîsa kurdî hebin helbestan dinivîsin.

c- Tinebûna perwerdeya bi zimanê kurdî.

d- Tinebûna dezgeh û rexnegirên wêjeyî.

e- Rewşa perçebûna Kurdistanê û pîrbûna zaravayên me bûye sedem, ku heya niha hê zimanekî yekgirtî, bi yek şeweyê tîpan, peyda nebûye.

f- Hin dezgeh û sazî hene, ku ji aliyê kurdan ve yan jî li ser navê kurdan hatine avakirin, lê ji ber bêpilanî ew nikarin rola xwe di qada wêjeyî de wek ku pêwîst e bilîzin.

Astengên li Ber Geşbûna Wêjeya Kurdî:

Ji bona geşbûn û pergala helbesta kurdî re pêdivî bi gavine nû heye. Lê mixabin gelek astengî hene li ber wê. Hinek ji wan ev in;

1. Xwênerên helbesta kurdî kêrn in.
2. Tinebûna dezgeheke navendî ji bo zimanê kurdî.
3. Tinebûna nirxandina wêjeyî û rexnegirên objektîf.
4. Pêwendiya nivîskar û xwendevan.
5. Lawaziya bazar û navendên wêjeyî.

Jêderkên vê Gotarê;

- 1- Dîroka Wêjeya Kurdî, Feqî Huseyn Sağniç
- 2- Antolojiya helbesta kurdî, A. Balî
- 3- Dîwana Osman Sebrî,
- 4- Dîwana Cigerxwîn,
- 5- Qedrican-Weşanxaneya Komal
- 3- Kovarên internetî;
 - a- Kurd pen
 - b- Tirêj
 - c- Amîda Kurd
 - d- Avestakurd.net
 - e- Amûde.Net
 - f- Malpera Celadet Bedirxan
 - g- malpera Xelîl Dihokî

Helbest Bûn Dîwan

Receb DILDAR

Di qada edebiyatê de beşa herî nêzî çanda devkî helbest e. Kurdan ji bi helbestê gavên xwe avêtine nava qada edebiyatê. Cara yekemîn Baba Tahirê Uryan bi zaravaya lorî helbestan lêkirîye. Di kurmançî de navê Elî Herîrî derbas dibe lê divê meriv qewlên êzîdîyan jî bibîr bîne û tişteke balkêş e ku ew qewl heta îro bi kurmançîyeke paqij û zelal gihîştine me. Piştî Celadet Bedirxan alfabeya kurdî bi tîpên latînî serrast kir, ekola Hawarê helbestên xwe bi tîpên latînî lêkirin. Li bakurê welêt kêsên ku ji medresê dihatin xwe ji tîpên erebî neqetandin, lê piraniya kurdan li dibistanên dewletê dixwendin û ji ber vê yekê jî nifşên nû helbestên xwe bi tîpên latînî lêkirin. Min jî xwest ku van pirtûkên helbestan ên ku bi tîpên latînî hatine lêkirin û li bakurê welêt hatine çapkirin an hatine belavkirin wek listeyekê amade bikim û li ber çavên xwendevanan raxim. Dibe ku em negihîştibin hinek berheman; eger ew bigihîjin ber destên me, em ê li listeya xwe zêde bikin.

Wek ku di listeyê de jî diyar e, li bakurê Welat bi tîpên latînî kitêba yekemîn a helbestê *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye û di sala 1968an de ji aliyê Weşanxaneyê Gûn ve hatiye çapkirin û ji wê rojê heta îro çapa wê pênc cara nû bûye, heta niha kitêba çapa herî zêde nû bûye ew e. Heta dawîya sala 2005an bi tevayî 144 heb kitêbên helbestê hatine çapkirin. Di sala 2003yan de wek rekorekê 34 kitêb hatine çapkirin.

Ji van 144 kitêban 11 hebê wan bi kurdiya zazakî 133 heb jî bi kurdiya kurmançî hatine çapkirin.

Mijarên helbestan:

1-Welatparêzî û têkoşîna azadiyê: Di vê xalê de meriv dikare rastî binmi-

jarên wek dîrok, ziman, welat, feqîrî, nezanî, têkoşîna ji bo mafên azadî û neteweyî were. Ez ê ji bo vê mijarê ji helbesteke Rojen Barnas a bi navê "Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir" çend rêzikan mînak bidim:

*"Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
Ez şêx Seîdê kal
Bijîşk Fûad im
Pêşmergekî bê nav û bê nîşan
Û qevdekî ji pincara welat im
Ez duh şehîd bûm
Îro nûhat im."*

2- Evîn û hesret: Di vê mijarê de, meriv dikare xalên wek eşq, evîna zarokan, hesreta dê û bav, hesreta gund û bajaran bibîne. Ji bo vê mijarê ez ê mînakek ji helbesteke Sabah Kara bidim.

*"Ez zanîm ku tu nîn î
Lê ez bazê kemînê
Dibe ku tu dikarî
Min dîn bikî bi evînê
Porê xwe yê zêrînî
Bikî sîya havînê
Vaye ez li vira me
Li ber deriyê evînê
Ez li hêviya te me
Ji şemiyê ta inê"*

3- Jin: Di vê xalê de bindestî û pirsgirêkên jinê, hestên jinê hatine nîqaşkirin. Ji bo vê mijarê ez ê çend rêzên Gulîzerê mînak bidim.

"Ji anatomiya jinekê

(Dersa yekemîn)

- 1- Bi tîpekê dûrî janê ye
- 2- Zimanê wê qedexe ye ji dilê wê re
- Pira di nava dil û zimanê wê de şikestî ye
- 3- Her qermîçokek rûyê wê xwediyê çîrokeke dilşewat e
- 4- Her tim du dilop hêsir dibin şîrîkên kenên wê
- 5- Cênîkên wê nobedaran xwedî dikin, ji bo kontrola çavên wê
- 6- Tim bi stûxwariya diya heft qîzan diji
- 7- Ji bo girêbidin zimanê porê wê, dolbendekê avêtine serê wê
- 8- Ji kerba dilê xwe yê parçebûyî re bi ta û derziyê re bûye heval, kêlan diavêje navbera xeyal û jiyanê"

4- Oldarî: Di vê xalê de li ser mijarên wek, dîn, dîndarî, pesnê Xweda, pêxember, kitêbên pîroz û şexsiyetên navdar helbest hatine nivîsandin. Ji bo vê mijarê ez ê ji helbesteke Raîfê Bêçare mînak bidim.

"Pirtûkê rîsalê nûr
Ew ji me re bûne şûr
Kufr û îmana rast
Weke çiya ji hev dûr"

5- Xweza: Li ser xweşikbûna gul û kulîlkan, deşt û çiya, teyr û tilûran, aramîya xwezayê helbest hatine nivîsandin. Ez ê çend rêzikên xwe ji vê mijarê re mînak bidim.

"Xwezî
Ji bajarên qilêr dûr bûma,
Li serê qotekî bilind
Bi lorîna bayê sibê
Di nav kulavekî koçerî de
Li benda zayîna rojê bûma."

Di helbesta bakur de teşe: Nîfşên nû hema bêjin bi tevayî helbesta serbest dinivîsînîna lê ên ku bi awayê klasîk jî dinivîsînîna hene; yên ku ji medreseyê hatine pirranî bi awayê klasîk dinivîsînîna.

Lîsteya 144 kitêban li jêr e, ji vana 46 hebên wan ên klasîk an dewra Hawarê an ên parçeyên din in, 98 hebên wan ji aliyê nîfşên nû ve hatine nivîsandin.

No	Nav	Helbestkar	Weşanxane û sala w	
1-	Mem û Zîn	Ehmedê Xanî	Gûn	1968
2-	Mem û Zîn	Ehmedê Xanî	Koral	1973
3-	Şefeqa Lenîn	Cegerxwîn	Kaynak	1976
4-	Li Bandeva Spêde	Rojen Barnas	Tirêj	1979
5-	Diwan	Melayê Cizîrî	Firat	1987
6-	Mem û Zîn	Ehmedê Xanî	Hasat	1990
7-	Kîne Em	Cegerxwîn	Pelê Sor	1991
8-	Kela Dimdimê	Jan Dost	Melsa	1991
9-	Sîpan 1	Sîpan Xizan	Dicle-Firat	1991
10-	Nûbar	Ehmedê Xanî	Firat	1992
11-	Helbestên Welatê Bindest	M. Seîd Alpaslan	Pelê Sor	1992

12- <i>Nalînên Min</i>	M. Şakirê Koçer	-----	1992
13- <i>Prisk û Pêti-Sewra Azadî (Diwan-1-2)</i>	Cegerxwîn	Deng	1992
14- <i>Evîna Wêlat</i>	Abdurehman Durre	Melsa	1992
15- <i>Destanek Ji Bihuşta Wînda</i>	M.Zahir Kayan	Berfin	1993
16- <i>Evîna Dilê Min</i>	Mehdî Zana	Belge	1993
17- <i>Azadî û Jiyan</i>	Kemal Burkay	Deng	1993
18- <i>Kîme Ez-Ronak(Dîwan 3-4)</i>	Cegerxwîn	Deng	1993
19- <i>Doza Jîn</i>	Hisêyn Elî Başar	-----	1993
20- <i>Hiroşîma Duwem Helebçe</i>	Riza Çolpan	Dilan	1993
21- <i>Stranên Azadiyê</i>	M. Seîd Alpaslan	Pelê Sor	1994
22- <i>Brîna Bêar</i>	Îlhamî Sertkaya	Med	1994
23- <i>Mewlûdê Kirdî (zazakî)</i>	Mele Ehmedê Xasî	Firat	1994
24- <i>Ez</i>	Reşîdê Kurd	Avesta	1995
25- <i>Ji nav Şîrên Min</i>	Şêrko Bêkes	Avesta	1995
26- <i>Milkê Evinê</i>	Rojen Barnas	Nûdem	1995
27- <i>Adir û Asme</i>	Qemerê Alî	Piya	1995
28- <i>Gome</i>	Kemal Astare	Piya	1995
29- <i>Ariya Demsalê Ez im</i>	Mahzar Kara	Govend	1995
30- <i>Berf Fedî Dike</i>	Kemal Burkay	Deng	1995
31- <i>Potîna Reş</i>	Remzi Çakin	Pêrî	1995
32- <i>Vêger</i>	Evdila Peşêw	Avesta	1996
33- <i>Çarîn</i>	Kemal Burkay	Deng	1996
34- <i>Mem û Zîn</i>	Ehmedê Xanî	Deng	1996
35- <i>Sê Reng</i>	Nesimî Yaman	Yaman	1997
36- <i>Gulbihar</i>	Latif Ozdemîr	Kora	1997
37- <i>Xewnên Rojê Ronî</i>	M.Şakirê Koçer	-----	1997
38- <i>Nalîna Sevê</i>	Seracettîn Kirici	Sor	1997
39- <i>Zend Avesta- Şefaq(dîwan 5-6)</i>	Cegerxwîn	Deng	1997
40- <i>Gaziya Min</i>	Berhîm Paşa	Nûbihar	1997
41- <i>Ji Çem Bi Derya(Çarîn)</i>	Sabah Kara	Nûbihar	1998
42- <i>Evîna Qedexe A.</i>	Sivar Yalçin	Aso	1998
43- <i>Xewna Avê</i>	Raîf Yaman	Pêrî	1998
44- <i>Kulilkên Ezêb</i>	Kamîran Alî Bedirxan	Avesta	1998
45- <i>Dubeytî</i>	Baba Tahîrê Uryan	Nûbihar	1998
46- <i>Wêre Dotmam</i>	Celadet Alî Bedirxan	Avesta	1998
47- <i>Awazên Xerîbiyê</i>	Bedirxan Epozdemîr	Aso	1998
48- <i>Diwan</i>	Seyid Eliyê Findikî	Nûbihar	1999
49- <i>Zîlan Agir û Stranên Jiyanê</i>	Medenî Ferho	Pêrî	1999
50- <i>Hêvî û Jiyan Derwêş</i>	M. Ferho	Pêrî	1999
51- <i>Di Siya Dara Xaçê de Serhildan</i>	Miraz Ronî	Pêrî	1999
52- <i>Janya</i>	Rênas Jiyan	Doz	1999
53- <i>Çend Xezel û Helbest</i>	Siyahpûş	Ens. Kurdî-St	1999
54- <i>Çerxa Felekê</i>	M.Şakirê Koçer	-----	1999
55- <i>Ey Avê Av</i>	Feqiyê Teyran	Ens. Kurdî St.	1999
56- <i>Rozê Yena</i>	Hawar Tornê Cengî	Tij	1999
57- <i>Ramûsan Min Veşartin</i>	Arjen Arî	Avesta	2000

58- <i>Duri Siya Nezdî Ama</i>	Xal Çelker	Tîj	2000
59- <i>Hêvî-Aştî(Dîwana 7-8)</i>	Cegerxwîn	Deng	2000
60- <i>Feqiyê Teyran(M.Xalid Sadimî)</i>	Feqiyê Teyran	Nûbihar	2000
61- <i>Şeva Dawî</i>	Jana Seyda	Avesta	2000
62- <i>Helbestên Kelogrî</i>	Mucteba Baravî	-----	2001
63- <i>Arzeba</i>	M. Zahir Kayan	Sî	2001
64- <i>Êş</i>	Berken Bereh	Sî	2001
65- <i>Evîna Mîr Hesên</i>	Feyzî Demirag	Pêrî	2001
66- <i>Ji Nav Şûrên Min</i>	Şêrko Bêkes	Avesta	2001
67- <i>Gulîstana Bêçare</i>	Raîfê Bêçare	-----	2001
68- <i>Bêdeng Mane Zozanên Kurdistan</i>	Fatma Bozarşan	Deng	2001
69- <i>Bimre Brakuji</i>	Riza Çolpan	Dêrsim	2001
70- <i>Hesreta Pênce Salî</i>	Riza Çolpan	Dêrsim	2001
71- <i>Me Welatek Hebû</i>	Can Gulşenoglu	Doz	2001
72- <i>Ev Çiya Rûspî ne</i>	Arjen Arî	Avesta	2002
73- <i>Şîr</i>	Rojen Barnas	Nûdem	2002
74- <i>Sê Kulm Ax</i>	Mezher Bozan	Pêrî	2002
75- <i>Ratîka</i>	Cîhan Roj	Sî	2002
76- <i>Dîmenên Derizî</i>	Irfan Amîda	Sî	2002
77- <i>Qeşem</i>	Bêrî Bihar	Sî	2002
78- <i>Azebe(Zazakî)</i>	Çetîn Satici	Sî	2002
79- <i>Dîwan</i>	Dîlbêzarê Bêkes	Pêrî	2002
80- <i>Rêbaz(Dîwan-1)</i>	Molla Suleyman Kurşun	-----	2002
80- <i>Keskê Dawî di Cenazeya Xwedê</i>	Hoşeng Broka	Pêrî	2002
81- <i>Gulûcinûkavil</i>	Osman Mehmed	Avesta	2002
82- <i>Dîwan</i>	Ehmed Huseynî	Avesta	2002
83- <i>Nehcul Enam</i>	Mele Xelîlê Sêrtî	Ens. Kurd.	2002
84- <i>Dîwana Rûhî</i>	Şêx Evdîrehmane Axtepî	Ens. Kurdî St.	2002
85- <i>Dîwana Kerbelayî</i>	Şêx Mihemed Kerbelayî	Ens. Kurdî St.	2002
86- <i>Alisû</i>	Hassan Îrandost	Sî	2002
87- <i>Nalîna Agirî</i>	Mehmet Avci	Sî	2002
89- <i>Şagirtên Evînê</i>	Berken Bereh	Sî	2003
90- <i>Zomafer</i>	Serkeft Botan	Elma-Mîr	2003
91- <i>Berbejna Rê</i>	Lal Laleş	Belkî	2003
92- <i>Mexzena Xwînê</i>	Rênas Jiyan	Belkî	2003
93- <i>Bajarê Dirinde</i>	Ehmed Huseynî	Belkî	2003
94- <i>Roja Spiye</i>	Çetîn Satici	Elma-Mîr	2003
95- <i>Qêrîn</i>	Medenî Ayhan	Ozanli	2003
96- <i>Agirbanû</i>	Ilhamî Ozer	Elma -Mîr	2003
97- <i>Kurdê</i>	Rahîm Qoserî	Pêrî	2003
98- <i>Selpakfiroş</i>	Kawa Nemir	Rewşen-Name	2003
99- <i>Destana Kawa</i>	Arjen Arî	Elma-Mîr	2003
100- <i>Zend-Avîsta</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
101- <i>Şefaq</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
102- <i>Mewlûdî Nebî</i>	Mela Kamil Puexî	-----	2003
103- <i>Nameyên Nabersivîn</i>	Îrfan Amîda	Aram	2003

105- <i>Hêviya Brînê</i>	Yalçin Yaşar	M	2003
106- <i>Kewê Canê</i>	Receb Dildar	Gun-Hivron	2003
107- <i>Helbestên Sirgûniyê</i>	Lokman Polat	Veng	2003
108- <i>Guantanamo</i>	M. Şakirê Koçer	-----	2003
109- <i>Agir û pirûşk</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
110- <i>Sewra Azadî</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
111- <i>Kî Me Ez</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
112- <i>Ronak</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
113- <i>Zend-Avesta</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
114- <i>Şefaç</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
115- <i>Hêvî</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
116- <i>Aşitî</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
117- <i>Salar û Midya</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
118- <i>Şerefnameya Menzûm</i>	Cegerxwîn	Avesta	2003
119- <i>Hesreta Zerrê Mi</i>	Xeyrî	Tîj	2003
120- <i>Destûr Bide</i>	Kemal Astore	Tîj	2003
121- <i>Awaza Serpêhatîyan</i>	Evin Çiçek	Pêrî	2003
122- <i>Awaza Serpêhatîyan-2</i>	Evin Çiçek	Pêrî	2003
123- <i>Awaza Serpêhatîyan-3</i>	Evin Çiçek	Pêrî	2003
124- <i>Dîwan</i>	Osman Sebrî	Pêrî	2004
125- <i>Ez jî jîyame</i>	Mezher Bozan	Pêrî	2004
126- <i>Hesret</i>	Fuad Dogan	Pêrî	2004
127- <i>Tav û Leylan</i>	Cemîl Denlî	Bajar	2004
128- <i>Monologên Evînên Kedîkirî</i>	Mem Bawer	Bajar	2004
129- <i>Şop</i>	Reşit Keskin	Tevn	2005
130- <i>Jana Sipan</i>	Sipan Xizan	Tevn	2005
131- <i>Qetran</i>	Dost Çiyayî	Avesta	2005
132- <i>Hestên Veşartî</i>	Aydin Orak	Berçem	2005
133- <i>Ta Ji Sêvan û Wêdetir</i>	Hoşeng Broka	Pêrî	2005
134- <i>Kêr û Hevrîsim</i>	Nihat Çelik	Elma	2005
135- <i>Dêsan de Sûretê Ma Nimite</i>	Roşan Lezgîn	Vate	2005
136- <i>Evîna Dilê Min</i>	Mehmet Geçit	Tevn	2005
137- <i>Stranên Çavbiken</i>	Cemal Ozçelik	Doz	2005
138- <i>Bazên Welat</i>	Serdar Roşan	Doz	2005
139- <i>Zulfiyar</i>	Rehîm Koserî	Tevn	2005
140- <i>Buwariya hestên lerizî</i>	Bêrî Bihar	Avagon	2005
141- <i>Dilê Min Bû Jîngeha Evînê</i>	Hemîd Dilbihar	Aram	2005
142- <i>Ez Bûm Jînpêrest</i>	Hemîd Dilbihar	Aram	2005
143- <i>Mem û Zîn</i>	Ehmedê Xanî	Deng	2005
144- <i>Çima</i>	Serkeft Botan	Belkî	2005
145- <i>Nesrîna Qedexe Ji Bêcirriya Tê</i>	Tengezarê Marînî	Belkî	2005
146- <i>Dîwan</i>	W. K Merdimîn	Vate	2004
147- <i>Dîwan</i>	Mela M. Eliyê Hunî	Vate	2004
148- <i>Dîwan</i>	Mela Mehemedê Kavari	-	2005

MEWLIDÊ KIRDKÎ


Roşan LEZGÎN

Mewlidê Kirdkî, sey "Mewlidê Xasî" zî yeno şinasnayîş. Xusûsiyetê xo yo muhîm o yo ke, metno tewr verên ê kurdîya zazakî yo. Û hetê kurdêkê zazayî ra, yanî destê Seydayê Xasî ra ameyo nuştîş.

Mewlidê Kirdkî 1899 de Dîyarbekir de çap bîyo. Hetê Zeynel Abidîn Amedî ra bi xetê destan ameyo nuştîş. Û reya verêne Çapxaneyê Lîtoğrafya de 400 nusxeyê ey ginayê çapî ro.

Ez vana qey yewna xusûsiyetê xo zî no yo ke, herçiqas lehçeyanê kurdkî ra a ke tewr erey ameya nuştîş kurdîya zazakî (kirmanckî) ya zî la kitabo kurdkî ke reya verêne yew metbea de çap bîyo, no yo.

No kitab hetê Mihanî ra alfabeya erebkî ra tiranskirîbeyê alfabeya latîni ya kurdkî bîyo û 1994 de hetê çapxaneyê Firatî ra Îstanbul de ameyo weşanayîş.




Verî ke ez derheqê xusûsiyetanê bînan de, derheqê muhtewaya nê kitabê ma yê erjayeyî de malumatan

bida, ez do nuştoxê nê kitabî bi şima bida şinasnayîş.

Nuştox:

Seydayê Xasî, nameyê xo Mela Ehmedê Mela Hesenî yo. Labelê, mîyanê şarî de sey Seydayê Xasî ameyo şinasnayîş. Manaya "Xasî" zî tîya ra yena ke; Xasan, zemanêk tam serê sînorê Dara Hênî û Licê de, mîyanê ê koyanê berzan de, gelîyêko xorîn de yew mezraya qijikeke bîya. Babê Seydayê Xasî Mela Hesen bi eslê xo uca ra, yanî Xasan ra yo. La semedo ke babê ey demeyêko derg nehîyeya Licê Hezan de melatîye kerda, o semed ra Seydayê Xasî xo Hezanij zî hesibneno. Heqê ey zî esto, çunke, Seydayê Xasî serra 1867 de Hezan de ameyo na dinya û 18ê Sibata 1951 de (84 serre) Hezan de na dinya ra bar kerdo. Rehma Homayî ro ey bo. Nika



mezelê xo yo mubarek zî mîyanê goristanê Hezanî de yo.

Seydayê Xasî, wextêk muftîyê Licê bîyo. Ma nika nê kitabê ey ra zanê ke Xasî goreyê zemanê xo ra yew alimêko namedar û jêhatî bîyo. Ma vajin zemanê osmanîyan de ziwani heme serbest bîyê. Ê ziwane ke no mintiqe de ameynê qiseykerdiş, Xasî pêru zanaynî. Kurdîya kurmancî û zazakî, fariskî, erebkî û tirkî zaf weş qisey

kerdîni. Bi nê ziwanan nuşto zî. Mesela, yew xezela dubeytî no kitab de esta ke, erebkî û fariskî û tirkî û kurmanckî û zazakî têreyde nuşta. Ez wazena na xezele ra çend numûneyî şima rê nîşan bida:

"Merheben ya men 'ela bil husnî teqwîmil beşer (erebkî)

Hafizîş Xaliq şevd ez çeşmê bednam û nezêr (fariskî)

Mucîdî esbabû latû we ma minha seder

(erebkî)

*Dil ji qeyda leşkerê xem kir reha wextê seher (kurmanckî)**Ax û nalînê verînê bîy vînê, nêmend eser (zazakî)*

.....

*Feilemen fellahû xeyrun hafizen halen-newa (erebkî)**Xasîya, ba sebr û şevta nûr şevd narê hewa (fariskî)**Rehberindir, bîl bû derden, çunkî hem odîr dewa (tirkî)**Yawerê rindan nebî Ehmed! Çi insaf û rewa (kurmanckî)**Dûriyey yîne, hevalo, kufri ya, ey bêxeber!(zazakî)"*

Wendoxê delalî, seke şima zî vînenê, na xezela Xasî de yew mey-dano tebîi yo demokratik de û mîyanê azadîye de heme zîwanî têreyde yê, bi hawayêko seypê yewbînî tamam kenê.

Eser:

No kitab de nêke tena na xezele esta, ney, verî ke Mewlid dest pêbiko çendnayê bînî zî estê. Sey zafê eseranê kilasîkan Seydayê Xasî zî, bi yew xezela "Axaz" yanî "destpêk" dest pê kerdo. Xezela verêne erebkî ya. Vano:

*"Ebdûhul Xasî, yeqûlû we yezer,
Kulle ma kane xetaen we xeter.
Ebsîrû bîl cennetî ya îxwetî,
Ba'de tesdîqîn we îqrarîl xeber".*

Yanî:

*"Hemeyê xeta û xeterîyê ke ey ra vejênê,
Xasîyo evdê Homayî, ehwalê xo beyan keno.
Badê ke Homayî û Pêxeberê ey tesdîq bikî,
Mijdîyana cennetî to rê yena ey bira".*

Dima ra, bi hawayêko menzûm, xora no kitab seraser menzûm o, yanî bi nezm (şîrkî) nusîyayo, behsê nameyanê Homayî keno, yanî Esmayê Husna. Na menzûme de neway û new (99) nameyanê Homayî yew bi yew ano zîwan.

Naye ra zî dima, di "Reddîye"yî estê. Mewzûya nê reddîyan, yanî cewaban zî, ez vana qey yew munaqeşe yo ke mîyanê alimanê ê wextî de, tay çîyan ser o bîyo. Nê "Reddîye"yî bi erebkî nusîyayê.

Û dima ra yew xezela tirkî esta. Tabî, tirkîya ewroyîne nîya, tirkîya ê zemanî ya. Bêke ez tercume bikera, qismêk tira ez wazena neqil bikera. Seydayî Xasî na xezele de wina vano:

*Bîr qewm kitabsiz olse, dîlsiz deware benzer
Dînsiz heyatê fanî, yazsîz buhare benzer
Cehaletin libasî, kîrlî xumare benzer
Libasê dînî soyan, ûyûz hîmare benzer*

....

*Qiyasê nefse ûyan, îblîsê jare benzer
Qezayê heqqe razî, Xelîlê nare benzer
Axir zemande dînî, eshabê xare benzer
Alim olan munevver, butûn enware benzer
Cahil olan zewallî, mûmsîz fenere benzer
Kelamê hikmetamîz, miskê tetare benzer
Xasî, meqaleyê sadîq, şemsê nehare benzer*

Badê naye zî, a xezela ke bi çar zîwanan nusîyaya, a ke mi binêk verê cû qalê aye kerdibi, esta.

Nê heme xezelan û reddîyeyan ra dima zî Mewlidê Kirdkî dest pêkeno.

Qismê Mewlidî:

Mewlid, yew çekuya erebkî ya. Manaya zayîşî de ya. Labelê, gama ke

ma sey yew kitabî vanê "Mewlid", no yeno a mana ke, yew metno ke bi hawayêko menzûm, yanî şîrkî nusîyayo û qalê ameyîşê dinya û cuyê Pêxemberê dînê îslamî Hz. Muhemmedî (sHs) keno. Nê tewir metnî, ez vana qey, mîyanê heme qewmê ke musluman ê de, bi ziwane heme qewmê ke muslumanîye qebl kerdo de estê. Mesela, bi tirkî û kurdkî û belki sewbîn ziwane zî estê. Sey numûne, Mewlidê Kirmanckî yo ke Melayê Batê nuştî, ame vîrê mi ke wina dest pêkeno:

*"Hemdê bêhed bo Xudayê alemîn,
Ew Xudayê daye me dînê mubîn.
Em kirine umeta xeyrul beşer,
Tabîê Wî muqtedayê namuwer."*

Nara, mîyanê muslumanan de sey yew edetêkê dînî, no metno ke qalê bîyayîş û cuyê Pêxemberî keno, yeno wendiş û dima ra zî, sey yew zîyafetî werd yeno dayîş. Yew mela yan zî merdimêko vengweş bi veng, seke yew xezele, yan zî qesîde biwano, winî bi aheng/melodî waneno û cemat zî bi xuşû, mîyanê zîkrî de goşdarîye keno. Peynîya her qismî de zî cemat heme têreyde selawatan waneno.

Seke mi verê cû zî vatibi, no hem metno yewin o ke kurdîya zazakî de ameyo nuştîş û hem zî kitabo verên ê na lehçe yo. Esas verê ey zî yewna kitab bi kurdîya zazakî ameyo nuştîş. Ta serra 1852 de camêrdêkê orisî, nameyê xo Peter Îvanovîch Lerch, yew metno ke tede qalê kurdîya zazakî û zazayan keno nuştî.

Mewlidê Xasî, heme şîyês (16) qismî yo. Hewt sey û pancas û şeş

(756) misreyî, her misre zî yewindes (11) hece ya. Ziwane xo zî zaf akerde û fesîh o.

Ez wazena her qisim ra numûneyêk binawna.

1. Qismo verên, destpêk o. Û bi no qayde dest pêkeno:

*"Bismillahirrehmanirrehim
Ez bi bismillahi îptida kena,
Raziqê aman û xasan pîya kena.
Rebbî, hemd û şukrî ancax to rê bê,
Kîbr û medh û fexrî pêro to rê bê."*

2. Qismê diyîne de behsê "Tertîbê Mewlidî û fedlê wendişî" keno. Mesela vano ke:

*"Lazim o tertîbê mewlidî temam,
Ma ser o, vacin, bizanê xas û am.
Ger ti yew mewlid xo rê wendiş bidê,
Lazim o tertîb bizanê pê bidê!"*

Dima ra zî seba fedl û xeyrê wendişê Mewlidî zî wina dewam keno:

*"Nefê mewlidî şima persê, bizan,
Qet nîne hisabê defteran.
Belkî yew-yew lazim o vacin şima
Pê bizanê, pîlyê ay şahê şima.
Yew tera wendiş bîyo ger çî ser o
Kamo bworo go hezar îllet bero.
Hem bedel de rehmete w keyf û surûr,
Nazilê qelbî bîbo hem feyz û nûr."*

3. Qismê hîrêyîne de behsê "Çin-bîyayîşê eşyan (çîyan) û sîrrê Homayî" keno. Tîya de zî Seydayê Xasî vano:

*"Ewulê xellaqê kullê masî wa,
Tîm tenî bê, baş bizanê, bênewa.
Ne eno erd û enê ezmanî bîy,
Ne perî û cinnî û însanî bîy."*

*Ne enê roc û şewî, ne nîzd û dûr,
Nê zemanî, nê mekanê bêfîtûr."*

4. Qismê çarine derheqê
"Xeliqnayîşê Pêxemberî û eşyan" de
yo. Xasî vano:

*"Ewulî dareyê yeqînî, Rebbê ma
Kerde xelq û pa bi çar şaxî hema.
Badê cû yê padîşahê sermedî,
Hinkî nûrê xo girewt qey Ehmedî.
Vâ, "Bibe Ehmed" hema şahê wedûd,
Şeklê teyra Tawuse ame wucûd."*

5. Qismê pancine de behsê "Emrê
Homayî qey qeleme" keno. vano:

*Badê cû va, "Ey qelem nuştîş bike!"
Vâ, "Ez di emrê to der a, vatiş bike."
Vâ, "Binusne! Yew çinîk o xeyrê min,
Hem Muhemmed qasid o, qey emrê min."
Weqto ana va, şinawit ay qelem,
Tavilî şî secde û bêheş bî hem.
Secde ra weqto wurîşte, "Rebbena!"
Vâ, "Ti xellaqê min ê, ez vînena."*

6. Qismê şeşine de behsê "Xelqê
Ademî û nûrê Pêxemberî yo ke kewto
piştîya ey" keno. Vano:

*"Badê kullê nuştîşê eşyan ku kerd,
Xaliqê cebbarî fermanêke kerd.
Qeybê Cebraîlî va, "Henkî herrî,
Biyare erdan ra bi şestî tewirî.
Nêbo dengêke tera biyarê kemî,
Pê virazin ay herrî ra Ademî."*

7. Qismê hewtine de behsê "Eştîşê
Ademî yo cennetî ra û humartişê
kalikanê Pêxemberî" keno. Tîya de
vano:

*"Hezretî Hewa nezer da Ademî,
Vâ, "Çi nûr o?" Vâ, "Fexrê alemî."
Xaliqê her di muzeyyan kerdibî,*

*Hem di cennet de muxeyyer kerdibî.
Badê cû ku Ademî bêemrî kerd,
Xaliqî va, "Yê bigîrê, bierzê erd!"
Tavilî libas û tezyînî bîy vînî,
Yîne ra yo, eştî na dinyaya genî.
Bî fixan û zarîyey yê her go hewe,
Qet ebed nêbî sekan yew roc û şewe."*

8. Seydayê Xasî qismê heştine yê
Mewlidê Kirdkî de qalê "Babiyê
Pêxemberî Ebdulahî û cihûdanê Şamî
û ey rê waştîşê Amîna" keno, vano:

*"Wexto ke Ebdullahî de nûr bi zuhûr,
Kafirana zana ke amewo nîzdî nûr.
Badê cû geyray bi qetlê yê hema,
Hafîzê yê Xaliqê erd û sema.*

.....

*Badê cû, şî yê bi orfê ay zeman
Waştê Ebdullahî rê şahê cîhan
Yew weqeyke zerd û yew sîm hem se pes,
Hem devey zî sey pesan day ende bes.
Weqto arde hem yene bi ay şewî,
Hem receb bi, aşme bibî yew şewî."*

9. Qismê newine de "Întîqalê nûrê
Pêxemberî û hewnanê Amîna" keno.
Vano:

*"Badê cû nûro ke ma kerdo sena,
Ame, bi meyman, bi qeybê Amîna.
Wexto yo nûr Amîna de bi zuhûr,
Amîna zî diy ecêb îzz û surûr.*

.....

*Weqto bi şeş aşme hemlê ay ci rê,
Kerdi Ebdullahî qesdê təcîrî.
Şî Medîne, Xaliqî da nêweşî,
Qeybê Ebdullahî şerbetwerdişî.
Na dinya ra yo hebîbo enwerî,
'Emrê yê zî pêru vîst û panc serrî.
Weqto Ebdulmutelîb bi baxeber,
Amîna berma û va, "Ax û keser!"
Vâ, "Zereyê mi bi du nîmey, wey li min!
Xaliqî verda yetîm no hemlê min..."*

*Dar û ber pêru tedir bermay bi hal,
Hem çiqas heywanî der sehl û cibal."*

10. Qismê desine zî derheqê "Ameyîşê dinya yê Pêxemberî" de yo. Yanî qismê "Merheba" yo. Tîya de zî vano:

*"Şî rebîulewîwelî ra des şewî,
Amîna bî xerqê nûrî, yew hewî.*

.....
*Merheba, ey sîrrê subhan merheba,
Merheba, ey ruhê ruhan merheba.
Merheba, ey fexrê ersî merheba,
Merheba, nesley Qureyşî merheba."*

11. Qismê yewendesine de behsê "Tay ecaîbanê şewa bîyayîşê Pêxemberî" keno.

12. Qismê diwêsine de qalê Helîmaya Sadîyan ke şit dayo Pêxemberî, keno. No qism wina dest pêkeno, vano:

*"Amîna va, hevne min de bi beyan,
Go bido yê şit, Helîmay Sadîyan.
Çende rocî badê cû yew kariwan,
Ame Mekke, name vatê, "Sadîyan".
Yine dir bî hem Helîmay Sadîyan,
Şî xo rê berd seyîdê îns û can.*

.....
*'Emrê yê weqto tamam bi şeq serrî,
Amîna zî şî dinya ra ay serrî.
Weqto yê rê heşt serrî bî munqelîb,
Qebrî rê bi meyman Ebdulmutelîb.
Mend Ebî Talîb tenî pîy heyderî,
Bi ci rê hafîz, bi emrê ekberî."*

13. Qismê hîrêsine de zî qalê "Nazîlbîyayîşê wehîy û şîyayîşê Mîracî" keno. Nê qismî de zî vano:

*"Badê cû anîya ku dinya fanî ya,
Hem bi qîymet qasê yew dasî nîya.*

*Va xo rê, "Rebbî, ti zanê, vînenê
Çike ra hes nêkena bê to tenê".*

.....
*Weqto Cebrailî ra fer bi hebîb,
Ame şerman ra ci rê xewfo 'ezîb.
Bi muheyyer, hendî nêzana seyîn,
Şo huzûrê ay ku Rebbulalemîn."*

14. Qismê çarêsine de "Duay" keno.

15-16. Qismê pancês û şîyêsine de zî derheqê alfaba û tarîxê nuştîşî de û tayna malumatanê bînan dano.

Ma zî, pêru vajin ke, Homa ey ra razî bo. Homa ma hemîne bido xatîrê însananê başan ê sey Xasî. Ê verî ke ez nuştîyê xo biqedêna, seba ardimê ey, ke tercumeyê qismê erebki de hetê mî kerdîbî, ez Mela Huseynê Dingilhewa rê zaf sipas kena.

TAYBETIYÊN BIWÊJAN

Şehmûs ASLAN

Ji bona ku ristek bibe biwêj gere: peyvên wê ristê xweş lihevhatî bin, ji du peyvan kêmtir nebin, wateyek wan ya hêsa hebe, sal û zeman ser de derbas bibin, di nav gel û giştî de belav bibin, ji aliyê gel ve hatibin pejirandinê.

1. Her biwêjek xwedî rêzepeyvînek resen e. Ew peyvsaziya wê nayê guhertinê. Ciyê peyvên biwêjan bèn guherandin qeyde xirab dibe. "Av ji dêv çûyin" biwêj e, lê belê "Ji dêv av çûyin." ne biwêj e. Peyvên biwêjan nayên guhartinê. Wateya wan yek be jî, di şûna wê peyvê de, peyvek din nayê bikaranîn. Mînak: Di şûna "Lingê şeytên şikandin"ê de "piyê şeytên şikandin" nayê bi kar anîn. Hin deveran *nigê şeytên şikandin* tê gotin

Lê belê çend biwêj hene li derveyî vî qeydeyê dimînin.

Ji dêv filitî/felqizî/derket/pekiya

Ji gewriya xwe kirin/birîn

Ji îro pê ve/şûnda

Ji şîr vekirin/birîn

2. Pirrî peyvên biwêjan, ne di wateya xwe ya ferhengî de, di wateyeka mecazî de tèn bikaranîn.

Av ji dêv çûyin.

Av lê venexwarin.

Bed di guhan re kirin.

Dest dirêjî.

Kevir di zika de ye.

Kevir û kuçikê Xwedê li min barî.

Ser dirika rûniştin.

3. Lê belê hin biwêj, wateya wan a ferhengî û ya biwêjî nêzî hev in. Wateya peyvê hebekî hatiye nepixandin.

Ava aşekî ji dêv çûyin.

Bi hewa ketin.

Herî erş herî fers, tu yê bêyî ber çoyê reş

Çavê min te nebîne.

Serî jê re hejandin

4. Car heye yek biwêjek, çend wateyên ji hev cuda dide fahmkirinê.

Aqil negirtin: 1- Ji bûyerên bi serî de hatî ders dernexistin. 2- Neket sêrî.

3- Tişteke jê fahm nekirin.

Ar berdayê: 1-Mahf kir. 2-Şewat derxist.

Kevir biteqe: 1- Pirr çetin, zor pêk were. 2- Hedê xwe yê dawîn dftin. 3- Tu carî naqewime. 4- Çi qas biha here jî, bihayê herî mezin were ser ew qas e.

Ser xwe re avêtin: 1- Karek, gavekê de qedandin. 2- Gedûgek zor, ser xwe re derbas kirin. 3- Xwarinek qedandin li xwe ferikandin. 4- Bi serfirazî kuta kirin.

5. Gelên cîranên hev, biwêj ji hev girtine.

a- Çend biwêj ji zimanê tirkî ketine nava kurmançî. Tirk wan biwêjan naşixulînin, kurmanca qertaf lê zêde kirine û bikar tînin. Ew bûne malê kurmancan.

Kefen soka

Ît qanî be.

Gogil alçaxî.

Yaxeparçe bûyin.

b- Çend biwêj ji zimanê erebî derbasî kurmançî bûne.

Ya hewl û wela.

La îlac.

Ahd û wahd kirin.

c- Hin biwêjên kurdî ketine nava tirkî. Kurd wan bi kar naynin, tirka paşgiran lê zêde kirine, wan bi lêkerên tirkî bikar tînin. Ew bûne malê tirkan.

Peşkeş çekmek,

Pirû pak olmak.

Çar neçar.

BIWÊJ Û GOTINÊN PÊŞIYAN

1- Pirr caran meriv gotinên pêşiyên û biwêjan zor ji hev digerin. Ristên

ku darazeke didin nîşandan gotinên pêşiyên in. Ristên ku mînakek resen didin nîşandan biwêj in. Mebesta gotinên pêşiyên, rê nîşandayin û şîret lê kirin e. Mebesta biwêjan, têbiniyekê bi qalibekî xweş ravekirin e. **Wek:**

Adarê li min bada, min Boza xwe bi tayek ka da. (biwêj)

Dinya bi sebrê ava bûye.

(gotina pêşiyên)

Afirê gamêşa bû warê mêşa. (biwêj)

Yê bixwe sawarê, dê biçe hewarê.

(gotina pêşiyên)

Anî ji parsê da xêra xasê. (biwêj)

Erê erê ye, na na ye, erê-na bela ye.

(gotina pêşiyên)

Ez axa, tu axa, kî golikê bibe bin baxa.

(biwêj)

Gotin ji mirdaran, sipî ji qerpalan.

(gotina pêşiyên)

Kulav patin, li hev hatin. (biwêj)

2- Çend cûreyê ristan hene, ew hem wek gotinên pêşiyên, hem jî wek biwêjan karin bên şirovekirinê. Ger wek biwejan bên şirovekirin **biwêj** in. Ger wek gotina pêşiyên bên şirovekirin **gotinên pêşiyên** in.

Devê rovî nagiyê tirî, dibê "tirş e" : Qurnaz e, wexta zevta wî li tiştêkî neyê nabêje min nikarîbû. Kêmaniyê nayîne ser xwe. Dibê zatî min nedixwest an bi kêrî min nedihat. (Biwêj)

Devê rovî nagiyê tirî, dibê "tirş e": Şambaz, gava çavê wan nebire, xwestika xwe an mebesta xwe nîşan nade, kêrnehatina tiştan dibêjin. Dibêjin bila kes bi kêmaniya min nizanibe. (Gotina Pêşiyên)

Devê xelkê, ne doxîna merivan e: Guh ne de gotinên xelkê. (Biwêj)

Devê xelkê, ne doxîna merivan

e. Meriv nikare li ber gotinên xelkê rûne. Nûçe li nav gel zû belav dibin. Kes nikare wan nûçeya qedexe bike. (Gotina Pêşyan)

Guhê erdê heye: Mêze pê dihesin ha? (Biwêj).

Guhê erdê heye. Sirra bê gotinê veşartî namîne. Yek pê bihese ji yê din re dibêje, wilo, wilo her kes pê dihesin. Peyv zû digihîje ciyê xwe. Qisa hate gotinê êdî dizî namîne. (Gotina Pêşya)

Kê kir? Kê ne kir? Sêwiyê bêdê û bêbav kir: Sûc ket stûyê min feqîrê Xwedê. (Biwêj)

Kê kir? Kê ne kir? Sêwiyê bêdê û bêbav kir: Çi sûc û sigûtên bê xwedî hene dikeve stûyê bêkesan. (Gotina Pêşyan)

3- Di zimanê kurdî de qandî 10-15 ristan hene angorî rêzkirin û bilêvkirinê jî wateya wan diguherin. Rist, car heye dibe biwêj, car heye dibe gotina pêşyan.

Mînak: Meriv bibêje “tu guran ji gaziye ditirsînî.” biwêj e. Meriv bibêje “Gur ji gaziye natirsin.” dibe gotina pêşyan.

Kes bila dilê xwe bi miriyan xweş neke.
(biwêj)

Kes dilê xwe bi miriyan xweş nake.
(gotina pêşyan)

Kê derê zirav e bila di wê derê de biqete.
(biwêj)

Kê derê zirav e di wê derê de diqete
(gotina pêşyan)

DIRÛVÊ RISTÊN BIWÊJAN

1- Lêkerên rista biwêjan qertafên demê nagirin. Pirrî caran lêkerê hevo-ka biwêjan rader in.

Cila xwe li cahnimê raxistin
Çav jê nekutandin
Fitir xweş kirin
Fitil fitil di pozê re derxistin
Ser lingekî hezar derewî kirin
Li ser mûkê mayin/nemayin

2- Hin biwêj hevokên pirsan e. Bi lêkerên erênî tên gotinê, lê belê wateyek neyînî didin famkirin.

Berfa sor bariya ye? (Ne sar e.)
Deve û qatir e? (Bazarek ne girîng e.)
Kî ji birçîna mirî ye?
(Xwarina her kesî heye.)
Kuliya zimanê te xwarîye?
(Tu çima napeyivî?)

3- Hin biwêj hene lêkerên wan hew erênî tên bi karanîn.

Avê bi bêjîngê berhevkin.
Av ji dêv çûyin.
Bi ava heft çema şûştin.
Ber (nigan)lingan çûyin.

4- Hin biwêj hene lêkerê wan hew neyînî tên bi karanîn.

Ba di ber re neçûyin.
Bend li ser nayê girêdanê.
Beqa nekin.
Ber dirana negirtin.

5- Hin biwêj hene lêkerên wan hem bi erênî, hem bi neyînî tên bi karanîn. Di ferhengê de evan biwêjena bi hev re di xalekê de hatin nivîsandin. Erênî û neyînî ya lêkerê bi nîşana (/) ji hev hatine qetandin.

Bênamûstî qebûl kirin/nekirin,
Ber daxwarin/danexwarin.
Ber dêv re kenîn/nekenîn
Li ber çavan ketin/neketin
Mehdê xwe tengkirin/tengnekirin.

Nêzî hev bûyin/nebûyin
Pere kirin/nekirin.
Pêşiya xwe dîtin/nedîtin.
Pî da/neda ber.

6- Hin biwêj hene, lêkera wan erênî be wateyekê, lêkera wan neyînî be wateyeka cûda didin famkirinê.

Li erdê nexistin: Pirr rûmet dayin.

Li erdê xistin: Şikandin, avêtin, xistin.

Serî dananîn: Danexwarin, kêmasî nepejirandin.

Serî danîn: 1- Mirin. 2- Stûxwarî kirin.

Dest lê gerand: Bi desta saxî kirin.

Dest lê nagerin: Dil hez nekir ku bike. Tê nebihurî.

7- Biwêjên kurmançî jî wek hevoksaziya kurdî ne, lêker pirrî caran li dawiya ristê tê, carna dikeve pêşiyê, yek caran jî di nawa hevokê de cî digirê.

a- Biwêjên lêkerê wan li dawiya ristê de pirr in.

Ava sêrî germkirin.
Ba ber guha ketin.
Bi ava heft çema şûştin.
Cî li sêrî bû hesret.
Çavên feqîriyê birijê.

b- Gelek biwêj jî lêkerên wan li pêşiya ristê ne.

Bide aqilê xwe.
Bûye qîra reş.
Da ser serê xwe.
Dan ber çavan.
Dixweyî mastê nayî rastê.
Zane mala şeytên li ku ye.

c- Biwêjên lêkerê wan di nav ristê de jî hene.

Bela ye, ketî ber derî.
Çong da erdê.
Çû ber tîrrên dahşikan.
Dest dan hev.
Destan de ketî elemanê.
Zor da ser.

8- Hin biwêj ji du hevokan pêkhatine. Wate bi du mînakên xwurttir kirîye.

Eger ne fen e, va çî dar û ben e.
Ez dibêjim va ye hîrç, tu dibêjî ka rêç?
Gilikî wisa bibêje, bila sêl nan bipêje.
Gunehê te li stûyê te, jinan te qadiyê te.

9- Di pirr biwêjan de cînavkên nebinavkirî tînin şixulandinê. (Hin, kes, tiştêk, hemî, gişt, yek, kes, kesek, her kes, merivek, yek, ... hwd.)

Hineka pift guhan kirî.
Her kesî di rêkê de majo.
Kes jê re du kevira nade ser hev
Kîja bagêrî tu anî.
Yek sor dike, yek şîma dike.

10- Biwêjên bi cînavkê kesane dest pêdikin jî hene.

Ew û bextê xwe
Ew û nefsa canê xwe.
Ew û şîrê xwe.
Ez axa, tu axa, kê golikê bibe bin baxa.
Ez çiya, tu çiya, kê ji golikê re here giya.
Ez di şûna te de ba ma.
Ez dibêjim vaye hîrç, tu dibêjî ka rêç?
Min bûk anî bi lez û bez, tê da ga û pez, sivika malê tim ez.
Min cî de (nigên)lingên xwe rûyê bavê gelek xortan de dirîm.
Min ker ker kuştî, şekir şekir şûştî
Min neke destiyê kêrê!
Min pezê pirr çî kir, ez ê kavirê kur çî bikim.
Min sîr nexwariye ku bîhn ji min bê.

Tê dî kanî, li ser danî.
Tê ji mala bavê xwe aniye?
Tê nanê sêlekê xwarî, min nanê êlkê xwarî
Tu girêdî nasekine
Tu guran ji gaziye ditirsîni?
Tu ji bavê xwe bêminet î.
Tu ji dê yî, em ji damariyê ne?
Xwedê ya dide min, ya dide te!

11- Biwêjên lêkerî, ger ji daçek û
lêkerekî çêbibin, bi ya min ristên wilo
ne biwêj in; wek (bêmirad- bêxîretî).
Ristên ji daçek, cînavk û lêkerekî
çêbûne biwej in. Wek:

Bi lêv kirin.
Jê hez kirin.
Ji hev de xistin.
Li hev xistin.
Li xwe anîn.
Pêve danîn.
Tê derxistin.

12- Hin biwêj mînanan nîşan
didin. Bi peyvên "bû-bûye, dibêje qey,
tu dibêje, wek- wekî" dest pê dikin.

Bû pizot
Bû porê dîna
Bû qîr û qiyamet
Bûye cirm hefî ber derî
Bûye çituxêr
Bûye dirik ketî dêrî
Dibê qey bi zor ji Xwedê girtî
Dibê qey mastêrik di dêv de ye
Dibê qey sêveke kirine du ciya
Dibê qey xwîn ji paş guha berdaye
Tu dibê cinet e.
Tu dibê çermê ser milê wê ye.
Tu dibê min ga xwarî
Tu dibê qey kevir kişandî.
Tu dibê qey xwîn ji paş stûya berdaye.
Wek mozê pêvedayin.
Wek nanê sêlê dirûyi.
Wek nimêja feqîran.
Wekî nokê ser tahtê belav bûyin.

JI ALIYÊ WATEYÊ VE BABETÊN BIWÊJAN

1- Biwêj edet û marîfetên civatê,
bîr û baweriyên gel didin nîşandan.

Bi serê xwe dikî.
Bi xwîna bavê te ye.
Dest birakê axretê,
Ez ê simêla xwe kur kim.
Ji rû û simêla xwe fedî bike.
Kosteka xwe qetandin.
Ning lihev hatin.
Nigê şeytên şikandin.
Şertê mêran sê car e.
Tu ji jina xwe xirabtir bî.
Xwestiya te ji te hezdike.

2- Hin biwêj hene pêxweşbûnê
didin nîşandayin.

Bavê kê ye?
Bavê min bî.
Çavê te bixwim.
Delala/ê ber dilê min.
Dora te digêrim.
Rohniya çavê min î.
Gula min î.

3- Hin biwêj bixwe çîrokên kin in.

Ji golikê re gotine: Tu çima li dî
mangê baz didî ? Gotî: Wer nekim dê
dor bê mi.

Ji gur re gotine: Çima stûyê te wisa
qalind e?

Gotî: Ez bi destê xwe dikim, bi devê
xwe dixwim.

Li zikê mêrik xistin e. Gotî: "Ax piştâ
mi!"

Gotin e: Em li zikê te dixin tu çima
dibêjî "Ax piştâ mi!"

Gotî: Eger piştâ min hebûya we
nikarîbû li zikê min bixista.

Qizikê got "Ez ji vî zika xelisîm, rûyê
bavê gelek xortan de dirîm."

4- Hin biwêj ji çirokan derketine. Wexta serenav hat gotinê, ew biwêj, wê çirokê giştî dide bîrxistinê. Mînak:

Nokê Guno

Qîzên gund çûne qirş berhevda, Guno jî bi cem wan ketiye, gotiye "Qîzno hûn min jî bi xwe re nabin." Qîzan gotine "were." Hinek nok di cêba Guno de bûne, bi rê de li qîzan belav kirîye. Çûne çolê, qîz li ber qirşa pahn bûne. Guno sekiniye. Qîzan gotine "Guno tu çima qirşan berhevna." Guno gotî "Erê erê, hûn nokê Guno bixwin tasek ava sar ser da vexwin. De Guno koro were qirşan berhev ke!" Qîzan anîne her yekî qevdek qirş danê Guno, piştîya wî tamam kirine. Piştîya xwe şidandine. Guno rûniştîye. Qîzan gotine "Guno tu çima piştîya xwe tevnakî?" Guno gotî "Erê erê... Hûn nokê Guno bixwin tasek ava sar ser da vexwin. De kuro were piştî tevbike."

Qîzan rê tê nedîne. Piştîya wî jî şidandine. Ketine ber piştîyên xwe bi rê ketine. Guno nehatiye. Gotine "Guno tu çima piştîya xwe naynî?" Guno gotî "Erê erê, hûn nokê Guno bixwin, tasek ava sar ser da vexwin. De Guno kuro were piştî bikşîne!" Qîzan bi dorê piştîya wî kişandine anîn ber derî.

Diya Guno gotî "aferim lawê min, ez ê tim nokan têkim cêba te."

Ax! Pišta Min!

Li zikê mêrik xistin e. Gotî: Ax pišta min!

Gotine: "Em li zikê te dixin, tu çima dibêjî ax pišta min!"

Gotî: eger pišta min hebûyana we

nikarîbûn li zikê min bixistana.

Bazara Macîrok û Gungumokê ye

Dibêjin gava Nemrûdî Îbrahîm Pêxember avêtî agir, gungumokê pifî agir kiriye, macîrokê jî av di gepa xwe de aniye li agir kiriye. Yek di wê derê re derbas bûye

Gotiye: gungumokê bi pifa te van agira geş nabe. Tu çira pif dikiyê?

Gotiye: "Bila Hz. Îbrahîm zanibe ez dijminê wî me."

Ji macîrokê re gotî ev şewata bi ava gepa te venasê tu çima xwe di westîni?

Gotiye: "Bila Hz. Îbrahîm zanibe ez dostên wî me bes e."

Ez Wî Berdidim Ew Min Bernade

Lawik got "Yabo min dizek girt"

Got "Bîne."

Got "Nayê."

Got "Berde."

Got "Ez wî berdidim, ew min bernade."

Ji Pezê Min re Zerar Heye?

Şivan kerî birî çarşiyê firotinê. Mele li ser minarê dîtiye, gotiye "Ew ê hanê derketî wî diyara çî bang dide?" Yekî gotiye "Çima tu nizanî ew mele ye, Ezana Şerîf dixwîne. Bang gel dike, dibê werin nimêjê... "Şivan dibêje "Hêla hiş be. Ji pezê min re zerar heye? Tune ye?" Mêrik gotiye "Tune ye."

Gotiye "heta dikare bila bang bide."

a.sexmus@mynet.com

GULA QADAN

Arêkerdax: Turgut Ersoy

Qasim Çawîşî mi rê va. Eses derdê xu mi rê va. Va: Wexto ki ez xort bîyo, Gula Qadon keynek bî. Zerra mi tede bînê, zaf tede bînê. Nara, mi kerd-nêkerd, merdimî ser nay, nêbî. Gule va, "Ez Qasî nêgêna!" Teslîya mi kewte, Gule zewiciyay ez ca mendo.

Gule zewjîyay ez ca mendo. Zeman tede şî, ez zî zewicyayo. Ez zewicyayo, ara di çend serrî şîy, cenîya mi merdî. Cenîya mi merdî, ez vîya mendo. Mi va, "Ya Rebbî, ti yew berê xeyron mi rê akê. Ez wayîrê gedon o, berê mi qeflîyayo..."

Ey zaf zemon nêkewt orte ra, mêrdey Gule zî merd. Gule zî mendi vîyay. Gule zî wayîrê di gedan bî. Mi va, "Willahî, ena Gule zor-weşî gere ez ja bigîro. Mêrdey ja zî merdo, cenîya mi zî merda. Ez gere ja bigîro!..."

Welhasilikelam, yew êrey, rojawan o. Ez vejyayo yew bonî ser. Ez ewnîyayo ki Gule keye bi keye geyrena. Mi va, "Liya, Gule çi geyrena ecêba, eno serê êrey?" Yew imbazê mi, mi het o, nomey jey Kor Henefî yo. "Heno kor" vonê tira. Mi va, "Heno!" Va, "Ha!" Mi va, "Ti sax ke, veyni ina Gule çi rê keyon ra geyrena?" Hen şî. Hen baş şî, ome. Mi va, "Xeyr o?" Va, "Willa xeyr o. Gule siba palon bena filon ca di, Qalbêron⁽¹⁾ di velg birnena. Paley gere şorê velg." Mi va, paley şorê dayî rê velg birnê. Paley dewijê ma yê. Her kes xatirê mi zono. Ew (û) zor-weşî, ez gere inî gurî biko!...

Paley dades heb î, dades hebî paley estê.

¹ Qalbêran, dewa Qasim Çawîşî Behro de nameyê yew cayî yo.

A şew heto nimajî mi çim pêser nêna. Mi yew tepîşt, yew verada, ez se ko? Senî hewa biko? Mi va "Heno!" Va, "Ha!" Mi va, "Heno, ti gere mi rê yew mudafay bikî! Gule palon bena, îllahî yena palon hetî. Ma yew delevêre bikê!..."

Nimajî, tarî ra ez warîşt, mi çek û sîlehê xu girêday. Tifingo pîl mi d' o ew (û) dabonçe zî mi ra girêdaye yo. Ez şîyo, rayîro ke paley tira şonê, ez şîyo çetê rayron ra ronîşt. Serê sibay, şefeqê, ez şîyo çetê rayron ra ronîşt. Willa mi dî, rêz kewta palon, paley ha yenê. Teka ki omey, mi va, "Vindi!" Mi va, "Ewta vindinê!" Pêro bindê emirdê mi d' ê, dewijê min î. Xatirê mi zonê. Hesabê mi zî kenê! Mi ra tersenê, ez mehkmê herbê şêxon bîyo. Tek û peynî ome. Mi va "Gelî dewijon!" Va, "Ha!" Mi va, "Qadê Ellay rê, qadê pêxemberî rê, ... Qalî mekê! Şima eyro nêşonê Gulda Qadon rê velg ew şima xeber zî nêdonê bide. Şima hiergo yew cayê karbê xu ra şonê. Xu bide menawnê ew ez qe nişna Gula Qadon bero!" Hemîni va, "Çimondê ma ser..." Mi va, "Ez şîyo Koydê Miradon⁽²⁾, Mi hewn dîyo, mi Gule girota. Ez gere ja biremmo..." Willa, mêrdekî, Ellay jîn ra razî bo, hergo yew cay ra şî; ayêk xu limit, ayêk şî kardê xu ser, ayêk şî bostondê xu...

Xebera Gule çinîk a. Ez şîyo. Yew qoto berz esto, tira vonê "Taloy Gomey Şekî⁽³⁾". Taloy Gomey Şekî,

² Koydê Miradon (Koyê Miradan), yew koyo mitolojik o. Kam ke şiro uca, hesreta ey yena ca.

³ Taloy (Talvomêr) Gomeyê Şekî, mintiqeyê dewa Pîranî Behro de yew cayo ke hamnanan pes uca de beno weye.

toy vonê "Zîyar a". Ez şîyo weyra ronîşt. Ez û Heno kor pîya yê. Ma şî weyra ronîştî. Wila mi dî Gule ha yena. Herê xu bar kerdo. A û di hebî gedey ja yê. Gedey xu, xu rey vistî, barê herî wenayo, ha yena, nonê palon ona. A zî vona qay paley şîy velg birnenê!

Omey, epey nîzdî ma. Ma xu verada cayo ki velg birnenê, ma şî weyra. Ez û Heno kor, ma şî weyra ronîştî. Willa Gule omey, senî ki omey ayo meydon, tira vonê "Qalbêron", çîyekdê palon çinîk o, çew nêaseno! Naşt ewnîyay, daşt ewnîyay, ona tedi mendî.

Ez yewaş cadê xu ra warîşt, mi va "Gulê!" Va, "Ha!" Mi va, "Eyro rojê comêrdon o!" Gule va, "Ez bextê to bena, heyron bena, qurbon bena. Ez wayîrê gedon a, ez wayîrê seyona a..." Mi va, "Pere nêkeno!"

Namey pêrdê ja zî Elîy Qadon bi. Tira vatinê "Elîy Qadon". Gule va, "Elîy Qadon to kişeno ha! Inî gurî meki!..." Mi va, "Îmkan çinî yo!" Mi çengiley Gule tepîşt. Mi çengiley Gule tepîşt, Henê korê zî ay wir di gedey tepîştî.

Mi va, ez hîdî şoro Merga Gomey Şekî. Ez şîyo bindê yew kerrî. Ez newtono zaf vîndo. Ez vono, cay gazî di nêrê! Willay mi dî, yew şwone cêr ro ome, vîyart. Willay Gule va, "Ez kena gazî, ayo şwone kom ki esto, wa bêro mi to ra bigîro!" Mi va, "Lîyra kutikî! Lîyra kutikî! Ayo şwone Elê Îsî yo, tornê Elîy Ximrî yo. Ti eslê-cislê jey persa, armenî yo, bin ra bisilmane nîyo, armenî yo. Wayîrê hîrê keynon û di lajon o. Hema bila sunetê pêxemberî nêbîyo. Ayo şeno to mi ra bigîro?!"

Şwone şî, vîyart. Mi va, "Wardi!" No merg o, no zî şîyayîş o. Mi giroti erdi Zixrê Beyndironî⁽⁴⁾. Mi erdi weyra, taştêre şîkiya. Ma weyra yew sey di ronîştî, awk esta. Gelê mend, ez ewnîyayo ki zerey verê derî ra yew qiret ha yeno. Serqot, qolsiz ew cêr a qolî paykerdê ew ha yeno. Ha yeno, eno merdim o, eno heş o? Ez nîştî çîyekî teber ko! Neyse, ma epey mendî. Gorebê yew menzîlî mendo ma bireso. Mi va, inka ome ma dî, îllahî yew heway keno ma! Hîdî se bîyo, çî yo, çî kare yo!...

Ez zî nêzono ki Hîkmet Efendî⁽⁵⁾ yo, wayîrê dew o, wayîrê topraxî yo weyra. Hinda menzîlêk-di menzîlî tîfingî mendo ki ma bireso. Mi va, "Fîîk!..." Senî ki ma va "Fîîk!" ona vindert. Ew mi lingî ser na. Mi va, "Ti lingî ronê ti şî!" Tepa ageyra. Tepa ageyra, ona gorey cixarey-di cixarey ez vinderto. Ez duşmîş bîyo, mi va, "Eno merdim îllahî şîyo yew bar gêno, ma rê cay gazî-mazî nêyarî! Cay peyonyon nêyarî, ma bikşo?" Mi va, "Gulê wardî!" Mi va, "Wardi, ma şorê qotî ser o ronîştê". Lewey derî di yew qot esto, tira vonê "Tîlekî"⁽⁶⁾. Ma şî weyra yew kerrî ser ro ronîştî. Ona peyê kerrî di ma ronîştî. Ez ona ewnîyayo ki mêrdek, eynî ayo merdim o, ayo şîkil d' o ew tîfingo pîl ha tede yo, ha yeno.

Ome. O vono qay ma hema weyra yê. Ma hîdî gelêk ca şî. Ma ona xu çep tadayo. Ome, ayo cêr o ewnîya, çîyekî

çînik o. Ewnîya, nêzono, se ke, çî ke, çî çînik o. Hewna ageyra şî keye.

Ez se ko? Mi va "Willay, eyro ina dawa, nêtê mi esto, ez şoro key Hîkmet Efendî. Mi nomey jey eşnawito, ez nêşinasneno. Ez şoro key jey 'enî.

Gule va, "Hadê ma şorê, yew dostê pêrdê mi esto, tira vonê, Evdalê Fetihî⁽⁷⁾. Inka Gome d' o. Ma şorê key Evdalî, dostê pêrdê min o. Mele dawa ma girêdo." (Gule vona, mele ez şora weyra. Dostê pêrdê min o. Wa mi tira bigîro! Gule qayîl nîya jey reydi şoro. Zor berda çunkî!) Ew ma şî, heto mexrebî weyra ronîştî. Gellê şewî şî. Mi va, ez eno êrey şoro, nêbeno! Destê sibay di ez şoro, ma veynî, dinya hema qîlyaya ya. Mi xu cêr o, peyê gomî ro verada. Ez şîyo, kutikî ome mi. Mi yew-di kerrey eştî kutikon, mi dî yew ome teber. Va, "Lya şîma kom î, şîma çî yê, çî kare yê? Şîma kerron ver kutikon donê!" Mi va, "Qayme bê, qayme!" Ome ki lajê Evdalê Fetihî yo. Nomey jey Hecî Misfa yo.

-Silamuneleykum

-Eleykumsilam

Mi va, "Ewta gomey komî yo?" Va, "Gomey dat Evdalî yo". Mi va, "Gomey dat Evdalî eno yo?" Va, "Eno yo". Mi va, "O kora yo?" Va, "Şîyo Daxon⁽⁸⁾". Ewta gomey bizon o. O Daxon d' o." Mi va, "Ez şono Derey Gomeyê Bizon. Ti şo veynda dat Evdalî di, wa bêro". Ew willay lajekî ma dekerdî zerey gomî. Ber, kinarê teberî ra kerseki day piro ew şî. Ma şî zerey gomî ew lajekî da piro şî Daxon.

⁴ Zixir: Dereyo teng û xorîn. Beyndiron: Yew mezra ya.

⁵ Hîkmet Efendî, wayîrê Beyndironî yo.

⁶ Beyndiron de nameyê yew cayî yo.

⁷ Evdalê Fetihî daxonij o.

⁸ Daxon: Yew dewa Pîranî ya.

Ona mend, mi dî yew celbi omeý. Hewt-heşt tenî, des tenî omeý. Pêro sílehî yê. Mi va, "Ez se ko, ya Rebbî! Eno çi gure yo?" Neyse, senî ki daşt a omeý, siloma Ellay zî nêday ma. Ma hîdî gome ra omeý teber. Mi xu da ino kinar. Ê tikê ma ra hera yê. Ez nêşîyo jîn mîyon. Dat Evdalî va, "Qasê Fetî! To Gule erda zorbê çuwon, ez to ra gêno Gula Qadon! Ez to ra gêno!" Mi va, "Dat Evdal! Meki henekon, qal biki qala comêrdon. Ez omeýo key to, ti gere girêdê inî dawon". Va, "Ney! Ez to ra gêno. Dostê mi Elîy Qadon o".

Gule zî qîray, va "Dat Evdal, mi tira bigîr! Ez erdo zorbê çuwon, hela bê veyni birîna cwonikon. Ti vonê qay monena xetta cumikon⁽⁹⁾".

Neyse, mi va "Xal Evdal!" Va, "Ha!" Mi va, "Mi va qay ti kenê henekon. Dêmek ti eno gure raşt vonê. Mi ra vonê "Qasê key Feton!" Quça dost û dişmenon. Xismê vîst û ponc peyon. Mehkumê serrda herba şêxon. Eki ti mi ra bigîrê Gula Qadon, gere ez şoro xu dekwo bindê siloyondê behroyijon⁽¹⁰⁾. Ez gere rîyê dinya nêveyno!" Mi ona va. Mi dî lajê jey ê pîlî va, "Bawo, inî dawey to rê lazim nîyê. Fek veradi inî dawon ra! Bîyare, ma jîn wenê istoron. Ma jîn raşt kê Hopi⁽¹¹⁾ mîyon. Têres, ruto yemon o! Dayîkda ma û eylon pîya nono! Cenîyonê ma pêrin vîyay ver-dono. Ardonê keydê ma vaydono!..."

Mi va, "Gulê, metersi? Key Paşadê Heşîm Begî⁽¹²⁾, key doston o. Ayo

comêrd verên a dostê ma yo. Faris Axa⁽¹³⁾ kerway ma yo. Ma weyra girêdonê inî dawon..." Ew mi Gule giroti, ma êrey omeý Hopi, keyê Paşadê Heşîm Begî. Paşay Heşîm Begî nişna daway ma girêdo. Paşay Heşîm Begî şî Faris Axay di. Weyra ra zî, ma raşt ke, ma şî Gêl. Mîronê Gêlî weyra daway ma girêday.

GUALA QADAN

*Erê Gulê êre yeno, rojawon o
Roj viliki koy ser nono
Gule kewta dew mîyono
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon*

*Erê mi va, willay Qas vejya lewey bonon o
Keno tarqîbatê cwonikon o
Veynday Hendê korî dono
Vono, "Heno, wino çî yo, çî qewmîyayo?"
Henî va, "Hero Qaso, willa Gule kewta dew
mîyono
Arêkena wî palono,
Palon bena Qalbêrono,
Gule birmena wî velgono..."
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gulê vono*

*Aşm' û şefeqî têver naynê
Qasî o tepîştê, veradaynê
Roj akewtê, silam daynê
Qasê veynda Hendê korî daynê
Çetê rayîron di edilnaynê*

*Va, erê willey, rêz kewt, rêza palon o
Qas dekwenno qay vermîyo
Vono, "Willa ez eyro beno Gulay Qadon o"
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon*

⁹ Cumîkî: Gayê pîlî yê hêzdarî ke cite de xeta înan xorîn de şîna.

¹⁰ Bahro: Yew dewa Pîranî ya.

¹¹ Hopi (Altay): Yew dewa Pîranî ya.

¹² Paşayê Heşîm Begî, beganê Gêlî ra yo, Hopi de maneno.

¹³ Faris Axa, Gomey Şekî ra yo. Vistewreyê Paşayê Heşîm Begî yo.

Va, Gulê Qalbêr veşo, di leyek î
Gul caverday di seyekî!...
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon

Va, erê Gulê, willa Tileki veşo sîyateli yo
Gul û Qasî xu day taxdedê yew kerrî yo
Willa va, yew veng yeno, vengê şivonî yo
Gule va, "Ez keno qîrî û gazî yo
Teres, komo ki esto, wa bêro mi to ra bigîro!"
Qasî va, "Herê Gulê, willa ayo camêro ki ti
vona, ayo nîyo!
Wino tornê Welê Îsê Elîy Xerî yo
Ti esl û cislê jey persa, armenî yo
Wayîrê di keynon û hîrê lajon bîyo
Hema sunetê pêxemberî nêdîyo!
Pelxaç* werdo, qewetlî yo?!...
De haydê haydê, Gulê haydê
Haydê haydê, Gula Qadon

Gule va, "Willa Qaso, Beyndiron veşo pêro dar î
Bê, ma şorê gomedê dat Evdalî
Dat Evdal verên a comêrdê cimeton o
Yo girêdo inî doz û dawon o"

Va, Gul û Qasî xu cor di ay kaşon a vera-
daynê
Va, bî help-helma kutikon o
Va, Keleş vejya teber va, "Hoşt! Hoşt!
Ayo kom o, qay se vono?"
Vônê, "Erda Gulay Qadon o
Teresî erda zorbê wî çuwon o"
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gulê vono

Va, willa Keleş veynda Misfay dono
Misfa veynday Resûlî dono
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon

Va, Gul û Qasî dekerd gomedê bizon o
Çengalê berî piro dono
Va dat Misfay vera xu taday Daxon mîyono

Şono veynday bawikî dono
Willa va dat Misfa berê odî kiştay nono
Destî akerdî, keno duono
Poldê raştî ser di silom dono
Vono, "Lya çî yo, çî qewmîyayo?"
Willa vono, "Qasî erda Gulay Qadon o
Teresî erda zorbê wî çuwon o..."
Vono, "Wa dat Evdal bêro girêdo wî dawono"
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon

Va, Evdalî vera xu taday Mondeivono
Lya silomê Homa, xayîney dono
Gulê haydê, Gulê vono

Qasî va, "Dat Evdal, xu bigîr cadê comêrdon o
Ti gere girêdê inî dawon o..."
De Gulê haydê, Gulê vono

Va, dat Evdalî va, "Ez to ra gêno Gulay
Qadon o!
Elîy Qadon dostê min o..."
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gulê vono

Qasî va, "Dat Evdal hewani inî henekon o
Qal bi qala comêrdon o
Ez nêdono to Gulay Qadon o
Ti gere girêdê inî doz û dawon o!..."
Dat Evdalî va, "Willa ez to ra gêno Gulay
Qadon o!"
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon

Qasim Çawîşî va, "Willa, dat Evdal
Mi va qay ti qal bikê qala comêrdon o
Ti girêdî inî dawon o
Eger ti mi ra bigêrê Gula Qadon o
Ay çax ez xu dekeno bindê siloyondê
behroyjon o!"
Willa va, "Ez yew rut o, ruto yemon o
Ez xismê vîstî û ponc peyon o
Ez mehkûmê serrda herba şêxon o

Ez to w leyîron keno qurbonê Gulda Qadon o
Willa ez ardonê keydê şima vaydono
Ez cenîyonê şima vîyay verdono!..."
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon

Va, Sefer veynday Resûlî dono
Vono, "Mi rê bonci teber istoron o
Ez vêrena veyvekan o,
Vêra ja tadê Hopi mîyon o!"
De Gulê haydê, Gulê vono

Va, "Herê Gulê willay de Ehmedê Remî
meskenê ma yo
Paşay Heşîm Begî dostê ma yo
Herê Gulê willay bê,
Ma şorê lewey Ziyarda hopijon o
Wêy hopijî kilawtuj î!...
Merdimî kenê wayîrê eyb û sucî"
De haydê haydê, Gulê haydê
Gulê haydê, Gula Qadon**

*Pelxaç: Yew tewirê werdî yo. Tay cayan de ey ra
"Binadir" zî yeno vatiş

**Mi na deyîre Hopi de di kesan ra arêdaye.
Qismê mesele yewî va, deyîre zî yewnayî va.
Labelê her dîyan zî nêwaşt ke ez nameyê înan
binuso, coka nameyê vatoxan çin o.

**Dr. Tove Skutnabb-Kangas'un BİR Dergisinin 3. Sayısında
Yayımlanan "Tehlike Altındaki Dilsel ve Kültürel Çeşitlilik ve Tehlike
Altındaki Biyoçeşitlilik- Çeşitliliğin Korunmasında Dilsel İnsan Hakları
Eğitiminin Rolü" başlıklı yazıya ilişkin düzeltme aşağıdaki gibi:**

1) İki Numaralı başlık yanlış yazılmış, doğrusu şöyle: "Dünya Dillerine Neler Oluyor ve Neden? Dil Ölümü Paradigması ve Dil Cinayeti/Dilsel Soykırım Paradigması" Sen soru işaretini en sona atıp iki cümleyi birleştirmişsin.

2) a- Tablo 2'nin başlığının hemen altında "Diller doğal olarak yok olurlar... Doğarlar, büyürler; belirli bir yaşam süreleri vardır ve bu süre küçük dillerin çoğu için sona ermiştir. Arson: Kütüphaneler yanıyor!" diye bir yazı yerleştirmişsin. Böyle bir yazı olmamalıydı. Tablonun kendisinde olan ifadeler ayrı bir paragraf olarak yer almış.

b- Tablo 2'de sütunların yeri değişmiş. Sol sütunla sağ sütun (altındaki bilgilerle birlikte) yer değiştirecek.

c- Tablo 2'nin altında tabloda yer alan cümleler iki paragraf halinde tekrarlanmış. Böyle bir şey olmaması lazım.

d-Tablo 2'nin altında yer alan "Kuramsal olarak hangi paradigmayı kullandığımız fark eder mi?" cümlesi başlık değil.

3) a-Tablo 4'te düzeltilmesi gereken şey (en çok da buna üzüldüm, çünkü yazıda asıl vurgulanmak istenenin tam tersi söylenmiş oluyor) şu:

* Kırmızıyla gösterilen cümleler yer değiştirmiş.

Tablo 4. Kaç Yıllık Resmi Eğitim Sizi Okuryazar Yapar?

Edinilen okuryazarlık düzeyi/türü	Resmi eğitim yılı, eğer eğitim...	
	Anadilinde ise	Yabancı bir dilde ise
A.metin okuma teknik becerisi	A. 1-2 yıl	1-2+2=3-4
B. Kalıcı "teknik" okuryazarlık	B. 4-6 yıl	4-6+4-5=8-11

C. İleri düzeyde eğitim alabilmek ve sivil toplumun bir üyesi olabilmek için edinilmesi gereken temel okuryazarlık düzeyi	C. en az 8-9 yıl	8-9+4-5=12-14
D. İş piyasasına ve topluma tam katılım için gerekli okuryazarlık (bilgisayar kullanımı dahil)	D. en az 12 yıl	12+4-5=16-17

b- Tablo 4'ün altındaki "Ya Türkiye'deki Kürt çocukları?" cümlesi başlık değil.

4) Örnek 5.3'ün altındaki "Ya Türkiye'deki Kürt çocukları?" cümlesi başlık değil, bold değil.

5) 6. başlık (**Dilsel Soykırıma Karşı Koymak: Uluslararası Hukukta Anadiliyle Eğitim Konusunda bir Dilsel İnsan Hakkı Var mı?**) altında, Azınlık Bildirgesi'nin 1.1, 1.2, maddelerinde "italik" yazımlar kaybolmuş:

1.1. Devletler kendi ülkelerindeki azınlıkların varlığını ve ulusal ya da etnik, kültürel, dinsel ve dilsel kimliklerini *korurlar* ve bu kimliklerin geliştirilmesinin koşullarını *teşvik ederler*.

1.2. Devletler bu amaçlara ulaşmak için **uygun** yasal önlemler ile diğer önlemleri *alırlar*.

6) Tablo 5 çok karışmış, olduğu gibi yeniden yayımlanmalı.

Tablo 5. Ramirez ve diğerleri Araştırması, 1991, 2352 öğrenci

GRUP	EĞİTİM DİLİ	SONUÇ
Sadece İngilizce	İngilizce	Düşük seviyede bir İngilizce ve okul başarısı; hiçbir zaman gereken düzeyi yakalamama olasılığı
Erken-ayrılarak geçiş	1-2 yıl İspanyolca, sonra hep İngilizce	Oldukça düşük düzeyde İngilizce ve okul başarısı; gereken düzeye ulaşma olasılığı zayıf
Geç-ayrılarak geçiş	4-6 yıl İspanyolca, sonra İngilizce	En iyi sonuç; anadili İngilizce olanlarla hemen hemen aynı seviyeyi yakalama

7) Tablo 6'da "Araştırmaya Katılan Finliler" satırındaki rakamların yeri değişmiş. Bence bu tablo da yeniden yayınlanmalı:

Tablo 6. İsvেççe Test Sonuçları ve Deneklerin İsvেççe Yeterliliği Konusunda Kendi Değerlendirmeleri

	TEST SONUCU (1-13)		KENDİ DEĞERLENDİRMELERİ (1-5)	
	Ortalama	Standart Sapma	O	SS
İsvেç kontrol grubu	5.42	2-23	4.83	0.26
Araştırmaya katılan Finliler	5.68	1.86	4.50	0.41

8) Dergi'de, s. 23'de, sondan bir önceki paragrafta "Birçok ülke, azınlıklara yönelik dilsel ve kültürel soykırımı katılıyor olsa da, Türkiye, ne yazık ki dünyada bu konudaki en kötü ülkelerinden biridir, birkaç bakımdan en kötü..." cümlesi şöyle olmalı: "Birçok ülke, azınlıklara yönelik dilsel ve kültürel soykırımı katılıyor olsa da, Türkiye, ne yazık ki dünyada bu konudaki en kötü ülkelerden biridir, birkaç bakımdan en kötü..."

Bu benim hatam, cümledeki bozukluğu görememişim!

9) Tablo 8'e çok yazık olmuş. Bütünüyle ve doğru biçimde yeniden yayınlanmalı.

Table 8. Yerel Diller-Biyçeşitlilik Karşılaştırması

Ülke	Sıra, toplam sayı				Çiçekli Bitkiler	Yerel Kuş Bölgeleri (YKB)	Mega çeşitlilik listesinde mi?
	Sıra	Sayı	Sıra	Sayı			
PAPUA YENİ GİNE	1	847	13	203	18	6	evet

ENDONEZYA	2	655	4	673	7	1	evet
Nijerya	3	376					
HİNDİSTAN	4	309	7	373	12	11	evet
AVUSTRALYA	5	261	1	1,34 6	11	9	evet
MEKSİKA	6	230	2	761	4	2	evet
KAMERUN	7	201	23	105	24		
BREZİLYA	8	185	3	725	1	4	evet
KONGO DEMOKRATİK CUMHURİYETİ	9	158	18	134	17		evet
FİLİPİNLER	10	153	6	437	25	11	evet
ABD	11	143	11	284	9	15	evet
Vanuatu	12	105					
TANZANYA	13	101	21	113	19	14	
Sudan	14	97					
Malezya	15	92			14		evet
ETYOPYA	16	90	25	88			
ÇİN	17	77	12	256	3	6	evet
PERU	18	75	8	332	13	3	evet
Çad	19	74					
Rusya	20	71			6		
SOLOMON ADALARI	21	69	24	101			
Nepal	22	68			22		
KOLOMBİYA	23	55	9	330	2	5	evet
Coite d'Ivoire	24	51					
Kanada	25	47					

(Kaynak: Skutnabb-Kangas, Maffi & Harmon 2003: 41).

10) Dergide, s.31'de "Bazı Örnekler" başlık değil.

11) "***** İngilizce'de "immersion" sözcüğüne karşılık kullanılmıştır. Immersion-daldırma eğitim programları, artırıcı-additive ikidilliği geliştiren programlardır; bu eğitim programlarında ikinci bir dilde -çoğunluk dilinden başka bir dilde- öğretim yapılmaktadır; bu eğitim programlarındaki öğretmenler her iki dili de bilirler (ç.n)." açıklama notundaki "ikidilliği" kelimesi, "ikidilliliği" biçiminde olmalı. Benim hatam!

